

CON BÎVÊR



# Tîrsê Bîskênin

Li ser xwe beyî texmînkirina gunekarîyê, bêje na,  
Beyî xweşkirina besera mîriv, li ser tabîya xwe qewîn be.

Hevalê qedirbilind,

Hûn şabûna Xwedê û şabûna dilê Wî ne. Ew dixweze we nas bike û ji alîyê we da bê naskirinê. Li rex nêzîkbûna tevî Wî, Xwedê hûn dewat kirine bo hevkariyê, ku padişatîya ezmîn li ser dinîayê belakin. Çawa ku Pawlosê şandî dibêje, Xwedê “Ji nû va me nava Îsa Mesîh da çê kir, bona ku em bikaribin wan karên qenc mîaser bikin, Kîjan Ewî zû va bona me dabûne progiramkirinê” /Efesî.2:1O/

Em lawên Xwedê ne û em hemû jî dixwezin Bavê xwe bidine razîkirinê. Çawa ji hebe, gelek cara em wê yekê texmîn nakin, ci ku Îsa zelal got: “ Em bona mîaserkirina progiramên Xwedê qewatê distînin, dema ku em tevî Ruhê Pîroz dikevine nava tevgirêdana. Xwedê naxweze ku hûn tenê bo Wî kar bikin. Ew we dewat dike, ku tevî Wî kar bikin. Ew dixweze bibe hevalê we yî herî baş û her demeke nava emir da tevî we nîvî bike. Ew dixweze tevî we xeber bide û qewatê bide we. Wê tevgirêdanê bedewtir tevgirêdan tune, kîjan Xwedê bi rîya Ruhê Xwe pêşnîyar dike.

Xwedê dilê min ra xeber da û gote min, ku ez vê berbirîbûnê bidime we û serwêrên ruhanî ye li rex we, yêñ li temamîya cîhanê. Ez tewaqe dikim wê yekê tevî hizkirin û piştgirîya min qebûl bikin. Ewê derbazî li cem hemûya bikin, kîjana nas dîkin. Ez bawarim, wekî ev berbirîbûn wê bibe ya diha kûr û usa jî destpêka tevgirêdanê tevî Xwedê him bona we û him jî bona endamên komên we.

Eger hûn lawên Xwedê ne, Ruhê Pîroz soz daye ku wê tu cara ji we dûr nekeve. Hevaltiya Wî bêyî tu tişfî ya we ye. Rastiyê nava rûpelên vê kitêbê da jîyana min guhartine û ez dua dikim, wekî hûn jî bi lêkolînkirina rastîya ji Gotina Xwedê eyantîya kivş bistînin. Minê bi dil bixwesta bizanibûya, ku evê berbirîbûnê hukumekî çawa nava jîyana we û jîyanê wan meriva da hişt, derheqa kîjanada hûn difikirin.

Birayê we yî nava Mesîh da:



Con Bîvîr

JohnBevere@ymail.com



teach reach rescue  
**Messenger International®**  
MessengerInternational.org



# Tırsê Bişkênin

CON BÎVÊR

Xudanê kitêba “Tela şeytan”

Breaking Intimidation by John Bevere, Kurdish (Latin)

© 2014 Messenger International

[www.Messengerinternational.org](http://www.Messengerinternational.org)

Originally published in English as Breaking Intimidation by

Additional resources in Kurdish (Latin) by John & Lisa Bevere

Are available for free download at: [www.CloudLibrary.org](http://www.CloudLibrary.org)

To contact the author: [JohnBevere@ymail.com](mailto:JohnBevere@ymail.com)

“Tirsê bişkênin”, kurdî (bi zaravê kurmancî, bi tîpêñ latînî),

xudanê kitêbê- Con Bîvêr

© 2014 Messenger International

[www.Messengerinternational.org](http://www.Messengerinternational.org)

Cara ewlin bi zimanê înglîzî hatîye çapkîrinê,

bi sernavê “Tirsê bişkênin”

Hûn dikarin belaş matêrîyalên Con û Lîza Bîvêra ye mayîne bi zimanê kurdî li vê malperê ber bigrin: [www.CloudLibrary.org](http://www.CloudLibrary.org)

Bona ïzbatkirina tevgirêdana tevî xudanê kitêbê: [JohnBevere@ymail.com](mailto:JohnBevere@ymail.com)

## Ez spasîya xwe elamî:

jina xwe Lîzayê dikim. Peyî Xudan ra tu hevalê minî here hizkirî yî.

Ez ji Xudan gelekî razîme, ku min te stend. Spasiyê bona wan seheta elam dikim, ku te bona xebata li ser vê kitêbê pêşkêş kirin. Ez te hiz dikim, delala min. Her çar lawên me: Îdîson bona dilê teyî nazik ez razîme. Tu anegorî navê xwe dijî yî, fikira kîjanî “layîqî gumanê”-ye. Ostîn, ez bona ewê hizkirina te û nazikaya te razîme. Alêk’sandr, tu wan cîhya ronayî dikî, li kîderê tu diquesidî. Ez te hiz dikim. Ardên, te şabûneke bêqîmet pêşkêşî me kir. Con û Kêy Bîvêra, hûn dê û bavêن xwedêp’arêz bûne. Ez usa şame, ku Xwedê ïzin daye min, ku ez bibime lawê we, ez we herduya jî hiz dikim. Ez usa jî ji teşkîla xebatk’arêd “Qulixdarîyêن Con Bîvêr” razîme. Spas bona piştgirîyê û bona bawerîya we. Razalixîya mexsûs ez elamî Con Mêyson, dostê minî bê qelp, dikim, yê ku bi rastî bi açixîyêن merivêن mayînva şâ dibe, temamîya teşkîla xebatkarêن “Kriyeyşin Haûs”-ê , yên ku tevî me xebitîn û piştgirîya qulixa me kirin. Hûn hemû jî nava qulixê da hevalkarêن cudane. Tiştê herî girîng ewe, ku ez bi bê qelpî ji Bavê Ezmîn razîme, bo hizkirina Wîye bê sînor, Xudan Îsa, bona merîfeta Wî, rastîyê û hizkirinê, Ruhê Pîroz bona wê yekê, wekî Ewî pêşkêşî nava vê bernemê da li me kir.

## ***Gotina xudanê kitêbê***

---

Dema ku min ev kitêba dinivîsî, Xwedê sozê pêxembertîyê da min û got:

“Gelek meriv hene, yên ku xwe çawa bawarmendên eskerê Min, yên rojên dawîyê, hesab dikin, lê ew bi tirsêva girêdayîne”. Ew li ber Xwedê û meriva bi dilê paqijin, lê mînanî Gêdêon ew tirsa merivatîyêva girêdayîne /Hakimî. 6-8/. Pêşkêşen ku Min danîne nava wan, temirîne.

Ezê berbirîbûna evê kitêbê bidime rûnkirinê, bona ku ji wan meriva gelek azabin. Ew meriv wê rabin û wê bêyî tirs gura Minda bin. Ewê şerkarên li ser xwebin û wê bi hukumê Xwedê yê xwe serketinê mezin bidin”

---

## **İÇİNDEKİLER**

Pêşgotin.....	6
Naverok.....	7

### **Beşa yekemîn Nava tabîyaxweye ruhanî da îzbat be**

1. Bi wê serwêrtîyê bigere, ya ku bona te hatîye dayînê.....	11
2. Tabîya ruhanî û serwêrtî.....	21
3. Du tiştên nerast.....	31
4. Pêşkêşen dayî.....	41

### **Para duda Tirsêşkerekîn**

5. Pêşkêşen temirî.....	53
6. Ji tirsê destxweçûyî.....	65
7. Ruhê tirsê.....	77

### **Para sisîya Tirsê bişkênin**

8. Pêşkêşê gurke.....	91
9. Koka tirsê.....	105
10. Tenê xwestin bes nîne.....	119
11. Xofa Xwedê, yan tirsa mîriv?.....	135
12. Bişuxulin, yan cabê bidin?.....	153
13. Ruhê xwegirtinê.....	165
14. Pêşda bicedîne.....	181

# Pêşgotin

---

**E**va ïdî gelek salin, ku ez Con Bîvîr çawa qulixçîkî cahil û hevalekî giranbiha nas dikim. Ew yek bona min qedirekî mezine. Ez bi temamîya dilê xwe bawer dikim, wekî Xwedê ew berbi serkevtinê bilind kirîye, ku bawarîyê û gumanê bona vê nivşê bîne.

Con Bîvîr bi kitêba “Tirsê bişkênin” berbiribûnekê bona bedena Îsa tîne, kîjan ya dema nihayê û hewcetîya kîjanê geleke. Hewcetîya me heye, ku wan pêşkêşa bidine xebatê, kîjan Xwedê dane me, ku em bighîjine dinîayê. Dewsa wê yekê, ji me gelek meriv ji êrifşen kivş û ne kivş, yên li ser serkarîya meye nava Îsada, paşda vedikişin.

Cin bi her cûreyî wê qewila sazke û meriva bide xebatê, ku pêşkêşa teye nava Xwedê da bitemirîne. Nava Gotina Xwedê da gelek meselên bawarmenda hene, kîjan nava tirsê da bûne, lê bi şikênañdina wê yekê gihiştine serkevtinê. Em çend meriva bidine kivşê: Hêşû, Gêdêon, Nêmîya û Dawid. Kitêba Pîroz dibêje:

*“Hemû tiştê, ku dijî te hatine çêkirinê, gerekê li hev neyên”.*

*Îşaya 54:17*

Bi rîya vê kitêbê û qewata Ruhê Pîroz her bawermendek dikare tîrsê biqelêşe û serkeve. Bira Xwedê nava vê nivşê da eskerekî şerkarayî usa bilindke, kîjan wê tu cara paşda venekişe.

Con Mêyson

Xudanê kitêbên “Dijminê sade”, “Wî hemû tiştî dûrxe, çi ku dicêribîne te bide sekinandinê” û “Xeberên sozdayînê”.

**G**elek mesîhîyi dijî tirsê şer dikan, gelek jî dijî endamên tirsê şer dikan, lê ew gerekê dijî koka wê şerkarîyê bikin. Hûn niha maleke bihaye bi hemû qewilava razîkirî bînin ber çavê xwe, lê em bêjin, banê wê malê tune. Barana gur tê û temamîya malê şil dibe. Hemû tişt xirab diban. Wedekî dirêj wê lazimbe, ku meriv jî eşîayêni ji avê xirab bûyî azabe û nava malê paqîjke. Paşê xweyê malê gerekê bi kel û ced bixebite, ku dîsa ji nûva vî hemû tişfî dest bîne, ci ku xirab bûye.

Karek hela hê ser hevda nehatîye, lê bager tiştê çêkirî hildiweşîne. Bi undakirina gumanê, ew meriv dîsa dest pê dike wê xebatê bike. Piştî demeke kurt baran dîsa hemû tiştî xirab dike û ew merivê westîayî qewat û karebûna xwe unda dike. Bi undakirina gumanâ xwe, ew idî şerkarîyê nake û hînî halê pêşdahatî dibe- bawarîya xwe li yazîya xwe tîne.

Mixabin, eva tiştekî xêfikîye. Tê bifikirî: “Bona ci ewî banê avayî çênedikir?. Çimkî bi wê yekê ewê tişt unda nekira. Ci merivekî bêaqile”. Çawa jî hebe, tiştên vî cûreyî li cem gelek meriva heye, kîjan dijî tirsê şer dikan. Ew, dewsa şikêñandina qewata tirsê, dicedînin feydayêن wê rast bikin-bêgumanîyê, tevlîhevbûnê...

Hinek jî, bi berbirîbûna berbi pisîxolojîyê, dijî tirsê şer dikan, bona ku hînbin, ku çawa nêzîkî tirsêbin. Yê mayîn emirê xwe tesmîlî koletîya tirsê dikan, çimkî ditirsin, ku gumanâ wane azayê wê hebe. Ev herdu mesele jî mînanî hevin, ya bêyî banê avayî. Hinek jî başqe dibin. Ew gumanâ xwe unda dikan û ji wê malê dûr dikevin.

Berbirîbûna vê k'itêbê wê we hîn neke ku şer bikin, lê ewê rîya Xwedê ya bona azabûna ji tirsê bide eşkerekirinê, peyî kîjanê ra hûnê bikaribin nava emirê xweda pêşkêşa Xwedê mîaser bikin.

Min, dema xebata li ser vê kitêbê, li ber kompyûtêrê gelek sehet derbaz kirine û min pêşkêşîya Xudan tewaqe kirîye. Şebeqekê, wextê

ku ez li ser kitêbê dixebeitîm, min hazirîya Xudan li odê texmîn kir.

Ez ji ber kompyûtêrê rabûm, min dest pê kir bigerim û dua bîkim. Dema ku min dua dikir, Ruh'ê Xudanî pêxembertîyê peyayî li ser min bû û ev xeber derketin: “Kurê min, gelek meriv hene, yên ku xwe çawa bawarmendên eskerê Minî qewatî rojêna dawîyê nav di-kin. Lê ew tirsêva girêdayîne. Dilê wan li ber Xwedê û meriva pa-qije, lê ew mînanî Gêdêon tirma merivatîyêva girêdayîne. /Dat. 6-8/. Ew pêşkêşen, ku Min danîne nava wan, temirîne. Ezê berbirîbûna vê kitêbê bidime rûnkîrinê, bona ku gelek merivê wî cûr'eyî azabin. Ev meriv wê rabin û bêyî tirs ewê tes îmî lMin bibin. Ewê bi mîrxasî şer bikin û bi qewata Xwedê yê xwe serkevtinê mezin pêşda bînin”.

Ev yek tenê hînbûna xwedêzanîyê nîne. Bi sala ser hev ez tirsêva girêdayî bûm. Dijwarîya here mezin, rastî kîjanê ez dihatim, ew bû, wekî min hîmê problêmên xwe nizanibû. Xwedê ew dijmin da eşkerekirinê. Peyî wê yekê ra Xwedê ev berbirîbûn daye xebatê, bona ku li dinîayê mesîhîya azake.

Qulixçîkî carekê wa got: “Ev berbirîbûn gerekê li Amêrkayê destê her qulixçikîda hebe”. Ev gotin tenê bona qulixçîya nîne, lê bona her endamekî civînê ye. Ez bawar nakim, wekî ev kitêb bê feyda destê te da ye. Dema ku tu azabî, tewaqe dikim, ku tu evê berbirîbûnê derbazî merivê başqe bikî, kîjan hewcê wê ne. Wextê ku tu derbazî li cem wana bikî, ev berbirîbûn wê nava teda diha qewat be.

- Ez piştgirîyê didime te, ku tu nava duayê xwe da bighîjî min, wextê ku tu destpê bikî vê kitêbê bixwînmî, tewaqe dikim, dilê xwe veke û van xebera nava hazirîya Xwedê da bêje:

*“Bavo, bi navê Xudanê min Îsa Mesîh, ez tewaqe ji Ruhê pîroz dikim, ku xebera Te elamî min bike, wextê ku ez vê kitêbê bixwînim. Tewaqe dikim, ku Tu hemû bêbawerîyê eşkere bikî û ji emirê min dûr bixî, bona ku koka tirsê hişk be. Bira ez diha gelekî nêzîkî Te bim û li ser xwe gu-man şedetîya Xudanê xwe Îsa Mesîh bidim”.*

---

*Beşa yekemîn*

# **Nava tabîyaxweye ruhanî da îzbat be**

*Bi wê serwêrtîyê gava biavêje, kîjan Xwedê daye te,  
yan na kesekê wê yekê ji te hilde û wê dijî te bide  
xebatê*

## **Bi wê serwêrtîyê bigere, ya ku bona te hatîye dayînê**

**B**i qulixkirina bona Xudan, ez diha gelekî fem dikim, wekî Xwedê halên cûr bi cûr û meriva bona hazirkirina me dide xebatê, bona ku nava emirê me da pêşkêşa Wî mîaser bibe.

Sala 1983-a min kariêra xwe, qulixa înjênêrîyê, hişt, ku civînekê da bikevime nava qulixa alîkarîyê. Min tabîya xweda qlixî serwêr, jina wî, h'êmû mîvan û qulixçîya dikir. Min alî dikir, ku pirsên pilana duda bêne helkirinê, bona ku wana ew xebat bikira, bona çi Xwedê gazî wan kirîye. Peyî çar sala ra Xwedê ez ji wê qulixê derxistim, bona ku ez li civîneke mayîne mezin bibûma serwêrê gêncâ.

Wextê ku wedê çûyînê nêzîk bû, merivekî, yê ku tevî min nava wê qulixê da bû, gote jina min, ku Xwedê bo min soz daye wî. Peyî wê yekê ra, hetanî roja îroyîn ew gotin çawa eşaretî guhê munda nebi parastina min, bi îman û qewata xwe. Çawa her gotineke Xwedê ye rast, ew jî bona dilê min bû rênîş û usa jî çawa hîmê bona xweparastina ji nezelalîyê.

Ewî merivî eşaretî dabû jina min û gotibû: “Eger Con bi wê serk’arîkirinê pêşda neçe, kîjan Xwedê daye wî, kesekê ewê ji wî hilde û dijî wî bide xebatê”. Ev gotin hukumê xwe hişt. Min ew

çawa serwaxtîya Xwedê qebûl kir, lê min texmîn nedikir, ku ezê wê yekê çawa bidime xebatê. Ew ulma, wê paşê nava çend salada bihata.

## Cêribandina ku jîyanê dide guhartinê

Sala 1990-î Xudan ûzbat kir, ku pêşkêşa Wî ye nava jîyana min da wî çaxî ger û qulix bû. Wextê ku ez bi dema kurt ketime rê, peyî ra cêribandina ku emir diguhêre, li cem min pêşda hat, bi saya kîjanê min bi kutasî xeberên ku Xwedê ûzbat kirine, fem kirin, kîjan çend sal pêşda gotibûne min.

Me destpê kiribû li civînekê qulixê derbas bikin. Qulix hatibû programkirinê û gerekê êvara çarşemê destpê bûya û roja yekşemê ser hevda bihata. Ruhê Xwedê bi cûrê qewat dilivîya û azabûnên mezin, doxtirî û xilazkirin diqewimîn. Her êvar, wextê qulixê, hazırîya Xwedê diha gelekî eşkere dibû.

Nava hevtîya ewlinda jinekê, ya ku nava heja “Nyû Êyc”-ê da bû, bi cûrê kivş aza bû. Ev yek bû menîya guhartinê, kîjanê destpêka hişyarbûna mezin danî. Nava hevtêkê da, merivên ku 90 mîlî /mîlek beramberî 1,6 kîlomêtreye/ ji me dûrtir diman, gihîştine me.

Serwêr got: “Em nikarin van qulixkirina bidine sekinandinê. Xwedê bona me hela hê gelek xweyî kirine”. Ez qayîl bûm û me 21 qulixkirin derbaz kirin. Gotina Xwedê mînanî kanîke lez dikîşîya û pêşkêşen Ruh wextê her qulixkirinekê dihatine kivşê.

Nava hevtîya duda da, êvarekê, wextê min terîf dikir, min berê xwe veger’and û dîna xwe da sazbenda, dengbêja /li ser dikênežîkî 25 meriva hebûn/. Paşê min elam kir: “Li ser vê dikê guneh heye. Eger tu tobe nekî, Xwedê wê ewê yekê eşkere bike”.

Wextê ku gotinên min gihîştine guhê min, ez fikirîm: “Ay tera gîlî, ji kîderê ew gotin hatin?”. Hinek wede şûnda, peyî terîfkirinê ra, min fem kir, wekî wedê usa dibe, wextê ku r’ûnkirina Xwedê bi qe-

*Bi wê serwêrtiyê bigere, ya ku bona te hatîye dayînê*

wateke usa peyayî li ser te dibe, ku tu dikarî xeberên wî cûreyî elam bikî, kîjîan guhêñ te peyî gotinêr'a dibihêñ. Eva terîfa pêxemberîê ye, wextê ku em bi ruhê wî cûreyîva xeber didin.

Fikira min destpê kir derheqa gotina minda pirsa bide, lê min lez ew fikir dûrxistin, çimkî min zanibû, ku ci min got ji Xwedê bû. Min pêşda ew yek nedabû plankirinê. Rûnkirina terîfê li ser min giran bû.

Wextê qulixkirina reqema meriva zêde bû. Nava hevtîya sisîa da dîsa, wextê ku min terîf dikir, ez zivirîm û min pêçîya xwe berbirî merivêñ li ser dikê sekinî kir û bi qewata Ruhê Pîroz min elam kir: “Li ser vê dikê gune heye. Eger tu tobe nekî, Xwedê wê ewê yekê eşkere bike û tê bêyî dûrxistinê”. Min zêdebûna serwêrtiyê û îtbarîyê texmîn kir. Vê carê nava min da pirs pêşda nehatin, çimkî min zanibû, ku Xwedê nava wî şuxulî da ye, ku ji mala Xwe gune bide paqijkirinê.

## **Xwe gunekar bike, ku tu neîyî gunekarkirinê**

Eger guneh dizîva dikeve nava emirê te, Ruhê Pîroz me hîn dike, lê eger em guh nedînê, wî çaxî em bere- bere sar dibin. Ev yek wê aw-qas wede bikişîne, heyâ ku em dilêñ xweda himberî Wî dilovan nebin.

Dewsa wê yekê, ku em bighîjine alîk'arîya merivêd dora xwe û parastina wan, Xwedê yekî dişîne, ku şaşîyê eşkere bike. Xwedê vê yekê bi meremê şaşkîrinê nake, lê bona eşaretîyê û parastinê wê yekê dike.

Eger em hert’im guhdarkirinê înkark bikin, gunehkarkirinê bê:

*“Çimkî eger me xwe gunekar bikira, emê nehatana gunekarkirinê. Lê bi gunekarbûna ji alîyê Xudanda, em têne şîretkîrinê, ku em tevî dinîayê neyêne gunek'arkîrinê”.*

*A Korint’î. 11:31,32*

Xwedê guneh hinek wede temûl dike, ku wede bide bona tobe-kirina wî guneyî û wî cûreyî me ji cezayên Xwe diparêze. Nava ceza Xweye şîretkirinêda, Xwedê dixweze ku em tevî dinîayê neyêne gunekarkirinê. Kur’ê undabûyî ser hişê xweda hat, wextê ku goma berazada bû. Diha başe, tu bi xwe ser hişê xweda bêyî, lê ne ku nava guneyên xweda bimînî û rojekê dengê Xudan bibhêyî, Yê ku wê bêje: “... Ji min dûrk’evin, neheqno” /Metta 7:23/.

Eger em tobe nakin, em dizêrin, nenihêrî wê yekê, ku daxweza Xwedêye bona me ew nîne. Bi dayîna şedetîyêye derheqa wê yekêda, Pawlos dibêje: “Lema jî nava we da gelek nexweş û xweyî zede hene û hinek jî mirine” /A Kornt’î. 11:30/. Guneh, bi kutasî berbi mirina ruhanî û fîzîkî dibe. Min texmîn dikir, wekî Xudan şîretê dide yekî li ser dikê û dicêriband wî merivî berbi tobekirinê bibe, lê min zanibû, ku ew gotin bona kê bû.

## **Êrişkirina ne kivş ji alîyê tirsê da**

Êvara mayîn, dema ku em tevî serwêr li ofîsa wî bona qulixê hazir dibûn, serwêrek kete odê û got, ku qulixçîyê pesindayînê medekirîne û moralê wan nebaşe. Serwêr fikirî, wekî diqewime ew westîyâne û got: “Tu tenê bêje wana, ku bira derkevin û pesinê Xwedê bidin, besera xweye xirab dayînine alîkî”.

Min li serwêr nihêrî û got: “Deqekê bisekine, diqewime tiştek usa nîne?”.

Serwêr cab da: “Baş, ew difikirin, ku gelekî berkin û eger gotinêne weye bona wana hene, gerekê başqe, lê ne ku li ber hemûya wan re bêjin”.

Nenihêrî wê yekê, wekî min wî çaxî tu tişt nizanibû, lê ew dem demeke grîng bû. Usa derket, wekî miqabilî wê serwêrtiyê derketibûn, kîjan ji alîyê Xwedê da hatibû dayînê. Dijmin xweş nedihat, ku wextê wan berevbûna çi diqewimî û dixwest wê yekê bide sekinandinê.

Bijartineke min hebû, nenihêrî wê yekê, wekî wî çaxî min ew yek fem nedikir. Ez dikaribûm tesmîlî tirsê bûma û paşda vekişfama, lê wî çaxî minê serwêrtîya xwe unda bikira, yan jî ez dikaribûm nava wê serwêrtîyêda bimama. Min gerekê qewata tirsâ wan bişkênda û nava gotina Xwedêye mehkemda bimama.

Ez carekêra fikirîm: “Con, bona çi te ew meriv kirine nava şâşiyê. Bona çi te bêyî berêxwedayîna berbi wana ew yek terîf nekir?. Niha cimeta civînê zelalkirinava mijûle, ku kîye ew meriv, yê ku li ser dike ye û nava guneh da ye. Lê eger tu kes jî tune be?. Yan jî eger guneh heye, wê çi be, eger bê eşkerekirinê?. Cimetê şikber be, lê yên paqîj wê zyanêkevin. Civînê rastî çetinaya /dijwarîya/ bê. Gelo min edetên başe li vê civînê xirab nekirin?. Eger usaye, ewê navekî xirab bona min bîne, lê min jî gera xwe teze destpê kirîye”.

Ez hema usa nava van fikira da bûm. Tirsê min destpê kiribûn li ser fikirekê berevbin: “Gelo wê çawabe?”.

Bi vî cûreyî tirsê fikira te bide guhar’tinê. Menî ewe, wekî koka dudilbûnê hema tirs e û tirs jî dibe menî, wekî mirov li ser wê bisekinin. Hizkirinê da tirs tune, lê hizkirina gîhîştî tirsê dûr dixe, çimkî tirs xweyî cefaye û ewê ku ditirse, ew hizkirinê da hê negîhîştîye. /Yûhenna.4:18/.

Serwêr tu tişt negot, me her sê tevayî dest da destêd hev û dua kir, wekî xwestina Xwedê wextê wê berevbûnê mîaser bibe. Quлиxa me wî cûreyî destpê bû, çawa ku ew yek nava hersê hevtîada derbaz bû. Wextê pesindayînê min texmîn kir, wekî Gotina Xudan naeve dilê min. Min serwêrtî texmîn ne dikir, lê ez difikirîm, wekî Xwedê li ser gotina Xwe ye. Min zanibû, ku ezê çi bêjim, dema ku ez r’abûma ser dik’ê.

Pesindayîn ser hevda hat û wextê ku serwêr elametî bela dikirin, min dilê xweda tu tişt guhdar nedikir. Ez fikirîm, ku wextê ez rabime ser dikê û li wir bisekinim, Xwedêyê pêşikêşîyê li min bike.

Ez ne merivê tek- tenê me, yê ku wextê hazirbûna bona

terîfkirinê, nivîsarên anegor dike. Hîmlî ez lê dinhêrim, dua dikim û paşê bi dilê xwe Xwedê texmîn dikim. Nerihetîya min çiqas diçû zêde dibû, çimkî wede derbaz dibû û min zanibû, wekî eger Xwedê rîberîyê min neke, tiştên mine gotinê wê tunebin.

Paşê serwêr ez dame raberkirinê. Ez pêşda hatim û min got: “Werin em dua bikin”. Wextê ku me dua dikir, min texmîn dikir, wekî rîberî tune ye. Min çend deqa dua kir. Hal diha xirab dibû, çimkî nava dua yê minda jîyan tune bû. Xeber ji devê min derdiketin û diketine bin nigê min. Ez difikirîm: “Ezê çawa bikim?. Min qirar kir tiştekî ji Zebûra bêjim, kîjan min pêşda terîf kiribû.

Min destpê kir terîf bikim, lê min tu tişt texmîn nekir, çimkî nava wê gotinê da rûnkirin tune bû. Min dicedand fikirêñ xwe berevkim. Dihate texmînkirinê, wekî Xwedê hazir nîbû. Ez difikirîm: “Bona ci min ew yek got, ku min ji kîderê ev gotin Hilda ye?”. Şaşbûnê rîberî li min dikir, lê ne ku Ruhê Pîroz. Ez bi xwe ber dilê xwe da dihatim, wekî Xwedê wê rîberîyê min bike û wê min ji şaşbûnê xilazke. Lê çiqas diçû hal awqas xirab dibû.Bi kutasî min terîfkirin û qulix ser hevda anî, kîjanê 35 deqa kişand.

Ez şaşbûyî vege riame wî ciyi, li kîderê ez sekinîbûm. Ez berbirî Xwedê bûm: “Xwedê yê min, bona ci Te rîberî li min nekir, hetanî roja îroyîn hemû qulix gelekî baş û bi qewat derbaz dibûn, lê nava vê qulixêda jîyan tune bû.Eger ez dewsâ van meriva bûma, ezê idî neçûma qulixê. Bi rastî gotî, ez naxwezim paşda vekişim”. Wê şevê, dema ku ez ketime nava nivîna, min texmîn dikir ku tê bêjî min torbeqûm daqurtandbû.

Sibetira mayîn ez hişyar bûm û min texmîn kir, ku ew torbê qûmê werguhêzî herîyê-çemûrê bûye û min li ser xwe giranîke usa texmîn dikir, ku min nedixwest ji cî-nivîna rabûma. Şabûn ji min dûrketi bû. Ez derketim ku dua bikim. Min dîsa ji Xwedê pîrsî: “Bona ci Tu rîberîyê nakî?”.

Bersiv tune bû.

*Bi wê serwêrtîyê bigere, ya ku bona te hatîye dayînê*

-Min guneh kirîye?. Min tu xeyîdandî...?

Dîsa tu deng tune bû. Min sehetekê dua kir. Her deqek şerkarî bû. Min SD-ke pesindayînê pêva kir û min destpê kir bistirêm. Nîv sehetî min stira, nava kîjanê da jîyan tune bû. Ez diha gumanbir' bûm: "Min çi kirîye, bona çi Tu bersiva min nadî?".

Peyî xarinê ra ez çûme deşta nêzîk. Ez difikirîm, wekî îdî bese, ezê cin girêdim. Lê min tenê xwe girêdayî texmîn dikir. Li derva min sê sehereta dua dikir û dengê xweyî bilind li ser cin bela dikir. Îdî dema çûyîna malê bû û min gerekê xwe bona qulixkirinê hazir bikira. Ez ber dilê xweda hatim: "Peyî vê berxwedayînê ra vê êvarê Xwedê wê bi cûrê qewat pêşda bê. Con tu bi bawarî here".

Wê êvarê me dîsa şikirîya xwe Xwedê anî , lê nava minda dîsa ew tişt hebû, kîjan pêşîya vê qulixkirinê hebû. Ez dîsa fikirîm, wekî Xwedê wê bi deste min pêşda bê, wextê ku ez rabime ser dikê. Dîsa tu tişt tune bû. Min bona rêberiyê dua kir, lê dîsa ker û lal bû...

Min destpê kir tiştekî mayîn terîf bikim, kîjan min pêşda kiribû û ez dîsa ketime nava şaşiyê. Peyî vê şaşiyê ra, pênc deqe derbaz bûn û min got: "Cimet, hewce ye ku em dua bikin. Tiştek rast nîne". H'emû kes rabûne ser pîya û me destbi dua kir.

## Tırsa eşkerekirî

Ji 24 sehereta zêdetir şûnda nişkêva min cara ewlin dengê Xwedê bihîst. Ewî got: "Con, tu ji wan meriva tırsîyî, kîjan li ser dikê li piş te ne, tu ji tabîya serwêrtîya xwe derketî û pêşkeşa Xwedê nava te da temirîye".

Peyî vê yekêr'a işiqek vêket û ruhê min ronahî bû. Merivên li wir dua dikirin û nava pênc deqada Ruhê Xwedê bi rîya Kitêba Pîroz qewimandinên cûre- cûre nîşan da, wextê ku mîr û jîn tırsîyî bûne û çawa ew yek bûye menî, ku pêşkeşa Xwedê ye nava wanda temirîye. Min dît, ku çawa wana serwêrtîya xwe tesmlî dikirin û

unda dikirin. Peyî ra Ewî ez nava salêن mine derbazbûyî ra derbaz kirim û da kivşê, ku min jî ew yek kirîye.

Min carekêra destpê kir qewata tirsê nava xweda bişkênim. Mînaka duakirina wî cûreyî xilazîya kitêbê da heye. Nava 75 deqên mayînda mînanî merivê nava agir da, min ew gotinêن Kitêba Pîroz terîf kirin, kîjan Xwedê dida min. Wextê ku min xilaz kir, du-sêanîya cimetê pêşda hat ku ji tirsê aza bibe. Eva qulixa hisyarbûnê ye here mezin bû.

Hevtêk derbaz ne bûbû, wextê ku Xwedê destpê kir guneh yê li ser dikê bide eşkerekirinê. Zelal bû, wekî sazbendekî li ser dikê, peyî qulixê ra diçe û içikê veduxwe. Serda zêdekim, wekî yekî ku pesindayînêva mijûl dibû, tevî keçeve civînê ye cahil zinêkarâ dikir. Ew her du ji qulixê hatine dûrxistinê. Sazbend ji civînê çû, lê ewê ku bi pesindayînêva mijûl dibû tobe kir û hemû tişt da dasekinandinê.

Peyî hinek wede ra serwêrê pesindayînê û çend merivê mayîn nava civînêda bêtifaqî pêşda anîn. Yek çaranîya civînê dûr ket. Zelal bû, wekî serwêrê pesindayînê zinêkarîyêva mijûl bû û salek jî derbaz ne bûbû ew ji jina xwe cihê bû. Van axirîya ez pê hesîyam, wekî ew niha jî tevî jineke mayîn dijî. Nava vê bêtifaqîyêda tenê malbetek maye, ku ji hev cihê nebûne.

Evana ew merivin, kîjan ne razî bûn, ku ez himberî wana berk bûm. Xwedê eşareti dida wan. Gelo wê çiqas baş bûya, eger wana ew eşareti dilên xweda qebûl bikirana. Ez du cara vegerîyame wê civînê û min li wir diha gelek yektû û qewat dîtîye, ne ku pêşda. Serwê şirove dikir: “Xwedê civîna me paqîj dikir û wê yekê em diha qewat kirin. Pesindayîn û şikirfanîn tu cara usa aza nîbûye”. Ewî usa jî got, wekî hevraqayîlnebûn û nerazîbûnen pêşdahatî dirêj nekişandine û ew lez hatine zelalkirinê. Şikir ji Xwedê.

Ew çi ku Xwedê nava dua pênc deqêda got, zêde bû û werguhêzî terîfekê bû, kîjan te xwend. Ewî ev berbirîbûn daye min, ku ez temamîya dinîayê terîf bikim. Min gelek jin û mîr dîtine, yêن ku ji hêşîrîya tirsê aza bûne.

## Berbirîbûna bona hemûya

Nnihêrî wê yekê, wekî ev berbirîbûn wextê konflîkta dema qulixkirinê bona min hate dayînê, nefikire, wekî ew yek tenê bona wan mirova derse, yên ku li ser dikê disekinin. Gelek mesîhiyî dijî tirsê şerkarîyê dikan. Gelek cara ewên ku tirsîyane, texmîn nakin, ku miqabilî ci şer dikan. Mînanî gelek fêlên cin tirs jî veşartîye û nayê kivşê. Em tenê feydayên wê- şâşbûnê, kîmasîya bawarîyê texmîn dikan, bêyî zanebûna derheqa koka wêda. Eger min fem bikira, wekî ez tirsîyayî bûme, minê awqas li civînê şer nekira. Lê ez ji Xwedê razîme bona wê dersê, kîjan Ewî da min.

Nava gumanbirîyêda gelek miqabilî feydaên tirsê şer dikan, lê ne ku miqabilî koka tirsê. Li cem me dikare wedelî hatina ber dilada pêşda bê, lê şerkarîya me wê bi wê yekêva ser hevda neyê. Tu dikarî hemû rezên darê jê bikî, lê wextê ku koka wê saxleme, rezên wê wê dîsa bîghîjin. Ev yek dikare gumanbirîyê pêşda bîne, çimkî em texmîn dikan, ku em nikarin ji van çetinaya azabin. Emê gumana xwe undakin û emê li cîkî mayîn bijîn, kîjan ji wî ciyî dûrtire, li kîderê Xwedê gazî me kirîye.

Rastîya vê kitêbê wê alî te bike, bona ku tu ne tenê tirsê nas bikî, lê ewê te bi ulmê lazimva bide sîlihkirinê, bi kîjanî tê hêşîrîya tirsîye nava emirê xweda bişkêni. Ew yek dua yê mine, wekî hetanî ku tu dixwînî û bi vê rastîyêva pêşda diçî, azabî, ku pêşkêşa te çawa xulamê Xudan İsa Mesîh mîyaser bibe.

Diqewime niha tu hemû tiştî dikî, ku tu li ber tirsê ber xwe bidî. Gelek cara nava emirê meda em tiştekî usa divînin, kîjan hukumî li ser me dike û em safikirina lez digerin, lê gelek cara ew safikirina lez li ser mîriv gelek biha rûdinê. Ez dixwezim ku tu guhdarîya mezîn bidî li ser vê yekê û vê berbirîbûnê usa fem bikî, çawa ku ew yek bona min zelal bûye. Nava hersê parêن kitêbêye mayînda ezê derheqa wan hîmada xeberdim, li ser kîjana hûn dikarin qewînbin û tabîyameye ruhanî û serwêrtîyê fem bikin.

*Cin dicesdîne me ji tabîya me bavêje, bona ku bi wê  
yekê ew wê serwêrtîyê paşda bistîne, kîjan Îsa ji wî  
hildaye*

## **Tabîya ruhanî û serwêrtî**

**W**ere em wê gotinê gotûbej bikin, kîjan bona min hate dayînê: “Eger tu bi serwêrtîya ku Xwedê daye te, pêşda neçî, kesekê ewê yekê ji te hilde û miqabilî te bide xebatê”.

Berê e’wlin tiştekî gelekî ferze fem bikin, wekî nava ruhda cî yan jî tabî heye, kîjanîda em in- bawarmendên nava Îsada. Ji vê tabîyê jî serwêrtî tê û dijmin jî hema vê dixweze. Eger ew bikaribe usa bike, ku em serwêrtîya ji Xwedê dayî bidinê, ewê hilde û wê miqabilî te bide xebatê. Ev yek tenê hukumî li ser te nake, lê usa jî li ser wana, bona kîjana em xemxurin.

Gelek gotinê pîroz hene, kîjan derheqa tabîya serwêrtîya meye nava ruhdanîn, îzinê bide ez çend mînaka bînim:

“*Yê bin hêşîya Yê herî jorında dimîne, ew bin sîya Yê Herî Zorda rihet dibe*”.

*Zebûr: 91:1*

“*Ü ez derxistime cîkî bergefîre û ez xilaz kirim, çimkî ez begem kirim*”

*Zebûr: 18:19*

*“Nigê Min sekinîye rastîyêda û ezê Xudan nava cimetada pîrozkim”*

Zebûr: 26:12

Bi gilîkî bawarmend nava ruhda cîyê xwe digrin. Bona te bawarmendî /bawarmendê/ hatîye emirkirinê ne tenê wî cîyî naskin, lê usa jî gerekê nava wîda xebatê bikin. Eger tu cîyê xwe nizanî, tu nikarî li ser gumana nava bedena Îsada bixebitî.

Vê tabîyê û serwêrtîya tabîyê tu dikarî unda bikî, yan jî wê dikarin ji te bidizin. Meseleke Kitêba Pîroze berbiçav, ya Cihûda Îsxerîonîye.

Peyî wê yekê ra, wextê ku Îsa berbi Ezmînhate hilatinê, şagirt bona duakirinê berev bûn. Wî çaxî Petrûs şirove kir, ku çi hatibû serê Cihûda:

*“Çawa k’itêba Zebûrada jî nivîsare: de bira mala wî xirab be, kesek têda nemîne û de bira qulixê wîyî ser-wêrîyê yekî din bistîne”.*

K’arên şandîya 1:2O

Rûyê neheqîyê da Cihûda cîyê xweyî nava ruh da unda kir. /K’arên şandîya 1:16,17/. Eva ew cûrê hîmlîye, bi kîjanî dijmin mîriva ji serwêrtîya ruhanî derdixe. Ev bû menî, wekî Adem û Hêwa ji tabîya xwe bik’evin, lê cin ew avîtine nava telê û herdu jî kirine bin hukumê xwe.

Adem û Hêwa li ser tabîya serwêrtîyeye here bilind bûn. Her tişt bin serwêrtîya wan da bû. Xwedê gotibû: “... Wekî ew serkarîyê hemû masîyên behrê û teyredên ezmîn, heywana û hemû tiştên li ser dinîyâbikin. Li ser dinîyâbikin govekên ruhanî û fîzîkî da ji serwêrtîya bona mîriv dayî bilindtir tu tişt tunebû, tenê Xwedê bi Xwe bilind bû.

Dema ku Adem li cîyê xweyî serwêrîyê bû, wî çaxî tu nexweşîk, erdhej, xelayî yan jî kesîbtî tune bû. Li ser dinîyâbikin govekên ruhanî û fîzîkî da bû û ewî bi

serwêrtî û qewata Xwedê serkarî dikir. Lê rûyê guneyê Adem da nifira mirinê wî hemû tiştî hate kirinê, çi ku ewî serwêrtî lê dikir. Bi rîya gunehê ewî cîyê xweyî nava Ruhda da dijminê Xwedê.

Kitêba Pîroz derheqa wê yekê da şedetîyê dide, wextê ku cin li qûmistanê, wextê cêribandina Îsa kubar bû. Cin Îsa bire li ser çiyekî bilind, bona ku h'êmû padışatîyên dinîayê nîşanî wî bike û gote wî:

*“Ezê rewş û serwêrtîya van hemûya bidime destê te,  
çimkî min ra hatîye dayînê û kê ra ku bixwezim, ezê  
bidimê”.*

*Lîqa 4:6*

Xwedê serwêrtî tesmîlî Adem kiribû, lê Adem rûyê wê kirina xweda ew yek da cin. Xêncî undakirina cîyê xwe Adem usa jî gelek tişt unda kirin. Hemû tiştê ku Xwedê dabû bin destê Adem, hatine heramkirinê.

Ez mînaka heywana bînim: Şêrên baxçê bin serwêrtîya Xwedê û Adem da heywanên mayîn nedixwerin /Îşaya 65:25/. Lêxistinêner mera, yên jerkirî nîbûn /Îşaya 65:25/. Berx ji gura neditirsîyan, yên mayîn jî neditirsîyan, ku bibine nêçîr /Îşaya 65:25/. Feqet peyî wê yekê ra em divînin, wekî heywanên bêsûc û gune dibine qurban. Diha dereng em divînin, wekî dijminatî û tirs nava tevgirêdanêner mîriv û heywana da cîyê xwe digre, kîjan wextekê ewî serwêri lê dikir.

Goveka mayîn, ketina kîjanê hukumê xwe hişt. Nifir li axê hate kirinê. Dewsâ qulixkirina bona mîriv ewî miqabilî mîriv kar kir, çimkî meriv gerekê bi kel û ced bixebeitîya, ku rez bistîne, bi kîjanî wede da ew razîkirî bû. NavaRomaya da 8:2O-da tê gotinê: “Belê, efrîn jî ber bayê betalîyê ketin, ne ku bi hemdî xwe, lê Xwedê ew dane vê yekê. Lê belê ew guman hebû”.

Li ser dinîayê tu tişt, dixwezî ew fizîkî, yan jî ruhanî be, nikaribûn ji feydaên gurênekirinê dûrkeve. Barbarî, mirin, nexweşî, çetinayî, xelayî û gelek tiştênen mayîn ketine dinîayê. Wî çaxî undabûna qeyde-

qanûnê Xwedê û serwêrtîyê qewimî. Nuxurîyê Adem hîn bû hiz neke, dexesiyê bike û bikuje. Dijmin parastin û çareserîya ji Xwedê dayî hilda û ew yek miqabilî efrînê da xebatê-bona wêrankirinê û mirinê.

## **Serwêrtîya dasekinandî**

Mirov tabî û serwêrtîya xwe unda kirîye û ew jî dikare wê yekê bide dasekinandinê, paşda bîne. Bi hezara sala şûnda Îsa hate dinîayê. Dayîka wî dota ji cimeta Xwedê derketîbû. BavêR saI uhê Xwedêyî Pîroz bû. Ew nîv merî û nîv Xwedê nîbû. “Qîza bikir wê hemlebe, kurekê jêra bibe û navê wî Îmanûêl wê dayînîn” ku tê femkirinê: Xwedê tevîmeye”/Metta. 1:23/. Ew meriv bû û îzina qanûnî dane Wî, ku ew wî hemû tiştî paşda bistîne, ci ku hatibû undakirinê. Çawa ku Îsa Kurê Xwedê bû, Ew ji serwêrtîya ku dijmin ji mîriv dest anîbû, azabû. Îsa xwestina Xwedê elam kir û ci got, ew jî kir. Gu-neh dihatine baxşandinê, çimkî nava hazırîya Wî da serwêrtîya gu-neh tune bû. Sistbûn û nexweşî li ber serwêrtîya Wî û qewata wî ta dibûn /Lûqa.5:2O-24/. Tebyet bi xwe tesmîlî emirkirina Wî dibû. Îsa bi wê serwêrtîyê digerîya, ji kîjanê Adem paşda sekinî. Îsa bi saya gurêkirinê sebirê serwêrtîya ji Xwedê dayî da dasekinandinê, kîjan Adem undakiri bû, usa jî tevgirêdanameye tevî Xwedê.

Hetanî paşdahatina li cem Bav, Îsa elam kir: “... Hemû hukumê erd- ezmên min ra hate dayînê. Niha herin hemû mileta hînkin û bi navê Bay, Kur û Ruhê Pîroz binixumînin û wan hemû temîyên ku min dane we, mileta hînkin, wekî ew xweyî bikin. Ez jî iro da timê heta axirîya dinîayê t’evî we me” /Metta.28:18-2O/.

Femdarîye, wekî Îsa dîsa ew tişt dest anî, ci ku Adem unda kiribû û serbara serda hela tiştekî zêde. Cin û Adem tenê li ser dimîayê dikaribûn serwêrtî bikirana, lê serwêrtîya Îsa ne tenê li dinîayê, lê usa jî li ezmîn heye. Îsa ji serwêrtîya cin jortire. Peyî elamkirina tabî û serwêrtîya Xwe ra, Îsa mera got: “Dêmek, herin”.

Bona çi Îsa serwêrtîya Xwe pêşkêşa meva dide girêdanê. Caba wê em nava nivîsarên Pawlos da divînin.

## **Tabîyên serwêrtîyê**

Pawlos dua dikir, ku em bizanibin: "...Û çîye ew qewata wîye mezine bêhimber, ya ku nav me bawarmenda da dixebite. Eve ew qewata wîye zor, ya ku Xwedê ser Mesîh da xebatê, gava ew ji nava mirîya rakir û li dîyarê E'zmana kêleka xweye rastê da rûniştandinê" /Efesî. 1:19,2O/. Pawlos zelal dibêje "cî". Hîmê wê yekê em peyî çend gotina ra divînin, wextê ku em dixwînin: "Hûn ji dest neheqî û gunehê xwe mirî bûn, gava hûn peyî edetên vê dinyayê diçûn li gora xwestina Mîrê serwêrtîya vê hewê, ruhê kö niha jî nava merivada ya xwe dike, yên ku ne gura Xwedêdane. Yekfîya wî da em ji mirinê rakirin û tevî wî em li dîyarê ezmana dane rûniştandinê, bi saya Mesîh Îsa" /Efesî. 2:2,6/. Evana ew cîne, li kîderê lawên Wîye xilazkirî dijîn.

Niha em pirsekê bidin: "Ev cîyên jîyînê li kîderêne û ew tabîyên çawadanin?". Caba vê yekê nava Efesî -1:21-êdane: "Ew danî ser hemû serwêrtîya, hukumetîya, qewata, xudantîya û usa jî ser hemû navên, ku têne hildanê, ne ku tenê li vê dinyayê, lê wê dinê jî".

Merivê xilazkirî, yên ku nava Mesîh da nixamtîye, niha nava Ruh da tabî stendiye, kîjan ji tabîya cin bilindtire. Îsa bi cûrê zelal elam kir: "Awa min hukum daye we ku hûn mer û mişka û qewata dijmin pêpeskin û tu tiştê zirarê nede we" /Lûqa. 1O:19/.

Niha hema ew temî femdarîye, kîjan dibêje: "Dêmek, herin". Îsa fem dikir, ku serwêrtîya çawa tesmîlî bawarmenda dikir. Bûyîna me mafê tabîyê dide me, ku em li van cîya ji serwêrtî û qewata dijmin bilindtir bûn.

Çi ku cin li baxçê Adem û Hêwayê himberî wana kir, îro jî cedandina nahêvşîne, ku em ji tabîya ruhê xwe derkevin, bona ku ew

dîsa serwêrtiyê dest bîne, kîjan Îsa ji wî paşda hildabû. Wextê ku cinra li hev tê serwêrtiyê bidize, yan jî usa bike, ku meriv serwêrtiya xwe tesmlî bikin, ew dîsa serwêrtiya kirinê xwe distîne. Pawlos bi cûrê gelekî femdarî dibêje: “Û cî nedine mirê cin” /Efesî. 4:27/. Em, bawarmend, gerekê tabîya nava ruhê xweda tesmlî nekin.

## **Tabîya qulixê nava padişatîyêda**

Em gerekê fem bikin, wekî padişatîya Xwedê hema xût padişatîye. Padişatî hema li ser tabîyen qulixkirinê û serwêrtiyê têne hîmdanînê. Serwêrtiya ezmîn jî usaye. Tabî û serwêrtiya diha bilind û diha bi hukum heye.

Nava baxçe da cin nedabû peyî fil yan jî şêr. Ewî fem dikir, ku serwêri çîye û peyî merivê Xwedê ketibû. Ewî zanibû, ku eger ew bîhîje mîriv, wî çaxî ewê serwêrtiyê li wî hemû tişîf bike, kîjan ji alîyê mîrivda dihate serkarîkirinê û xweyîkirinê.

Bona wê yekê jî, wextê ku cin peyî civînê dikeve, nîşangeha wîye hîmul hema serwêr bû.

Van axîriya serwêrekî civîneke mezin qirar kir, ku ji jina xwe cihêbe. Bona wê yekê tu hîm tune bûn û ew yek bû xirabî bona jin û zarokên wî. Wextê ku serwêrên mayîn menîya cihêbûna wî pîrsîn, serwêr cabda, wekî eger ew yek wana xweş nayê, ew dikarin dûrkevin.

Ewî, bi teribandina temîyen Xwedê, li her dera ruhê cihêbûna jin û mîr û yên xapîayî bela dikir. Peyî wê yekê ra li wê civînê cihêbûnên jin û mîra zêde bûn. Gelek meriv ji wê yekê gumanbir bûn. Ew şaso-p’aso bûn û ji civînekê diçûne yeke mayîn û dipîrsîn, ku gelo dikarin îtbarîya xwe kê bînin. Wextê ku cin derbê dîghîne xweyîkirê malêû wî ji tabîya wî davêje, wî çaxî ewênu ku ji alîyê wî da têne xweyîkirinê, dikarin derbê bistînin. Min dîtiye ku çawa dê û bav bi kêfa xwe temîyen Xwedê diteribînin. Hinek wede şûnda zarokên wan peyî mesela dê û bava diçin. Diqewime tu vê yekê çawa nîfir

navkî, lê gelo ew yek bona ci diqewime?.. Bi rîya guneh dê û bav tabîya xweye serwêrtiyêye nava ruhê xweda tesmlî dikin û bi wî cûreyî zarokên xwe bona dijmin dikine nîşangeh.

## **Bi dayîna mecalâ bona dijminê Xudan**

Ev prînsîp bi mesela emirê Dawid tê raberkirinê /B Padiş. 8-18/. Padişatî hêna serkarîkirina Dawid diha qewat û xweyîkirî bû. Xwedê çend kur û qîz dabûne wî. Paşê Dawid bi xwe ew tişt hilda, ci ku Xwedê nedabû wî: Dawid tevî Bêrsabêyê zinêkarî kir. Bêrsabê hemle bû. Hal diha gelekî çetin bû, çimkî mîrê wê jinê ji wê derê dûr bû, ew li deşta şer bona padişatîya Dawid şer dikir.

Dawid meriv şandine peyî mîrê wê-Ûrya, bi wê gumanê, ku ber dilê wîda bê, ku ew bê cem jina xwe. Bi wê yekê wê usa derketa, ku Ûrya bavê wê zarêye. Ûrya qîrar kir ku hetanî wî çaxî nêzîkî jina xwe nebe, hetanî ku leşker li deşta şêrdabin. Progirama Dawide bona veşartina gunehê wî nexebitî. Ewî zanibû, wekî hinek wede şûnda Ûryayê bizanibe, ku jina wî hemleye. Hemû kes jî wê bizanibûna, ku bavê zarê Dawide.

Bona wê yekê jî Dawid kuştina Ûrya da teşkîkirinê û ew paşda şande deşta şer. Ew danîne li ser ciyê şerî here gur. Wextê ku dijmin dora wî girt, şerkarê tevî Ûrya ew hiştin û dûrketin, çimkî usa hatibû progiramkirinê. Ûrya kete destê dijmin. Zinêkarîya Dawid ew bire berbi fîlbaziyê, derewkirinê û merivkujîyê.

Zûtirekê Natanê pêxember hate cem Dawid ku wî gunehî bide eşkerekirinê. Dawid xwe mikur hat: “Min miqabilî Xudan guneh kirîye”. Paşê Natan gote Dawid: “Xudan jî gunehê te baxşand, tê nemiri” /B P’adiş. 12:13/.

Dawid tobe kir û baxşandin stend. Xwedê ew ji gunekarîya wî aza kir. /Îşaya 43:25,26/. Lê Nat’an eşareti da Dawid: “Çimkî te mecal da dijminê Xudan...” /B Padiş.12:14/.

Dawid baxşandin stend, lê emirê wî û malbeta wî bona dijminên Xwedê bûne nîşangeh, ne tenê bona dijminên fizîkî, lê usa jî bona yên ruhanî. Malbeta wî û cimeta Îsraîlê zêrandinên mezin dîtin.

Zara Dawide ewlin, ya ji Bêrsabê, mir. Kurê Dawidî mezin-Amnon, yê ku gerekê peyî wî ra bibûya padişa, xwîşka xwe-Tamara, şuhurand. Kurê Dawid û birayê Tamarê Abîşalon bi heyfildanêva tijî bû û birayê xwe Amnon kuşt. Abîşalon dilên gelek merivên Îsraîlê vegerande miqabilî Dawid û bû xweyê textê wî. Ewî merivên Îsraîlê şand, ku Dawid bivînin û bikujin. Ew yek mîaser nebû, lê Abîşalon hate kuştinê.

Sê kurên Dawid mirin, çimkî rûyê gunehê wîda ewî derên xweyîkirina malbeta xwe li ber dijminên Xwedê vekiribûn.

Min zarên qulixçîya dîtine, kîjan narkotîka didine xebatê, bi dijminatî nêzîkî civînê dibin û gelek tiştên xirabva mijûl dibin, çimkî dê û bavêwan bi rîya nerastîyê tabîyênu ruhêna xweda tesmlî kirine. Hewcetîya me heye, ku em bi guhdarîke mezin nêzîkî Kitêba Pîroz bibin, wextê ku ew dibêje: “Bira gelek ji we, birayênu min nebîne dersdar, çimkî hûn zanîn dîwanê ser me dersdara hê giranbe”/Aqûb. 3:1/.

Menîya gunekarbûna dersdaraye bi cûrê diha berk ewe, wekî gurênekirina wana wê hukumê diha mezin bihêle. Ew ne tenê zyanê didine xwe, lê usa jî dîghînîne wan hemûya, yên ku bin xweyîkirina wanadanin. Xwedê wana dibaxşîne, çawa ku baxşande Dawid. Lê ewê wê yekê biçînin, ci ku wana çandîye, cî dane dijmin.

Ez fem dikim, wekî ev gotin gelekî giranin. Ez li ber we ta dibim, berbirî we dibim. Û van gotina bi tîrs dinivîsim û pêra jî diricifim. Me gelek tragêdiya dîtine, xwezima nava qulixkirinada. Em gerekê gunekar nekin. Hewceye, ku em bibaxşînin û bighîjine wana, yên ku jî wê rê derketine. Eger ew tobekin, Xwedeyê bibaxşîne wana. Lê ez wan gotina çawa hînbûn û eşaretfî dinivîsim, kîjan ji alîyê dijminda wê bibine nîşangeh.

Çar kurên min hene û ez hatime li ser wê fikirê, wekî ez bona emirên wan cabdarim. Ew yên Xwedêne. Ez tu cara naxwezim wana nava halêن xirab da bivînm, çimkî min bi xwe cî nedaye cin.

Wextê ku ez nava qulixa alîkirinê da bûm, min dîna xwe dida hinek tiştên grîng, bona ku ew merivên ku min bona wan qulix dikir bikaribin pêşkêşa Xwedê mîaserkin. Min dîna xwe dida paqîjîyê, zarêن wan ji mektebê danîn, avtomâşinêd wan dişûştin û tiştên mayîn. Rojekê Xwedê min ra xeberda û ewê yekê alî min kir, ku ez bi guhdarîke diha mezin nêzîkî qulixêbim: “Kurê min, eger tu nava evê tabîya xweda bêterbetîyê bikî, rastkirin hêsabe, çimkî tu tevî tiştên fizîkî dixebeitî. Lê wextê ku ez te daynime nava t’abîya qulixê, tê tevî meriva bixebeitî, lê xebata tevî emir lîstik nîne”.

## **Serwêrtîya tesmlîkirî**

Nêta evê beşa kitêbê ewe, ku tu derheqa serwêrtîyê û tabîya ruhanîda bizanibî. Me çend mesele anîne ber çeva, kîjana serwêrtîya xwe unda kiribûn, yan ji tesmîlî dijminê Xwedê kiribûn. Cinê eşkere bicêribîne serwêrtîya te bidize, wê guneh bîne nava emirê te. Eger te qirar kirîye bi dilê xwe qulixî Xwedê bikî, ewê bicêribîne derbê bighîne te û bi destî tirsê te ji tabîya nava Mesîhda derxe.

Gava şikêndina tirsêye ewlin ewe, ku tu dilê xweda tiştên ku çetinaya pêşda tînin, bipelçiqmî. Beşa kitêbêye mayîn da ezê bêjim, ku gerekê çawa wê yekê bikin.

*Qîmetê eyantîyê bêyî serwaxtîyê û xeysetê ku tu pêva  
dijîyî, tune.*

## Du tiştên nerast

**R**uhê Xwedê nava çend deqîqada dikare bi beşeke eyantîyêye mezin ruhê te tijî bike, lê ew eyantî bêqîmete, eger nava wê yekê da zanebûn û xeysetê ku tu bi wî dijîyî, tune bin.

Wextê ku Ruhê Pîroz bi rîya xeberên Kitêba Pîroz rêberî li min kir, kîjan derheqa şerkarîya miqabilî tirsê bû, Ewî du tiştên, ku nerastin, nîşanî min kirin, kîjan emirê bawarmenda ji balansê /wekehevîyê/ didine derxistinê. Ya ewlin ewe, ku peyî qewatê diçî, lê ya duda jî şikestîbûna qelpe. Temamîya balansê em nava emirê Tîmotêyo da divînin, yê ku diha gelekî xeysetê xwedêparêz çê dikir, lê ne ku şikestîbûna qelp û diha gelekî pêşkêşa nava xwe da pêş dixist, lê ne ku peyî qewatê diçû.

### Dilê paqij

Pawlos cara ewlin li Lyûstrîayê rastî Tîmotêyo hat. Ew cahilek bû, dayîka kîjanî cuhîya mesîhî bû, lê bavê wî yûnan bû.

Pawlos dixwest ku Tîmotêyo rêberîyê wî bike, lê Şîxa jî bibe

alîk'arê rêuwîtîya wana. Tîmotêyo gerekê piştgirîya Pawlos bikira /Karên şandîya 19:21/.

Hinek wede şûnda helaltîya Tîmotêyoye çawa qulixçî pêşda hat. Tîmotêyo hate bilidkirinê û îtbarîya xweye himberî wî, ya çawa qulixçiyê Kitêba Pîroz, dane kivşê. Pawlos nava nema xweye duda da, ya ser navê Tîmotêyo dibêje:

*“Ez wê bawariya teye dilê sax tînime bîra xwe, ya ku berê cem pîrika te Loyîsê û dîya te Eynikê hebû û ez bawarim, ku ya te jî heye. Bona wê yekê ez tînim bîra te, ku tu agirê pêşkêşa Xwedê hê gur bikî, ya ku bi dest-danîna min ter'a hate dayînê”.*

B Tîmot'êyo. 1:5,6

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî Pawlos wê yekê bîr tîne, ku bawariya Tîmotêyo bêqelp bû. Dilê wî cahilî paqij bû. Ew helal bû. Nava nameke mayînda Pawlos xeberên pesindayînê dibêje: “Gumana min ser Îsa Xudan heye, ku ezê zûtirekê Tîmotêyo ser weda bişînim, ku dilê min rihet be, gava ez halê we pê bihesim. Ez dilê xwe ra yekî mîna wî nabînim, ku bona halê we mînanî pêşewitîkî xema buxwe. Çimkî yên mayîn her kes li peyî kara xwe ketine, lê ne ku pey Îsa Mesîh. Lê hûn xwexwe zanin, ku ew yekî çawayî cêribandîye û xwexwe tevî min Mizgînidayînê ra usa xizmet kir, çawa kur bavêra”/Filîpî. 2:19-22/.

Tiştekî femdarîye, wekî pirsa xeysetê Tîmotêyo nedihate guvtugokirinê. Çawa mesîhî xeyset gerekê pirsa pêşin be û berbi wî bicedînin. Ci ku Bavê me digere, ew yek ne qewate, lê xeysete. Tiştekî berxweketinê ye, wekî roja îroyîn nava civînê da gelek meriv dane peyî qewat û rûnkirina Ruh, lê naxwezin xeysetê xwedêparêzîyê bigerin. Nava kaxeza Korintîaye ewlinda, 14:1-ê da me wa hîn dikin: “Dîna xwe bidne hizkirinê û heyra pêşkêşen ruhanîbin...”. Lê ew temî me nav hev xistine. Em pêşkêşa û rûnkirinê digerin, lê rezê

hizkirinê em nava emirê xweda dixwezin. Xwedê hizkirine û hetanî ku em nava hizkirinê da negerin, emê wê yekê dest neynin.

**Rêke ne baş jî ewe, wextê ku tu diha gelekî berbi qewatê  
dicedînî, ne ku berbi xeyset**

Hinek mesîhî rûyê dûr diçin, bi seda kîlomêtra dûr diçin, ku herin bîghîjine qulixeke wî cûreyî, lê ew naxwezin ji dilên xwe hêrsê, baxşandinê, yan jî telayê berdin. Ev yek şedetîyê dide, wekî ew guhdarîyê didine li ser qewata hê zêde, ne ku li ser xeyset.

Nava van qulixada nîşandayînên ruhanî dikarin ji Xwedê jî bin. Lê em borcedarin usa jî tevî merivê hundurê xwe kar bikin. Nerazîbûna bona karê hundurê xwe da derî vekirîye. Nenihêrî wê yekê, wekî nava vî wedeyî da civîn pêş dikeve, gerekê guneh bidine dûrxistinê. Tiştekî gelekî başe, wekî meriv hewcê qewata Xwedêne, lê werin em paqijaya dil bîr nekin.

Me gelek qölixçî dîtine, kîjan ketine. Ew rûyê wê yekê da neketine, wextê ku wana gavêni ji rêderketinîye ewlin avîtine. Na xêr, ew hela hê pêşda dest pê kirine bikevin. Ketin hema ji wê rojê da destpê bûye, wextê ku wana açixîya nava qulixê da diha gelekî grîng hesab kirine, lê ne ku heleqetîyê tevî Xwedê.

Îsa got: “Xwezî li dilpaqija, çimkî ewê Xwedê bivînin”/Metta:5:8/. Ewî got: “Xwezî li wan, yên ku wê qulixa açix mîaser bikin”. Ewî got, wekî bêyî dilê paqij hûnê Xwedê nevînin. Bêfitîya tenê Îsaye, ku dikare dilê paqij bide me. Ew tiştekî usa nîne, ku em bikarbin qazanc bikin. Ew him bahê wê tune û him jî belaşe. Ew bêbihaye, çimkî dewa mirina Kurê Xwedê kir û belaşe, çimkî bêyî tu tişti bona wan meriva tê dayînê, kîjanê Îsa bigerin.

Min dua dikir: “Xwedê yê min, min bide xebatê, ku ez bîghîjime undabûya, ku bikaribim wana qenckim û gelek meriva azakim”. Min hert’im vî cûreyî dua dikir û ev yek para gera mine Xwedê bû.

Meremê minî herî bilind ew bû, ku ez qulixçîkî açix bim.

Rojekê jî Îsa bo min da kivşê, wekî ew tişt , çi ku ez guhdarîyê didime ser şâse. Gotina Wî ez zendegirtî hiştim: “Con, Cihûda cin derdixistin, nexwêş qenc dikirin û Kitêba Pîroz dixwend. Ewî karê xwe hişt, ku bibe şagirtê Min, lê roja îroyîn ew li kîderê ye?”. Ev yek tê bêjî mînanî tonne bar ser serê min da ket. Paşê ewî xebra xwe berdewam kir: “Meremê navê mesîhîtyeye herî bilind ew nîne, ku bîghîjine qewata Xwedê, yan jî qulixê, lê naskirina Mine”/Filîpî. 3:1O,15/. Dîha dereng, wextê ku jina min dua dikir, ku Xwedê wê anegorî ewê navnîşê bide xebatê, Îsa ji wê dipirse: “Lîza, hebûye car, ku tu ji alîyê hevalê xweda hatî xebitandinê?..

- Belê-, ew bersivê dide.
- Te li ser xwe ew yek çawa texmîn dikir?.
- Ew bersivê dide: “Min texmîn dikir, ku ez hatime xapandinê”.

Îsa gotina xwe berdewam dike: “Lîza, Ez meriva nadime xebitandinê. Ez rûn dikim, qenc dikim, didime guhastinê, dikime anegorî şikilê Xwe, lê Ez wana nadime xebatê”.

Tê çawa derheqa wê jinê da xeberdî, ya ku dicedînebona mîrê xwe zaroka bîne. Ewê tenê wî çaxî nêzîkî mîrê xwe be, wextê ku qirar bike ku peyîhatîyê wan hebe. Hewaskarîya jina wî cûreyî wê tune be, ku mîrê xwe ji nêzîkva nas bike.

Ez zanim, wekî ew yek xêfiktîye. Feqet ew yek bi çiqasîva cuda dibe ji wê yekê, wextê ku em berbirî Xwedê dibin, ku Ew me bona xilazkirina wan meriva bide xebatê, wextê ku em bi xwe heleqetî û hevaltiya tevî Wî navînin. Wextê ku em tevî Xwedê dikevine nava tevgirêdana, wî çaxî meremê Wî mîaser dibe: “Lê cimeta ku Xwedê nas dike, gerekê pêşkeve û kar bike” /Danîêl 11:32/. Ceddandina Pawlose tek- tenê naskirina Wî bû /Filîpî. 3:8-1O/. Mûsa digot: “Rêyên naskirina Xwe bêje, ku ez Te nas bikim /Derketin. 33:13/. Dawid kire gazî: “Ez ji Xudan tiştekî tewaqe dikim û minê gelek bixwesta, ku ez hemû rojêñ emirê xwe li mala Xudan bijîm,

wekî şikirîya Xudane bedew bivînim û dîna xwe bidime mala Wî /Zebûr. 27:4/. Û dîsa: “...ruhê min bona Te tîye: bedena min Te dixweze” /Zebûr. 63:1/.

Ew jin û mîrêne Kitêba Pîroz, yên ku ji hemû tiştî zêdetir dixwezin Xwedê nas bikin, himberî Wî helal man. Ew hînî sura qewata wî bûn. Wana kûraya dilê Xwedê nas kir.

Hinek meriv çapa gîhîşfibûna ruhanîya xwe bi pêxembertibûnê, yanê jî nava pêşkêşa da qîmet dikin. Lê bira bîra te da bimîne, ku pêşkêş têne dayînê, lê naêne qazanckirinê. Guhdirêjekî xeberda û dît, ku kete nava goveka ruh. Dîkekî sê cara bang kir û miqabilî Petrûs derket. Gelo ev h’emû tişt heywan kirineruhanî?.

Îsa got, wekî gelekê Wî çawa Xudan navkin û wê hîvîyê bin, ku bikevine nava padışatîya Xwedê, lê ewê bêne înkarkirinê. Ewê bi navê Wî pêxembertîfîyê bikin, berî cina bidin, lê Ewê bêje: “Ji min dûrkevin, heramno” /Metta 7:23/.

Eger tu rûnkirîyî ew yek nade kivşê, ku te ji Wî begemî stendîye. Shaûl peyî wê yekê ra bû pêxember, wextê ku Xwedê idî ew înakiribû. Kayîapa wî çaxî bû pêxember, wextê ku meremê wîyî tekkenê kuştina Kurê Xwedê bû /Yûhenna. 11:49-51/. Dilê me gerekê yê mînanî Xwedê be, bona ku em bikaribin gura Wî da bin. Bêyî wê yekê emê bin sîya rûnkirina Wî da bigger’in û ji rastîyê bizêrin.

Pawlos qîmetîyên Tîmotêyo bi paqijaya dilê wî çap dikir. Em jî gerekê vê yekê bidine li ber xwe û ïzinê bidine Ruhê Pîroz, ku ew bi cûrê rast me qîmet bike. Ev tiştê ferz /grîng/ nikare bê bilindkirinê, wextê ku em dikevine nava şerkarîya miqabilî ruhê tîrsê. Bêyî kivşkirina wê yekê nava vê gotinê da rastî wê te aza neke û diqewime hela hê diha zyanê bide te. Tenê xeber nînin, wekî qewata wane azakirinê heye, lê piş wan ruh û heyîne.

Bona şirovekirina vê yekê em bîr bînin, ku Petrûs ci eşaretî da: “Sebira Xudanê me xilazbûnê hesabkin, çawa Pawlos birê meyî delal jî bi wê serwextîya ku ji Xwedê jêra hatîye dayînê, wera nivîsiye.

Hemû namên xwe da jî ew bona wan tişa xeber dide. Wana da çend tişt hene, ku bi zehmet têne femkirinê, ku yên nezane bêbingeh şâş şirove dikin, usa jî nivîsarên pîroze mayîn û xwexwe dibine bayîsê serê xwe” /B Petrûs. 3:15,16/.

Tiştékî gelekî ferze /grînge/, ku em berbi heleqefîya raste tevî Xwedê bicedînin, lê ne ku berbi qewata Wî. Bona şirovekirina vê yekê em derbazî pêşgotina kaxeba duda, ya Pawlose bona Tîmotêyo bin. Pişti îzbatkirina paqijaya dilê Tîmotêyo Pawlos nivîsiye: “Bona wê yekê ez tînime bîra te, ku tu agirê pêşkêsa Xwedê hê gurkî...” /B Tîmot’êyo. 1:6/. Bi vî cûreyî Pawlos Tîmotêyo hîn dikir ku nava emirê wî da pêşkêsa Xwedê nehata hesabhlidanê, eger bawarîya Tîmotêyo ya bêqelp nîbûya. Niha werin em pêşda herin.

## **Rîya duda ye xirab şikestîbûna qelpe**

“*Ez wê bawarîya teye dilê sax tînime bîra xwe, ya ku berê cem pîrika te Loyîsê û dîya te Eynikê hebû û ez bawarim, ku ya te jî heye. Bona wê yekê ez tînime bîra te, ku tu agirê pêşkêsa Xwedê hê gur bikî, ya ku bi dest-danîna min hate dayînê*”

*B Tîmot’êyo. 1:5,6*

“Bona vê yekê jî ez tînime bîra te”. Nava nema xweye ser navê Tîmotêyo Pawlos bang dike: “Hindava wê pêşkêsa xweye ruhanî da bêxem nîbe, ya ku bi pêxembertîyê tera hatîye dayînê, gava berpirsara destê xwe danîne ser te” /A Tîmot’êyo. 4:14/. Pawlos guhdarîyê tîne ser pêşkêsa Xwedê û derheqa grîngîya hesabhldana wê da dide kivşê û cara duda derheqa wê yekê da dinivise, wê yekê dike çawa tiştékî pêşin, kîjan neme da tê bîranînê.

Bona ku em bi cûrê zelal fem bikin, ku hesabhldana “pêşkêş”-ê çîîye, werin em çend xebera binihêrin. Ev xeber miqabilî xebera hesabhlnedanê ne:

*mîaser bikin, bighîjine açixîyê, guhdar bin, tomerî  
bikin, qirar bikin, layîqî guhdarîyê bikin, bighîmine xi-  
lazkirinê.*

Ev hemû xeber, xeberên serkarîkirinê û karkirinê ne. Ev xeber bi fikira baş têne xebitandinê. Bona diha baş femkirina xebera Xwedê werin em lêkolin bikin, ku fikira xebera “hesabhilnedan” çîye. Fikira wê eve:

*biteribînin, dûrxin, guhdarîyê nedine ser, qîmet nekin,  
jorda lê binhêrin, bêqîmet bikin, orta pêçîya ra lê bini-  
hêrin.*

Ev h'êmû xeber bi fikira xwe karên nebaş didine kivşê, kîjan kemasîya qirarkirinê û serkarîkirinê didine kivşê. Ew yek tiştekî bi qezîa ye û çetine, wextê ku ew tiştê ku tesmîlî te kirine û îtbarîya xwe te anîne, tu hesab hilnadî. Em zyanê dikevin, wextê ku hesab hilnadin. Wextê ku meriv nava halê şikestîbûna qelp da dijî, ew yek rêke ne başe. Merivên ku nava vî halîdanin, wê yekê grîng hesab dikin, ku bibine mînanî keysetê Xwedê û ew li wir jî disekinin. Ew tu cara nava emirê xweda pêşkêşen Xwedê bernadin, çimkî ditirsin. Ew ji her şerkarîkê dûr dikevin û h'esab dikin, wekî ew yek kemasîya hizkirinê, yan jî mesîhîaye.

Ez wan meriva çawa “edilayîparêz” nav dikim. Bi lênihêrandina ewlin edilayîp’arêz tê bêjî tiştekî başe, lê Îsa tu cara negot: “Xweziya edilayîparêza”. Ewî wekî mayîn got: “Xwezi li wan meriva, yên ku edilayê çê dikin, wekî ewê çawa zarêن Xwedê bêne navkirinê” /Metta. 5:9/. Edilayîparêz ji dew û dozê dûr dikeve, nenihêrî wê yekê, ku qîmetê wê yekê çîye. Ewê bi hemû rîyava pêşda here, ku tenê ewê texmînirina xweye qelpe bona bêqezîfabûnê xweyî bike, kîjanê ew bi şasî çawa edilayî nav dike.

Ewê ku edilayê çê dike, wê bêyî wê yekê jî ber xwe bide, nenihêrî wê yekê, ku ew kirin wê bona wî ci qîmetî be, çimkî ew bona seksê xwe ber xwe dikeve, xemgîn dibe. Menîya kirina wî hizkirina wîye bona Xwedê û rastîyêye. Tenê nava halê vî cûreyîda edilaya rast dikare gulvede.

Nava padişatîya Xwedê da edilayî heye /Romayî. 14:17/. Lê çawa jî hebe, ev edilayî ji tunebûna dew û dozê nayê. Çawa ku Îsa da kivşê: "...Padişatîya ezmîn bi qewatê tê stendinê û ewên ku qewatin wê yekê zeft dikin" /Metta. 11:12/. Pêşketina padişatîya Xwedê bi dew û doza zorva tê rêberkirinê.

Gelek cara em difikirin: "Ezê problêmê bivînim û ew yek wê dûrkeve". Lê hewce ye, ku em hişyarbin û fem bikin, wekî ew tiştê miqabilî kîjanî em şerkarîyê nakin, wê neyê guhastinê. Binihêrin, ku Cihûda ci dibêje:

*"Delalno! Gava min dil kir, ku ez bona vê xilazbûna  
meye tomerî wera binivîsim, hingê min rê têra dît bona  
vê yekê wera binivîsim û dil bidime we, wekî hûn bona  
wê bawarîya, ku carekê bona hertim cimeta Xwedê ra  
hatîye dayînê, şerê xwe bikim".*

### *Cihûda. 3*

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî ewî digot, ku "şerê xwe bikini", lê nedigot, ku bona tiştê baş guman bin. "Şerkarî" dide kivşê, ku gerekê "şer' bikin". Mesîhî cûrê jîyînêye hêsa nîne.

Çawa ku em peyî Xwedê diçin, usa ye dew û doz û berxudan jî hene, dixwezî ya fizikî be, dixwezî ya ruhanî be.

Pawlos qewat dida Tîmotêyo û digot: "Awa tevî cefê me be, mîna eskerê Mesîh Îsayî qenc. Tu esker şuxulê binelîtîyêva mijûl nabe, wekî li seresker xweş bê..." /B Tîmotêyo. 2:3,4/.

Nava vî şerî da em bi eskerîyêva mijûlin û em borcdarin, wekî tabîya me ya eskerîyê be. Em ji tiştê xirab bin nakevin, lê em ser dikevin bi saya rehmê- pêşkêşa Xwedê /Romayî. 12:21/.

Nemên Pawlos eşarefîyêna bona eskerîya Tîmotêyo bûn, wextê ku ewî şivantî dikir. Wî çaxî gelek tişt miqabilî Tîmotêyo bûn. Hînkirineke qelp hebû, kîjan gerekê bihata eşkerekirinê, kîjan gerekê bihata sekinandinê, bona ku civîneke qewat û gîhîştî bihata sazkirinê. Nava van borcdarîya da evana yên here kêm bûn.

Ez gumanim, wekî bona dew û dozê gelek menî hebûn. Ez zanim, wekî miqabilî Tîmotêyo gelek gunekarkirin û buxdan dihatine pêşdakîşandinê û ew jî ji alîyê wan merivada, yên ku hundurê civînê da bûn. Xêncî vê yekê ewî gerekê çetinayîke mayîn alt bikira- emirê xweyî cahil. Tîmotêyo xortekî cahil bû nava civînê da, li kîderê gelek bi yaşê xweva mezin bûn. Ev yek jî idî bes bû, wekî derê tîrsê, dudilîyê bîhata vekirinê.

Nava vî h' emû tiştîda Pawlos Tîmotêyo hîn dikir bona ku ew qewat be, bîr neke ku ci derbazî wî kirine. Pawlos hertim danî bîra Tîmotêyo, ku gerekê nava serkarîkirina ji alîyê Xwedê da dayî bisekine. Lê carekê Tîmotêyo têberda bû û bona wê yekê jî Pawlos ew hîn dikir:

*“Temîya van tişta bide û hîn bike”.*

*A Tîmotêyo. 4:11*

*“Van tişta temî bike, wekî bêleke bin”.*

*A Tîmot'êyo. 5:7*

*“Awa lawê min, bi wê kerema meye ku yektiya Mesîh  
Îsada ye, qewat be”.*

*B Tîmotêyo. 2:1*

Diqewime Tîmotêyo mînanî gelek merivênen roja îroyîn bû, yên ku Xwedê hiz dikin, lê xwe ji dew û doza dûr digrin. Ewênu ku ji dew û dozê xwe dûr digrin, rehet dikarin bibine qurbanîyê tîrsê.

Eger te heyîna vê tîrsê nas kir, wî çaxî ev temî bona altkirina çetinaya, mîrxasî yê û anîna azayê hatîye şandînê. Xwedê dixweze te aza bike, bona ku tu wî hemû tiştî usa bikî, çawa ku Ew ji te dixweze. Wextê ku tu ditirsî, şabûn tune, lê bêyî şabûnê jî qewat tuöne. Li wan cîya, li kîderê tîrs heye, edilayî tune. Lê wextê ku tu wê yekê bîşkînî, kîjanê te girtîye, ku te paşda bibe, tê wî çaxî şabûnê û edilayî bîvînî.

*Gelo ev yek çawa bona min werguhêzî tiştê  
kirinê dibe?*

## Pêşkêşên dayî

**S**erê kitêbêye derbazbûyî da me derheqa tirsê û hukumê wêye li ser serwêrên civînê xeberda. Lê diqewime usa be, wekî ji we gelek, wextê xwendina vê kitêbê nava qulixêda nînin. Tu diqewime ji min bipirsî, ku çawa vê yekê dikarin bona xwe werguhêzî tiştê kirinê bikin.

Xwedê nava ruhda cî û tabîyê dide her bawarmendekî. Pawlos şirove dikir, wekî Xwedê: "...yekîtya wîda em ji mirinê rakirin û tevî wî em li diyarê ezmana dane rûniştandinê, bi saya Mesîh Îsa" /Efesî. 2:6/. Eva hema ew cîye, li kîderê zarêن Xwedêye xilazkirî dijîn. "Ew danî ser hemû serwêrtîya, hukumetîya, qewata, xudantîya û usa jî ser h'emu navêن, ku têne hildanê, ne ku tenê li vê dinê, lê wê dinê jî. Û Xwedê her tişt kire bin pîyêن wî û ew bona civînê kivş kir, çawa serwêrê her tiştî. Civîn jî bedena Mesîhe, temambûna wîye, ku xwexwe her tişte, her tiştî temam dike" /Efesî. 1:21-23/.

Civîn bedena Mesîhe. Çawa ku bedenêmeye fizîkî ji gelek perçane, kîjan bi funksiyêن xwe û karebûna xwe cuda-cudane, usa jî endamên bedena Mesîh bi nav û pêşkêşen cuda-cuda şuxul dikan. Her yek jî grîngin û tu yek ji yên mayîn başqe nîne. Pawlos elam kir, wekî ruhêن hemû cina bin pîyêن Mesîhdanin. Ev yek şirove dike, wekî tu cinek nikare serkarîkirinê li ser bawarmenda bide xebatê. Eger tu

nigê bedena Mesîhyî, usa ye hetanî niha cin bin nigê tedane. Îsa got: “Awa min hukum daye we, ku hûn mer û dûpişka û temamîya qewata dijmin pêpes bikin û tu tiştê zirarê nede we” /Lûqa. 1O:19/. Eger em bi hukumê ji Xwedê dayî şuxul nakin, yan jî nagerin, wî çaxî yekî mayîn wê jî me hilde û wê ewê yekê miqabilî me bide xebatê. Dijmin daye peyî tabîyameye nava ruh da.

## **Bi pêşkêşên dayî va şuxul bikin**

Werin em lênihêrandina nema Pawlose bona Tîmotêyo dîsa berdewam bikin.

*“Bona wê yekê ez tînim bîra te, ku tu agirê pêşkêşa Xwedê hê gur bikî, ya ku bi destdanîna min tera hate dayînê”.*

*B Tîmot'êyo. 1:6*

Nava zimanê yûnanîda xebera /pêşkêş/ xebera “xarîzma”-ye. Dîalêkta St’rongî vê xeberê çawa “pêşkêşa ruhanî” şirove dike. Şirovekirineke mayîn jî nava ferhenga Vaynda heye û vî curie ye: “Pêşkêşa merîfetê, kîjan pêşkêşî bawarmenda kirîye- bi şuxulk’arîya Ruhê Pîroz”. Bi vî cûreyî xebera “xarîzma” wan karebûnên ruhanî şirove dike, bi kîjana Xwedê nêzîkî bawarmenda dibe.

Nava padişaflîya ruh da bêyî vê xarîzmayê, yan jî karebûna Xwedê tu tişt nayê mîaserkirinê. Bêyî wê yekê em gerekê ne bistirê, ne bêjin, ne pêşkêşiyê bikin, yan jî qulixkin. Bêyî vê pêşkêşê emir tune. Ji emir başqekirî dîn pêşda hatîye, wextê ku meriv céribandîye bi rîya xweye şexsî here û bi karebûna xwe qulixî Xwedê bike. Wextê em bêyî pêşkêşen Xwedê qulixî yên mayîn dikin, wî çaxî em badilhewa dixebeitin. Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî ev pêşkêş idî nava Tîmotêyo da hebû. Wextê ku Xudan pêşkêşa xwe dinikîne, ew nayê û naçe, lê hundur da dimîne, “çimkî pêşkêşa Xwedê /xarîzma/ û nav poşman nabin”/Romayî. 11:29/. Ev pêşkêş, yan jî hukum, karebûnên lazimin, ku vî navî mîaserkin, kuîjan Xwedê bona me her

## *Pêşkêşen dayî*

yenî têra dîtîye. Xebata bi van pêşkêşa gerekê bona me baş be. Çawa ku fûnksiyên endamên bedena me û kîrinêne me nayêne guhastinê, usa jî pêşkêşen Xwedê nayêne guhastinê.

Pawlos bona bawarmendê romayî nivîsî: “Çimkî ez gelekî heyra dîtina weda me, wekî pêşkêşeke ruhanî bighînime we, ku hûn bawarîyê da bişidin” /Romayî. 1:11/. Civînê bêyî wan pêşkêşa îzbat nebe. Ew yek mecalê dide zarokên Xwedê, ku xwestina wî mîaserkin. Niha bi guhdarî van xebera bixwîne:

*“Ji we kê çi pêşkêş stendîye, bi wê jî hev ra xizmetkarîyê bikin, çawa wek’îlên qence wan keremên Xwedê”.*

*A Petrûs. 4:10*

Nava vê xeberê da emê sê têma guvtugo bikin

1. Her yek pêşkêşê distîne
2. Pêşkêş ya me nîne, lê em awqasî wekîlin
3. Pêşkêş pareke kerema Xwedê ye pircûreye

### **1. Her yek pêşkêşê distîne**

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî wa tê gotinê: “Ji we her yek çi ku qebûl kirîye, gerekê bide yên mayîn ji”. Petrûs got: “çimkî çend meriv idî pêşkêş stendine”. Na xêr, eger tu hatî dinîayê û ruhva tijî bûyî, usa ye te pêşkêşa Xwedê stendîye, bona ku tu nava bedena Wî da bixebeitî. Nava vê bedenê da merivêne seqet-sûqet tunene.

Pawlos nava Efesi 4:7-da dibêje: “Bona me her yekî pêşkêş anegorî pêşkêşa Mesîh hatîye dayînê”. Nava kaxeza Korintiaye ewlin 7:7-da tê gotinê: “Çimkî ez dixwezim ku her merivek mînanî min be, lê her merivek pêşkêşa Xwedê stendîye- yek vî cûreyî, yek jî cûrekî mayîn”.

Eger em derheqa vê yekê da nizanîn, emê bona her qulixekê bêçare bin, bêkare bin. Bi vî cûreyî navê me dibe nemîaserkirî. Çawa ku zarok hîn dibin, ku perçen bedena xwe bidine xebatê, usa jî em gerekê van bidine pêşkêşa pêşxistinê û hînkirinê, kîjan bona qu-lixâ bo bedena Xwedêne. Tu endameke bedena Wî ji evê karebûna

bi hukum der wê nexebite.

## **2. Pêşkêş ya me nîne, lê em awqasî wekîlin**

Dêmek, çawa ku em xweyê wê yekê nînin, ev pêşkêş nikare bê hesab hilnedanê, yan jî bona meremê xweyî şexsî bê xebitandinê. Ew yek ya me nîne, bona ku em wê yekê bikin, ci ku dixwezin. Ew yek hatîye dayînê, ku em bikaribin bona yên mayîn qulix bikin. Em cabdarin bona wê yekê.

Werin em derheqa serhatîya telantda bîr bînin. Merivekî ku wê derketa rêuîtîyê gazî xulamên xwe kir û hebûka xwe sparte wan. Pênc telant dane yekî, du telant dane yekî û telantek jî da yekî, her kesîra weke qewata wî û zû rê ket çû /Metta. 25:15/. Her du merivên ewlin telantên xwe bi aqilî dane xebatê, zêde kirin, lê yê sisîya çû erd kola û zîvê axayê xwe tê da veşart.

Wextê ku axa paşda vegerîya, her du merivên ewil hesab dane wî ku wana ew telant çawa kirine. Axa pesinê wan da û got: “Eferim, xulamên qenc û amin”.

Paşê yê sisîya hat, ku heq- hesaba bike. Ji tirsa axê ewî telantê xwe veşartibû, çimkî ewî fem kiribû, wekî axayê wî gelekî hişke. Bi vî cûreyî evî xulamî bi saya hesab hilnedanê, xwehizî û bêbaşerîya xwe, xwe çawa afûkirî texmîn dikir. Ewî gote axayê xwe: “Binihêre ez wî tişfî didim, ci ku yê teye”.

Wextê ku axa dît, ku xulam çawa ew yek hesab hilnedabû, ci ku tesmîlî wî kiribûn, ewî ew xulam çawa “merivekî ne baş û xweranedîti” nav kir.

Ewî ew telant ji wî hilda û da wî merivî, yê ku keda wî dubare kiribû. Paşê ew xulamê, ku kêrî tiştekî nedihat, ji wir hate dûrxistinê.

Emê bona wan pêşkêşen dayî hesaba bidin, çawa ku êkonomîst bona êkonomîkayê hesaba didin. Bona xebera “pêşkêş” xebereke başqe jî heye –“hebûk”. Ew çawa “karebûn, mecal, yan jî qewat” tê şirovekirinê. Bi cûrekî mayîn gotî, ew yek “merîfetê” dide kivşê. Eva hema ew meseleke ferze, ku em gerekê ewê pêşkêşa ji Xwedê dayî mezinkin û pêş bixin.

Pawlos pêşkêşa bona hînkirinê û qulixa şandîya stendibû. Ewî

## *Pêşkêşen dayî*

got: “Min mînanî pêşkêşa ji Xwedê dayî qulix kir”. Guhdarîyê bide ser wê ferzbûnê /grîngîyê/, kîjanê Pawlos dide wê pêşkêşê:

*“Belê, ez nikarim peya bidime xwe, eger ez Mizgînîyê danasîn bikim, çimkî ev deyînê stûyê mine. Wey li min, eger ez Mizgînîyê danasîn nekim.*

*Ü eger min eva yeka bi hemdê xwe bikira, hingê xelata minê hebûya, lê ez vê yekê ne bi hemdê xwe dikim, çimkî eva qulixeke ku li min hatîye spartinê”.*

*A Korint’î. 9:16,17*

Pawlos dibêje- wey li min. Gotina “wey li min” gotineke berke. Îsa ev gotin wî çaxî dida xebatê, wextê ku derheqa wê yekêda eşaretî dida, ku hinek meriv û bajar wê bihatana gunekarkirinê. Ewî ew gotin bona bajarên Xorazînê û Beytsayîdaê da xebatê û ew bajar idî zûva tunene /Metta. 11:21,22/.

Xebera “wey” Cihûda dida xebatê, ku derheqa gunekarkirina merivên civînêye nebaş da bide kivşê. Nava kitêba eyantîyêda ew bona bîranîna binelîyên dinîaêye bin gunekarkirina Xwedê da tê xebitandinê /Eyantî:8:13/.

Eger Mesîhî anegorî pêşkêş û navê xwe kar nake, wî çaxî ew paşda vedigere ser emirê xweyî berê, çawa ku tamarê mîriv ji nexebitandinê sist dibin. Wî çaxî bawarmend wî cûreyî xwe başqe dike û bona dijmin dibe nîşangeheke hêsa.

Wextê ku min emirê mîr û jinê Xwedêye qewat lêkolîn dikirin, lê dînihîrîn, bona min zelal bû, wekî ew meriv ketine, yên ku nava navê xweda bûne xweranedîfî, yan jî bêguhdar. Raste wana qulixa xwe dîsa berdewam dikir, lê ew li ser hîmê qulixa berê pêşda diçûn. Wana pêşkêşa Xwedê destpê kiribû bona kara xwe bidine xebatê, lê ne ku bona parastin û qulixkirina yên mayîn.

Dawidê padişa wî çaxî kete nava guneh, wextê ku ew borcedar bû li deşta şêr be.

*“Û ew yek wê salê bû, wextê ku padîşa gerekê der-  
ketana meydana şér: Dawid Hovab û xulamên wî, usa  
jî temamîya Îsraêlê şand, yên ku Amonayî qir kirin û  
Gabba kirine nava hesarê, lê Dawid li Orşelîmê mabû”  
B Padîş. 11:1*

Dawid padîşa bû, Xwedê ew kiribû padîşa, ku ew rêberîyê cimeta Îsraêlê bike û wana biparêze. Bona wî wedê şerkirinê bû. Dewsâ wê yekê ew li Orşelîmê rûniştibû û bi pêşkêşen altindarîen berêva razî dibû. Dawid rehet dibû û bi xebata berê kirî emirê xwe derbaz dikir. Ji bêxebatîyê ew eyciz dibû û derdikete hewşê: dîna xwe dida hebûna xwe û hema wî çaxî jî ewî Bêrsabê wextê avxwekirinê dît. Berdewama wê nava serhatîyêdane.

Gerekê bidime kivşê, wekî em niha li vir bona hêسابûnê nînin, emirê me jî hebûna me bi xwe nîne, çimkî ew hatîye kir’înê û paşda dane me, ku em bidine xebatê. Em mihacirin û ne binelîyên hertimîne.

Îsa got: “Xwerina min ewe, ku ez xwestina Yê ku ez şandime, bikim û şuxulên wî bînimê sêri” /Yûhenna. 4:34/. Eva yeka usa jî gerekê bibe xwerina me. Îsa zanibû, ku bona xweyîkirina qewata Wî çi lazim bû. Qewata me kîsî him xwerina fizîkî, him jî ya ruhanî zêde dibe. Eger em îdî xwestina Wî nakin, lê bona kara xwe dikin, em diwestin û qewata xwe unda dikin. Eva hema mînanî wê yekê ye, ku em îdî xwerinê naxun. Bi undakirina qewatê, em rehet tevî dinîayê dikişin û miqabilî wê dernakevin. Wî çaxî em dibine xwehîz û tenê qulixî xwe dikin.

Cabdarîya meye mezin heye. Gerekê usa nîbe, ku em tenê herine civînê û nebîne merivên bi Xebera Xwedê “kokbûyî”. Xewdê eşaretîyê dide: “Awa Ezê bi Xwe orta peza kok û ya jar da dîwanê bikim”.

Gelo ew pezêن kok kîjanin? Ewana ew bawarmendin, yên ku bi tiştên Xwedêye bi rehm qulixî xwe dikin û yên mayîn bendî tiştekî hesab nakin. Binihêre, ku Xwedê derheqa wan pezêن kok da çi dibêje:

*“Gelo ev yek bona we hindike, wekî hûn diçêrin, şînaya  
mayî pêpes dikin û ava paqij vedixun, ava mayî jî bi*

## *Pêşkêşên dayî*

*pîyêن xwe şêlû dikin?. Çimkî hûn yên sist û zeyîf def didin û bi strûyêن xwe wana dixin û wana bir-birî dikin, lê Ez gerekê pezêن Xwe xilazkim û ew gerekê neêne zeftkirinê û gerekê pezê nava pezada gunekarkim”.*

*Êzékiel. 34:18,21,22*

Pêşkêşên Xwedê bona zêdebûna hebûka me nînin. Xwedê wê bi rehma Xwe me binihêre. Em gerekê ewê karebûna Xwedê bona qulixkirina bo yên mayîn bidine xebatê, yên ku sistin, cahilin, bêçarene, bona ku bi wê yekêva beden bibe yek.

Şaş fem nekin. Şabûna bi feydayê xebata me tiştekî başê. Xwedê him rehetîyê û him jî tezebûnê dide me. Lê wextê ku fikirêن me tenê dora şexsê me dizvirin, em wî çaxî “kok” dibin û derheqa tu tişî da nafikirin. Wî çaxî pêşkêş û merîfetên ku qulixî me dikin, zêde nabin.

Her endameke bedena te bona yên mayîn cabdare. Eger nigêن te nehejin, wî çaxî temamîya bedena te wê bizêre. Eger pişikên te û dilê te bisekinin, wî çaxî hemû endamên mayîn wê bimirin. Eger cin bikaribe usa bike, ku em dewsa qulixkirina bo yên mayîn tenê derheqa xweda bifikirin, wî çaxî temamîya bedenê wê zyanêkeve.

### **3. Pêşkêş pareke kerema Xwedêye pircûre ye**

Petrûs pêşkêş pareveyî ser du parêن sereke dikirin. Ya ewlin pêşkêşa berbirîbûnê yan xeberdanê ye, lê ya duda pêşkêşa qulixkirinê ye: “Eger yek xeber dide, bira gotinêن Xwedê xeberde, eger yek xizmetkarîyê dike, bira bi wê qewatê bike, kîjan Xwedê dayê, wekî her tiştida navê Xwedê bê bilindkirinê bi Îsa Mesîh, şikir û qudret ji wîra heta-hetayê..”

Paşê Pawlos wan her du klasa pareve dike. Nava kitêba Romaya da Pawlos dibêje:

*“Çawa qalibê meda gelek endam hene û hemû endam kirekî nakin, usa jî em gelekin, lê yektiya Mesîh da em bedenekin û her kes jî me endamên hevin. Awa anegorî wê kerema mera hatîye dayînê, pêşkêşên xweye cûre-cûre bidine xebatê. Eger pêşkêşa pêxembertîyê ye, bira*

*weke bawarîya bidine xebatê, eger xizmetkarî ye, bira nava xizmetkarîyêda bin, eger hînkirine, bira peyî hînkirinê bin, yê dil dide mîriv, bira li peyî wê yekê be, ewê parevedike, bira bi merdanî bike, ewê serwêre, bira xîret be, ewê qenciyê dike, bira bi eşq û şa bike”.*

*Romayî. 12:4-8*

Nava klasa xeberdanê da em pêxembertîyê, hînkirinê, berdildahatinê û rêberîyê divînin, lê nava ya qulixkirinê da em qulixê, dayînê û rehmê divînin.

Îzinê bide min, ku ez vê yekê şirove bikim. Tu nikarî nava tabîya xeberdankir, yan jî serwêr da bî, hetanî ku tu paqijaya xweye nava qulixekê da nedî kivşê. Gelek meriv hene, ku dixwezin rêberîyê bikin. Lê ew emirê xwe bona qulixkirinê pêşda nakişînin. Firqî tune, ku merîfeta wî çiqase, çimkî ew qulixkirin wê biteribe, him bona wî û him jî bona yên mayîn. Eger xeysetê wana bi rîya qulixkirinê pêşda naçe, wî çaxî ewê tabîya xweye serwîrtîyê bona serkarîkirina merivên mayîn bidne xebitandinê.

Min du tiştê xirab dîtine, kîjan feydayêن kêmasîya femdarîyêne. Ya ewlin ewe, wekî merivên wî cûreyî derheqa xweda li ser fikira mezinin, lê bi rastî usa nîne. Ew difikirin, wekî pêşkêşa xeberdanê ya tek- tenê ye û ew yek jî dereca qulixa wane here bilinde û bawar nakin, wekî rêke mayîn bona qulixkirina boy Xwedê heye.

Ev yek rast nîne: “...Belê, beden ne tenê endameke, lê ji gelakaye. Eger temamîya bedenê çav bûya, lê bihîstinê li ku bûya? Eger hemû beden guh bûya, bînhildanê li ku bûya?” /A Korintî. 12:14,17/. Ew hemû meriv dixwezin çawa dev bin. Her endamek jî ferze. Bêyî alîkarîya qulixê, qulixa xeberdanê sînorkirîye. Meriv diha gelekî dicêribînin bi wê pêşkêşê bilivin, kîjanê ew dixwezin, lê ne ku bi wê pêşkêşê, kîjan li cem wan heye.

Nava tiştê xirabe mayînda, ew merivin, yên ku bawarin, wekî qulix bi xeberdanê û teşkîla qulixçâva tê sînorkirinê. Fikirdarîya vî cûreyî usa dike, wekî bedena Îsa nikare tam bixebite. Pawlos şirove dike: “Lê serda ew endamên bedenêye ku sist kivş dibin, ew hê fer-

## *Pêşkêşen dayî*

zin û ew endamên bedenêye bêqedir têne hesabê, em hê qedirê wan zanin û yên eybe nava wêda, em hê bi terbet dinixêmin” /A Korint’î. 12:22,23/.

Ev yek ferzbûna endamên ku naêne kivşê, bilind dike. Xwedê ferzbûna endamên ku veşartîne, hê pêşda dikişîne, ne ku yên ku têne kivşê. Tu bêyî deng dikarî bijî, lê bêyî cegerê yan jî dil nikarî, çimkî bêyî wana tu nikarî bigerî, yan jî qise bikî.

Kitêba Karêن Şandîya nêzîkbûna himberî pêşkêşa dide kivşê, kîjan li civinê hebû. Mesîhiyên ewlin fem kirine, wekî nava qulixê da diha gelek tişt hene, ne ku nava xeberdanê, qenckirinê, azakirinê û pêxembertîyê da. Nava para kitêbeye şesa da tê bîranînê, wekî hinek sêwî û jinêن bêmêt li dêra Orşelîmê bendî tu tişfî nedihatine danînê. Lê ew her roj jî hewcê alîkarîyê bûn.

Ev yek layîqî guhdarîya serwêra bû, wana bersiv da: “Niha, gelî bira ji nava xweda hevt meriva bibijîrin, ku bi îzbatîya Ruhê Pîroz û serwextîyêva tijîne, wekî em wana dayînine ser vî şuxulî” /Karêن Şandîya:6:3/.

Wana ew meriv dîtin, kîjan ev tişt anîne nava şandîya: “Evana ber şandîya dane sekinandinê, şandîya jî dua kirin û destêن xwe dane ser wan. Ü xebera Xwedê pêşda diçû. Elaleta şagirta Orşelîmê da gelekî zêde dibû û ji kahîna jî geleka bawarî qebûl dikirin” /Karêن şandîya 6:6,7/.

Gelo wextê ku şandîya destêن xwe danîne li ser wana ci qewimî?. Pêşkêşa qulixkirinê hate dayînê û paşê Xebera Xwedê bela bû, lê şagirt jî gelek dibûn. Ev meriv bi wê pêşkêşê dixebeitîn, kîjan bona wan hatibû dayînê. Ew merivênu ku bona jinêن bî qulix dikirin, bûne sebeb, wekî Xebera Xwedê bela bibe û şagirt jî zêdebin.

Ez bawarim, wekî ji menîyên hîmlî yek jî ewe, ku bona ci civinêne me zêde nabin ewe, wekî ne hemû meriv anegorî pêşkêşen xwe pêşda diçin. Kitêba Karêن Şandîya dide kivşê, wekî wextê ku serwêr anegorî pêşkêşen xwe kar dike, wî çaxî bi reqema sînorkirî meriv têne xilazkirinê, lê wextê ku temamîya civinê tevî van pêşkêşa bûye, feydayêن wê yekê hê zêde dibin.

Petrûs wextê xeberdana xwe got: "...Ewê rojê nêzîkî sê h'ezar meriv zêde bûn" /Karên Şandîya. 2:41/. Wî çaxî jî, wextê ku Petrûs li Orşelîmê bi rûnkirina qenckirinê digerîya: "Lê dîsa elaleta jina û mîra hê- hê zêde dibû, yên ku bawarîya xwe Xudan danîn" /Karên Şandîya. 5:14/.

Wextê ku bawarmenda destpê kir her roj hîn bikin, li her malekê û paşê jî civîn zêde bû /Karên Şandîya. 6:1/. Dereca mayîn qulixa bona bawarmenda bû û ew yek bi qulixa bona jînê bî destpê bû. Peyî wê gavêra, civîn "gelekî zêde bû" /Karên Şandîya:6:7/.

Dêmek roja îroyîn serwêr bona rezedilvana tewaqe dikin. Nava kitêba Karên Şandîya da tê tiştên usa nevînî, wekî rîber r'ezedilvana bi gerin. Ewana bi awqasî bi dil diketine nava qulixê, wekî bona qulixkirinê merivên usa digerîyan, karebûnên kîjana li ser hîmê xeyset hatîbû danînê, lê ne ku li ser merîfetê. Peyî vê yekê ra ew dihatine kivşkirinê. Ci ku wana ferz hesab dikir, roja îroyîn em kemala mezin nadinê.

## **Cabdariya bona aminayê**

Gelo wê ci biqewimîya, eger hemû bawarmend nava tabîyên xweda kar bikirana? Meyê wî çaxî tiştên gelek qewat bidîtana. Hişyarbûn bona xeberdankira nîne, lê bona temamîya bedenêye, wextê ku her merivek cîyê xwe li ser tabîya xwe digre.

Hertim bira bîra te da be, wekî pêşkêş karebûne, kîjan ji alfîyê Xwedê da hatîye dayînê. Em bona wê yekê cabdar nînin, wekî îtbariya xwe me ne anîne. Nig bona dîtinê cabdar nîne. Xwestina Xwedê jî tenê bi ïzina Ruh dikare bê mîfaserkirinê. "Ne ku em ji xwe hesab dikin, ku em layîqî vê kirinêne, lê karîna me ji Xwedê ye" /B Korintî. 3:5/.

Cin dixweze hema xût şuxulkarîya vê yektfîyê bide sekinandinê. Ew yek wê wî ra li hev bê, eger ew bikaribe pêşîya mezinbûna me bigre. Cin zane, wekî nikare Xwedê bide sekinandinê, bona ku Ew wan pêşkêşa nede. Bona wê yekê jî dijmin daye peyî azaya me, ku em wan pêşkêşa nedine xebitandinê. Tirs, dudilîbûn mecalâ tek-tenê ye, bi kîjanê ew çetinaya bona zêdaya bawarmenda pêşda tîne.

---

*Para duda*

# Tırsêeskerekîn

*Bona çi ji me gelek meriv awqas ne kardar in*

## Pêşkêşên temirî

**M**e ïzbat kir, wekî her bawarmendek xweyê tabîya serkarîkirinê ye, kîjan tevî pêşkêşen ji alîyê Xwedê da dayî tê û nava Îsa Mesîhdane. Wî çaxî bona ci ji me gelek meriv awqas nekardarin. Bona dayîna caba wê pirsê werin em careke mayîn bixûnin, ku Pawlos ci tîne bîra Tîmotêyo:

*“Bona wê yekê ez tînim bîra te, ku tu agirê pêşkêşa Xwedê hê gur bikî, ya ku bi destdanîna min te ra hate dayînê”.*

*B Tîmotêyo. 1:6*

Nava zimanê yûnanî da xebera “gurkirin” ya “anazopûrêoye”, kîjan dide kivşê “dîsa zêde bike, yan jî temamîya agir xweyî bike” /Ferhenga Vayn/. Eger Pawlos piştgirîyê dide vî cahili, ku pêşkêşê /xarîzmayê/ diha gur bike, usa ye tê kivşê, wekî ew pêşkêş dikare bitemire. Pêşkêş bi xwe kar nake. Wêya jî mînanî agir gerekê gur bikî û xweyî bikî.

Merivêni bi dilê paqij û bi cedandinê rast hene, kîjan bawar dikin, ku eger Xwedê dixweze tiştek biqewime, wî çaxî wê biqewime. Lê ev yek rast nîne. Êdmûnd Bûrk’ sala 1795-a nivîsiye: “Tişte

tek- tenê kîjan bona altindarîya xirabîyê lazime, ewe wextê ku meriv tu tiştî nakin”. Tîmotêyo bi dilê xwe paqîj bû. Tê bîra te, ku Pawlos çawa pesinê xeysetê wî dida?. “Gumana min li ser Îsa Xudan heye, ku ezê zûtirekê Tîmotêyo ser weda bişînim, ku dilê min rehet be, gava ez halê we pê bih’ esim. Ez dilê xwe ra yekî mînañî wî navînim, ku bona halê we mîna pêşewitîkî xema buxwe. Çimkî yên mayîn her kes li peyî kara xwe ketîye, ne ku ya Îsa Mesîh. Lê hûn xwexwe zanin, ku ew yekî çawayî céribandîye û xwexwe tevî min Mizgînîdayînê ra usa xizmetî kir, çawa kur bavêra” /Filîpî. 2:19-22/. Bi wê yekêva tevayî, Pawlos du cara eşaretîyê dide, ku pêşkêşa Xwedê ferz hesabke bona ku ew netemire. Bi vî cûreyî du pirs hene, kîjan hewcene, ku bêne cabdayînê: gelo kengê pêşkêş ditemire û em çawa wê yekê gur dikin?. Caba pirsa duda ezê paşê nava serîkî kitêbêye mayînda bidim, lê niha em derbazî pirsa ewlin bin.

Çi dibe menî, wekî pêşkêşa Xwedê dikeve nava halê temirî?

Caba vê pirsa nava vê gotinê da ne:

*“Bona wê yekê ez tînim bîra te, ku tu agirê pêşkêşa Xwedê hê gur bikî, ya ku bi destdanîna min te ra hate danînê. Çimkî Xwedê ruhekî tirsê neda me, lê Yê qe-watê, hizkirinê û xwegirtinê”.*

*B Tîmot’êyo. 1:6,7*

Bi gilîkî mayîn, Pawlos digote Tîmotêyo: “Pêşkêşa ku ji Xwedê hatîye dayînê, rûyê tirsê da temirîye”. Bêyî guhastina fikirê ez dikarim bêjim: “Tîmotêyo! Rûyê tirsê da pêşkêşa ku ji Xwedê da hatîye dayînê, temirî dimîne”. Bawarmendên tirsonek serkarîya nava ruhê xwe da önda dikin. Ü pêşkêşa wana, karebüna Xwedêye nava wanna, ne aktîve, ditemire. Nenihêrî wê yekê, wekî ew yek pêşkêşe, lê ew kar nake, naxebite.

Wextê ku ew serwêrê Mîçîganê gote min, wekî serwêrên pesindayînê difikirî, ku ez gelekî berk nêzîkî wan dibim, ez tirsîyam. Wî çaxî pêşkêşa Xwedê destpêkir nexebite û bin rûnkirinêda min

usa xeberda, mînanî 18 qulixên derbazkirî.

Tıştekî kivş bû, wekî emirê Xwedê çûbû. Tevhevbûn destpê bibû, min serxwebûna xwe unda kiribû û min nedixwest miqabilî meriva derketama. Bona ci?. Çimkî ez tirsîayî bûm û min serwêrtîya ji alîyê Xwedê da dayî dida girtinê.

## **Şirovekirina tirsê**

Niha em binhêr’ in, ku şirovekirina xebera “tirs” çîîye?. Ferhen-  
ga Ok’sfordê ye înglîzî xebera “tirs” vî cûr’eyî şirove dike:

1. meriv dibe şermoke,
2. tirsê têkî dilê xwe,
3. bitirse.

“Ferhenga akadêmîkî, ya Mêrrîan-Wêbstêr” xebera “tirs” çawa mecbûrkirin, bi rîya gefxarinê hukumkirinê dide kivşê.

Ferhenga Oksfordê ye înglîzî xebera “tirs” vî cûreyî şirove dike:

1. kirineke tirsandinê,
2. halekî tirsê,
3. zeftkirina bi rîya zordarîyê û gefxwerinê,mecbûrkirina bona pêşîgirtina tiştekî.

Problêma tirsê ewe, wekî te mecbûrkin, ku tu kar nekî, bi wê yekê bikevî binê hukum. Tirs dixweze te bicivîne ser hev û tu tirsîayîbî. Eger nava hinek wedeyî da te bi wî cûreyî kirine bin hukumê xwe, wî çaxî tu bûyî xulamê wî merivî, yê ku te tirsandîye.

Bi we’dê dirêj tu aza nîbûyî, ku xwestina Xwedê bikî, lê te xwestinêñ wî merivî kirine, yê ku te tirsandîye.

Dêmek, pêşkêşa Xwedê-karebûna Wîye ruhanî, wî çaxî sekînîye, kar nekirîye.Bi wê yekê serwêrtîya te ji destê te hatîye hildanê û ew yek miqabilî te û yên bin hukumê te da hatîye xebitandinê.

Hîmê dudilîbûnê tirse, koka kîjanê jî nava dijminê me- cinda-

ne. Hema ewe ku tirsê pêşda tîne /Xebera 1O-a, ya Destpêbûn:3:1-1O/. Cinê hicûmî ser fikirêن me bike, bi rîya qeretîya, yan jî prosêsa û merivêن bin hukumê xwe da miqabilî me bide xebatê, ku me bitirsîne.Bi gîfîkî nêta cin tenê yeke. Me bike bin kontrola xwe û kirinêن me bide sînorkirinê.

## **Gelo Îlîyas tirsîya?**

Îlîyas pêxember bi qewateke mezin dixebeitî. Ew li ber padişayê xirab sekinî, yê ku ji Xwedê neditirsîya û elam kir: “Nava van salada baran gerekê tunebin...” /G Padişa. 17:1/.

Ew ji padişê bêxwedê neditirsîya. Nava çend salêن pêşiyê da Îlîyas emirê nebînayî da derbaz kir. Pêşda qarqarka xwerin didane wî, paşê jinebîkê ew xweyî kir, xwerina kîjanê tu cara xilaz nedibû, nenihêrî wê yekê, wekî li dor- bera xelayî bû. Kurê jinebîyê nişkêva mir û Xwedê duayê Îlîyas bihîst û ew ji nava mirîya rabû. Îlîyas merivekî bi qulixa qewat bû.

Wedekî dirêj şûnda ew dîsa li ber padişê sekinî. Padişê Îlîyas bona wê yekê, ku baran tune bûne û xelayî pêşda hatîye, gunekar kir û gote wî: “Ev tu yî, çetinaya Îsraêlê?” /G Padişa. 18:17/.

Îlîyas got: “Min bona Îsraêlê çetinayî pêşda neanîne, lê tu û mala bavê te ew yek kirine, wekî te gotinêن Xudan hiştin û peyî Bahaga diçî”/G Padişa 18:18/. Paşê ewî emirî ser padişê kir, ku 85O-î pêxemberên Bahag û Astarovt berevke û bibe li ser çyayê Karmêxosê, tevî temamîya miletê Îsraêlê.

Ewê roja dozê temamîya Îsraêlê berev bû, ku bivîne kîjan Xwedê yê raste. Îlîyas bangî pêxembera kir, ku bona xwedêyên xwe qurbanê bidin. “... Ewê Xwedê be, yê ku bi agir cabê bide” /G Padiş. 18:4/ , Îlîyas got.

Xudan Xwedê bi agir bersiv da û cimeta Îsraêlê deverû ket û berbirî Xwedê bû. Peyîra bi emirê Îlîyas wana 85O-î pêxemberên qelp kuştin.

Paşê Îlîyas elam kir, wekî bi duakirina germ û berbirîbûna berbi Xwedê baranê hebin. Peyî çend deqara ezman reş bû û baraneke gur

hat. Wextê ku Akaab revî sera xwe, destê Xwedê hate ser Îlîyas û ew ji hespê Akaab leztir çû.

Ev yek rojek ji emirê Îlîyas bû. Cimet paşda vegevîya, merivên xirab hatine kuştinê, xelâyî derbaz bû. Îlîyas dikaribû dengê Xwedê guhdar bike û anegorî wî dengî kar bike.

### **Ji alîyê jina padişê da zêrandî**

Hema ewê rojê jî jina Akaab- Îzabêlê bihîst, ku ci hatîye serê pêxemberên wê û cab li ser Îlîyas şand: “Xwedê vî cûreyî eger bikin û ji vê yekê zêdetir jî bikin, yeke rojtira mayîn vî çaxî ezê te dewsa tu yekî jî daneynim”/G Padiş. 19:2/. Îzabêl li ser Îlîyas gelekî hêrs ketibû, çimkî ew pêxember yên wê bûn, kîjana gotinên wê bela dikirin. Niha binihêre, ku Îlîyas caba çawa da:

*“Bi dîtina vê yekê, ew rabû û çû, ku xwe xilazke û  
gihişte Bêrsabêya Cihûda û xortê xwe li wir hîst. Ew  
rojekê nava qûmistanêra çû- hat, cîkî rûnişt û bi dil  
xwest bimire û paşê got: “Xudan, idî bese ruhê min ji  
min bistîne, çimkî ez nava bavada yê nebaşim”.*

*G Padiş. 19:3,4*

Hema wê rojê jî Îlîyas nava şerkarîya mezin da bû, ew ji emirê xwe direvî. Îlîyas ji Îzabêlê awqasî tirsîayî bû û gumanbir bibû, wekî dixwest bimira. Meremê Îzabêlê ew bû, ku Îlîyas bitirsîne, bona ku ew nikaribe meremê Xwedê mîaser bike. Ewê dixwest hukumê Îlîyas ji ser milet bide hildanê, wî unda bike û ji rê dûrxê. Nenihêrî wê yekê, wekî Îzabêlê nikaribû Îlîyas bikuje, ewê usa dikir, ku wî bitirsîne, bona ku ew bireve û bixweze bimire. Rûyê nezanbûna xweda, Îlîyas wî cûreyî tevî programa Îzabêlê hevkarî dikir. Eger Îlîyas bikaribûya ew yek diha zelal bidîta, ewê tu cara nerevîya.

## Nîşanên tirsê

T'evhevbûn, gumanbirî ruhê tirsêva girêdayîne. Meremê wê yekê ewe, wekî te mecbûr bike, ku tu pêşeroja xwe unda bikî. Wî çaxî hemû tişt usa tê kîvşê, wekî tu difikirî, ku hemû tişt çetine û nikarî çetinaya alt bikî. Eger tu carekêra pirsêd wî cûr'eyî safî nekî, ewê wî çaxî bibe menî, wekî tê tiştên usa bikî, ci ku teyê pêşda nekira, eger tu bin hukumê tirsê da nîbûyayî. Hema eve meremê tirsê.

Ez qewimandinê wî cûreyî guvtugo dikim û wê yekê texmîn dikim, ci ku Îlîyas li ser xwe texmîn dikir. Dewsa femkirina wê yekê, ku tirs ci cûreyî dixebyte, ez li oda mîvanxanê da rûniştibûm û min miqabilî gumanbirîyê şer dikir. Bona min hewaskar bû, ku ez kîme û nava kirinê minda ci tiştên rehm hebûne. Fikirê vî cûreyî usa jî peyî qulixkirina şebeqê ra dihatine cem min.

Wedekî usa hebû, wextê ku min nava temamîya rojê da nikaribû tu tiştî bikim. Ez ji wê giranîyê aza nebibûm. Min dua dikir û min texmîn dikir, wekî hazırîya Xwedê tunebû. Hema xût mînanî Îlîyas min guhdarîya xwe li ser xwe dabû berevkirinê.

Min xwe çawa merivekî nekardar texmîn dikir û ez difikirîm, wekî qîmetê qulixkirina min tune. Hema bona vê yekê jî Îlîyas digot: “Xudan, îdî bese, ruhê min ji min bistîne, çîmkî ji nava bavada ez yê nebaşim” /G Padış. 19:4/.

Nava evê roja gumanbir da Xwedê nîşanî min kir, ku Îlîyas çawa ji Îzabêlê tirsîya bû. Bi kutasî min fem kir, wekî ez ji hema nava wî halî da me. Ruhê tirsê dixwest min ji wê yekê paşa bigre, ci ku Xwedê bona min şandibû, ku ez wê yekê bikim. Li wê civînê merivîn usa hebûn, wekî ew gotinên tobekirinê û pîroz dilê wan nîbû, kîjan min ji Xwedê anîbûn.

Bi vî cûreyî min destpê kir koka wan nîşana biggerim, miqabilî kîjana min temamîya rojê şer dikir. Ew yek ruhê tirsê bû. Min bi mîrxasî berxwedayîna hukum qelaşt û min texmîn kir, ku ez ji tevhevbûnê û gumanbirîyê azabûm. Hema ewê êvarê civîna me gelekî bi qewat derbaz bû. Paşê ezê şirove bikim, ku çawa miqabilî ruhê tirsê derkevin. Lê niha were em dîsa emirê Îlîyas binihêrin, ku bivînin çawa dikarin wî ruhî naskin.

## Tu li vir çi dikî?

Êlîyas ji ewê serwêrtîya xwe wî çaxî derketibû, wextê ku nikaribû miqabilî tirsa ji Îzabêlê derkeve. Çawa feydayê wê yekê, pêşkêşa wîye bona qulixa bo milet, hate fetisandinê û Êlîyas alîkîda diçû, kîjan xwestina Xwedê nîbû. Ew tê bêjî merivekî başqe bû, çimkî ew ji dozê direvî, nenihêrî wê yekê, wekî pêşda ew usa nîbû. Ew lap alîkî mayînda diçû, xulamê xwe hiştibû û 4O roja û şeva li ser çayê Korêbê başqe bibû. Wextê ku ew kete şikevtê, gotina Xwedêye ewlin ev bû: “Êlîyas, tu li vir çi dikî?” /G Padiş. 19:9/.

Tu dikarî bînî ber çevê xwe?. Gumanâ Êlîyas unda bibû, ew nava 4O rojada ji revê sist bibû û gumanbir bûbû. Lê Xwedê dipirse: “Tu li vir çi dikî?”. Bi vê yekê Xwedê digot: “Bona çi tu ji tabîya xwe revîyî û te li vir xwe veşartîye?”.

Diqewime tu bifikirî: “Gelo baş nîne, wekî Xwedê milyaketê xwe şand, ku Êlîyas bikaribe 4O roja û şeva bireve. Wî çaxî bona çi Xwedê dipirsî: “Tu li vir çi dikî?””.

Xwedê zanibû, wekî Êlîyas qirar kiribû bireve. Wextê ku meriv dilê xweda qirar dike tiştekî bike, gelek cara Xwedê ïzinê dide ku ew wê yekê bike, nenihêrî wê yekê, wekî ew yek xwestina Wî nîne.

Xwedê wî cûreyî usa jî nêzîkî Bilam bû, wextê ku padîşê Mowabê Ballaq tewaqa kiribû, ku bê û nifira li ser Îsraîlê da bîne. Xudan gote Bilam, ku ew neçe. Lê Bilam paşda hat û cara duda ji Xwedê pirsî û tê texmînkirinê, ku dilê Xwedê hate guhastinê. Ewî gote Bilam ku ew here.

Sibetira mayîn Bilam têra kera xwe girêda, ku here. Kitêba Pîroz dibêje: “Bona çûyînê hêrsa Xwedê gur bû” /Jimar. 22:22/. Milyaketekî Xwedê hatibû, ku wî bikuje.

Bona çi Xwedê gote wî, ku here, lê paşê hêrs ket, wextê ku Bilam çû. Xwedê ïzin da Bilam here, çimkî Ew haj dilê wî hebû. Xwedê zanibû, wekî Bilam diha gelekî bona qedir û perên Ballaq diçû, lê ne ku bi gotina Xwedê. Wextê ku meriv dilê xweda qirar dike tiştekî bike, Xwedê wê wî nede sekinandinê, nenihêrî wê yekê,

wekî ew yek xwestina Xwedê nîne.

Hema wî cûr'eyî jî li cem Îlîyas bû. Xwedê dixwest, ku ew vegere û miqabilî Îzabêlê şer bike, çawa ku ewî miqabilî pêxemberên Bahax şer kir. Lê Îlîyas nedixwest miqabilî Îzabêlê derkeve. Ewî dixwest ji bin wî hukumî derkeve. Bona wê yekê jî Xwedê mîlyaketeş şand, ku xwerina lazim bide wî bona rîwîtîya wî. Xwedê hîvîyê bû û wê wan pirsêni ji tirsê pêşdahatî safikirana, hema ku ew bîghiştâ çiayê Korêbê.

## Ewê ku piş vî hemû tiştî sekinîye

Ew karê, (şuxulê), ku Xwedê bi destî Îlîyas destpê kiribû, wê bi temamî nehata sêrî, eger Îlîyas miqabilî Îzabêlê derneketa. Îzabêl koka problêmên Îsraêlîye hîmlî bû. Kitêba Pîroz dibêje: “Yê mînanî Akaab tune bûne, kîjanî bona xirabkarîya ewlin li ber çevê Xudan xwe bifrota, wekî jîna wî Îzabêlê ew kire nava şasîyê” /G Padiş. 21:25/.

Xudanê teví Îlîyas bûya, çawa ku ew li ser çiayê Karmêxosê teví wî bû, lê ew gerekê nerevîya. Lê Îlîyas ji Îzabêlê tirsîa bû û ji serwêrtîya xwe derketibû. Pêşkêşa wî temirî bû.

Niha binihêre, ku Xwedê peyî wê pirskirinê ra çi dike, wextê ku ji Îlîyas pirsî, ku ew li wir çi dike.

*“Xudan gote wî: “Bi rîya xwe paşda vegere Damişqê û wextê ku tu bêyi, Ezayêl çawa padişê Aşûriya bide rûnkirinê. Kurê Nemesî Hêwû jî çawa padişê Îsraêlê bide rûnkirinê û kurê Sepetiê ji Abêlmaûlaê Elişa dewsa xwe bide rûnkirinê. Paşê ewê ku ji şûrê Ezayêl xilazbe, wê Hêwû bikuje, lê yê ku ji şûrê Hêwû xilazbe, wê Elişa bikuje””.*

G Padiş. 19:15-17

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî Xwedê gote Îlîyas, wekî ew dewsa xwe Elişa çawa pêxember bide rûnkirinê, lê Hêwû jî çawa

padişê Îsraêlê bide rûnkirinê. Du merivên Xwedê ye mayîn hebûn, yên ku ji ïzabêlê nedir’evîn. Ewana gerekê borcdarîyêن Êlîyas bi-qedandana.

Şuxulê Êlîyas ji wî çaxî da destpê kiribû ji wî meremî dûrkeve, wextê ku ew ji tirsa ïzabêlê revî. Bîr bîne, wekî ïzabêl nava Îsraêlê da menîya hukumê xirab bû. Eger li ber hukumê rîberekî şâş ber xwe nadin û nadine sekinandinê, wî çaxî, hinek wede şûnda, merivên bin hukumê wîda jî bi xirabîyê tijî dibin.

Îsa ev prînsîp da hînkirinê: “Lê belê, tu kes nikare bikeve mala mîrxasekî û hebûka wî talanke, eger pêşiyê wî mîrxasî girênedê. Gava girêda, hingê wê bikaribe mala wî talanke” /Marqos. 3:27/. Merivê mîrxas serwêre, mala wî govek, yan jî têrîtorîya hukumê wîye, hebûna wî, rezê hukumê wîye. Niha li ser hîmê vê şirovekirinê careke mayîn wê yekê bixûne, ci ku Îsa got:

*“Lê belê, tu kes nikare bikeve mala mîrxasekî û hebûka  
wî talan bike, eger pêşiyê wî mîrxasî girênedê. Gava  
girêda, hingê wê bikaribe mala wî talanke”.*

*Marqos. 3:27*

Diqewime tu bêjî, wekî Akaab rîber bû, lê Êlîyas ji wî neditirsîya. Him erê, him jî na. Akaab bi navê serwîrtiyê hatibû dimîayê, lê ewî serwîrtiyâ xwe dabû jina xwe. Bi vî cûreyî jî nava goveka ruh da ïzabêl “merivê mîrxas bû” û ewê cimeta Îsraêlê nava kerepaştîyêda xweyî dikir. Rûyê hukumê ïzabêlê da bû, wekî cimeta Îsraêlê, xêncî hevt hezar meriva, ji hebandina Xwedê ye rast dûrket. Hukumê ïzabêlê ma, çimkî ew rastî berxudanê nehat.

Ez gelek cara rastî tiştên wî cûreyî hatime. Hene meriv, ku xweyê navê serwîrtiyêne, lê ew bin hukum û tirsa yên mayîndanin, ilahî wana, yên ku nézîkî wanin. Ew meriv, wextê ku dixebeitin, nayêne kivşê, ew ji piş dikê serwîrtiyê serwêra dikin.

Vî cûr’eyî usa jî nava malbetada diqewime. Dê û bav ji zarokêñ xwe ditirsin, mîr ji jinêñ xwe ditirsin. Malxwêñ wî cûreyî malbetêñ

xweda nabine serê malbetê. Bona serwêr şêwirdarîya tevî dor û bera ferze- him nava malbetêda û him jî nava qulixê da. Feqet diha gelekî ferze, wekî serwêr nava serwêrtîya xweda bimîne, ku bi wê yekê bi-karibe qulixî malbeta xwe bike û malbetê xweyî bike, pêra jî qulixa xwe mîaser bike, bi xebitandina pêşkêşa ji Xwedê da dayî.

Eger tu serhatîya Îlîyas dîsa bixûnî, tê bivînî, ku peyî wê yekêra wextê ku Îlîyas bona xilazkirina emirê xwe revî, ci hate serê wî. Şuxulê ku Îlîyas destpê kiribû, idî qîmetê xwe unda dikir. Akaab dîsa li ser cimeta xwe hukum dikir. Hukumê Îzabêlê li ser mîrê wê û padişatîyê mezin dibû. Hebandina Bahaq hate dasekinandinê, nenihêrî wê yekê, wekî Îlîyas miqabilî pêxemberên wî şer kir û temamîya milet qewata Xwedê qebûl kir.

Wextê ku Îlîyas ji Îzabêlê revî, bi wê yekê ewî usa jî mîrxasîya cimeta Îsraîlê tevî xwe bir. Akaab mir, lê her du kurêñ wî, peyî wî ra, padişatî kirin û dîsa cimeta xwe berbi kerepaştîyê birin /G Padiş. 22:51, D Padiş. 9/.

## Du merivêñ ku serwêrtîya xwe tesmlî nekirin

Îlîyas ji rîderketinê û kerepaştîyê direvî. Rûyê wê yekê da jî Xudan gote wî, ku ew du meriva bide rûnkirinê, yên ku wê miqabilî wê jinê derketana. Ji wana yek Hêwû bû, yê ku Îzabêl kuşt /D Padiş:9:30-37/. Wextê ku Îzabêlê cêriband Hêwû bin kontrola xwe da xweyke, evê axirîyê nexwest bikeve bin hukumê wê. Îzabêl rastî berxudanê hat û hate kuştinê, hukumê wê jî ket /D Padiş. 10/.

Hêwû û merivêñ wî peyî wê yekê ra hemû 7O kurêñ Akaab kuştin. Ewî usa jî ew merivêñ ku peyî Bahaq diçûn, berev kirin û ew qir kirin. Hêwû kete paristgeha Bahaq û hemû eşîayêñ wa gotî “pîroz” şewitandin. Merivêñ wî heykelên Bahaq xirab kirin û paristgeh jî hedimandin.

Xwedê zelal gote Îlîyas: “Ewê ku ji şûrê Hêwû xilazbe, wê ji alîyê Elîşada bê kuştinê” /G Padiş. 19:17/. Niha dew ji her dua jî dihate kirinê, ku vî hemû tiştî bidine tomerîkirinê, bona ci Îlîyas

### *Pêşkêşen temiri*

hatibû şandinê. Wextê ku Xwedê gote Îlîyas, ku Elîşa dewsa xwe bide rûnkirinê, menî ew bû, wekî Îlîyas rûyê tirsêda tabîya xweye serwêrtîya tesmlî kiribû, lê Hêwû û Elîşa serwêrtîya ji Xwedê stendî nedane tu kesî, wî çaxî pêşkêşa Xwedê temirî nîbû û millet ji hebandina Bahaq xilazbû.

Wextê ku em ditirsin, bi wê yekêva em tabîya serwêrtîya xwe tesmlî dikin. Wî çaxî pêşkêşa, ku bona qulixkirina bo Xwedê destpê dike bitemire û em bêyî femdarî disekinin û dikevine nava tirsê.

Nava Kitêba Pîroze Kevin da gelek serhatî hene, ku çawa meriv paşda vekişîane, wextê ku bin hukuma da tabîyen xwe tesmlî kirine. Çawa ku Pawlos dînivîsi: “Ev hemû tişt çawa meselên gotî dihatine serê wan, lê bona me ku em axîrîya van dewra da dijîn, çawa şîret hatine nivîsarê” /A Korint’î. 1O:11/. Wî cûreyî jî nava nama bona Romaya hatîye nivîsarâ:

*“Lê çi ku pêşda kitêbê da hate nivîsarê, bona hînbû-na me hate nivîsarê, wekî em bi sebirê û wan gotinê nivîsarava, ku bînê didine ber me, xweyîgumanin”*

*R’omayî. 15:4*

Nava vê kitêbê da ez gelek serhatîya ji Kitêbên Pîroze Kevin û Teze tînime ber çeva, çimkî meselên ji Kitêba Pîroze Teze bêyî meselên ji Kitêba Pîroze Kevin wê bi temamî neyêne femkirinê. Serê kitêbêye mayîn da hûnê bivînin, ku çawa tirs çetinaya pêşîya şuxulê Xwedê pêşda tîne, ne tenê nava emirê serwêr da, lê nava emirê wan meriva da, bona kîjana ew qulix dike.

*Meriv ji çi ditirse, diha qedirê wê yekê digire, ne ku  
qedirê Xwedê*

## Ji tirsê destxweçûyî

Tırs nava goveka ruhda me seqet dike. Ew dibe menî, ku em bin hukumên başqeda tiştên ku em qebûl nakin, qebûlkin, kîjan me li ser tabîya me, mehkem nagire.

Meseleke girêdayî vê yekêra meriv dikare serhatîya Hêxî û kurên wî bîne ber çav. Hetanî ku Îsraîl bibûya padişatî, ew ji alîyê hakimada dihate serkarîkirinê, kîjana wextê krîzîsa dîroka millet Xwedê bilind dikir.

Anegorî cûrê Kitêba Pîroze Dêyk, Hêxî hakimê Îsraîlîyî 15-a bû. Ew ne tenê hakim bû. Ewî li Îsraîlê 4O salî hakimî kir. Niha we-rin em binihêrin, ku dor-berê Îsraîlîye ruhanî salên rêberîya Hêxî çi cûreyî bû:

“*Ü wan roja gotina Xudan cuda bû...*”.

*A Padiş. 3:1*

Li vir “gotina Xudan” ji Kitêba Pîroz nîbû, çimkî ya îsraîlîya Toran bû. Nava vê gotinê da eyantîya ji Xwedê tê kivşkirinê, ya ku nava rê û progiramên Xwedê da ye. Li vir jî tenê bîranîneke dûr dima, ku Xwedê çawa eşkere tevî cimeta Xwe xeber dida. Xudanê kitêbê

wî çaxî xwe ker dikir. Dengê Xwedê car- carna dihate guhdarkirinê.

Dêmek, Xwedê bona ci awqas xwe ker dikir. Caba vê yekê em nava kitêba Padişatîyê, serê duda da divînin:

*“Hêxî gelekî kal bibû û guhdarîya wî hemû tiştî dikir,  
çî ku kurêñ wî danîne serê cimeta Îsraîlê û çawa tevî  
komên jinaye berevbûyî radizan”.*

*A Padiş. 2:22*

Kurêñ Hêxî Vopnî û Pênhêş ji rîya xwe derketibûn. Ewana ne tenê tevî jinêñ Îsraîlê, lê usa jî tevî wan jina radizan, yên ku dihatin bona qulixkirinê, li kîderê hazırîya Xwedê hebû. Gelo ewana ji Xwedê neditirsîyan?. Rêderketina wana tenê bi wê yekêva nedihate sînorkirinê. Kurêñ Hêxî usa jî bi mecbûrkirina meriva goşte bona qurbanê anî ji wana distendin. Bi vê kirinê wana him bawarmend û him jî Xudan talan dikirin, çimkî goşt ne yê wan bû. Ew bû menî, wekî cimeta Îsraîlê qurbana bona Xudan bendî tiştekî daneyne. Vopnî û Pênhêş bona cimeta Îsraîlê kevirên giran bûn. Bi kirinêñ xwe ew bûne menî, wekî cimet li ser tiştên Xwedê hêrskeve.

Hêxî zanibû, ku kurêñ wî ci dikirin, lê ewî ew dûr nedixistin, tenê ewî sivikayî dida rastkirinê: “Bona ci hûn tiştê vî cûreyî di- kin, çimkî ez derheqa vî hemû tiştî da gotinêñ xirab ji devê cimetê dibhêm. Lawêñ min, ew ne tiştekî başe, ku ez derheqa we da dibhêm. Hûn cimeta Xudan dikine nava şâşyê” /A Padiş. 2:23,24/. Kurêñ wî layîqî gotinêñ hê zêde bûn, lê ewî bi sivikayî digote wana. Vopnî û Pênhêş gerekê ji tabîyêñ xwe bihatana dûrxistinê, çimkî dilê wane tobekirinê tune bû.

Milyaketeke Xwedê hate cem Hêxî û got: “Hûn bona ci qurban û pêşkêşen Min heram dikin, kîjan Min bona mala Xwe başqe kiribûn. Tu qedirê kurêñ xwe ji Min zêdetir digrî...çimkî Ezê pesinê wana bidim, yên ku qedirê Min digrin û Ezê wana heramkim, yên ku Min bendî tiştekî daneynin” /A Padiş. 2:29,30/.

“Pesindayîn”, “qedirgirtin” dide kivşê “qedirê yekî bigrin, navê wî bilindkin”. Wextê ku Hêxî nexwest miqabilî wan derkeve û şîreta bide kurên xwe, bi wê yekê ewî da kivşê, wekî ewî qedirê kurên xwe diha digirt, ne ku yê Xwedê. Bi femkirin, yan jî bêyî femkirin ew tesmîlî wana dibû, ên ku ew ditirsandin. Eger ew tırsîayî nîbûya, ewê tevî kurên xwe cûrekî mayîn xeberda.

Diha dereng Xwedê tevî Samûêl derheqa Hêxî da xeber dide: “Min eşaretî da wî, wekî mala wî gerekê heta- hetayê gunek’ar-kim, wekî ew tiştên ku kurên wî dikin, nifira tînine ser xwe û ew jî miqabilî wana dernakeve” /A Padiş. 3:13/.

Gotina Xudan ya hertimî nîbû û xirabkarîyê li wir padişatî dikir, çimkî Hêxî ji kurên xwe ditirsîya. Ewî serwêrtîya xwe unda kiribû û karebüna wîye gunekarkirina bi heqîtî û qulixkirina bona Îsraêlê ji wî dûrketibûn. Meremê Xwedê hatibû teribandinê. Dijminen Îsraêlê ji hemû alîava qewat bibû, li hundurê welêt ruşetxwerinê padişatî dikir. Wextê ku serwêr serwêrtîya xwe dihêlin, ewê bin bandûra wanda dizérin.

## **Gelo ev hal bo te nase?**

Ew yek zulme, wextê ku bav ji zarokên xwe ditirsin. Wextê ku ez serwêrê cahila bûm, malbetên mesîhiya usa dihatine cem min, kîjan bona alîkarîyê tewaqe dikirin. Min xortên usa didîtin, kîjan dê û bavê xwe bendî tiştékî danetanîn, wana ra bêyî qedirgirtin xeber didan. Dihate texmînkirinê, wekî dê û bav hêrsa wan radikirin. Min li ber çavê dê û bavên wan şaşiyêن wana rast dikirin, çimkî şaşbûyî bûn û ditirsîyan xwe bidine rastkirinê. Malên wanda krîzîs bû, anarxiyê padişatî dikir. Dê û bava serwêrtîya xwe tê bêjî dabûne zarokên xwe. Li malbetên wan pêşkêşa Xwedêye îzbatkirina qeyde-qanûna û mezinkirina zarokên xwedêparêz temirîbû.

Ev pirsgirêk tenê nava malbetada nîne, lê ew usa jî nava civînada heye. Ez çûme gelek civîna, ez gerekê xwe mikur bêm,

wekî gelek serwêr ji cimeta xwe tirsîayîne. Atmosifêra li wan civîna ji atmosifêra Îsraêlyaye bin serwêrtiya Hêxî cuda nabe.

Serwêrên wî cûreyî tabîya xweye serwêrtiyê tesmlî kirine, lê hukumê Xwedê jî temirîye. Serwêr wextê qulixê xeber didin, wextê kîjanê pesindayîn û qedirgirtina mezin heye, lê hazırîya Xwedê yan hindike, yan jî qet tune.

Qulixçî fesal xeberdana xwe hazir dike, ku wana bêhurmet neke û miqabilî wan dernekeve, yên ku gurê da nînin, yan jî dikine qalme- qalm û bi hêrs derheqa gumanbirîyê da xeber didin. Ew pêz dixe bona ku tirsa xwe bigre. Feqet nava vî hemû tişti da emirê ruhanî tune, yan jî ew qet nayê kivşê.

Nava halên vî cûr'eyî da hindik cara hazırîya Xwedê tê kivşê. Raste, pevçûyîn ên emir dibin, lê hazırîya Xwedê tam nîne û gotina Wî mînanî kanîya ava saxlem aza nîne.

## Civîna ku meytê sax bû

Sala 1990-î min li civînekê qulix dikir. Li vir meriv difikirîn, wekî ew saxin û tevî Xwedê dilivin. Sibeke roja yekşemê, wextê ku min qulixa xwe derbaz dikir, min texmîn kir, wekî gotinê min tê bêjî paşa dihatine ser çavê min. Tê bêjî li pêşîya min dîwar sekinîbû. Atmosifêra li wir lap cûrekî mayîn bû.

Min tiştek fem nedikir. Serwêr û jina wî merivne gelekî baş bûn. Kurê wan gelekî hizkirîbû. Ez tev-hev bibûm. Peyî qulixê ra ez çûm, ku tevî wan nan bixum.

Serwêr got: “Con, ez dixwezim pirsekê bidime te. Li civîna me jin û mîrek hene, yên ku hazır dibin ji hev cihê bin. Ew herdu jî têne qulixê û ji hev dûr rûdinê. Mîrê wê jinê serwêrê meye qeyde-qanûna ye, li civîna me r'astî jineke cahil hatîye û bengî bûye. Ew jin cîguhastî li cem wan bûye û niha ew tevayî dijîn. Ez niha çi bikim?”.

Min guhêñ xwe bawar nedikirin, çimkî ez difikirîm, gelo ew hewcê şêwira mine?. Min zendegirtî ji wî pîrsî: “Tu dixwezî bêjî, ku te hetanî niha ew ji civînê dûrnexistîye?”.

“Na, xêr,- ewî cab da,- lê min tewaqe kirîye, ku ew îdî serwêrê qeyde-qanûnê nîbe”.

Nêzîkî sehetekê min tevî serwêr û jina wî qise dikir. Min wan ra gîlî kir, ku çawa Pawlos nêzîkî serwêrên civîna Korinfîya dibû. Li wir merivek ji rîya xwe derketibû. Pawlos digot: “Û hûn ji kubarîyê hur bûne! Ne gerekê we şîn bikira û yê xweyê vî kirî ji nava xwe derxista” /A Korintî:5:2/. Pawlos digot, wekî wî merivî gerekê ji civînê dûrxin û şirove dikir, ku bona çi gerekê bê dûrxistinê: “Ne qence, ku hûn firanax dibin!. Gelo hûn nizanîn, ku hinek hevîrtîşk temamîya şikevê hiltîne” /A Korintî:5:6/. Hevîrtîşk nava hevîr da dixebite û dibe menî, ku nan bikaribe bilindbe. Pawlos ev kirinêñ bêserm himberî hevîrtîşkê nan dike.

Min gote serwêr: “Te îzin daye, ku guneh nava temamîya civînê da belabe. Xwedê wê ji te dewa hesaba bike, çimkî ew yek wê tevî pezên mayîn jî biqewime. Tu tenê xwerinê didî wana, lê ditirsî wana biparêzî, çimkî tu hiz nakî miqabil derkevî. Herdu tişt jî grîngin. Tu gerekê li ser xwe guman û bi rîya hizkirinê li ber wî merivî bisekinî, lê eger ew carekêra tobe neke, wî ji civînê dûrxse”. Eger em xwerinê nedîne pêz, ewê birçîna bimirin. Lê eger em wana neparêzin, ewê undabin. Reng li serwêr û jina wî çû. Jinê got: “Ez nizanim, ku dixwezim nava qulixêda bimînim, yan na, lê çi ku dixwezim bikim, ew hizkirina meriva ye”.

Min bersiv da: “Eger tu wan meriva naparêzî, wî çaxî ew hizkirin ya rast nîne”.

Ew xwe mikur hatin, wekî ew ji hinek endamên civînê tîrsîyîne. Wana derheqa problêmên xweda gîlî kirin. Nava komê da hinek sazbend bi bêqedir nêzîkî wana dibûn. Ez jî xwe mikur hatim, wekî wextê qulixê hinek çetinayî derketine pêşîya min û niha min îdî fem

dikir ku bona çi usa bû.

Êvarê, wextê qulixê, merivekî nedîhişt, ku ez xeberdim, bona ku bi zimanê başqe-başqe berbiribûnê bide. Min tewaqe ji wî kir, ku ew bisekine û şiroveke, wekî Xwedê bi Xwe bona Xwe çetinaya pêşda nayne. Ewî merivî fem kir û idî xebernedâ, lê wextê ku ew sekinî, gitarîst ji cîyê xwe banzda, ser minda kire qîrîn û got: “Ezê t’u cara netirsim ku miqabilî /dijî/ xeberdana yekî mayîn derkevîm, kîjan îzinê nade, kö Ruhê Pîroz bilive. Ez ji vir derdikevîm”. Ewî jina xwe hilda û li ser sazbendekî mayînda kire qîrîn û emir kir, ku ew jî peyî wî here. Ew sazbendê mayîn, jina wî û yekî mayîn hêrs ketin. Tev-hevbûn ketibû nava meriva.

Min carekêra alîk’arîya Ruhê Pîroz tewaqe kir. Ewî got: “Derheqa serwêrtiyêda wana hîn bike”. Wextê ku min ew yek kir, edilaya Xwedê peyayî li ser wan meriva bû û qeyde-qanûnê Xwedê ïzbat bû.

Wextê ku min xilaz kir, Xudan minra got: “Bêje wî merivî, yê ku sekinî, ku berbiribûna bi zimana bide û şirove bike”.

Ez berbirî wî merivî bûm:

- Maqûl, eger Hûn dikarin, ez bawarim, Xwedê dixweze, ku hûn ewê berbiribûnê niha bidin”.

Ewî ew yek kir û usa jî şirovekir.

Ewî merivî destpê kir xeberde: “Xudan wa dibêje: Min li vê civînê pir’aniya guneha dîtîye. Min derheqa wê yekê da nîşanî xulamê xwe kirîye. Guhdarîyê bidine ser xeberên Wî, çimkî ew xeberên Minin”.

Bona gunehê wê civînê hêşir ketine çavêن min. Guneh lez bela dibû, çimkî serwêr ji çend merivêن mayîn ditirsîya, bona kîjana Xwedê dixwest ku ew hişyarbin.

Ez gelekî şabûm, wextê ku minbihîst, ku serwêr miqabilî wî merivî û ewê jina cahil derketîye, yên ku tevayî diman. Wana her dua jî tobe kiribûn û qirara derheqa cihêbûnê da qebûl kiribûn.

## **Serwêrek ji temamîya teşkîla xebatkarên xwe tirsîya bû**

Carekê min li civîneke mayîn qulix dikir, li kîderê berevbûn şebeqa roja ledê /yekşem/ destpê bibû û têra hatibû dîtinê, ku wana hetanî êvara çarşemê dûmayîkin /berdewamkin/. Berevbûnên me gelekî baş derbaz bûn. Ewênu ku dihatine civînê zêde bûn. Lê êvara sêşemê, hetanî destpêbûna qulixê, serwêr girîya.

- Çi qewimîye?,-min jê pirsî.

- Con, ez çavnebarîyê te nakim. Ez awqasî fe'm nakim, ku bona ci min tu cara heja Xwedê nedîfîye. Ez bi Ruhê Pîrozva tijîme, lê hetanî niha, wextê qulixkirina min tu pêkêsheke Ruh nexebitîye. Tu yek nehatîye qenckirinê, yan jî azakirinê û hemû tiştê bêjî çetine.

Min destpê kir pirsa bidime wî. Eyan bû,wekî nava teşkîla xebatkarên serwêrda du jin û mîr hene, kîjan ji wî zûtir bi Ruhê Pîrozva hatibûne nixamdinê, ne ku serwêr û wana rê nîşanî serwêr dikirin, ku ew ci bike û çawa bike. Min şirove kir: “Tu gerekê paşa vegerî li ser serwêrtîya ku Xwedê daye te û bêjî wana, wekî tuyî serwêr, lê ne ku ew”. Rojtira mayîn ewî tevî wan jin û mîra xeberda. Ew ne razîbûn û ji civînê dûrketin. Berevbûn hatine paşdaêxistinê û wextê qulixa xilazîyê komeke meriva pêşda hat, ku dua bike, lê Xudan gote min: “Tu gerekê bona wan meriva dua nekî: serwêr gerekê wê yekê bike”.

Serwêr li min nihêrî û min li ser wî hukumê Xwedê dît. “Serwêr,- min gote wî-, Xwedê dibêje, wekî tu gerekê bona wan meriva dua bikî”.

Ewî destpê kir nava wan merivara bireve. Serwêr li wan diket û meriv ji hukumê Xwedê diketin. Hinek hetanî nêzîkbûna serwêr diketin. Hukumê Xwedê gelekî qewat bû.

Keçikeke sazbend aza bû. Nava çend deqada hemû merivên wê komê li ser erdê ketîbûn. Ruhê Pîroz qulixî wana dikir. Serwêr zivirî,

carekê li min nihêrî û li ser piştê erdê ket.Bi mecbûrî jina wî qulix da girtinê. Peyî nîv sehetî ra du meriv alî kirin ku serwêr rabe.Wê civînê tu cara tiştên usa nedîtibû.

Hukumê Xwedê rûyê tirsêda nava serwêr da kar nedikir. Ew yek feydayê wê yekê bû, wekî hukumê Xwedê û hazırlîya Wî li vê civînê hertim tune bû. Pişti şikêndina hukumê tirsê pêşkêşa Xwedê hate azakirinê.

### **Serhatîya dîsa vî cûreyî, lê bi ssênameke mayîn**

Ez hatime li ser wê fikirê, wekî li çend civîna ev prînsîb bi aqasîva raste,bi çıqasîva nava emirê merivadaye.

Min li civîneke ji welêt der qulix dikir, li kîderê serwêr miqabilî tirsê şer dikirin. Nava temamîya hevtê da min gote wan, piştgirî da wan, ku nava ruhê xwe da qewatbin û navê xweyî bilind, yê nava Xwedê da,bidine xebatê. Peyî wê yekêr'a çar meh derbaz bûn, peyî çûyîna minra, endamên wê civînê sê cara zêde bibûn. Ew ji avayê xwe, li kîderê cîyê 4OO merivî bû, cîguhastî cîkî usa bûn, li kîderê cîyê du hezar merivî bû. Wextê ku ez hê dereng vegevîyame wî welaflî, serwêr minra got,wekî ew bi xwe û civîna wî ji wî çaxî da hatine guhastinê, wextê ku wana tirs şikêndîye.

Min bi sê rojava, bona qulixê, teglîfî li Atlantayê kiribûn. Roja xilazîyê min derheqa şikêndina qewata tirsê da xeber dida. Serwêr ji wê tirsê aza bû.Ewî got: "Hûn gerekê dîsa bêñ û hevtêkê bîmîn".

Peyî sê hevtîara ez paşda vegevîyam û me dîsa neh qulix derbaz kirin. Hukumê Xwedê û hazırlîya Wî usa qewat bû,wekî hinek hetanî nîvê şevê diman. Nîvê şevê wana mala serwêr ra têlêfon dikirin û dipirsîn, ku ci bikin, çimkî wana hetanî wî çaxî hukumê Xwedê û hazırlîya Wî texmîn dikirin.

Peyî vê yekê ra neh meha ser hev, xilazîya her hevtêkê civînê

qulixa hişyarbûnê derbaz dikir. Serwêr min ra têlêfon dikir û digot, ku qulixên çawa qewat li civîna wî derbaz dibin. Ewî digot, wekî ji wan berevbûna tu yek mînanî ya mayîn nîbûye. Civîna wan ji 4OO-î gihîştibû 7OO-î. Ewî usa jî got, wekî hema wê êvarê , wextê ku min derheqa şikêinandina tirsê da xeber dida, nava emirê wî û qulixa wîda guhartineke mezin qewimîye.

Ez li civîneke mayîn bûm. Wextê qulixê serwêr ji cîyê xwe rabû û elametî bela kirin, derheqa qurbanayînê da “hîn kir”. Gotinê wî qet hewaskar nîbûn. Wextê ku peyî qulixê ra me nan dixwer, ewî tenê derheqa fûtbolê da xeber dida. Wî çaxî nanxwerina me jî idî hewaskar nîbû.

Êvara mayîn Xwedê usa kir, ku ez derheqa şikêinandina tirsê da xeberdim. Nîvê xeberdana mînda serwêr erdê ket û sistbûn tobe kir, kîjan ewî nava emirê xweda û wextê qulixa xwe qebûl kiribû. Min zanibû, wekî Xwedê nava emirê wîda kar dike, lê min fem nedikir, wekî ew yek wê çiqas wede bikişanda.

Rojtira mayîn ewî min ra têlêfon kir: “Con, jina min idî sehetke ku razaye, lê ez ranezame. Em temamîya şevê hişyar bûne, me tobe kirîye, em girîyane, paşê em kenîyane. Paşê hemû tişt dîsa wî cûreyî diwekilî”. Ewê rojê ew çûbûn li cem alîkarêن xwe û li ber wan tobe kiribûn, baxşandin xwestibûn, wekî ew çawa pêşîkêşê Xwedêyî wî cûreyî nîbûye, kîjan ew gerekê bibûya.

Ji alîkara çend meriv ji civînê dûrketine, wextê ku wana fem kirîye, ku ew idî nikarin serwêrtiyê li serwêr bikin. Yêن mayîn gihîştine wî û piştgirîya wî kirine.

Civîn û ew meriv tu cara vî cûreyî nîbûne. Peyî çar sala ra niha li cem wan vî cûreîye. Nava van herdu salêن xilazîyê da ew xilazîya her hevtê berevbûnê hişyarbûnê derbaz dikan. Wextê ku serwêr minra têlêfon kir, gîlî kir , ku çawa Xwedê wîra xeber dide û çi li civînê diqewime. Ez çend cara paşda vegeryame wê civînê û her car hal diha baştir dibû. Ewî çend cara minra gotîye, wekî bi saya

azabûna ji tirsê nava emir û qulixa wîda gelek tişt hatine guhastinê.

Azabûna vî cûreyî ne tenê bona serwêra, lê bona temamîya bawarmendaye. Me gelek şedetî stendine, wekî merivên nava govekêd emire cuda-cuda da aza bûne, wextê ku wana zincîrên tirsê şikêñandine.

Wextê qulixekê, wextê ku min derheqa şikêñandina tirsê da xember dida, xilazîya berevbûnê jinekê şedetî da, wekî ewê hukumê tirsê texmîn kirîye û tirs ji nava emirê wê derketîye.

Peyî çend rojara ew jin û qîza wê li ser rîya xwe rûyê agirkirinekê da disekinin. Merivên ku êrîş dikin, kîskêن jina ji wan distînin û sê cahil dora wan digrin.

Wî çaxî nava wê jinê da mîrxasî bilind dibe û ew destpê dike bi dengê bilind bi zimana xeberde. Cahilê ku sîlîh' dêst da hebûye, emir dike ku ew xeberdanê bide sekinandinê. Ew jin dîsa xeberdana xwe pêşda dibe. Ew cahil awqasî nav- hev dikevin, wekî qîza wê jinê péra dîghîne bireve malê û polîsîaéra têlêfon bike. Cahil direvin û tenê kîskê jinê tevî xwe dibin.

Rojtira mayîn mesîhîk qirar dike pîya here mala dayîka xwe. Ew nava mêsera derbaz dibe û kîskê wê jinê li wir divîne û jêra têlêfon dike. Ew herdu jî şâ dibin. Ji kîskê jinê hindik pere kêm bibûn, lê hemû dokûmêntê wê jî tê da mabûn.

Ewê jinê gotibû jina min, wekî ewê xeberdanê mîrxasî dabû wê, kîjanê emirê wê xilaz kiribû. Eger berê bûya, ewê bitirsîya, lê niha tirsa wê tune.

Ez şikirîyê bona hemû şedetîya didime Xwedê. Ez jî tirsêva girêdayîbûm, lê bi saya Xwedê niha ez azame. Aqilmendî û hukumê vê azabûnê ji Xwedê tê û yên dîlketî aza dike.

Me tirs da eşkerekirinê û da kivşê, ku ew yek çawa dikare çetinaya pêşda bîne, lê gelek cara jî pêşkêş û hukumê Xwedê bide sekinandinê. Meremê me ewe, ku em tirsê ne tenê bidine eşkerekirinê, lê serbara serda wê yekê bidine şikêñandinê.

*Berxwedayîna ruhanî dewa piştgirîya ruhanî dike*

## Ruhê tirsê

**B**ona fe'mkirina tirsê em gerekê du tişta givtugo bikin. Berê ewlin pirs ewe, wekî tirs ruhe, lê ya duda, wekî ew yek ji Xwedê da nîne.

*“Çimkî Xwedê ruhê tirsê neda me”.*

*B Tîmotêyo. 1:7*

Nava vê gotinê da xebera “ruh” bi zimanê yûnanî xebera “pnêûma”-ye, kîjan bona Ruhê Pîroz, ruhê mîriv tê xebitandinê, wextê ku derheqa dûrxistina cina da xeber didin. Tirs tabî yan jî nêzîkbûn nîne, lê ruhe.

Çawa ku me got, tirs ruhe usaye û em nikarin bi fikirdarîyê yan jî bi dereca xwestinê miqabilî /diji/ wî şer bikin. Bi heyîna tabîya fikirdarîyê tê tirsê alt nekî. Berxwedayîna ruhanî dewa piştgirîya ruhanî dike û ew yek bona goveka ruhe.

Pirs pêşda tê, ku gelo bona çi merivên aqil û bi fizîkî qewat, bi şer'kirina miqabilî tirsê, gelek cara ji mirovekî yan jî ji tiştekî ditirsin, kîjan bi fizîkî yan jî bi fikira xwe ji wî sistire. Diqewime hemû

tişt başe, lê ew nava halekî usada dijî, wekî nava emirê wanda hemû tişt dikare berbi xirabîyê bê guhartinê. Ew meriv temamîya wede û ênêrgîya xwe nava nerehetîyêda dixebeitînin û dicêribînin xwe ji tiştên usa dûr bigrin, kîjan dikarin qet neqewimin jî. Ew wedê niha ra nikarin şabin, çimkî ji pêşeroja xwe tırsîyâne. Ew yek ferz nîne, ku derheqa wanda fikira te çîye, yeke tırsa wan dimîne. Merivên wî cûreyî xweyê ruhê tırsê ne û ew hertim navaşerkarıya tevî sistaya fizîkî nînin, lê sistaya ruhanîdanin.

Niha em derheqa wan merivada xeberdin, kîjan texmîn dikin, ku hertim dîghîjine xwestîna xwe. Menî ne yaşê wane, ne jî xwendina wane. Ew dikarin bêyî tabî û serwêrtîyê bin, lê merivên dor- berên wan gura wandanin. Bona çî?. Eva tiştekî zelale. Ew bi saya ruhê tırsê serkarîyê li yên mayîn dikin. Ew hîn bûne tırsê bona kara xwe bidine xebatê.

Min tevî merivekî teşte dixwar, bîznêsa kîjanî gulvedida. Ewî minra gilî dikir, ku çawa dijî û çawa bîznêsa wî pêşîya xilazbûna wî kar dikir.

Nava bîznêsa xweda ez dîghîştime her tiştî, wextê ku min meriv nava tırsê da xweyî dikirin. Min hukumê ewê tırsê li ser xwe texmîn dikir, wextê ku ez nava bajêr da digerîyam. Li min xweş dihat, wextê ku meriv ji min ditirsîyan û ez wî çaxî jî dîghîştime xwestîna xwe, eger tiştek girêdayî bû qirara şêwira bajêr ra. Nava wê yekê da ruhê tırsê hebû. Serk'arêñ bajêr, nenihêrî tabîya wane bilind û serwêrtîyâ wan, dil nedikirin miqabilî min derkevin.

## Ruhê ku kontrol dike

Êlîyas ji cimeta Îsraîlê neditirsîya, wextê ku wana xwe pêşkêşî hebandina Bael kiribûn. Gelo mîrxasîke çawaye, wextê ku merivek miqabilî temamîya milet derdikeve. Ew neditirsîya, wextê ku miqabilî 850-î pêxemberên derewîn şer dikir. Êlîyas wî çaxî jî nedifikirî, wextê ku padışê Îsraîlê li ser wî hêrs ketibû. Hemû kes

wê nikaribûya wî tiştî bike. Feqet Îlîyas ïzin da ku jinek usa wî bitirsîne, ku ew rîya revê bide pêşîya xwe û ew bixweze bimire.

Pisîxolog dikarin bêjin, wekî ew jin ditirsîya, lê eva fikireke siste, çimkî nava cimeta Îsraêlê da t’enê mîr nîbûn. Na xêr, eva şerkarîya ruhanî bû, tevî kîjanê dibûn milet, padişa û pêxemberên feş. Îlîyas nava Îzabêlê da rastî ruhê tirsêye qewat, kontrolkirinê hat, kîjan ne li cem padişê, ne jî li cem pêxemberên feş hebû.

Were em binihêrin, ku Kitêba Pîroz derheqa vê yekêda çi dibêje. Guhdarîyê bide ser qisa Yêhû û kurê Îzabêlê Yoram:

*“Gava Yoram çevv Yêhû ket, jê pirsî: “Te xêre, Yêhû?”.  
Ewî lê vegerand: “Wê çawa xêr be, wekî çiqas diçe bê-namûsî û pîresêrtîya Îzabêla dîya te zêde dibe”*

D P’adîş. 9:22

Ji xebera “pîresêrtî” tu fikira xwe cûrekî mayîn pêşda nebe. Şaş nebe ku tu jineke bi pozê xar bînî ber çavê xwe, kîjan bi gêzîyê di-fire, pîresêrtîyê dike, jehrê dide xebatê. Meriv bi pîresêrtîyêva mijûl dibe, dixwezî ew jin be, yan jî mîr be, meremê wê cedandina bona kontrolkirinêye. Belê, cûrê pîresêrtîyê, yan jî serwêrtîyê heye, kîjan gazî ruhêن xirab dike. Feqet pîresêrtî bi vê yekêva xilaz nabe. Pawlos miqabilî civîna galatîya derdikeve, dibêje: “Gelî galatîyên bêhiş! Kê serê we tijî kir? Ne axir Îsa Mesîh li ber çevê we xâçbûyî hate dîyarkirinê”/Galatî. 3:1/. Ev pîresêrtî ne ew pîresêrtî bû, kîjan jehrê dide xebatê. Pawlos dixwest derheqa wan dersdara da bêje, kîjan ew anîbûne li ser wê fikirê, ku gura wî hemû tiştî nekin, çi ku Xwedê bi cûrê femdarî elam kiribû. Ev dersdar xweyên ruhê kontrolkirinê bûn û ev yek hukumî li ser temaîya civînê kiribû.

Ruhê Îzabêlêyî kontrolkirinê û tirsandinê awqas qewat bû, wekî padişa, rêber û temamîya cimeta Îsraêlê rê dabûne wê. Îlîyas jî teslîmî wî ruhî bibû û direvî, ku emirê xwe xilazke. Wextê ku tu ïzinê didî, ku tirs bikeve dilê te, tê edilayê, îtbarîyê, mîrxasîyê,

sebirê, serxwebûnê û bêqeziabûnê unda bikî. Vê navnîşê meriv dikare zêde bike.

Min dîtiye, ku çawa meriv dicêribînin bi saya fikirêن baş ji zêrandina tirsê azabin. Ew aza nabin, çimkî karê wan ne ku tevî feydaêd tirsê, lê koka wê heye. Tu dikarî rezê darê jê bikî û ew dar hinek wede dikare bê rez bimîne, lê çawa jî hebe, paşê ewê dîsa bîghîje. Darê hetanî wî çaxî rez bide, hetanî ku koka wê qewîn be. Eger tu bicêribînî vî cûreyî hukumê tirsê bişkêni, tê mecbûr bî bidî peyî qewata ruhanîye piş wê.

## **Ruhê kontrolkirinê û tirsandinê ye li civînê**

Civînên meda hene meriv, dilên kîjana li ber Xwedê rast nînin. Ew wan serwêra ditirsînin, ku bîghîjine xwestina xwe. Ew awqas wext gura wandanîn, çimkî hemû tişt bi xwestina wane. Merivên wî cûreyî direvine civînên usa, li kîderê serwêr sistin.

Li civînên cuda-cuda gelek cara ez rastî tirsê dihatim û min nizanibû, ku ez bona ci miqabilî wê yekê şer dikim, yan jî ew yek ji kîderê tê. Menî eve: “Tirs ruheke, kîjan xwe bi saya merivekî dide kîvşê. Kitêba Pîroz eşaretîyê dide bawarmenda, ku cî nedine mîrê cin /Efesî. 4:27/.

Ez dixwezim derheqa hinek cêribandinê xweda we ra bêjim. Min fem kirîye, wekî hinek meriv wextê ku rastî meriva têن, ew cina nava wan merivada digerin. Eger tu dikarî nava hemû tiştîda mîrê cin gunekar bikî, usaye tê bona kirinê xwe cabdarîyê nekişînî. Bi wî cûreyî tê diha gelekî guhdarîyê bidî ser cina, lê ne ku li ser Îsa. Kitêba Pîroz me hîn dike, ku em berbi Îsa binihêrin, lê ne ku berbi cina. Ewe Xudan û xilazbûna bawarîya me /Îbranî. 12:2/.

Ez wê yekê fem dikim, wekî em borcedarin bi jîyîna xwe guhdarîya xwe li ser Îsa bidine merkezkirinê û eger ruhek derê ser riya me, em gerekê wî bi Xebera Xwedê unda bikin û dîsa peyî Îsa

herin. Alêlûia!. Bona ku em bi kardarî tirsê bişkênin, gerekê em bi-zanibin, wekî ew ruheke û eger em wî bendî tiştekî jî daneynin, ewê dîsa ji me dûr nekeve.

## Êrîş

Ezê we ra derheqa qewimandinekê da gilî bikim, kîjan îzbat dike, wekî tirs ruhe. Li civîneke Başûr min qulixa xwe mîaser dikir. Berevbûna ewlin roja yekşemê bû û ew gelekî bi hukum bû. /Çar sala ser hev em video ya wê qulixê didine xebatê/. Peyî qulixê ra tu yek tiştekî tirsîayî yan jî xirab negot.Bi gilîkî merivên dora min bi fikira baş berev bibûn. Piştî denê nîvro min fem kir, wekî ez dijî tevhîbûnê û gumanbirîyê şer dikim. Min fem dikir, wekî tiştek rast nîne, lê min nizanibû, ku ew yek ji kîderê tê. Min nîşanên wê yekê nas kirin. Ew jî mînanî wan nîşana bûn, wextê ku min dijî tirsê şer' dikir. Ewê şevê Xudan emir kir, wekî ez li civînê bi serwîrtîya xwe xeberdim. Bi wî cûreyî min bona geleka qulix kir.

Piştî qölixê, serwêr ez birime ofisa xwe. Ewî got: “Tu nizanî, ku te vê êvarê, wextê qulixê nîşangirîke çawa girtibû”. Ewî min ra gilî kir, wekî jineke ji civînê nîvro gazî wî kirîye û gotîye wî: “Serwêr ez zanim, wekî tu xeberdana wî merivî ra qayîl nînî, ew li ser cimetê gelekî hukum dike. Ez zanim, wekî tê berevbûna bidî sekinandinê, çimkî tu mînanî wî nînî. Ezê vê êvarê neyême qulixê, ezê malê bimînim û miqabilî wî merivî dua bikim”.

Bona min idî zelal bû, ku ev nerazîbûn ji kîderê tê. Min ji serwêr pîrsî, ku ewî gotina wê jinê da rastkirinê, yan na?. Serwêr merivekî gelekî belengaz bû û got, wekî ewî usa nekirîye, lê awqasî gotîye, wekî ew gerekê wê yekê tesmîlî destê Xudan bike. Eger serwêr gotinên wê jinê rast bikira û li ser tabîya serwîrtîya xwe bima, ez gumanim, wekî peyî denê nîvro ra hemû tiş wê cûrekî mayîn bûya. Ew tiştên, miqabilî kîjana em dernakevin, wê tu cara neyêne guhastinê. Wextê ku xirabî nayê hesabhildanê, bi wê yekê ew diha

qewat dibe. Me herdua jî ji ev qewimandin bona xwe çawa ders hil-da. Xudan ev cêribandina da xebatê, bona ku bide kivşê, ku ez çawa nava serwêrtîya ruhanî da bimînim û li ber ruhê tirsê çok nedim.

Razalixî Xwedêra, boy Ruhê Pîroz, Yê ku zanibû, ku ci diqewime û alî min kir, ku ez miqabilî wî ruhî derkevîm, nenihêrî wê yekê, wekî min nizanibû ci diqewime. Serwêr fem kir û ewê yekê çevên wî dane vekirinê. Ew berevbûn bûne berevbûnên salêye here zor. Ez dîsa çûme li wê civînê, ez û serwêrê li wir niha hevline başin.

## **Pevçûyîneke mayîn tevî ruhê ku ditirsîne û kontrol dike**

Carekê li cîkî hêسابûnêyî ji welêt der min qölix derbaz dikir, li kîderê nêzîkî hezar merivî hêsa dibûn. Her roj gerekê sê berevbûn bi-hatana derbâzkirinê- dudu şebeqê û yek jî êvarê. Herdu qulixên ew-lin gelekî qewat bûn. Min hertim nava atmosiférâyê da berxwedayîn texmîn dikir. Peyî qulixa duda ra, temamîya nîvro min oda xwe da derbaz kir, bi şerkirina dijî giranîyê û gumanbirîyê. Min zanibû, wekî ew yek ew ruhe, yê ku ditirsîne û kontrol dike, lê vê carê tu kes dijî min tu tişt negotibû. Feqet ez îdî hîn bibûm, wekî ez ne ku dijî bedenê û xwînê, lê dijî ruhê xirab şer dikim.

Bawarmend hewcene hînbin, ku çawa nava Ruh da bijîn. Ruhê Xwedê wê e'lamî te bike, ku tu dijî ci derkevî. Bêyî stendina sîlîhêن dijmin emê guhdarîya xwe li ser hukumên ji der bidine merkezkirinê. Wextê ku min fem nedikir, ku karê min tevî kîye, bona min hewas-kar bû, ku ez bizanibim, ku bona ci miqabilî gumanbirîyê şer dikim û gelek tiştên mayîn... Eger min ev fikir berdewam bikirana, ezê bona qulixê lazim nîbûma, lê ruhê ku ditirsîne û kontrol dike, hema wê yekê jî dixweze. Min guhdarîya xwe dabû ser xwe, lê ne ku li ser wî tiştî, ci ku Xwedê bona wan meriva dixwest.

Nîvro nava şerkarîyê da derbaz bû. Wextê ku êvarê bona qulixê gazî min dikirin, min tercimeçîyê xwe ra got, wekî min nîvê rojê da

şerkarî miqabilî tirsê kirîye. Ewî got: “Min jî usa kirîye”. Me dît, wekî me miqabilî hema wê yekê şer kirîye. Wê êvarê min miqabilî ruhê tirsê xeberda, gelek meriv aza bûn.

Rojtira mayîn, wextê ku ez nêzîkî dikê bûm, min texmîn kir, wekî rûnkirin tune. Dihate texmîn kîrinê, ku Xwedê xwe ker kirîye. Ez çend deqa li ser dikê sekinîbûm, hîvîya Gotina Xudan bûm. Min dua kir û cimetê jî dest bi dua kir, lê ne pêşikêşî, ne rûnkirin, ne jî gotin hebûn, bona ku ez tiştekî bikim. Dilê xweda min zanibû, wekî ez nava şerkarîyêdame. Min zanibû, wekî gerekê wan gotina xirabkim, kîjan miqabilî min hatibûne gotinê. Gotina Xwedê dibêje:

*“H’emû tiştên ku miqabilî te hatine çêkirinê, gerekê li hev neyên û her zimanek, wekî rabe û te gunekar bike, gerekê bê gunekarkîrinê. Eve warê xulamên Xudan û heqûtiya wana ji Mine, Xudan dibêje”*

*İşaya. 54:17*

Ez dîsa çûme li wê civînê ûer tiptek girêdayî bû qirara þêwira rsîne û kontrol hevline baþin. erekbûnêd salêye here zor.

Min destpê kir tirsê bişkênim. Min emir kir, ku hemû gotinêni miqabilî min bêne gunekarkîrinê. Bona min hewaskar nîbû, ku mirovê derheqa minda çi bifikirin. Ez hîn bibûm guhdarîyê li dilê xwe bikim, li kîderê Ruh xeber dida.

Gotina Xudan mînanî agirkirina sîlih hate cem min. Xwedê gote min, ku cimet gerekê çi bike. Hukumê Xwedê nava du-sê deqa da peya bû. Meriv bi awqasîva bi Ruhê Pîrozva tijî bûn, wekî wana destpê kir bêhemdî xwe bikenin. Livandina Ruhê Xwedê awqas qewat bû, wekî min nikaribû xeberda. Dengê wan meriva hetanî nîvro seheta sisîya nediseqirîn. Terşeke mezin lê ketibû û dilê min şâ dibû. Eger ez miqabilî wî ruhî derneketama, eva yeka wê neqewmîya.

Paşê ez ji tercimeçî pê hesîyam, wekî wextê berevbûna jineke qulixçî, ya ku ji qulixê derketibû, nêzîkî serwêrê qulixê bibû, gotibû:

“Bona çi ew meriv gerekê tenê guhdarîya Con Bîvîr bikin, yê ku li vir hemû qulixa derbaz dike. Em usa jî hewcê qulixçiyêna başqene”. Ewê jinê bi xwe dixwest qulix derbaz bikira.

Min şedetîyêna başqe jî derheqa wê jinê da bihîstin. Wextê qulixa ewê ne bi prînsîpêna Kitêba Pîroz cêribandina “azakirinê” kiribû. Mesele, ewê dermanê çeva dabû xebatê û şerav çermê merivênen nexwêş xistibû. Tu kesî ew nedabû sekinandinê. Serwêre li wê civînê, bi hinek sînorkirina, îzin dabû wê jinê ku ew qulix bike.

Telebextra, gelek serwêr gelek cara ber tiştên wî cûreyî berdaxustina didine kivşê, miqabil dernakevin, çimkî ew difikirin, ku ev rî diha hêsaye. Feqet berdaxustin tu cara jî hêsa nîne, ew gelek cara gelek bihaye.

Peyî berevbûna ra min wî serwêrî ra qise kir û min jê pîrsî, ku gelo şedetîyêna derheqa wê jinê da rastin, yan na?. Ewî got, ku ew şedeti rastin. Min usa jî derheqa wê yekê da serwêr ra xeberda, ku çawa ewê jinê dewa şirovekirinêye derheqa qulixa minda kiribû. Min gote serwêr, wekî diqewime ewê jinê dixwest wî kontrol bike.

- Te boy çi îzin daye wê jinê, ku qulix bike?.
- Con, min gotîye wê, ku cêribandinê xwe nede xebatê.

- Tu dikarî wê bidî sekinandinê, wekî ew mêtodêna xwe nede xebatê, ruhê li piş wan tişa hela hê civînêda ye. Tabîya dilê jinê nehatîye guhastinê. Çawa serwêr te dixwest edilayî bê xweykirinê, lê te bi wî cûreyî meriveke bi ruhê ku ditirsîne, danîye ser tabîya qulixê û serwêrtîye. Ewê yekê îzin da ruhê tirsê, ku miqabilî min şer bike.

Bona ku ez alî serwêr bikim, ku ew bivîne ku çi diqewime, min derheqa qewimandineke emirê xwe da jêra gilî kir.

Min çawa serwêr li kolêcê qulix dikir. Me şevekê qulixa şikirdayînê û pesindayînê derbaz kir. Ji çevêna gelek cahila hêşir dikişîyan. Edilayî û hazırlîya Xwedê odê da tijî bibû. Wî çaxî hemû kes xwe ker kiribû, xêncî çend cahilêna mayîn, yên ku hêdî- hêdî dignîyan.

Nişkêva, cahilekî ku min cara ewlin didît, bi zimanekî nenas xerberda. Peyî wê yekê ra atmosifêra odê hate guhastinê. Paşê jina cahile li rex wî, ew jî min cara ewlin didît, bi şirovekirineke nebînayî pêşda hat.

Ez carekê ra hatime guhastinê û min tu tişt negot, çimkî min hazirîya Xwedê li ser xwe texmîn kiribû.

Wextê ku ewê jinê xeberdana xwe xilaz kir, atmosifêra li wir idî hatibû guhastinê. Hazirîya Xudan tune bû. Min texmîn kir, wekî idî derenge, ku ez tiştekî bêjim, lê zîyan idî gihîştibû. Paşê min tewaqe li hemûya kir, ku ew rûnên, min elametîyêne kurt bela kirin û min xêrkirin berev kir. Peyî wê yekê ra min destpê kir xeberdim.

Wextê ku min xeber dida, ez difikirîm: “Emir li kîderê ye? Ez kuda diçim? Bona ci min ew yek got?”. Bona xeberdanê rûnkirin tune bû û min texmîn dikir ku tiştek tevî min şer dike. Min fem nedikir, ku pêşkêşa Xwedê bona ci temirîbû û lema jî min tewaqe kir, ku hemû kes dua bike. Xudan got: “Ez dixwezim, wekî tu miqabilî wî merivî û wê jinê derkevî”.

Ez fikirîm, wekî idî 20 deqe derbaz bûne û ez nikarim wê yekê bikim. Min ew gotina Xwedê danî alîkî û ez fikirîm, hinekî jî dua bikim. Wextê duakirinê em dîsa rastî berxwedayîna ruhanî hatin.

Dîsa çend deqe derbaz bûn. Min bi gumanbirî got: “Xwedê, ev ci diqewime?”.

Ruhê xweda min dîsa dengê Xwedê bihîst: “Ez dixwezim ku tu miqabilî wana derkevî”.

Niha jî ewê yekê diha dirêj kişand. Nava xweda min digot, ku ezê wê yekê nekim. Merivê li wir destpê kirin bifikirin, wekî ez hatime guhastinê. Me dîsa deh deqa dua kir û tu guhastin tunebûn. Min qulix bi gumanbirî ser hevda anî.

Wê şevê ez bi dilê teng çûme malê. Min usa jî nedixwest derheqa wê yekêda ji Xwedê bipirsim. Ketime nava nivîna. Rojtira mayîn ez bi ruhekî giran hişyar bûm û derketim, ku dua bikim.

Min pirsî: “Xwedê yê min, êvara derbazbûyî ci qewimî?”. Ewî cab da: “Con min tera got, wekî tu miqabilî wî merivî û wê jinê derkevî”. Paşê gotina xwe zêde kir: “Eger min te danîye li ser tabîya serwêrtiyê, tu bona xweyîkirina serwêrtiyê û qeyde-qanûnên nva qulixê da cabdarî. Ezê wê yekê nekim, çimkî Min îtbarîya xwe te anîye. Wextê ku Min Adem danî nava baxçe, Min gote wî, ku ew baxçe xweyke. Wextê ku mîrê cin hat xirabke, nenihêrî wê yekê, ku Ez derheqa wê yekêda haj pê hebûm, ewê bibûya ne tenê bona Adem, lê temamîya merivatîyê, Ez peya nebûm û Min destê wî ne-xist bona hildana rez. Ez wê yekê hilnadim, ci ku min daye. Min ew cabdarî dabû ser wî. Ew jin û mîr, derheqa kîjanada Min got, ku tu miqabilî wan derkevî, ruhê wan hatibû guhastinê. Wextê ku tu miqabilî wana derneketî, ewî ruhî ïzina serwêrtîya qulixê stend. Wextê ku ew yek qewimî, Ruhê Min dûr ket, çimkî te serwêrtîya xwe tesmlî kir”.

Min carekê ra tobe kir û qirar kir, ku ezê tu cara ïzinê nedim, ku ew yek careke mayîn biqewime.

Peyî vê yekê ra, wextê ku min ev serhatî serwêr ra gilî kir, ewî fem kir, ku bona ci gerekê miqabilî qulixçîyê wî cûreyî derkevin. Sifetê wî zelal bû, wextê ku ronahîya aqilmendiya Xwedê kete dilê wî. Min piştgirî da wî: “Çawa serwêrê vê cimetê, tu ne tenê bona dayîna xwerina wan hatî gazîkirinê, lê usa jî bona parastina wan. Parastin hema berxwedayîne”.

Min ji wî pirsî: “Tu qet ketî nava halê usa, wextê ku meriva tiştek ji te tewaqe kirîye û te dilê xweda zanibûye, wekî gerekê bêjî “na” lê bona xweyîkirina edilayê te gotîye “erê!”.

Ewî cab/bersiv/ da: “Belê, Con, min ösa kirîye”. Paşê ew fikirî û bi nihêrandineke nava fikira da min nihêrî: “Ew yek feşbûne, usa nîne?”.

Ez pê ra qayîl bûm: “Te rast got, lê feşbûn û berdaxustin ji tirsê pêşda têñ”.

Ewî bona ruhê tirsê tobe kir û lez dûr ket, ku wan pirsa saff bike, yên tevî wan meriva, kîjana ew tirsandine. Cara mayîn, wextê ku min ew dît, li ber devê wî ken hebû. Ewî şabûna xwe şirovekir û got: “Ez azame”.

Fem bike, wekî meselên şerkarîyeye vî cûreyîye netam çend halên xirab raber dikan. Min wextê bi seda qulixa xeberdaye, wextê kîjana berxwedayîn tune bûye, azaya mezin hebûye. Azayî ya tebyetî ye, lê berxwedayîn cuda ye. Ez texmîn dikim, wekî raberkirina van çend mesela bona kara we ye.

Nenihêrî wê yekê, wekî ev mesele qulixêva girêdayîne, lê prînsîpêna wana nava hemû govekên emirda têne xebitandinê, tirs ruhe û ew anegorî hal kar dike. Eger em bicêribînin nava şerê ruhanî da bi sîlihêن fizîkî şer bikin, emê birîndarbin û emê bikevin.

*“Belê, raste, em merivin, lê bi merivayî eskerîyê nakin.  
Çekên eskerîya me ne yên merivayî ne, lê yên qewata  
ji Xwedê bona wêrankirina tabîya. Em wan şêwira û  
hemû bilindcîyên kubarîyeye miqabilî zanebûna Xwedê  
betal dikan û hemû fikira dikine hêsîr, êlimî Mesîh  
dikan”*

*B Korint’î. 10:3-5*

Bi saya tirsê dijmin êrîşî ser bîhna me dike. Ew bi rîya fikirêن pisîxologiyê û baş ji me dûr nakeve. Sîlihê miqabilî tirsê şer’ê Ruhebi ïzbatî sekinandina li ser Xebera Xwedê ye /Efesî. 6:17/.

Peyîhatina kitêbê ye mayîn da emê derheqa wê yekêda xeberdin, wekî gava ku em miqabilî tirsê derkevin, emê nava xwe da pêşkêşa Xwedê hişyar bikin.

---

*Para sisîya*

## Tîrsê bîşkênin

*“Xudan alîkarê mine, ezê netirsim, mirovê çi  
min bike?”*

## Pêşkêşê gurke

M eremê tirsê ewe, ku me usa bike, ku em serwêrtîyê tesmlîkin, pêşkêşen me nexebitin. Peyî wê yekêra em bi qewat û karebûna sînorkirî kar dikan. Wextê ku usa dibe tabîya meye êrîskirinê werguhêzî ya xweparastinê dibe. Peyî wê yekê ra, wextê ku em fem dikan, wekî em nikarin xwe biparêzin, em li cîhekî usa cîyê xwe divînin, li kîderê bona me baše.

### Pêşkêşê hişyarke

Bi vî cûreyî, eger tirs pêşkêşê radizîne, wî çaxî ci gerekê wê hişyarke?

**Serxwebûn.** Tirs dibe menî, wekî meriv paşa vekişe, lê serxwebûn hertim pêşda dibe, heta wextê berxwedayînê jî. Gelo merivê tirsîayî çawa dikare serxwebûnê fem bike?

*“Çimkî Xwedê ruhekî tirsê neda me, lê Yê qewatê, hiz-kirinê û xwegirtinê”.*

*B Tîmotêyo. 1:7*

Serxwebûn bi saya fikira saxlem, hizkirinê û qewatê tê. Serxwebûn bi xwe qîmetî nîne. Em hemû jî meriva nas dikin, kîjan bêterbe û li serxwe bûne. Serxwebûna rast ji Xwedê tê. Ew serxwebûn, kîjan bi xeysetê Xwedê kar dike, nava emirê meda pêşkêşa hişyar dike.

Merivên usa hene, yên ku zanin rast xeberdin û rast kar bikin, wextê kö ew rastî berxwedanê nayên, yan jî wextê ku berxwedan qet tune. Feqet berxwedayîna wana dirêj namîne, ew serra tê kivşê. Li ser sifetê merivên vî cûreyî maska kubarîyê, yan jî nezanîye. Koka wan kûr nîne û bayekî qalim bi kutasî wana dikare erdê bixe. Wextê ku hewa xweşe, zelale, tu nikarî bivînî, ku koka darê çiqas kûre, lê wextê ku ba radibe, dar yan kokêva radibe, yan jî karebüna xweye sekinandinê dide kivşê.

## **Kî diha qewate?**

Dawid digot: “Xudan qewata emirê mine, ezê ji kê bitirsim?” /Zebûr. 27:1/. Ewî Xudan çawa kanîya qewata xwe elam kir. Bi zanebûna wê yekê, wekî ji Xwedê qewattir tu yek tune, Dawid bêyî tirs dikaribû bigota, ku ew ji tu yekî natirse.

Ewî ne tenê li ser xwe derheqa li ser xwe gumanbûnê da elam dikir, lê ewî usa jî emirê xwe derbaz dikir. Dawid haj qewata Xwedê hebû, çimkî ewî Xwedê nas dikir. Serxwebûnê mecal dida Dawid, ku ew bi cûrê heq serkarîyê yazıya xwe bike. Werin em salêن wîye cahil binihêrin.

Dawid kurê Hêssêyî heyşa bû. Hersê birayêن wîye mezin nava eskerên Şaûlê padişa da qölix dikirin. Dijmin eskerê xwe miqabilî Îsraêlê dabû berevkirinê. Her roj Goliatê mîrxas bang dişandine li ser leşkerên Îsraêlê: “Ji nava xweda merivekî bijbêrin, ku peyayî cem min be. Eger ew bikaribe tevî min şerke û min bikuje, wî çaxî emê bibine xulamên we, lê eger ez altkim û wî bikujim, wî çaxî hûnê bibine xulamên me û qulixî me bikin” /A Padiş. 17:8,9/.

Anegorî qeyde-qanûna, îsraêlîya gerekê bijartina bona şêr bi-

kirana, lê Golîyat' leşkerekî sade nîbû. Anegorî hinek hesaba, bejina wî nêzîkî sê mêtîr û nîv bû. Sepeta baskêtbolê bîne ber çavê xwe. Serê Golîyat bi 50-î santîmêtra ji wê sepetê bilindir bû. Ew ne tenê awqas gir bû, lê usa jî şerkarê cêribandî bû. Tîrkevana wî tenê hevt kîlogiram bû. Kincê wîye eskerîyê ji bronzê bûn û nêzîkî 57 kîlogirama bûn. Şûr û mertalê Golîyat nêzîkî sed kîlogirama bû. Kitêba Pîroz dibêje: “Wextê ku Şaûl û temamîya Îsraîlê ev gotinbihîstin, gelekî tîrsîyan” /A Padiş. 17:11/.

Dawid, yê ku pez diçêrandin, bavê wî şandibû, ku xwerinê hersê birayên xweye mezin ra bibe û binihêre, kö ew çawanin. Wextê ku ew xwerinê tesmlî dike, ew direve ku birayên xwe bivîne. Zûtirekê, roja 40-î, Goliat derket, ku qerfê xwe îsraîliyâ bike.

Dawid ji dîtina xwe zendegirtî mabû, lê ne ku ji kirina Goliat, lê ji xwexweykirina birayên xwe û hemwelaftîyên xwe: “Hemû merivên Îsraîlê wextê ku ew meriv dîtin, gelekî tîrsîyan, ji wir revîn” /A Padiş. 17:24/. Dawid ji xwe dipirsî: “Wana bîr kirîye, ku Kî alîyêmeye. Ew miqabilî me dernakeve, ew miqabilî Xwedê derdikeve”.

Bi gilîkî Dawid li ser xwe bi guman pirsî: “Evê nesunetkirî kîye, wekî miqabilî eskerê Xwedê yê sax derdikeve” /A Padiş. 17:26/. Birayên wî şerm kirin, wextê ku Dawid tîrsa wan eşkere kir. Wana nedixwest gotina birayê xweyî biçûk bibhîsta, bi kîjanê sistbûna wana dihate eşkerekirinê.

Hersê bira li ser Dawid hêrs ketin û fikirîn, ku wî cûreyî ewê bikaribin şerma xwe veşîrin. Birayê mezin, yê ku ji Goliat tîrsîyî bû, cêriband birayê biçûk bitirsîne:

“*Ü biraê wîyî mezin Îliab, wextê ku ew yek bihîst, li ser Dawid hêrs ket û got: “Tu boy çi peyayî li vir bûyî û te çend pez jî tesmlî kê kirin?. Ez kubarı û xirabîa dilê te zanim. Tu peyayî li vir bûyî, ku dîna xwe bidî şer”*”.

*A Padiş. 17:27*

Wî çaxî Îliab bi hêrsketinê mîrxasîya xwe dida kîvşê. Ewî êrîşî li ser xeysetê Dawid kir. Wextê ku meriv tîrsîyîye, ew revê digere,

dixweze ji hukum azabe.

Eger meriv siste, ewê baxşandinê bide, lê eger qewate, wê zû- zû êrîşî li ser wana bike, yên ku miqabilî wî derketine.

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî Êlîab Dawid nava kubarîyê û xirabîyê da gunekar dikir. Êlîab tenê derheqa xweda difikirî, ewî texmîn dikir, wekî Dawid jî mînânî wî ye, lê Dawid yekî usa nîbû. Ew merivekî himberî dilê Xwedê bû. Ew kubar nîbû û li ber Xudan şikestî bû.

Ew merivênu ku wî cûreyîne, yên mînânî Êlîab, wê tirsê bidine xebatê ku derewê çawa rastî raberkin. Tu gerekê nava Ruh da bimînî bona ku tu wextê êrîşkirinê wî cûreyî alt bikî /serk’evî/.

Diqewime Êlîab çevnebar bû. Samûêl Dawid çawa padîşa rûnkiribû, nenihêrî wê yekê, wekî Êlîab kurê mezin bû. Dihate texmîn kirinê, wekî xeysetê wîye rêberkiranê û şerderbazkiranê hebû. Wextê ku Samûêl Êlîab dît, fikirî: “Bi rastî ewênu ku ji alîyê Xudanda hatîye rûnkiranê, li ber mine”. Feqet Xwedê ev yek bona dayîna dersa bona Samûêl da xebatê: “Lê Xudan gote Samûêl: “Tu çav bejin- bala wî nekeve, çimkî min ew bona wê yekê heram kir, wekî pirs nava wê yekê da nîne, ci ku meriv divîne, çimkî meriv pêşda li ber çavê xwe divîne, lê Xudan dil dinhêre”” /Padiş. 16:7/.

Niha pirs pêşda tê, dilê kê kubar bû? Xwedê gote Samûêl, wekî Ewê bi nihêrandina bejin û balê Êlîab nebijêre. Xwedê dil dinhêre û wextê ku Xwedê dilda kubarîyê divîne, miqabilî wî merivî derdikeve /Aqûb. 4:6/.

Xwedê Êlîab încar kir, çimkî ew dilê xwe da kubar bû. Dêmek nava Êlîab da ew hemû tişt hebû, nava çida ewî Dawid gunekar dikir-kubarî.

Gelek cara tirs te nava tiştên mayîne sistda jî gunekar dike, piş kîjana ew xwe vedîşêre. Ewênu ku ji derva paqij kar dikin, lê dilê wan paqij nîne, wê hertim êrîşî ser wan meriva bikin, dilê kîjana paqije. Wê yekê jî bîr bîne, wekî Timotêyoê dilpaqij tirsîyâ bû. Ez

gumanim, wekî li civîna Efesîyê jin û mîrêna usa hebûn, dilêna kîjana mînanî Êlîab paqij nîbûn.

Îsa gelek cara miqabilî tirsê derdiket. Fêrisiyêne dilpaqij dicêribandin Wî gumanbirkin. Eger wana bikaribûya Îsa bitirsanda, wî çaxî wana wê bikaribûya li ser wî serwêrtî bikira. Wana digot, ku Îsa xayîne, îçikexure û nava wî da cin heye. Ewênu ku wî cûreyî digotin, ji wana gelek wî cûreyî bûn. Bi înkarkirina serwêrtîya wana, Îsa dilêna wana dida eşkerekirinê.

Gelo bona ci merivênu ku dilêna wan nepaqijin, dicedînin merivênu ku dilêna wan paqijin bitirsînin?. Bi wê yekê ew dixwezin ji gunekarkirinê azabin û serwêrtîya xwe xweyî bikin. Eger ew yek wanra li hev tê, wî çaxî ew tobe nakin. Êlîab zanibû, wekî bi wî cûreyî ewê Dawid mecbûr bike, ku bin serwêrtîya wî da bimîne û ewê jî ji hukumê Dawid azabe.

Dawid merivê tek- tenê bû, miqabilî kîjanî derk' etin. Ew bin hicümkirinê, êrifskirine da bû û birayê wîyî mezîn jî bi fizîkî diha gir bû, ne ky ew. Bîr bîne, wekî birayêne mezîn dikarin bona yên bicûk tiştên nebaş pêşda bînin. Eger Dawid xwestina Êlîab nekira, wî çaxî li malê wê bona wî gelek çetinayî pêşda bihatana. Wî çaxî wê gelek wede lazim bûya, ku ewî rastî biparasta. Gelo hêja bû, ku ew yek bikiranâ?

Ew hukuma tenê nîbû, kîjan li ser Dawid bû. Yêna mayîn jî piştgirîya Êlîab dikirin. Wana nedixwest ku bi destî zarokeke sûretsor tirsa wan bihata eşkerekirinê. Bona Dawid wê diha hêsa bûya paşda vekişîya. Ev yek hema xwestina Êlîab û birayêne mayîn bû.

Dawid derbazî alîyê Xwedê bû û tirsa ku miqabilî wî bû, şikênan. Ewî jî Êlîab pirsi: “Niha min ci kirîye...?” /A Padiş. 17:29/. Bi rastî ewî digot: “Gelo ci ku min got, rast nîne?. Mêrxasîya we li kîderê ye?. Ez natirsim. Ew yek ber çavaye, wekî hûn 4O roja ser hev tirsîane û Xwedê gerekê yek bidîta, yê ku wê netirsîya û wê miqabilî evî felestînîye nesunetkirî şer bikira. Eve menî, ku ez li virim”.

Paşê Dawid birine cem padişê. Şaûl, yê ku ji Goliat tirsîayî bû, Dawid ra got: “Tu nikarî miqabilî ewî felestînî derkevî û tevî wî şer bikî, çimkî tu cahilî, lê ew ji zarotîya xwe destpêkirî merivê şêre” /A Padiş. 17:33/. Himberî gotinê birayê mezin gotinê padişê yên gunekarkirinê nîbûn, lê ew xeber tirsa padişê didane kivşê.

Dawid vî cûreyî caba padişê da:

*Xulamê te pezén bavê xwe diçêrandin û şîer, yan jî hirç dihatin ji wî kerî pez dibirin. Ez peyî wî diçûm, min lê dixist û ji devê wî pez aza dikirin. Wextê ku ew miqabilî min radibû, min ji simêlêd wî digirt, lêdixist û dikuşt. Xulamê te him şîer û him jî hirç kuştine û ev felestîniyê nesunetkirî jî bira bibe yekî mînanî ji wana, çimkî ew derkete miqabilî eskerê Xwedê yê sax. Dawid got: “Xwedê yê ku ji destê şîer û hirça ez xilaz kirim wê ji destê vî felestînî jî xilazke””.*

A Padiş. 17:34-37

Wextê xeberdانا tevî birayêن xwe û leşkera Dawid li ser xwe bû û ber xwe dida. Paşê wextê ku ewî tevî padişê xeber dida, ewî zanibû, wekî ew berbirî yekî dibe, serwêrtîya kîjanî li ser wî ye.

Ewî usa tewaqe ji padişê dikir, çawa ku kur berbirî bavê dibe. Ewî cêribandina xwe raber dikir û şedetiya wê yekê dida, wekî Xudan bû Xilazkirê wî, pêra jî bawar dikir, wekî padişayê birtyara rast qebûl bike.

Cabdarî û borcdarîya vê qirarê ketibû ser padişê. Eger nava şêr da ew binketana, miletê biketa nava koletîyê. Dawid zanibû, wekî eger ewî qirarkira şer bike, Xwedê wê dilê padişê biguharta. Gelekî girînge ku em tevî wan meriva bixebeitin, kar bikin, serwêrtîya kîjana li ser me heye. Peyî gotina Dawid ra, Şaûl îzin da wî, ku ew şer bike. Ewî got: “Here û bira Xudan tevî te be”.

Dawid kinc û sîlihênu ku Şaûl didane wî, încar kirin, çimkî ew

## *Pêşkêşê gurke*

hînî wana nehatibû. Ewî tenê çi ku wî hertim hildida tevî xwe, hil-da û çû. Wextê ku felestînî nêzîk bû, Dawid li ber wî merivê gir sekinî. Eger Dawid bitirsîya, wî çaxî ewê ne tenê bibûya menî, ku pêşkêşa Xwedê bitemirîya, lê wî çaxî ewê him emirê xwe unda biki-ra û welatê wî jî wê bik'eta bin kontrola, hukumê, welatekî mayîn.

*“Wextê ku filistînî li Dawid nihêrî, ewî Dawid bendî tiştekî hesab nekir, çimkî ew cahilekî sûretsor bû. Filistînî gote Dawid: “Were cem min û ezê bedena te bidime teyredên ezmîn û terewilên deştê””.*

*A Padîş. 17:42-44*

Golîat dicêriband Dawid ne tenê bi girbûna xwe, lê usa jî bi gotinêن xwe bitirsîne. Ewî xêncî wan gotina, qirar kiribû çi bike.

Dawid baş fem dikir ku çi diqewime, lê ew nava qewata xweda û usa jî li ser qewata Kanîyê şikber nîbû.

*“Dawid gote Filistînî: “Tu bi sîlihava ser minda têyî, lê ez bi navê Xwedê yê eskerê Îsraêlê têm, miqabilî Kî-janî tu derketî. Îro Xudanê te tesmîlî min bike û ezê te biköjim, serê te jêkim, cinyazên eskerê filistînîya bidime teyredên ezmîn û terewilên dinîayê, bona ku dinîya bizanibe, ku Xwedê yê Îsraêlê heye. Bira hemû kes bizanibe, wekî Xudan bi şûr aza nake, çimkî şer yê Xudane û Ewê we tesmîlî destê me bike””.*

*A Padîş. 17:45-47*

Dawid li ser xwe guman derheqa rastîya Xwedê da elam kir. Cimeta Îsraêlê tenê dîtibû, ku ew meriv bi çiqasîva gire, lê Dawid didît, ku Xwedê çiqas mezine. Merivên Îsraêlê dîtin, ku çawa Dawid berbi dijminê Xwedê revî û ne tenê xeberdana wîye li ser xwe guman, lê usa jî êrîşkirina wîye li ser xwe guman dîtin.

“Dawid kevirek hilda, kewkî kir û enîya filistînî xist. Kevir

enîya wîda rûnişt û filistînî deverû erdê ket” /A Padiş. 17:49/. Kirina Dawid gumana Îsraîlê da dasekinandinê. Xwedê alîyê wan bû. Lê tenê mîrxasekî filistînîya hatibû kuştinê. Îsraîlîya êrîş birine ser filistînîya û ew alt kirin.

Nava vê şerkarîyê da Dawid sê cara rû bi rû li ber tirsê sekinî. Ya ewlin wî çaxî bû, wextê ku birayê wî û leşkerên mayîn dicêribandin wî nimizkin û gumanbir bikin. Eger ew biketa bin serwêrtîya tirsê, bi wê yekê ewê ji mîaserkirina tiştê ku ji alîyê Xwedê da ketibû dilê wî, paşa bisekinîya. Dawidê bizivirîya û biçûya malê, lê pêşkêşa Xwedê wê bitemirîya. Mîrxasê filistînîya wê nehata kuştinê. Goliatê milet bikira bin hukumê xwe û Xwedê wê yekî mayîn bigerîya, ku k’arê Xwe bide maserkirinê.

Cara duda, Dawid tirsîya, wextê ku ew li ber padişê sekinî. Wî çaxî, eger Dawid paşa vekişîya, pêşkêşa Xwedê wê razayî bima, lê ewî tirsa ji alîyê padişê da jî îñkar kir. Dawid qedirê xwe himberî rîberê milet xweyîkir, lê wî ra li hev hat padişê bîne ser wê fikirê, ku ew iżinê bide wî şer bike.

Cara sisîya ew gav bû, wextê ku Dawid li ber mîrxasê filistînî sekinî û nava wî da tirsê pêşda hat. Ne tenê bejin û bala wî merivî ya altkirinê nîbû, lê ev meriva usa jî li ser xwe bû. Goliat dicêriband usa bike, wekî Dawid xwe sist texmîn bike. Eger Dawid bin hukumê tirsê da bima, wî çaxî jî pêşkêşa Xwedê wê razayî bima û Dawidê emirê xwe unda bikira.

Dawid bi qewata Xwedê usa li ser xwe bû, wekî karibû emirê xwe bike bin qeziyâ. Serxwebûna wî pêşkêşa Xwedê hişyar kir û Dawid dijminê xwe alt kir, kîjanî 40 roja ser hev temamîya eskerê Îsraîlê ditirsand.

## **Qewata heca nû**

Nava nema Pawlose bona civîna Korintîya, Pawlos orta pesindayîna qulixa mirinê /heca Kevin/ û pesindayîna qulixa Ruh da

### *Pêşkêşê gurke*

/Heca Nû/ himberîhevkirinê derbaz dike /B Korintî 3:7,8/. Pawlos digot, wekî eger Heca Kevin usa mezin bû, wekî lawên Îsraêlê nikaribûn hertim sifetê Mûsa binhêrin, usa ye qölixâ Heca Nû diha qewate û emir dide.

Pawlos derheqa ya “nû”-da vî cûr’eyî dibêje: “Lê ev xizne nava derdanêñ herî da heye, wekî bê kivşê, ku zoraya qewatê ji Xwedê ye, ne ku jimeye” /B Korintî 4:7/. Awa merivek, kî ku Xwedê yê xwe nas dike ew fem dike, wekî ew qewat ji wî nîne.

Pawlos xebera xwe berdewam dike:

*“Eger qulixa ku wê derbaz bibûya, biçûya, xweyrûmet bû, idî yê ku bimîne, hê çiqas xweyrûmete. Awa em xw-eyê vê gumanê ne, lema xeberdana xweda mérkîmî ne”.*

### *B Korintî 3:11,12*

Qewat serxwebûnê pêşda tîne. Tê serexwebûnê nava wan bawarmendada bivînî, kîjan gumanâ xwe nadine ser qewata xwe. Ew ji tu tiştî, ji mîriv û mîrê cin natirsin, çimkî Xwedê tevî wane. Eva sozêmeye:

*“Çimkî Ewî got: “Ezê tu car ji te neçim û tu car te ber-nadim”. Lema jî rûyê me digre, ku em bêjin: “Xudan piştovanê mine û ez natirsim. İnsanê ci li min bike?”.*

### *Îbranî. 13:5,6*

Em dikarin li ser xwe bi guman elamkin- însan ci dikare li min bike?

Serxwebûna vî cûreyî nava her bawarmendekî da heye. Bona ci em çawa bawarmend têne navkirinê, eger em bawar nakin? Feqet bawarîya xwe li ci tînin? Bawarîya xwe Xwedê bîne. Îzina ne mîriv, ne jî mîrê cin heye, ku bawarmendê rast bidine tirsandinê. Bona ci? Bi menîya Îsa. Tu navek bilind nîne, tu qewatek mezin

nîne. Îsa dibêje: “Awa min hukum daye we, ku hûn mer û dûpişka û temamîya qewata dijmin pêpeskin û tu tiştê zirarê nede we” /Lûqa. 1O:19/.

Gelo hemû tişt zelal nîne? Îsa qewat daye cimeta Xwe li ser wî hemû tiştî ra, çi ku li cem dijmin heye. Tirs bi xwe jî dijmîne. Ew te dixapîne û dibêje: “Serwêrtî û qewata min diha zêde ye, ne ku ya t Ìzibwar nakin.armendekîda heye.Bona çi em çawa bawarmend têne navkirinê, eger em bawar nakin.e. Diha başe tu paşda vekişî û wî tiştî bikî, çi ku ez te ra dibêjim. Lê eger usa nekî, hemû tiştê xirab be”.

Eger em bawarîya xwe van derewên ku ditirsînin, bînin, pêşkêşa Xwedê wê bitemire û emê bin hokum da bimînin. Lê wextê ku em Wî nas dîkin, Yê ku soz daye me, ku wê tevî me be, emê bi saya qewata Wî mînanî Dawid derkevine miqabilî tîrsa xwe.

## **Gelo bawarîya te awqas çetine, ku tu nikarî bawar bikî?**

Femkirina van rastîya çetin nîne, bi gilîkî ew zelalin. Kitêba Pîroze rast çetin û tev-hevbûyî nîne. Meriv rûyê bêbawarîya xwe da nagihîjine meremê xwe.

Evê pirsê bide xwe û bi bêqelpî bersivê bide: “Gelo îtbarîya te li ser gotina Xwedê, yan li ser dîtina te û cêribandina te hatîye hîmdanînê?”. Eger tu hemû tiştî bi qewimandinê berêva hesab hiltînî, wî çaxî tê tu cara pêşda neçî.

Tu bawarîya xwe didî ser wan tişta, çi ku te nava emirê merivên başqe da dîtîye? Gelo dereca îtbarîya te bi rastîya merivên mayîn tê çapkîrinê?

Eger tu dibêjî “belê” ez caba van pirsa didim, usa ye bi kûrayî dilê xwe gitugo bike. Diqewime te hemû tişt çetin kirîye, bi cêribandina şirovekirina qewimandinê nava emirê merivên başqe da. Bawarîya çetin gire- gira nakuje. Ew me davêje zindanê, li kîderê

*Pêşkêşê gurke*

em dicêribînin fem bikin, ku çi dikarin biguhêrin û nava gavavîtinê da dudilîne.

Bona çi em- bawarmend, nikarin bawarkin? Bona çi em ïzinê didin, ku şikberiyê me Kitêba Pîroz bidine çetinkirinê?

Ez dixwezim serhatîkê gîlîkim, kîjanê ezê tu cara bîr nekim. Salê 1980-êyî bûn, ez xwendikar bûm û ez li Karolîna Bakûr dimam. Rojekê ez şebeqê seheta çara, berbangê, ji dengê xwe hisyar bûm, kîjanî dikire gazî: “Ez yekî digerim, yê ku wê bawar bike”.

Ewê yekê ez zendegirtî hiştim. Nivînê min ji xwîdanê şil bibûn. Min fem kir, wekî Xwedê min ra xeberdabû. Wî çaxî ez difikirim: “Gelo dengê Xwedê çiqas zelal dihate bihîstinê?. Gelo bona çi Ewî tu tiştekî bi fikira kûr min ra negot? Ez zanim, wekî Ew hewcê merivêñ bawarmende”.

Rojtira mayîn ew xeber serê min da dizvirîn. Ew gotin hema usa dighîştine guhê min. Wextê ku min dîsa ew gotin bihîstin, min fem kir, wekî Ewî tiştekî kivş nîşanî min kiribû- kîlîta gavavîtinâ tevî Xwedê.

Min bi guhdarî Kitêbên Pîroz lêkolîn kirin. Îsa ji bêbawarîya meriva ber xwe dik’et. Wextê ku şagirta nikaribû ji nava cahilekî cin bidine derxistinê, Îsa bi hers gote wan.

*“Îsa got: “Nisilê nebawar û xalîfî! Heta kengê ezê tevî webim? Heta kengê ezê we sebirkim? Ewî bînîne vir, cem min”.*

*Metta. 17:17*

Mînanî gelek serwêrên îroyîn sistaya Îsa tune bû. Ewî şagirt didane femkirinê, wekî pêşkêşa Xwedê wê temirî bimîne, eger ew nikaribin bawarkin. Îsa dixwest, ku şagirtê wî bizanbûna, ku Ew hêrsketî bû. Min usa jî guhdarî daye ser wê yekê, ku tişten çawa beşera Îsa xweş dikirin. Ewênu ku bêyî pirsdayînê bawar dikirin, beşera Îsa xweş dikirin. Leşkerekî romayî bona bawarîya xwe layîqî

guhdarîya mezin bû, lê ne ku yekî mayînî li Îsraêlê. Evî romayî gote Îsa, wekî hewce nîne ku Ew bê mala wî. Xebereke Wî jî bese, ku xulamê wî qencbe: “Wextê ku Îsa bihîst, zendegirtî ma û gote ewên ku peyî wî diçûn: “Ez rast dibêjime we, nava Îsraêlê da bawarîya vî cûreyî min nedît”” /Metta. 8:1O/.

Em dixwezin ku Îsa bê mala me, lê gerekê em ji Wî pirskin, ku kengê ewê wê yekê bike. Em bawarîyê diha çetin dikin. Niha bawarî çîfîye? Bawarîya himberî Xwedê wê wî hemû tiştî bike, çi ku Ewî gotîye ku wê bike.

Îsa got, wekî Ewî qewat û serwêrtî li ser temamîya qewata dij-min ra daye me. Çi ku gerekê em bikin, bawarkirina himberî Wî ye û paşê gera nava ewî hukumî û serwêrtîê da ye. Hewce nîne ku em bi bîranînê nebaş, bi şikberîya û kêmâsiyêن berêva, bi tirsê gera xwe bidine çetinkirinê. Eger em usa bikin, emê ji serxwebûna xwe miqûf bimînin û emê nikaribin bi karebüna Xwedê bigerin. Pêşkêşa Xwedê ye nava meda wê bitemire. Pêşîya gavavîtina berbi çetinaya, gerekê em meremê dilê xwe bizanibin, ku gemîya me niqoyî binê avê nebe. Serê kitêbêye mayîn da emê derheqa wê yekê da xeberdin, ku orta /navbera/ menîyêن ku bona alîkarîyê te didine sekinandinê û yên ku te niqoyî binê avê dikin, firqî heye.

*Wî çaxî hêsaye li ser xwe bin, wextê ku Xwedê  
wêyekê dike, ci ku em hîvîyêne*

## Koka tirsê

**E**mirê bi şabûnêva tijî nade kivşê, wekî tu ji tirsê aza yî. Min gelek merivên eşq û şâ dîtine, kîjan miqabilî tirsê şer dikirin. Bi rastî, gelek cara şabûna wana bona veşartına tirsê ye, miqabilî kîjanê ew nava xwe da şer dikin. Tenê xwekerki-rin nîşana tirsêye tek- tenê nîne. Meriv hene, yên ku nava halê tev-hevbûyîdanin, diha gelekî xeber didin.

Ew yek ferze /girîng/, ku tu çiqasî rûnkirî yî. Tu jî dikarî tirsîayîbî. Min meriv nas kirine, yên ku nava qulixê da qewat bûne, lê bi wê yekêva tevayî tevî tirsê ketine nava şerkarîyê. Wextê ku rûnkirin peyayî li ser wan dibû, ew bêtirs dibûn, sistaya wan nava rûnkirina Xwedê da dihate veşartinê. Lê wextê ku perda rûnkirinê dûr diket, ew dibûne merivên ku şerkarîyê tevî tirsê dikin. Wextê ku ew teví meriva dikevine nava heleqetîya, şerm nayê veşartinê. Gelo ez çawa zanim, wekî ev hemû tişt raste. Çimkî ez jî usa bûm.

Tu dikarî eşqbî, qewatbî, serxwebî, lê bi wê yekêva tevayî şerkarîya miqabilî tirsê mîaserkî. Wextê ku hukum diha gelekî zêde dibe, heyîna teye rast eşkere dibe. Heyîna ruhê tirsê qewata fîzîkî, yan jî hindikbûna rûnkirinêva girêdayî nîne. Dêmek ci mîriv dike dîlê tirsê?

## Tiştên ji der miqabilî rastîyêne

Bona caba vê pirsê dîna xwe bide Şîmhûn- Petrûs. Ew yekî eşq bû û tu cara şerm nedikir fikira xwe bi dengê bilind bêje. Petrûs li ser xwe bû. Ji derva ew qewat bû û merivekî bêtirs bû. Dihate texmînkirinê, wekî tu tişt nikare Petrûs bitirsîne, lê tiştekî ew tîrsand. Tirsa mirinê bû menî, wekî Petrûs sê cara Îsa încar kir. Dêmek, karebûna azabûna ji tirsê nava wê yekê da nîne. Ew yek usa nedihate texmînkirinê, ku Petrûs wê Îsa încar bike, çimkî ewî Îsa gelekî hiz dikir.

Hineka Şîmhûn- Petrûs gunekar dikirin û digotin, wekî wextê ku wedê karkirinê hat, wî çaxî Petrûs bi r'astî “mirîşk” bû. Ez caba vê pirsê bi pirseke mayîn didim: lê gelo çiqas “mirîşk” wê bikaribûna li ber cimeta sîlihkirî bisekinîyana û êrîşî li ser wan bikirana?. Petrûs, li ser xwe guman, ew yek kir.

*“Awa Cihûda komeke eskera û nobedara xwe ra ji  
alîyê férisia û serekén kahîna da hildabû, bi fenera, agir  
û çeka hate wî cîyî... Hingê Şîmhûn- Petrûs ew şûrê ku  
pêra bû, kîsand û avîte xulamê serekkahîn û guhê wî yî  
rastê pekand”.*

*Yûhenna. 18:3,1O*

Ev yek bona min kirina mirîşkê nîne. Dêmek, bona ci Şîmhûn- Petrûs leşker hesab hilnedan lê ji jinekê tîrsîya. Belê, ew yek raste, ku ew tîrsîya. Jinekê ew tîrsand. “Petrûs li der rûniştibû, jinek nêzîkî wî bû û gotê: “Tu jî tevî Îsayê ji Galîlêayê bûyî”. Ewî jî li ber hemûya încar kir û got: “Ez nizanim, ku tu ci dibêjî”” /Metta. 26:69,7O/.

Gelo bo ci ew hate guhastinê?

## **Serxwebûna bona nîşandayînê**

Bona cabdayînê were em vegerine ser ewê qewimandina wê êvarê. Hemû şagirta tevayîcejina Derbazbûnê derbaz dikirin. Îsa eşaretî da wana: “Îşev hûn hemûyê jî ji Min pişk bin, herin” /Met’ta.26:31/. Feqet Petrûs xwe cuda kir û li ser xwe guman got: “Eger hemû jî ji te pişk bin, herin, ezê tu cara ji te neçim” /Metta. 26:33/. Gelo serxwebûneke çi cûreyî tê nîşandayînê?. Pêşda tê texmînkirinê, ku Îsa şaş bibû, wextê ku ewî Petrûs jî tevî wan meriva wî cûreyî hesab dikir.

Lê Îsa raste- rast ruhê Petrûs nihêrî û gote wî: “EZ rast tera dibêjim, hema îşev hê berî bangdana dîk, tê sê cara Min îñkar biki” /Metta. 26:34/. Eva derbek bû himberî Petrûs. Îsa Petrûs ra got, wekî ewê ne tenê pişk be, lê pêra jî Wî îñkarke.

Merivê sist rûyê vê yekê da dikare paşda vekişe. Feqet Petrûs hetanî dawîyê tabîya xwe xweyî kir. “Eger ez tevî Te herime mirinê jî, ezê Te îñkar nekim” /Metta. 26:35/. Bi gilikî, ev elametîya yên mayîn jî wê yekê ra dane qayîlkirinê: “... şagirta jî usa digot”.

### **Ji derva menî dikarin cûre- cure bin**

Meriv texmîn dikin, wekî ew meriv xweyê mîrxasîya mezin bûn û rastbûn. Eger em diha bi kûrayî lê dînihêrin, em divînin, wekî menî ne ku hizkirina Xwedê ye, lê tiştekî mayîne.

Pêşîya eşaretîdayînê Îsa şagirtên xwe ra got: “Û vaye destê ku nemamîya min bike, li ser vê sivirê tevî mine” /Lûqa. 22:21/. Gelo tiitekî çiqas xirab, bû, wekî ji wana yek dikaribû himberî Îsa xayîntî bikira. Yekî ku tevî Wî mabû, gerîyabû, gerekê niha destê xwe li ser Wî bilindkira.

Nenihêrî wê yekê, wekî Îsa zanibû û pêşda jî pê hesîyabû, ku kî ye ew meriv û ewê çi bike, şagirtên Wî cara ewlin derheqa vê yekêda pê hesîyan. Gelo tu dikarî bînî ber çevê xwe, ku peyî vê gotinêra

atmosifêra odê çawa hate guhastinê: “Û wana destpê kir nav hevda ji hev pirsîn: “Gelo kîye ewî nav meda, ku vê yekê wê bike?” /Lûqa. 22:23/. Şagirt tev-hev bibûn û bawar nedikirin, wekî ji wana yek wê bikaribe tiştekî wî cûreyî bike. Dêmek, menîya givtugokirina wana kîjane?. Bêyî şik ew gerekê bibûya xemgîniya wane bona Îsa. Lê gelo ew yek usa bû?. Qisa şagirta ew da eşkerekirinê. Binhêrin paşê çi tê gotinê:

*“Û nav wanda dew pêpda hat, ku ji nav wanda kîjan wê  
yê herî mezin bê hesabê”.*

*Lûqa. 22:24*

Çawa ku hûn zelal divînin, hîmê zelalkirina wana xwehizî û kubarî bû. Îsa şagirta ra got, wekî ewê tesmîlî serekkahîna bê kirinê, bona kuştinê. Lê şagirta destpê kir berbi serwêrtîyê û tabîyê bicedînin. Eva xwehiziye.

Em dikarin texmînkin, ku kî rêberîya vê qisê dikir. Diha nêzîkî aqilaye, wekî ew Şîmhûn- Petrûs bû, yê ku berêda ce'dandibû bibe serwêr û niha jî ew ji wî hîmî pêşda dihat.

Diqewime ew lez diket bîne bîra yên mayîn, wekî ew bû yê tek- tenê, yê ku li ser avê digerîya /Metta. 14:28-31/. Diqewime Petrûs bîra hevalên xwe dida tezekirinê, ku bi rastî Îsa Kî bû /Metta. 16:15,16/. Yan jî cêribandina wî ye li ser çiyê /Metta. 17:1-8/.

Petrûs gelekî li ser xwe bû ku bide kivşê, wekî nava 12 şagirta da ew yê herî mezin bû. Lê gelo ev serxwebûn li ser hizkirinê hatibû hîmdanînê? Ez bawarim, wekî Petrûs difikirî, wekî idî wedeye, ku derheqa ferzbûna /girîngîya/ xweda bîne bîr. Paşê wê e'yan bûya, wekî rastî wê cûrekî mayîn bûya. Serxwebûna wî li ser kubarîyê û xwehizîyê hatibû hîmdanînê.

Bi bîra xweda xweykirina vî hemûşkî, em pêşda bilivin.

## **Dezgehê bizir**

*“Wî çaxî Îsa tevî wan çû wî cîyê, ku jêra Gêtşemanî dibêjin û şagirta ra got: “Vira rûnên, heta ez her’im dera han dua bikim””*

*Metta. 26:36*

Xebera “Gêtşemanî” bi fikira xweva ewî dezgehî dide kivşê, kîjan zeytûnê diguvêşe û bizir derdixe. Zeytûn bi xwe ji bizir aza nabe. Tenê wextê ku tu hukumî ser zeytûnê dikî, diguvêşî, bizir ji wê derdikeve. Gêtşemanî cîkî hukumê vî cûreyîye, ne ku bona zeytûnê, lê bona dila. Bin hukumê mezin da çi hundurê meda heye, dikare nişkêva derkeve. Bi gilîkî mayîn gotî, menîyêñ dilê teda têne cêribandinê û eşkerekirinê, wextê ku cêribandin /hukum/ pêşda têñ.

Wextê ku Îsa tevî Petrûs û herdu kurên Zebedî tevî xwe hildan, keser hatê û ber xwe ket /Metta. 26:37/. Seksê Îsa “gelekî berxweteki bû”, çimkî Ew ketibû nava dezgehê ku bizir derdixe. Ew ketibû nava cêribandinê, çimkî ew cêribandin li ber wî sekinîbû, ku çawa xwestina Bavê gerekê mîaser bikira, bi kîjanê Ew gerekê Xwe xilaz bikira.

Hinek meriv bawar nakin, wekî mecalâ Îsa hebû, ku guneha bike. Em gerekê bîr bînin, wekî Îsa bi hemû cûreyî hate cêribandinê - “bi hemû cûreyî... mînanî me, lê bêyî guneha” /İbranî. 4:15/. Cêribandin dide kivşê, ku tu miqabilî tiştekî şer dikî. Îsa xwe ji şerkarîyê nediparast û hertim nedifikirî, ku ewê altkirî ji şerkarîyê derkeve. Bona çî? Çimkî Ewî xwestina Xwe mîaser nedikir. Eger gunekirina Îsa tiştê bûyînê nîbûya, wî çaxî ewê nehata cêribandinê. Ev tişt şikirîya Wî kêm nake, lê serbara serda dide kivşê, ku Ew bi çiqasîva qîmetlûye, çimkî ewî guneh nekirin. Alêlûîa!

Îsa nava baxçeda tewaqe dikir: “Bavê min! Eger dibe, bira ev kasa cefê ser Min ra derbazbe, lê ne ku çawa Ez dixwezim, lê bira xwestina Te be” /Metta. 26:39/.

Hukumê vê şerkarîyê nava Ruhê Îsa da zêde dibû. Dihate kivşê, wekî tenê tiştek dikare Wî paşda bide. Ewî dikaribû cûrekî mayîn bona mîaserkirina xwestina Bavê bijbarta û wî cûreyî Xwe xilazkira. Hela hê pêşda Îsa gotibû fêrisîya, wekî serwêrtîya Wî heye, ku Ew emirê Xwe dayne /Yûhenna. 1O:17,18/. Xwedê Ew mecbûr nekir, ku ew wê yekê bike û bona wê yekê jî Ewî tenê şerkarî dikir.

Îsa zanibû, wekî ev şerkarî hebû, hela hê pêşîya Wî, hetanî çokdayîna Wîye nava baxê Gêtşemanê da. Derheqa vê yekêda Îsa sê cara, hetanî hatina li Orşelîmê, gote şagirtên Xwe. Îsa gote wan, wekî ew yek xwestina Bavê Wî bû, wekî Ew bizêrîya, bimira û paşê ji nava mirîya rabûya.

Cend roj pêşîya xaçkirinê, Îsa derheqa wê sure da li ber şagirtên Xwe got: “Niha agir dilê Min ketîye. Ez ci bêjim?. Bêjin: “Bavo, Min ji vê sehetê xilazke?” Ne Ez bona vê sehetê hatime ? Bavo, navê Xwe bilindke” /Yûhenna. 12:27,28/.

Îsa gerekê emirê Xwe bida, ku bi wê yekê navê Bavê bilind bikira. Derheqa vê prînsîpê da ewî şagirtên xwe ra gotibû. “Yê ku emirê xwe hiz dike, ewê unda bike, lê ewê ku li vê dinîayê dijene emirê xwe, ew wî bona jîyîna heta- hetayê xweyî dike” /Yûh’enna. 12:25/.

Ev gotin caba du pirsa dide. Ya ewlin ewe, ku Petrûs bona ci nikaribû peyî sonda dayî here û ya duda jî ewe, ku Îsa çawa karibû wê yekê bike. Îsa Bavê Xwe ji emirê Xwe zêdetir hiz dikir, bona wê yekê jî Ewî karibû emirê Xwe bike qurban. Petrûs difikirî, wekî ew Îsa ji emirê xwe zêdetir hiz dike, lê “dezghê bizire” li Gêtşemanê bi rastî ew da eşkerekirinê.

Nava baxçe da ew yek tenê bes nîbû, wekî Îsa derheqa xwestina Bavê da zanibû. Niha Ewî gerekê xwestina wî mîaser bikira. Ev yek ewqas çetin bû, wekî Ewî tewaqe ji Bavê dikir, ku gelo rêke başqe tune, ku xwestina Wî cûrekî mayîn bê mîaserkirinê. Wextê duakirinê, Îsa miqabilî cêribandina evê xwexweykirinê şer dikir û

weke rêtina xwîdana bi xwînê ber xwe dida /Lûqa. 22:44/.

Qewata Îsa ye bona altkirina cêribandinê, nava hizkirina himberî Bavê û hiznekirina şexsê Xwe hatibû hîmdanînê. Îsa şexsê Xwe bona hizkirina himberî Bavê Xwe unda kir /Yûhenna. 14:31/. Evê hizkirinê Ew alt kir. Bizir derket- hizkirina Îsaye himberî Bavê ne ku bi gotinê, lê bi xwepêşkêşkirinê hate kivşê.

Niha binhêr'e, ku “dezgehê bizir” yan jî hukum çi cûreyî hukumî li ser Petrûs û şagirtên mayîn kir.

## Ruhê razayî, bedena sist

Peyî sehetekê şerkarîya tevî xwestina Xwe, Îsa rabû çû cem şagirtên Xwe û “ewana kerba kederê razayî dîtin” /Lûqa. 22:45/. Şagirta wedekî dirêj derheqa wê yekêda xeber nedida, ku kî ye yê herî mezin. Ew ji wê kederê ber xwe diketin. Îsa tenê nîbû, wekî bin hukum da bû. Şagirtên Wî jî ketibûne nava “dezgehê bizir”.

Şagirt rû bi rû li ber cêribandina xilazkirina emirên xwe sekinîbûn. Qewata wan idî tune bû, ku ber xwe bidin, çimkî ew li ser xwestina xwe sekinîbûn, lê ne ku li ser xwestina Bavê. Himberî Îsa wana nedixwest xwestina xwe tesmîlî xwestina Xwedê bikin. Eger em bifikirin, wekî emirê me biha ye, wî çaxî emê şer nekin, ku ewî daynine bona karebûnê.

Li ser vê yekê bifikire. Wî çaxî, wextê ku Îsa tevî fikira derheqa undakirina emirê xwe nava şerkarîyê da bû, şagirt ji şerkarîyê dûr ketin û razan. Îsa tevî Petrûs xeberda: “We nikaribû bi sehetekê tevî Min hişyar bimana? Hişyar bimînin û dua bikin, wekî hûn nekevine nava cêribandinê. Belê, ruh razaî ye, lê beden siste” /Metta. 26:40,41/.

Awa Petrûs, yê ku merivekî li ser xwe guman bû, dewsa duakirinê razayîbû. Ew hela hê hîn nebîbû, xwe qewatekê bigre, kîjan ya wî nîbû. Bi razanê ewî qewata xwe parast.

Ruh û dilên me dikarin razîbin, lê bedena me wê hertim parastina xwe bigere. Eger bedena me xaçkirî nîne, wî çaxî emê wê yekê bidine wê, ci ku ew dixweze. Petrûs dixwest himberî Îsa heta xilazîyê rast bûya, lê ewî nikaribû, çimkî serwêrtîya bedenê li ser wî hebû. Petrûs diha gelekî emirê xwe hiz dikir, lê ne ku xwestina Xwedê dixwest. Ewî halê dilê xwe nas nekir. Petrûs bi guhdarî nêzîkî gotinên xwe dibû û bawar bû, wekî ewê bona Îsa emirê xwe bide. Çawa jî hebe, peyî evî “hökömî”-ra ew yek eşkere bû, ci ku wextê Şîva Xilazîyê hatibû kivşê- xwehizî û kubarî.

## Du feydayêن cuda

Peyî wê yekê ra, wextê ku Îsa şagirt razayî dîtin, çû cara duda dua bike. Wextê ku Ew paşda vegerîya, dît ku şagirt dîsa razayîne, çimkî “çevêن wan ji xewê venedibûn” /Metta. 26:43/. Peyî wê yekêra jî, wextê ku Îsa eşaretî da wana, ew dîsa hişyar neman.

*“Û ew hiştin, çû cara sisîya dua kir, dîsa ew xeber gotin. Hingê hate cem şagirta û wana ra got: “Hûn hela hê razayîne û rehet dîbin? Û wext pêra gîhişt, ku Kurê Însan bikeve destê gunekara””.*

*Metta. 26:44,45*

Îsa sê seheta awqas dua kir, hetanî ku pê hesîya, wekî ew nava şerkarîyê da gîhiştîye serkevtinê. Xwestina Wî bi temamî tevî xwestina Bavê yek bû. Niha Îsa hazır bû rû bi rû li ber tirsa rêberên cuhîya û leşkerên romaya bisekine.

Karebüna sekinandina Îsa ye qewîn hema nava van zêrandina da serwêrê romayî zendegirtî hişt. “Lê çaxê serekên kahîna û rûspîya davîtine wî, ewî qet caba kesekî nedida. Hingê Pîlato wî ra got: “Tu nabihîyî, çiqas şikyatên te dikin?”. Ewî dîsa caba kesekî neda, heta welî jî şaş ma /Metta. 27:12-14/.

*Koka tirsê*

Serxwebûn ew nîne, ku em çiqasî bilind yan jî çiqas gelekî xember didin. Wê yekê em usa jî nava xwekerkirinê da divînin. Tu awqas wext xwe ker dikî, hetanî ku gunekarkirinê derew davêjine ser çevê te. Îsa nava serwêrtîya Xweda dima û caba wan gunekarkirina nedida. Ewî zanibû, wekî serwêrtîya wan meriva ye li ser Wî tune bû. Eger Ewî caba wan bida, wî çaxî wê bida kivşê, ku serwêrtîya wana heye. Serekkahîna û rûspîya dicêribandin Îsa bi gunekarkirin, gefxwerin û bi qulixên xweva kontrol bikin. Dayîna cabê wê rast nîbûya, çimkî serekkahîn û rûspî derheqa rastîfîye da nedifikirîn. Îsa zanibû, wekî ew nikarin emirê Wî ji Wî bistînin, çimkî Ewî emirê Xwe idî dabû Bavê.

Wextê ku Îsa rastî wan meriva hat, yên ku Ew gunekar dikirin, Petrûs derva, li ber agir xwe germ dikir. Ew ji xulamên rêbera tirsîya û încar kir û got, ku ew Îsa nas nake /Metta. 26:69-75/. Nenihêrî wê yekê, wekî Petrûs digot, ku wê bimire, lê wê Îsa încar neke, lê dîsa ew tirsîya û ew yek kir, ci ku ewî gotibû, ku wê neke. Menî ew bû, wekî Petrûs emirê xwe hiz kir.

Xeberên wî didane kivşê, wekî ew Îsa hiz dike, lê kirinê wî şedetîya tiştekî başqe didan. Koka tirsâ Petrûs hizkirina himberî şexsê wî bû. Ew yek piş gotinê wî ye pêşda hatibû veşartinê, lê bi saya “dezgehê bizir” ruhê Petrûse tirsîyâ eşkere bû.

Koka tirsê xwehizîye. Lê hizkirin bi tomerî hildayî tirsê paşda dide û serxwebûnê dide me. Serxwebûna ji hizkirinê pêşdahatî hukumê tirsê dişkêne. Xwehizî bona tirsê derî vedike.

*“Hizkirin awa dilê meda gihiştîye, wekî Roja Axretê em rûspîbin, çimkî Mesîh wê dinîaê da çawa derbaz kir, usa jî em derbaz dikan. Hizkirinê da tirs tune, lê hizkirina gihiştî tirsê dûr dixe, çimkî tirs xweyîcefa ye û ewê ku ditirse, ew hizkirinê da hê negihiştîye”.*

*A Yûhenna. 4:17,18*

Tirs û dudilübûn qewat dibin, wî çaxî, wextê ku em guhdarîyê li ser xwe didine merkezkirinê û dibêjin: “Lê ez? Tevî min wê çi biqewime?”. Evana gotinê zêrandinê ne.

Îsa got: “Tu hizkirin ser wê hizkirinê ra tune, ku yek emirê xwe ber dostêن xweva bide” /Yûhenna. 15:13/. Wextê ku em bi rastî emirê xwe bona hizkirina Îsa datînin, emê idî nefikirin, ku tevî me wê çi biqewime, çimkî Ew bona me difikire. Peyî wê yekêra, em nava Wî da mirîne û nixamtîne. Hewce nîne, ku em bona emirêن xwe xemgînbin, çi jî biqewime. Derheqa wê yekê da Îsa difikire. Em tenê gerekê hiz bikin û gurê da bin.

Tirsê idî me nezérîne, çimkî merivê mirî nikare bê zêrandinê. Tu dikarî bi sîlihê li ser cinyaz nîşanê bigrî û gefa bixwî, lê mirî wê qet çevê xwe jî nequrpîne.

## **Gelo çi hate serê yên mayîn?**

Gelo çi hate serê şagirtên mayîn?. Pêşîya nemamîya himberî Îsa, ew gîhiştibûne Petrûs û digotin, wekî ewê bimirin, lê wê nemamîyê nekin. Gelo wana bin wî hukumî da, hukumê “dezgehê bizir” çi kir?. Ew hela hê pêşîya înkarkirina Petrûs revîn. Kitêba Pîrozgilî dike, wekî wextê ku wana dît, ku çawa leşkera Îsa girt, “hemû şagirta Ew hiştin û revîn” /Metta. 26:56/.

Şagirt hemû jî bona xwe ditirsîyan. Ew diha gelekî dixwestin razana, ne ku dua bikirana. Wextê nanxwerina xilazîye tevî Îsa şagirta nava xwe da şer dikir, ku kî ye yê herî mezin. Wana tê bêjî nedibihîst, yan jî nikaribûn bibhîsta. Tenê pirsek serê wan da bû: “Gelo wê çi bê serê min?”. Xwehîziya şagirta bin hukumê “dezgehê bizir” eşkere bû.

Menîyêن wan ji yên Petrûs cuda nedibûn. Awqasî, Petrûs nava halê diha çetin da bû, çimkî ewî da peyî leşkera, hetanî wî cîyî, li kîderê Îsa birin.

## **Her serxwebûnek nîne, ku ji hizkirinê pêşda tê**

Diqewime hetanî niha bona te hewaskare, wekî ewê yekê ci da wê serxwebûna Petrûs, bi kîjanê ewî şûr hilda û li ber leşkera sekinî. Ez bawarim, wekî ew serxwebûna Petrûs ji wê yekê tê, ku ewî xwest layîqî begemîya yên mayîn bibe. Ewî ew gav avît, ku hukumê xwe li ser yên mayînbihêle. Derheqa wê yekêda bifikire. Şagirt hema teze ketibûne nava xeberdanê û dipirsîn, ku kî ye yê herî mezin? /Ev têma cara ewlin nîbû, ku dihate pêşdakîşandinê. Şagirt hertim nava lehcê da bûn/. Derheqa vê yekê da Petrûs bîr nekiribû û niha jî mecal ketibû destê wî, ku ew rastîya xwe ye mezin bide kivşê.

Feqet wextê ku ew tevî xulamên serekkahîna li ber agir rûnişt, dora wî idî merivên ji bawarîya wî tune bûn, çareserîya wî ye rast idî ser ra bû. Tirsa ku nava rehetîya wî ye der da veşartî bû, eşkere bû.

Qewimandinê pêşda jî serxwebûna Petrûse dudilübûnê eşkere dikirin. Yek wî çaxî bû, wextê ku Petrûs li ser avê digerîya. Wextê ku şagirt nav-hev ketibûn, Petrûs kire gazî: “Xudan, eger Tu yî, emirke, ku ez li ser avê ra bême cem Te” /Metta. 14:28/. Petrûs ji qeyîkê derket û li ser avê ra gerîya. Hilbet ewî ew serxwebûn ji xwestina hukumkirina li ser şagirta stendibû. Feqet wextê ku Petrûs nava behra tev-hevbûyî da tenê ma, bi qîrîn berbirî İsa bû, ku Ew wî xilaz bike. Wextê ku ew li ser avê digerîya, ewî fem kir, ku tu yek tevî wî nîne. Bin hukumê tirsê da ewî gazî İsa kir, ku wî xilazke.

Diqewime Petrûs difikirî, ku İsa wê wî ji qewimandina li baxçe xilazke, çawa ku Ewî gelek cara kiribû. Û ew rast bû. Petrûs û yên mayîn texmîn nedikirin, wekî wê İsa girtî bivînin. Nenihêrî wê yekê, wekî İsa gelek cara wan ra gotibû, wekî ew yek wê biqewime, wana dîsa bawar nedikir, wekî Ewê hema wî çaxî jî padîşaflîya Xweye li ser dîniyâ İzbatkê /Karêن Şandîya. 16:21/

Ew yek hêsa ye, ku meriv hertim gumanbe, wekî Xwedê we ewê yekê bike. Feqet wextê ku Ew nişkêva tiştekî dide ber me, wî

çaxî em dikarin dudilîbin. Hingê tiştek nava emirê meda diqewime û em rûê nezanîya xweda serxwebûna xwe unda dikan. Gelek cara em hazır nînin, ku bikevine nava zêrandinê, yan jî cêribandina. Bona me, mînanî zaroka, emirê herrojeyî baş xweşe. Wextê ku em nagihîjine xwestina xwe, dilên me têne cêribandinê. Eger em nava cêribandinada serketî derdikevin, dilên me qewat dibin. Em dikarin ser xwe bêne kivşê, wextê ku Xwedê wê yekê dide me, çi ku em dixwezin, yan jî wextê ku emir ber cava ye û kivşê. Lê wextê ku hemû tiş wekî mayîn pêşda diçe, wî çaxî hemû tiş eşkere dibe. Îsa vî halî vî cûreyî tîne ber çeva:

*“Ewêni li ser erdê kevirî ewin, ku gava xeberê dibihêن, ew zû bi eşq û şâ wê qebûl dikan, lê çimkî rawêن wan tunene, ew dirêj taw nakin. Û gava bona xeberê rastî tengasîya, yan zêrandinê têن, zû ji rê dik’evin”.*

*Marqos 4:16,17*

Göhdarîyê bide ser wê yekê, wekî şagirta teyax nekir , çimkî koka wan tunebû. Gelo em çawa kokê bidine pêşxistinê, bona ku ew me qewîn xweykin?. Gelo em nava çi da gerekê koka xwe day-nin? Nava xebera Efesîyaye 3:17-da tê gotinê, wekî em gerekê nava hizkirina himberî Mesîh koka xwe bavêjin û îzbatbin. Hizkirina rast ya xwe nagere. Ew merivênu ku hizkirina wan bêkoke, wê awqasî sebirkin, çiqas wê wan ra hêsa be. Ew tevî Mesîh nehatine xaçkirinê, lê hatine cem Îsa tiştekî bistînin, lê ne ku bona wê yekê, ku Ew kî ye.

Ewêni ku bi rastî hiz dikan, wê tu tişti negerin, xêncî Hizkirîyê xwe û çi ku Wî xweş tê. Hizkirina wî cûreyî hîvîya tiştekî nîne, ew tenê dide.

Menîya wî cûreyî wê nekeve bin tu hukumekî. Hizkirin guman-bir nabe, bona wê yekê jî ew natirse.

Serxwebûn, bi kîjanê em qewata tirsê dişkênin, gerekê ji hiz-kirina himberî Xwedê gur be. “Çimkî Xwedê ruhê tirsê neda me,

*Koka tirsê*

lê ruhê qewatê û hizkirinê da” /B Tîmot’êyo. 1:7/. Qewat pareke şikênandina tirsê ye, lê ew yek hela hê bes nîne. Çawa ku min idî pêşda gotîye, min gelek merivên rûnkirî dîtine, yên ku ji hukuma xwe civandine ser hev.

Hişyarbûn jî bes nîne. Ruhê Pîroz elamî Petrûs kir, wekî Îsa Mesîhe /Metta. 16:13-18/. Tenê wî çaxî, wextê ku Petrûs bi hizkirina Xwedêva tijî bû,ewî emirê xwe danî. Derheqa vê yekê da emê serê kitêbê ye mayîn da lê binihêrin.

*Bona altkirina tirsê rîya tek- tenê undakirina  
şexsê te ye*

## Tenê xwestin bes nîne

Tenê sidqê qenc bes nîne. Petrûs xwest bide kivşê, wekî ew dikare çawa merivekî rast bimîne, lê eger lazimbe emirê xwe jî wê bide. Feqet tenê qewata vê xwestinê bona xweyîkirina wê yekê bes nîbû. Tirsa dilê Petrûs da hizkirina himberî Îsa alt kir. Îsa peyî rabûna ji nava mirîya derheqa wê yekê da got.

Serê 21-ê da, ya Kitêba Pîroze Yûhenna da tê gilîkirinê, wekî Îsa li ber şagirtên Xwe sekinî û bona teştiya wan mesî û nan hazır dikir. Paşê Ewî ji Petrûs sê cara pirsî: “Tu min hiz dikî?”. Nava her dö carên ewlin da Îsa xebera “agapo” da xebatê, kíjan kirina boy hizkirinê dide kivşê. Petrûs her car bi xebera yûnanîye “filêo” cab dida. Ev xeber tenê hizkirinêva tê sînorkirinê, lê ne ku boy hizkirinê tiştekî bikî.

Petrûs ber xwe ket, wextê ku Îsa cara sisîya pirs dayê. Cara sisîya Îsa xebera “filêo” da xebatê. Îsa nava wê pirsê da hizkirin ji dereca kirinê peyayî ser dereca tenê hizkirinê kir. Petrûs ber xwe ket û got: “Xudan, Tu hemû tiştî zanî, Tu zanî, ku ez Te hiz dikim” /Yûhenna. 21:17/, ci jî dide kivşê: “Tu zanî, ku ez hizkirinê himberî Te texmîn dikim”.

Îsa pirs diha da konkrêtkirinê: “Gelo tu Min awqasî hiz dikî, wekî dikarî emirê xwe bona Min bidî?”. Bi vê gotinê jî gilî derheqa xebera “agapo” -da ne. Petrûs bi rastî û şikestî cab da, wekî hizkirina wî ya nava ruhê wî da bû. Bîr bîne, wekî ewî teze Îsa încar kiribû. Petrûs sistaya xwe qebûl dikir. Hizkirina wî awqas qewat nîbû, ku ïzin bida wî, ku emirê xwe bide.

Xilazîyê Îsa pirs da Petrûs: “Tu Min bi nêzîkbûna germ hiz dikî?”. Îsa zanibû, wekî niha Petrûs merivekî şikestî bû û hela hê nêzîkî hizkirina “agapo” nîbû.

Îsa xwest bi her du carêن ewlin Petrûsra şirove bike: “Ez rast divêjime te, wextê ku tu xort bûyî, te bi xwe qayîşa xwe girê dida û tu li wan dera digerîyî, li kîderê te dixwest, lê wextê ku tu kal bibî, tê destê xwe dirêj bikî û yekî mayîn wê qayîşê girêde, te bibe li wan dera, li kîderê tê nexwezî. Ewî da kivşê, wekî ewê bi çi mirinê Xwedê bilindke. Peyî vê gotinê ra, Ewî gote wî: “Peyî Min were” /Yûhenna. 21:18,19/.

Ez difikirim, wekî bi gotina wan xebera Îsa xwest Petrûs ra bêje: “Pêşda te ew yek teriband, bi jîyîna qewata hizkirina bêyî tu tiştikirinê, lê rojê bêñ, wextê ku tê li ber tirsa here mezin rû bi rû bisekinî û tê bi hizkirina mayîn serkevî, alt bikî”. Hetanî wî çaxî, Petrûs bi hizkirina merivatîyêye here baş hiz kiribû, lê ewê yekê ew dabû teribandinê. Eger Petrûs peyî Îsa biçûya, wê bi hizkirina “agapo” -vabihata sîlikirinê. Cûrê wê hizkirinê ji xwestina mîriv pêşda nayê, lê dilê meda ji Bavê pêşda tê /Romayî. 5:5/. Hizkirina Xwedê /agapê yan jî agapo/ ji wê yekê natirse, ku bona yekî mayîn bimire. Îsa piştigirî da Petrûs, wekî wextê ku careke mayîn Petrûs rastî “hukum” bê, ewê ji wî halfî altkirî derkeve. Wî çaxî ewê bikaribe wê yekê bike, bona çi ewî pêşda sond xweribû. Hetanî înkarkirina Îsa ew dikaribû bimira, lê eger ji hukumê tîrsê ew aza bûya, ewê bibûya merivekî guhartî.

Xwedê vê yekê bona kara me dike. Ew qewatê dide me, wextê ku em tîrsîyîne. Ewê ïzinê bide, wekî em awqas wext rastî wî hemû tiştî bêñ, ji çi em ditirsin, hetanî ku em wê yekê alt bikin. Wextê ku

em mecalên xwe ser hevda tînin, xilaz dikan, em gerekê gazî Wî bîkin. Nava wê qewatê da em nikarin bêne teribandinê, çimkî hizkirin tu cara nayê teribandinê /A Korint'î. 13:8/. Xwedê naxweze, ku em ji govekên xwe ye sist birevin.Ew dixweze, ku em bêyî tirs, rû bi rû rastî wana bêن.

### **“Tewaqe dikim, vê yekê dûrxe”**

Pawlos ev hemû tişt zanibû: “Û wekî nebe ez bona gelek eyantîyên ne ber hişa kubarbim, belake, mîna derzîkê qalibê minda min ra hate dayînê, milyaketekî ji mire cin, ku tepa bê min, wekî ez kubar nebim” /B Korintî. 12:7/.

Ez difikirim, wekî nava vê gotinê da şedetiya milyaketekî xirab tê dayînê, kîjan mire cin şandibû, ku derbê bighîne Pawlos. Evî milyaketî bona Pawlos çetinayî li her cîya pêşda dianîn. Nava kaxezâ Korintîya ye duda da, li ser 11:24-27-a, derheqa hinek çetinaya da tê gîfîkirinê, kîjan rastî Pawlos hatibûn:

*“Bi destê cihuya pênc cara, ji 4O-i yek kêm, bi qa-mçîya hatime lêdanê, sê cara bi destê romîya bi şiva hatime lêdanê, carekê ez dame ber kevira, sê cara rastî gemîwelgerandinê hatime, şev û rojekê behrê da mame. Gelek rewîtiyên xwe da nava cûre- cûre qede-belayên bêwa da bûme: Ji çema, ji rîbira, ji miletê xwe, ji necuhîya,bajêr da, çol- besta da, ser behrê,ji birayên derew. Dixebitîm, diçerçirîm, gelek cara xewê şeva nedikir, tî-birçî, gelek cara bê nan, sermê û bêsi-tarîyê da bûm”.*

Li h'emu cîya, li kîderê Pawlos, bona Kitêba Pîroz xeber dida, dikete nava zêrandinêن qewat. Zindan û qezîya li her bajara hîvîya wî bûn. Pawlos bi qamçîya û bi dara dihate lêdanê, ew didane ber kevira, rastî gemîwelgerandinê û gelek tiştên mayîn dihat.Bi vî cûreyî,ew bona vê yekê çû cem Xwedê.

*Tirsê Bişkênin*

*“Bona vê yekê min sê cara hîvî ji Xudan kir; ku vê yekê ji min dûrxe”.*

*B Korintî. 12:8*

Femdarîye, wekî Pawlos dixwest ji vê berxwedayînê û zêrandinê aza be. Xwedê caba wî wa da:

*“Kerema min besî te ye, çimkî qewata min sistaya da mîaser dibe”.*

*B Korintî. 12:9*

Xudan bi wê yekê digot: “Pawlos, tu jiMin tewaqe neke, wekî ez vî hemû tiştî dûrxim. Lê diha gelekî tewaqeke, ku kerem û qewata Min te ji wan tişa bilindtir bikin, kîjana tu nikarî alt bikî. Pawlos, li kîderê çetinayî tunene, li wir hewceşîya qewatê jî tune. Altindarî wî çaxî diqewime, wextê ku şerkarî heye. Bi çiqasî şerkarî mezine, bi ewqasîva jî altindarî mezine. Leşkerê rast ji dew û dozê nareve, lê direve pêşberî wî”. Nava şerkarîya gur da gerekê tewaqe ji Xwedê nekin, ku me ji şêr bide derxistinê. Ewa hema ew çaxe, wextê ku em gerekê bona kerema Xwedê dua bikin, bona ku em bikarîbin alt bikin /serkevin/. Xwedê wî çaxî bilind dibe, wextê ku em rû bi rû rastî tiştékî têñ, kîjanî em nikarin bi qewata merivatîyê altkin. Peyî wê yekêra, qewata Wî tê ser me û hemû kes dikare wê yekê bivîne. Kerema Xwedê h’emû tirsa û çetinaya alt dike, kîjan rastî me têñ. Tu bi xwe bi van çend gotinê Xwedê piştgirîyê bide xwe:

*“Lê şikir ji Xwedê ku timê me pêga koma Mesîhe ser-  
ketinêda pêşda dibe û bîna naskirina Xwe bi me her-  
dera bela dike”.*

*B Korintî. 2:14*

*“Lê şikir ji Xwedê, ku em bi destê Xudanê me Îsa Mesîh  
ser xistin”.*

*A Korint’î. 15:57*

*Tenê xwestin bes nîne*

*“Çi tiştê iżbatke, ku hizkirina Mesîh li me sar bûye? Derd- kul, telî- tengî, zérandin, xelayî- celayî, bêşitarî, qeda- bela, yan şûr? Çawa nivîsare: “Bona te em her roj ber mirinêne, mîna peza serjêkirinê hesab dibin”. Lî em nava van hemû tişta da hê zede ser dikevin, bi saya Ewî ku em hizkirin”.*

*Romayî. 8:35-37*

Yê ku ser dikeve miqabilî berxwedayînê dertê, ser dikeve û serketî ji şer’karîyê derdikeve. Pawlos xwe ji vê yekê hişk girt û xemgîniya wî werguhêzî gumanê bû. Ewî nivîsî:

*“Awa ezê bi dilekî şâ halê sistîyên xwe da bifirim, wekî gewata Mesîh nava min da be. Lema jî ez bona navê Mesîh sistîya, qara, hêşîrî- belengazîya, zérandina û telî- tengîya begem dikim, çimkî gava ez sist dibim, hingê qewat dibim”.*

*B Korintî. 12:9,10*

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî ew dibêje “begem kirîye”. Gelo çiqas cara em meriva divînin, yên ku hiz dikin nava zérandina, telî-tengasîya, feqîrîyê û tiştên mayîn da bimînin. Ew yek ew merivin, yên ku nava Îsadanan /Galatî. 2:20/, tenê ew meriv dikare ji tiştên wî cûreyî besera xwe xweşke. Yekî usa bona bilindkirina Mesîh dijî. Pawlos zanibû, wekî ew dikare gumana xwe bide ser kerema Xwedê, kîjanê hetanî wî çaxîbihata xweyîkirinê, hetanî ku Mesîh bihata pesidayînê.

Pawlos İsa ji emirê xwe zêdetir hiz dikir. Ew hazır bû bimire, lê diha gelekî dixwest bona Wî bijî. Niha guhdarîyê bide ser nema bona filîpiya:

*“Ez guman û çevnihêrîya vê yekême, ku tu tiştîva ezê şermî nemînim, lê belê, hê mérkîmî bim, çawa her gav, usa jî niha pesinê Mesîh bi qalibê min bê dayînê, eger bi mirina min be, yan jî bi jîyîna min be”.*

*Filîpi. 1:20*

Bona Pawlos firqî tune bû, ku wê pesinê Mesîh bi çi bida- bi emirê xwe, yan bi mirina xwe. Bona wî tiştê herî girîng ew bû, wekî tenê Mesîh pesindayî bûya. Pawlos bi wî meremî mirin hesab nedikir, kîjan rûê sistbûnê û nexweşiyê da pêşda tê. Îsa ew mirin bona me li ser xaç dît, sistbûn û nexweşî pesinê Wî nadîn. Ew yek şaşîye, wextê ku em bi mirina ji nexweşiyê bêjin me pesinê Îsa da. Îsa her du jî li ser xaç dît /Îşaya. 53:4,5/. “Pesinê Xudan bide, nevsâ min, û bîr neke hemû qenciyêñ Wî, yên ku hemû gunehyêñ te dibaxşîne, hemû nexweşiyêñ te qenc dike” /Zebûr. 1O3:2,3/. Çawa ku hûn divînin. Pawlos derheqa sistbûnê û nexweşiyê da xeber nedida. Nêzîkbûna me gerekê vî cûreyîbe: “Xudan, tiştê herî ferz ewe, ku Tu bêyî pesindayînê, ku xwestina Te mîaserbe û para mire cin tunebe”. Ji xwehizîya Pawlos cuda hizkirinê serxwebûnek da, wextê kîjanê tu tirsek nikaribû derbazî hundur bûya /Filîpî. 1:2O/. Bi zanebûna wê yekê, wekî li bajara ewê rastî zêrandinê û gefxwerina bê, ew pêşda diçû. Pawlos ji tu merivî neditirsîya.

“Û va ez bin destê Ruhê Pîroz da diçime Orşelîmê,wir wê çi bê serê min, ez nizanim. Tenê Ruhê Pîroz hemû bajara da temîyê dide min û dibêje ku: “Qeyd û tengasî pêşîya tene” /Karêن Şandîya. 2O:22,23/.

Bona min hewask’are, ku roja îroyîn çend merivê dero- dero k’evin, bona gotinên vî cûreyî. Na xêr, ewê qet nexwezin jî, ku tiştekî vî cûreyî bibhêñ. Em hiz dikin tiştên baş guhdarkin, lê Xwedê usa jî bona zyanê eşaretîyê dide, bi wê yekêva tevayî gumanê û serxwebûnê tîne. Pawlos wî cûreyî piştgirî dida û digot: “Bona me lazime, ku em bi gelek telî- tengasiava bikevine padişafîya Xwedê” /Karêن Şandîya. 14:22/.

Tiştekî hewaskare, ku emê çawa caba wê yekê bidin, eger gotineke vî cûreyî bibhêñ, wekî emê hertim rastî telî- tengasiya û berxudanê bêñ. Bêfitîya ez nabêjim, wekî her gotineke ji Xwedê stendî, gerekê vî cûreyî be. Pirs nava wê yekê da ne, wekî gelek tiştê dayî meriva berbi şaşîya def didin. Ew xeberên basın, mesele, wekî meriv gerekê nava bîznêsê, yanê jî qulixê da pêşk’evin, wekî hemû tişt wê bona

wan baş be. Gelek cara meriv Xwedê bona wê yekê digerin û qulixî wî dikan, ku bizanibin, ku Ewê nava emirê wanda çi bike. Hizkirina wana wî cûreyî nîne û bona wê yekê jî hewaskar nîne, ku bi emirê xwe, yan jî bi mirina xwe pesinê Xwedê bidin. Binhêrin, ku Pawlos çi dibêje:

*“Lê ez emirê xwe layîqî tu tiştî nakim, tenê dikim bîghîjime meremê xwe û wê qulixa, ku min ji Xudan Îsa stendîye, bînime sérî, awa gotî Mizgînîya kerema Xwedê bi merîfetî danasînkim”.*

*Karên Şandîya. 20:24*

Kîlîta serxwebûna Pawlos ew bû, wekî ewî emirê xwe çawa tiştekî biha hesab nedikir. Ewî fem kiribû, wekî progirama Xwedê usa jî cêribandin û zêrandin dikire nava xwe. Hizkirina Pawlose himberî Îsa diha mezin bû, lê ne ku ya himberî emirê wî. Emirê Pawlos sura xilazkirina lehcê dide kivşê. Emirê xwe dayne jêr û emirê Îsa hilde. Gelek cara ev yek dide kivşê, wekî em gerekê hemû tiştên baş daynin alîkî û tiştê bona te nebaş- xaçê hildin.

## **Tu li ser wê fikirê yî, wekî ev Kitêba Pîroz yaamêrîkîye?**

Ez zanim, wekî bona mesîhîtiya roavaê ev yek nêzîkî ruhê wan nîne. Niha ev hemû tiş ji dîtin û xeberdanê salêy 1980-ê yî û 1990-î cuda-cudane. Ez jî wan merivame, wekî xwe mikur têm, ku ez bi xwe jî şâş bûme. Nava deh salêن derbazbûyî da ez jî rastî halên mînanî “dezgehê bizir” hatim, ku çi dilê min da heye, eşkerekim. Ez mîna Petrûs ber xwe diketim, wextê ku min xwemikurhatinêن vala û halê dilê xweye rast didîtin. Gelek cara min gazî Xudan dikir, tewaqe ji wî dikir, ku Ew dilê min biguhêre. Ez hîn bibûm, ku bona cêribandinêن ku qewatê didin, razîbim /A Petrûs. 1:6,7/. Ev gotinêن Kitêba Pîroz min baş fem kirine:

*Tirsê Bişkênin*

*“Awa Mesîh, ku bona me bedenî cefa kişand, hûn jî bi nêt-fikirê sîlihkirîbin. Çimkî yê bi bedenî cefa kişand, wî dest ji guneha kişandîye, wekî idî heta mirina xwe ne ku li gora dilhavêjîyên xweye merivayî bijîn, lê li gora girara Xwedê”.*

*A Petrus. 4:1,2*

Nava zêrandina da em dighîjin. Ez derheqa femdarîya zêrandina ruhanîda xeber nadim, anegorî kîjanê gerekê em nexweşîyê û kesîbtîyê qebûlkin, çimkî tu bi wê yekê layîqî qîmetê Xwedê dibî. Ez ne jî derheqa wê zêrandinê da dibêjim, kîjan rûê nezanîyê û şâşîyê û kirinên bêxwedê da pêşda tê. Zêrandin, rastî kîjana gerekê em bêñ, ew zêrandinin, kîjan rastî Îsa hatine, yên ku bi her cûreyî, bêyî gu-neha, hatine cêribandinê /Îbranî. 4:15/. Ew zêrandina ku Petrus dide kivşê, ew berxwedayîna mîrive, wextê ku bedena mîriv û merivên dor- bera te mecbûr dikan, ku berbi wê yekê herî, ne bi xwestina Xwedê, lê bi wê rê, bi kîjanê ew dixwezin. Wî çaxî tirsê serê xwe bilindke, eger em nava hizkirina himberî Îsa qewînbûyî nîbin.

Ez dixwezim mînanî Petrus peyî Îsa herim, ne ku li wir, li kîderê ezê bêjim, wekî ezê bona Wî emirê xwe bidim, lê herime li wir, li kîderê ez mirina emirê xwe û xwestinê xwe qebûlkim. Îzinê bide, wekî tenê Ew bê pesindayînê. Ev yek bi kerema Wî mîaser dibe. Ew kerema Xwe dide şikesfiya /Aqûb. 4:6/. Eve menî, wextê ku Pawlos wextê rasthatina tevî zêrandinê dikaribû bigota: “Min begem kirîye”. Niha binihêre, ku Yûhennayê şandî derheqa wanda ci dibêje, kîjana mire cin alt kir:

*“Ewana pê xwîna berxê û xebera şedetîya xwe ser wî ketin, emirê xwe heta mirinê hiz nekirin”.*

*Eyantî. 12:11*

Min gelek cara ev gotin bihîstibû, lê tenê pareke wê bihîstibû. Gelek meriv zû disekinin:ew xilazîya gotinê berdidin. Eva jî hema

ew pare, kîjan nava kûltûra meye roavaê da eyane. Emê nava şerkarîya miqabilî tirsê hetanî wî çaxî negihîjine serkevtinê, hetanî ku em hizkirina emirê xweye hetanî mirinê înkar nekin. Eger em emirê xwe hizkin, wî çaxî emê rîya bigerin, ku wî xilazkin.

Jin û mîrên Xwedê, niha hûn rastîyê zanin: “Rîya altkirina tirsêye tek- tenê undakirina emirê teye”. Gazî Xwedê bike, wextê ku tu dixwînî, paşda venekişe, lê bawar bike. Tewaqe ji Wî bike, wekî dilê te bi hizkirina Xweva tijîke, kîjan tu cara paşda venakişe. Kere-ma Wî ji Wî tewaqeke, bi kîjanê tê nava halên wî cûreyî da serkevî. Tewaqe bike, ku Ew ïzinê bide, ku nava rîyênen cetin ra derbazbî. Dua bike, wekî tu merkeza wan şuxula da bî, bi kîjana Ew nava dinîayêda dike. Emirê hêsa, rehet tewaqe neke, dewsa wê yekê emir tewaqe bike, kîjan pesinê Wî dide.

## **“Lê gelo tê derheqa vî merivî da ci bêjî?”**

Were em paşda vegeŕine li ser wî cîyî, wextê ku Îsa ji nava mirîya rabû û bona şagirtên xwe taştê hazir dikir. Peyî taştê ra Îsa pêxembertíke “duakirf” da Petrûs. Hetanî wî çaxî gotinêd Îsa ew sozdayîn didane kivşê, wekî Petrûsê tirsâ here mezin alt bike û ewê xwestinênen xwe bi qewata merivatîyê mîaser neke. Îsa gote Petrûs, wekî rûê rastîya himberî Wî da ewê bimire. Petrûsê himberî tiştekî usa serketa, ci ku pêşda wê rastî wî nehata. Îsa xebata xilazîyê dît.

Petrûs hela hê hazir nîbû. Bi bihîstina wê yekê ku ci wê biqewime, Petrûs zivirî Yûhennayê şandî dît û pirs da Îsa: “Feqet, Xudan, tê derheqa vî merivî da ci bêjî?”. Petrûs hela hê xwe himberî yên mayîn dikir. Bi rastî ewî wa digot: “Eger ez gerekê nava vê yekê ra herim, lê ewê ci bike?”.

Îsa caba wî da: “Eger ez bixwezim ku ew bimîne heta ez bêm, ci tera ye?. Tu peyî min were” /Yûhenna. 21:22/.

Bi gîlîkî mayîn gotî, ew yek ferz /gîrîng/ nîne, tu xwe himberî

yên mayîn neke, awqasî peyî Min were. Gelek meriv emir û kîrinê xwe himberî kîrinê yên mayîn dikin. Tu naxwezî xwe bi dereca şash çapkî. Orta santîmêtîrê û kilometer da firqîke mezin heye. Civînê meda pir'anîya meriva emirê xwe usa derbaz dikin, çawa ku ew dixwezin- nava firehyê da. Wextê ku em xwe himberî yên mayîn dikin, tê bêjî tê texmînkîrinê, ku li cem me hemû tişt başe. Ew yek tiştekî feşe, wextê ku tu ber dilê xwe da têyî, ku tu awqas başî, çiqas yên mayîn. Ev yek xwexapandine. Meriv bawarîya xwe wê yekê tînin, ku eger nava yên pêşber hemû tişt başe, wî çaxî li cem wan jî hemû tişt başe. Feqet çawa jî hebe, norm- derecke tomerî heye. Em ne endamê civînê mayîn, ne jî xwîşk û birayêne me bona xwe çawa norm- derecê hesab dikin. Norma me Îsa ye. Îsa Petrûs ranegot, ku ew peyî Yûhenna here. Ewî got: “Peyî Min were”.

Rîya ku Îsa têra derbaz bûye, rîya xwepêşkêşkirinê bû. Ew yek t'enê bes nîne, ku peyî Wî herin.

*“Paşê Îsa gazî elalete û şagirtên xwe kîrin, wan ra got: “Eger yek dixweze li peyî min bê, bira xwe înakar bike, xaçê xwe hilde û peyî min bê. Çimkî kî ku dixweze emirê xwe xilaz bike, ewê wî unda bike, kî ku emirê xwe bona Min û Mizgînîyê unda bike, ewê wî xilaz ke””.*

*Marqos. 8:34,35*

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî Îsa got, ku eger xwestina te kîrina hemû tiştî ye, ku emirê xwe xilazkî, wî çaxî tê emirê xwe unda bikî. Eger tu wî hemû tiştî bixwezî, ci ku ev dinîya dixweze, tê e'mirê xwe unda bikî. Niha jî guhdarîyê bide ser wê gotinê, ku Îsa ci dibêje:

*“Kî ku emirê xwe bona Min û Mizgînîyê unda ke, ewê wî xilazke”.*

*Marqos. 8:35*

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî Îsa negot, ku kî ku bixweze

emirê xwe bona Min undake. Tenê xwestin bes nîne. Petrûs jî xwest peyî Îsa here û hema wê şevê jî ewî Îsa unda kir. Piş wê menîyê ne hizkirina Xwedê hebû, ne jî qewata Wî. Ew yek bû menî, ku ew binkeve.

## **Dilê xwe binihêre**

Hetanî ku tu vê kitêbê dixwînî, bicêribîne menîyên dilê xwe binihêre. Gelo tu şagirtê Îsa Mesîhîyî rastî, eger tenê bi qewilên xwe dixwezî peyî Wî herî? Gelo tu bi dûrbûyîna ji xwepêşkêskirinê nava sînorêن xweda divînî?

Diqewime hema ew sînor te ji rîyêن Îsa ye derbazbûyî dûr xweykin?. Pêşîya qirara derheqa çûyîna peyî Îsa, em pêşda gerekê bahê wê pê bihesin. Belê, ew yek raste. Qîmetê wê heye. Ew ji emirê te kêmter dewê nake. Guhdarke ku çawa Îsa ev yek bona wê cimetê şirove kir, kîjanê dixwest peyî Wî here.

*“Peyî vê yekê ra elaleteke giran tevî Îsa diçû û ew ser wan da vegeรiya û got: “Eger yek peyî min bê û min ji dê û bavê xwe, ji jin û zarêن xwe, ji xwîşk û birayêن xwe û usa jî xwe zeftir hiz neke, nikare bibe şagirtê min. Û kî ku xaçê xwe hilnede peyî min neyê, ew nikare bibe şagirtê min. Ji we kîjan ku bixweze bilindcihke nobedara çê bike, pêşîyê rûnenî, nede ber hesêb, gelo qewata wîyê bighîjê, bîne sérî, yan na? Nebe, ku hîmê wê dayne û nikaribe bîne sérî, yêن ku bivînin, lê bikevin û bêjin: “Evî merivî destpê kir çêke û nikaribû banîya sérî”. Awa ji we her kes, kî ku destê xwe ji temamîya hebûna xwe nekişîne, ew nikare bibe şagirtê min”.*

*Lûqa. 14:25-30,33*

Awa ber ceva ye, ku qîmetê sebirkirina hetanî kutasîyê çî ye. Hinekî pêşda kitêba Eyantîyê da me xwend, ku ewê ku serketin,

emirê xwe hetanî mirinê hiz nekirin. Telebext ra roja îroyîn ev yek nikare bibe gotina derheqa civîna Amêrîkaê.

Ez dikarim gelek mesela ji emirê jin û mîrên mesîhî bînim ber çeva, yên ku dîsa xweyêñ emirên xwe ne. Wextê ku ez serwêr bûm, jineke cahil nêzîkî min bû û bi nerazîbûn got: “Conê serwêr, fikira min derheqa min da gelekî xirabe. Ez tewaqe dikim, dua bike bona ku fikira min bê guhartinê”. Min ewê jinê nihêrî û gotê: “Ew problêma te ye”. Jin nav hev ket. Pêşda ewê difikirî, ku ezê bi wedê dirêj şireta bidimê û paşê jî dua bikim. Caba min jina cahil tevlî hev kir. Feqet rastî me aza dike, lê ne ku xeberdana derheqa problêmên meda.

Min ji wê jinê pirsî: “Nava Kitêba Pîroz da tu li kîderê şedetîyên derheqa xwebilindkirinê, yan jî fikirên başê derheqa xwe da divînî?. Îsa got, wekî bona çûyîna peyî Wî tu gerekê bimirî. Te kengê dîtîye, dema ku merivekî mirî tabûtê da rûnişîye û dibêje, ku ev çi kincin we li min kirine, yên ku li min xweş nayên. We porê min çi ra wa çê kirîye, gelo merivê derheqa min da çi bifikirin?”

Min dixwest nîşanî wê jinê bikira, wekî anegorî Kitêba Pîroz nîne, wextê ku pesinê xwe didin, yan jî derheqa te da fikireke baş dibêjin. Bona çûyîna peyî Îsa û hizkirina Wî, eseyî nîne, ku tu derheqa xwe da li ser fikira baş bî. Ewê jinê guhdarîya xwe dabû li ser tiştên wedelî, lê ne ku li ser tiştên heta-hetayê.

Em nikarin qulixî Xwedê bikin, wextê ku em derheqa xwe da li ser fikira basın, yan jî wextê ku hemû tişt bi xwestina me pêşda diçe. Merivên vî cûreyî, yên ku wî cûreyî dikin, em çawa “hevalên rojêñ baş” nav dikin. Ew aqil nînin. Bi kutasî ewê rastî tiştekî usa bêñ, çi jî wê anegorî texmînkirinê wan nîbe. Ew yek hemû çaxî jî dikare biqewime. Eger ew hazir nîbin, wî çaxî ewê tesmlîbin. Diqewime ew herine civînê, bi zimana xeberdin û tiştên rast bêjin, lê dilêñ xwe da nexwezin Xwedê bigerin. Hizkirina Xwedê bêsinore. Eger hûn bi rastî dixwezin Wî ra gava bavêjin, gerekê sînorkirinê xwe dûrxin.

## **Merivê guhartî**

Wextê ku em kitêba Karêن Şandîya da Petrûs dinihêrin, çetine bê bawarkirinê, wekî ew hema ew merive, yê ku tirsîya û li ber xulama Mesîh încar kir.

Peyî tijîbûna bi Ruhê Pîroz, ewî bêyî tirs, bi temamîya Orşelîmêva destpêkirî elam kir, wekî Îsa Xudane û Mesîhe. Petrûs hate girtinê û ew anîne li ber rîbera, li ber wan serekkahîna, kîjana Îsa xaç kiribûn. Niha Petrûs ne ku li ber xulama, lê hema li ber wê şêwirê sekinîbû, kîjanê Îsa gunek'ar kir. Petrûs wana nihêrî û elam kir: "Ew hûn bûn, ewên ku Îsa Mesîh xaç kirin. Û tenê bi Wî xilazbûn heye"/Karên Şandîya. 4:8-12/.

Serxwebûna Petrûs û Yûhenna şêwira rûniştî zendegirtî hişt û wana nikaribû dengê xwe miqabilî wî karî bikirana, kîjan Xwedê dikir. Ew meriv hostayêñ kontrolkirinê bûn. Wana bi hev ra got: "Lê wekî nava cimetê da hê bela nebe, em gefê li wan bixun, ku tu cara bi vî navî kesî ra xeber nedin" /Karên Şandîya. 4:17/.

Bîr bîne, wekî van serekkahîna Îsa teze xaç kiribûn, lê Îsa idî gotibû Petrûs, wekî ewê hema wî cûreyî bimire, çawa ku Ew mir. Evana gefxwerinêñ vala nîbûn. Li ber mirinê sekinî, Petrûs û Yûhennna ew yek îzbat kirin: "Ka hûn bi xwe bifikirin, gelo ev yek ber Xwedê raste, ku em gura we bikin, ne ya Xwedê?. Em nikarin bona wan tiştêñ ku me bi xwe dîtin ûbihîstin, nekine dengî" /Karên Şandîya. 4:19,20/.

Wextê ku Petrûs li ber şêwirê sekinîbû, tenê Yûhenna tevî wî bû. Merivê usa li wir tune bûn, ku ew hukumê xwe li ser wan bihêle. Niha serxwebûna Petrûs cûrekî mayîn bû. Ew serxwebûn bi saya hizkirina Îsa gur bibû. Ew û Yûhenna aza hatine berdanê û ew dîsa gîhîstine şagirta, gîlî kirin, ku ci qewimîye. Niha binhêrin, ku ew meriv ci tewaqe ji Xwedê dikin:

*"Niha ya Xudan ser gef û gurtîya wan da binihêre, ker-emê xulamên xwera bike, wekî ew mîrkîmî xebera te*

*xeberdin, destê xwe dirêj bike, wekî bi navê berdestîyê te Îsa yê Pîroz ji nexeşîya qencbin, nîşan û keremet bi-qewimin”.*

*Karêن Şandîya. 4:29,3O*

Wan meriva ji Xwedê hela hê zêde tewaqe dikirin, lê ne ku neketina nava problêma. Wana zanibû, wekî bi xeberdana derheqa Kitêba Pîroz da ew emirê xwe dîkine bin qeziyâ. Wî cûreyî jî Xwedê keremet dida. Şagirta îzin neda, wekî rûê tîrsê da pêşkêşa Xwedê nava wan da bitemire. Bi gîlîkî qewata Xwedê awqas mezin bû, wekî nexwes derdixistine li ser kûçen Orşelîmê û meriv qenc dibûn, wextê ku sîya Petrûs dikete li ser wan /Karêن Şandîya. 5:15/.

Petrûs dîsa li ser xwe guman cab da:

*“Em gerekê gura Xwedê bikin, ne ku ya meriva. Xwedê yê kal- bavê me Îsa, ji mirinê rakir, ewê ku we darva dardakir, kuşt. Xwedê ew bilind kir, danî li milê xweyi rastê, ku bibe Rêber û Xilazkir, wekî mecalâ tobeyê û baxşandina guneha bide Îsraêlê. Em şedê van tiştane, usa jî Ruhê Pîroz, kîjan Xwedê da wan, yên ku gura wîdanin”.*

*Karêن Şandîya. 5:29-32*

Gelo serxwebûn û mîrxasî çawa ye. Şagirt tîrsîyî nîbûn. Îdî wedekî dirêj bû, ku Petrûs nedicedand emirê xwe xweyke. Ew ji xwehizîyê aza bû û bi Ruhê Xwedeyî Pîroz tijî bû. Hizkirina Xwedê dilê wî tijî kiribû.

Tîştekî femdarî ye, wextê ku Ruhê Pîroz hizkirina Xwedê tîne nava emirê me. Feqet ji mesela Petrûs usa jî meriv fem dike, wekî Ruhê Pîroz bona wan meriva tê dayînê, yên ku gurêdanin. Gelek mesîhîyî dixwezin bêyî gurêkirinê bîghîjine hizkirinê.

Bi xeberdana bi zimana, garantîya nîne, wekî hizkirina Xwedê wê dilê te da bimîne. Tijîbûna bi Ruhê Pîroz cêribandina carekê nîne. Ew

yen ferz nîne, ku tu çiqasî baş Kitêba Pîroz zanî û tu çiqasî baş bi zi-mana xeber didî. Eger tu li ber Xwedê bi emirê gurêkîrinê najîyî, dilê te destpê dike sarbe. Her gurênekîrinek wê hizkîrinê dide kêmkirinê.

Îsa got, wekî nîşaneke rojên xilazîyê jî ewe, wekî dilên mesîhiya da hizkîrina Xwedê rûê tiştên xirab û gurênekîrinê da wê destpêke sarbe /Metta. 24:12/. Hizkîrina ku Îsa gotîye, ya agape ye. Kîjana Îsa qebûl kirine, tenê li cem wan ew hizkîrin heye. Diqewime tu bi Ruhva tijîbûyî bî, lê dikare hizkîrina Ruhe rast tunebe.

Gurêdabûna Petrûs û Yûhenna usa kir, ku ew ser xwe bûn û dilên wana bi hizkîrinêva tijî bûn.

*“Ü gazî şandîya kirin, ew dane ber qamçîya, emirî ser wan kirin, ku idî bi navê Îsa xeber nedîn û berdan. Evana jî ji civîna gire- gira çûn, şâ dibûn, ku bona navê Îsa hêjayî rezîlkîrinê bûne”.*

*K’arêñ Şandîya. 5:4O,4I*

Petrûs û Yûhenna ji gire- gira tirsîyayî nîbûn, Ew bi şabûnêva tijî bûn. Evana ji wan şagirtê mayîn êpêce cuda dibûn, yên ku li nava baxçe razayî bûn. Ew şâ dibûn, wekî hatine zêrandinê û mecalâ wan çê bû, ku ew hizkîrina xwe bidine kivşê. Petrûs niha bi temamî hildayî hiz dikir.

Nava kitêba Foûkse bi sernivîsara “Cangorîyêñ dinîyaâye mesîhi” da tê gîlîkîrinê, wekî Petrûs usa mir, çawa ku Îsa gotibû. Wextê ku hazır dibûn Petrûs xaçkin, ewî got: “Ez layîqî wê mirinê nînim, çawa ku Xudanê min mir”. Bona wê yenê jî ew li ser sêrî xaç kirin. Petrûs ji vê dinîayê serketî çû. Alêluya.

*Ji kē ditirsî, tē qulixî wî jî bikî*

## Xofa Xwedê, yan tirsa mîriv?

Derheqa vî hemû tiştî da ci me hetanî niha xwend û lêkolîn kir, wê rêberîyê me bike, ku em miqabilî tirsê şerkarîyê bikin. Ev yek ne tenê wî çaxî ferze /girînge/, wextê ku em rû bi rû rastî tirsê tê, lê bona hemû govekên emire. Ezê derheqa sawa Xudan da xeberdim.

Civîn sawa Xudan fem nake. Eva qezîa ye, çimkî bona emirê mesîhî ye serketinê ev yek qewilekî girînge. İsha derheqa İsa da gotîye: “Û kêfxweşîya Wî sawa Xudane” /İsha. 11:3/. Hema ew kêfxweşî jî gerekê li cem me hebe.

Ew merivê ku li cem wî ji Xudan saw heye, wê bi rîyê Xwedê bê rêberkirinê /Zebûr. 25:12/. Şexsê merivê vî cûreyî wê nava rehmê da bijî û dinîayê bibe li mîrata nisileta wî /Zebûr. 25:13/.

Me ra hatîye gotinê, wekî sawa Xudan destpêka naskirin û aqilmendîya wî ye. Sawa Xudan wê rojêne me bide dirêjkirinê. Bona me eşaretî hatîye dayînê, wekî bêyî pîrozî tu kesê Xudan nevîne, çimkî pîrozî bi sawa Xudan tê pêşxistinê /Îbranî. 12:14, B Korintî. 7:1/. Evana çend mesele ne, ku Kitêba Pîroz derheqa sawa Xudan da dibêje.

Bona ku meriv ji tirsê aza bigere, rîya tek- tenê ewe, ku nava

sawa Xudanda bigere. Kitêba Pîroz dibêje: “Nava sawa Xudan da gumana qewîn heye û bona lawên Wî ew yek gerekê bibe guman” /Metelok. 14:26/. Li ser xwe gumanbûna qewat serxwebûnê pêşda tîne, kîjan bona me lazime, ku em rîyê Xwedê va biggerin, lê ne rîyê merivayêra. Werin em firqîyê orta sawa Xwedê û tirsa mîriv da lê binhêrin.

## **Firqîyê sawa Xwedê û tirsa mîriv**

Berê ewlin em givtugo bikin, ku kîjane xofa /sawa/ Xwedê?. Qedirê himberî Wî dikeve nava wê yekê, lê ew hela hê tiştekî diha zêde ye. Xofa ji Xwedê wê yekê dide kivşê, ku ewî qedirî, wê razîbûnê, wê pesindayînê û tiştê herî baş bidine Wî, layîqî kîjana ye Ew. /Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî Ew layîqî kîjanaye, lê ne ku wek em difikirin, ku Ew layîqe/. Tabîya Xwedê ye vî cûreyî nava emirê meda ne, wextê ku em qedirê Wî digrin û xwestinê Wî ji yêñ xwe jortir diatînin. Wî çaxî emê wan hemû tişta hiz nekin, ci ku Xwedê hiz nake û emê wê yekê hiz bikin, ci ku Ew hiz dike.

Ya duda- Were em tirsa mîriv givtugo bikin. Wextê ku ji mîriv ditirsî, tu hertim nava tirsê, nerihetîyê û şikberîyêdanî.

Wextê ku em dikevine nava tela vê tirsê, em nava revê da dijîn, ji zyanê û gunekarkirinê xwe vedişérin, hertim ji înkarkirinê û dew-dozê xwe dûr digrin. Em bi parastinêva mijûlin û bi qulixkirina bona mîriv, nava qulixkirina bona Xwedê kardar nînin. Bi tirsa ji mîriv, wekî ew ci dikare me bike, emê wê yekê nedine Xwedê, layîqî ci ye Ew.

Kitêba Pîroz dibêje me: “Tirsa mîriv wê te bike nava tev-hevbûnê” /Metelok. 29:25/. Tevhevbûn tele ye. Tirsa ji mîriv serwêriya ji Xwedê dayî didize. Paşê pêşkêşa Xwedê ye nava te da ditemire. Tu idî texmîn dikî, ku bêqewatî, ku kar bikî, çimkî qewata Xwedê idî nava te da kar nake. İshaia 51:7-13 me şîret dike: “Min guhdar bikin, ewênu ku heqîtiyê nas dikin, miletê ku qanûna Min dilê

*Xofa Xwedê, yan tirsa mîriv?*

te da heye, ji mîriv, gotin û buxdanê wî netirsin... Tu kî yî, ku ji mîriv û kurê mîriv ditirsî, yê ku mînanî şînayê çê kirîye û tu Xudanê ku te çê kirîye, bîr dikî”.

Wextê ku em mîriv kêfxwêş dîkin û ditirsin, miqabilî wan derdikevin, bi wê yekê em Xudan bîr dîkin, em ji qulixa Wî dûr dikevin . “Eger min hê bixwesta ez li meriva xweşbihatama, ez nikaribûm bibûma xulamê Mesîh” /Galatî. 1:10/.

Tê bona wî qulixkî û gura wî da bî, ji kê tu ditirsî. Eger tu ji mîriv ditirsî, tê bona wî qulixkî. Eger tu ji Xwedê bitirsî, tê qulixî Wî bikî. Eger tu ji mîriv ditirsî, wî çaxî xofa Xwedê wê cem te tune be, çimkî tu nikarî qulixî du axa bikî /Metta. 6:24/. Ji alîkî mayînva jî tu ji mîriv natirsî, eger xofa Xwedê li cem te heye.

## **Gelo lazime, ku bawarmendê Kitêba Pîroze Nû ji Xwedê bitirsin- xofa Wî li cem wan hebe?**

Xofa Xwedê hînbûna Kitêba Pîroze Kevin nîne. Ew cûrê jîyînê ye. Eger tu Xwedê hiz dikî, wî çaxî tê tenê ji Wî bitirsî. Sawa Xwedê wê hemû tirsa, çawa dibêjin, “daqurtîne”.

Ez gelekî ber xwe dikevim, wextê ku wan meriva guhdar dîkim, yên ku derheqa Xwedê da usa xeber didin, çawa tê bêjî Ew xorkekî cahile û tesmlîkirin û gotinê wana mîaser dike. Eger merivek derheqa Wî da li ser vê fikirê ye, usaye ew bi rastî Xudan nas nake. Şagirtên Îsa ye here nêzîk jî Îsa çawa Xudan, yan jî Serwêr nav dikişin /Yûhenna. 20:28/. Eger em bi cûr'ê sade nêzîkî Xudan dibin, wî çaxî em fikira himberî tabîya Wî ye rast unda dîkin.

Nêzîkbûna vî cûreyî wê bibe menî, ku em bi cûrê bêqedir wê yekê bikin. Tiştê wa em him li civînê û him jî nava emirê “bawarmenda da” divînin. Ew xwe çawa “bawarmend” hesab dîkin, lê gelo cûrê jîyîna wana wê yekê dide kivşê? Ez ber xwe dikevim, wextê ku divînin, ku meriv li civînê çawa dixebeitin. Pêşîya qulixê

ew pêşîya hev dikevin, cî zeft dikan û nerazîbûna xwe didine kivşê, eger yekî mayîn li cîhyê wan rûniştî ye. Ew wextê qulixê bi hevra qise dikan. Paşê radibin û dûr dikevin. Eger ew difikirin, wekî qulixê gelekî dirêj kişand, yan jî ci ku dibihên, wana xweş nayê.

Meriv tev-hev dibe, wextê ku divîne, ku qedirgirtina himberî serwêra li cem wan kême. Ew derheqa qulixçîy ên Xwedê da usa xeber didin, çawa ku prêssa derheqa şuxulkarêن sîasî da. Usa ye gelek qulixçîya mînanî şuxulkarêن sîasî qulix kirine, lê ne ku çawa merivê Xwedê. Feqet, çawa jî hebe, ew xulamên Xwedê ne û dîwan ya Wî ye. Wextê ku em ji Xwedê ditirsin, wî çaxî emê usa jî qedirê mala Wî, xulamên ku Ewî kivş kirine, bigrin. Dawid destê xwe li ser padişê ji alîyê Xwedê da rûnkirî- Shaûl bilind nekir, wextê ku Shaûl 85 kahîn kuştibûn /A Padiş. 22:11-23/. Sawa Xwedê li ser Dawid hebû.

Ez ji wan tişa jî ber xwe dikevim, ci ku bawarmend dibhêن, dinihêrin û dixwînin. Carna, wextê ku ez li malêن wan diquesidim, bona min hewaskar bûye bivînim, ku gelo firqî orta cûrê jîyînêye li malêن wan û merivê başqe heye, yan na?. Nava gera wane bona normalbûnê û naskirîbûnê da wana bîr kirîye, ku Xwedê wê yekê çawa tişte “normal” nav nake, ci ku dinîya wê yekê “normal” hesab dike. Wextê ku tu bi rastî Xwedê hiz dikî û sawa Wî li ser te heye, tê bi emirê pîroz bijîyî.

Petrûs digot:

*“Lê mîna Wî Pîrozê ku gazî we kir, hûn jî pîrozbin nava hemû rabûn- rûniştandina xwe da. Çawa nîvîsare: “Pîrozbin, çîmkî ezî Pîrozim”. Eger hûn wî ra Bavo dibêjin, yê ku bêfirqî dîwana her kesî weke emelén wî dike, ku usaye, vî wextê xerîb- firarîya xweye vê dinê bi xofa Xwedê derbazkin”.*

*A Petrûs. 1:15-17*

Xofa Xwedê menîke mezine, ku em ji bêxwedêtiyê bêne xweykirinê.

## Gelo civîn ditirse?

Nava para kitêba Karêن Şandîyaye duda da şagirt bi Ruhê Pîroz va tijî bûn, bi zimana xeber didan û pîroz dibûn. Ew bi awqasîva tijî bûn, wekî tê bêjî serxweş bûn. Ken û şabûn ji wana dibarî. Xwedê ew qewat dikirin. Ev yek kêfa Xwedê xweş dikir. Xwedê usa nîne, ku ji nexweşîya yekî kêfxweş be. Ew nava hizkirinê, heqîtiyê, aşîtiyê û şabûnê da kêfxweş dibe.

Şagirta gelek meriv dîtin, yên ku nava çend rojên mayîn da xilaz bûn. Lê nava wan da hinek hatibûn, ku duayêن Xwedê bistînin, lê ne ku bona Wî hatibûn. Rûê wê yekê da jî wana qedirê layîq nedane Xwedê. Bere- bere wana destpê kir bi cûrê “sade” nêzîkî Xwedê bin. Derheqa vê yekêda em nava para pêncada, ya kitêba Karêن Şandîya da divînin. Jin û mîrek erdê xwe frotibûn û ji wî erdê firofî parek pêşkêş kirin. Ew pere yê temamîya erd nîbûn, lê wana bi wê yekê dixwest li ber çevê bawarmendên mayîn baş bihatana kivşê. Wana qedirê prosêsa girêdayî ceva ra girt, lê ne ku qedirê rastîyê û pêra jî ew ji mîriv diha gelekî tirsîyan, ne ku ji Xwedê.

Wana ew pêşkêş anî, derew kirin û mirîfî ketin.

Ew mirin, çimkî wana nava hazırîya pesinê Xwedê da derew kirin. Ez vî cûreyî difikirîm /bawarîm, wekî tu jî wî cûreyî difikirî/: “Geleka van roja hema wî cûreyî bi hazırîya serwêra ew yek kirine û nemirine. Bona çî?”

Ez difikirim, wekî menîya wê yekê ewe, wekî hêna kitêba Karêن Şandîya hazırîya Xwedê diha qewat bû, ne ku îro. Mesele, kitêba Karêن Şandîya gîlî dike, ku nexweş qenc dibûn, wextê ku siya Petrus dikete ser wan /Karêن Şandîa. 5:15/. Roja îroyîn em tiştên usa navînin.

Ez difikirim, wekî wextê ku hazırîya Xudan û şikirîya Wî zêde bibe, wî çaxî wê tiştên usa biqewimin, derheqa kîjanada nava kitêba Karêن Şandîya da tê gîlîkirinê. Guhdar be, ku peyî mirina wan ra çi qewimî.

*“Tirseke mezin kete ser temamîya civînê û hemûyên ku ev yek bihistin”.*

*Karêن Şandîya. 5:11*

Qedirgirtina himberî Xudan hate dasekinandinê. Wana fem kir, ku hewce ye, ku ew nêzîkbûna xweye himberî hazirîya Xwedê careke mayîn lê binihêrin. Bîr bîne, ku Xwedê çi gotîye:

*“Ezê nava yêñ nêzîkî min dibin pîrozbim û li ber temamîya cimetê bême pesindayînê”.*

*Q Kahîntiyê. 10:3*

### **Xwedê ku xwe ker dike, dilêñ me têne eşkerekirinê**

Xwedê pesinê Xwe xweyî kirîye ku me bicêribîne û hazirke. Gelo emê wî çaxî bi qedirgirtin nêzîkbin, wextê ku hazirîya Wî neyê kivşê? Gelek cara nava gelek pirsa da civîna îroyîn mînanî lawêñ Îsraîlê dike. Bi gîlîkî Pawlos got, wekî cêribandinêñ wana bona me çawa mesele hatine nivîsarê /A Korintî. 10:6/.

Îsraîlî şâ dibûn, wextê ku Xwedê ew dua dikirin û keremet diqewimî. Wextê ku Xwedê behra Sor vekir, ew li ser erdê zîha ra derbaz kirin û wextê ku dijminêñ îsraîlîya niqoyî binê avê kirin, ew bona serketinê distiran, direqisîn û dikirine qîrîn /Derketin. 15:1-21/. Peyî çend roja ra wextê ku qewata Xwedê kivş nîbû, lê xurek jî xilaz bibû, wana miqabilî Xwedê ber xweda xeber didan /Derketin. 15:22/.

Dîha dereng Mûsa cimet anî nêzîkî çîyayê Sînayê, bona ku wana pîrozke, ku ew li ber Xwedê hazirbin. Xwedê li ber çavê temamîya cimeta Xwe peyîyî li ser çîyê bû. Ew yek saw pêşda anî, çimkî li ser çîyê evrekî reşe terî peya bû. Paşê Mûsa bona rasthatina tevî Xwedê cimet ji wî cîhyî derxist, lê “cimetê dît, paşda vekişîya û dûr sekinî” /

*Xofa Xwedê, yan tirsa mîriv?*

Derketin. 2O:1O-18/. Ew ne ku ji tirsa Xwedê paşda vekişîyan, lê rûê tirsa bona emirê xwe. Wextê ku Xwedê peya bû, eşkere bû, wekî ew emirê xwe diha gelekî hiz dikan, lê ne ku Xwedê.

Cimetê gote Mûsa: “Tu tevî me xeberde û emê guhdarîya te bikin, lê bira Xwedê tevî me xeber nede, ku em nemirin”. Mûsa gote cimetê: “Netirsin, çimkî Xwedê hatîye we bicêribîne, wekî xofa wî ser we ye, ku hûn guneha nekin” /Derketin. 2O:19,2O/.

Guhdar be, wekî xofa Xwedê qewatê dide te, ku tu nekevî nava guneh. “Bi tirsa Xudan merivê ji xirabîyê dûrkeve” /Metelok. 16:6/.

Nava derketinê da- 2O-21-ê da serhatî dûmayî dike. “Cimet dûr sekinî, lê Mûsa çû nêzîkî wê terîya severes bû, wê derê, ku Xwedê lê bû”. Mûsa gote Xwedê, ku wana çi gotibû û ew çawa tirsîya bûn. Xwedê cab da: “Min ew xeberên ku evî miletî gote te, bihîst. Hemû çi ku wana got qencin. Xwezî nêt- fikirên wan her gav ev bin, ji min bitirsin û hemû emirên min biqedînin, wekî wan û zarokên wan ra heta-hetayê qencbe” /Q Ducarî. 5:28,29/.

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî cimet paşda vekişîya, lê Mûsa diha nêzîk bû. Ev yek firqîya orta Mûsa û Îsraîlê da dide kîvşê. Li cem Mûsa xofa Xwedê hebû, lema jî tirsa wî tune bû. Ew meriv bêyî xofa Xwedê bûn, bona vê yekê jî ew tirsîyan. Xofa Xwedê te ne ku dûr dixe, lê dikişîne, dibe nava hazirîya Xwedê. Çawa jî hebe, tirsa ji mîriv dibe menî, ku tu ji Xwedê paşda vekişî.

Wextê ku em tirsa mîriv va girêdayî ne, wî çaxî em xwe nava hazirîya mîrivda baş texmîn dikan, lê ne ku ya Xwedê. Menî ewe, wekî hazirîya Xwedê dilê te vedike.

## **Ne ku Sîna, lê Sîyon**

Bona ku em azuru bikin, wekî xofa Xwedê rastîya Kitêba Pîroze Nûye, em paşda vegerine ser evê berbirîbûna kitêba Îbranîya:

*“Hûn mîna cimeta Îsraîlê nêzîkî çîyaê ber çeva nebûne,*

*yê ku bi agir vêketibû, bi terî- terîstanîyê, mij-dûmanê û bobelîskê va girtîbû, ku li wir borîn lê diket û dengê gotinê dihat. Gava yên ku ev deng dibhîstin, hîvî diki- rin, ku idî xebereke din wan ra neyê gotinê, çimkî li wê fermanê taw nedikirin, ku digot: “Eger rewrek jî nêzîkî çiyê be, gerekê bidine ber kevira”. Ev dîtina ber çava usa saw bû, heta ku Mûsa jî got: “Ez ditirsim û dile- rizim”. Lê hûn nêzîkî çiyayê Sîyonê bûne...”*

*Îbranî. 19:18-22*

Ya ewlin tîne bîra me, ku li ber çiyayê Sînayê çi qewimî. Paşê me ra derheqa çiyayê Sîyonêda tê gotinê. Li ser dinîayê Xwedê derheqa çiyayê Sînayê da xeberda. Niha jî hema ew Xwedê ji ezmîn derhqa çiyakî nû Sîoynê da xeber dide.

*“Idî haj xwe hebin, nebe ku hûn ewî we ra xeber dide, texsîr bikin. Eger ewên ku li ser dinîyayê Mûsa texsîr kirin, kîjanî ku temîyên Xwedê didan, xilaz nebû, idî emê çawa bikaribin xilazbin, eger em pişta xwe bidine yê ku ji ezmana me ra xeber dide? ”.*

*Îbranî. 19:25*

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî gunekarkirina me diha gelekî berke,wextê ku em gurê nakin û dengê Xwedê guhdar nakin.Ew pêşkêş, ku ji alîyê Xwedê da hatîye dayînê,bi saya heca Nû, bona wê yekê nîne, ku em ewê bona jîyîna xweye baş bidine xebatê. Gelo îsraêlîya bona çi guhdarîya dengê Wî nekirin?. Ew bêyî xofa Xwedê bûn.Wextê ku tu dixwînî, vê yekê bîra xwe da xweyke û tê zelal bivînî, wekî Kitêba Pîroze Nû da meriva hema bi vê menîyê jî guh- dar nedikir.

*“Awa em vê yekê bişêkirînin, ku em padişatîke nehejîayî distînin û bi vî awayî bi xof û tirs Xwedê*

*Xofa Xwedê, yan tirsa mîriv?*

*bihebînin, çawa ku li wî xweş tê, çimkî Xwedê yê me agirê peritandinê ye”.*

*Îbranî. 12:28*

Guhdar be, wextê ku tê gotinê: “bi tîrsê û xofê”. Eger xofa Xwedê tenê bi qedirgirtinê va bihata sînorkirinê, xudanê nivîsarê wê xebera “tirs”ji ya mayîn dûr nexista, başqe nekira. Guhdarîyê usa jî bide ser wê yekê, wekî xudanê nivîsarê texmîn nedikir, ku “Xwedê hiz dike” lê serbara ser da “Xwedê xwedê yê agirê peritandinê ye”. Ev elametîya derheqa Xwedê da şirove dike, ku bona ci cimeta Îsraîlê ji hazirîya Wî paşda vekişîya. “Ev agirê hanî mezin wê te hûfi xwe bike, wekî em dîsa dengê Xudan Xwedêyê xwe bibhên, emê bimirin” /Q Ducarî. 5:25/.

Belê, Xwedê hizkirine, lê Ew usa jî agirê peritandinê ye. Li civîn êd xwe me derheqa hizkirina Xwedê da gotîye, lê me hindik derheqa xofa Xwedê da bihîstîye. Şêwira Xwedê ye tomerî me ra nehatîye gotinê, texmînkirinêmeye derheqa hizkirinê da nav-hev xistîne.

Hizkirina ku em derheqa wê da xeber didin siste. Ewê hizkirinê rêberîya meye berbi emirê pîroz nekirîye. Ew avê dike li ser agirê me û me golî dike. Em bûne mînanî zarokên rûstendî, yên ku qedirêbavê xwe nizanin. Eger em nava xofa Xwedê da mezin nabin, wî çaxî qeziya heye, wekî ew tiştén ku Xwedê çawa yê pîroz hesab dike, dikarin bona me bibine yê sade.

Guhdarîyê bide ser van xebera: “Bi vî awayî bi xof û tirs Xwedê bihebînin, çawa ku li wî xweş tê” /Îbranî. 12:28/. Pêşkêşa Xwedê bona wê yekê nîne, ku em qedirnegirtinê û guna veşîrin. Ew karebûnê dide me, ku em bi cûrê layîqî Xwedê qulixkin. Qulixkirina bi cûrê layîq qulixa bi hizkirinê dide kivşê, ya bi qedirgirtin û bi xofê.

Pawlos serda zêde dike: “Bi xofê û bi lerizandinê, bona xilazbûna xwe qulixkin” /Filîpî. 2:12/. Gelo tirs û xofa me li kuderê ye?. Me bîr kirîye, wekî Ew Hakimê heqe. Gelo me gunekarkirina Wî bîr kirîye?. Bi guhdarî wan xebera bixwîne:

*“Kubar nebe, lê bitirse. Çimkî eger heyfa Xwedê çiqlên binyatî nehat, heyfa wî wê te jî neyê. Awa dîna xwe bide şîrinayî û hêrsa Xwedê, ew hêrse nava ji rêketîya da û şîrine hindava te da, eger nava şîrnayê da bimînî, lê eger na, tê jî bêyi birînê”.*

*Romayî. 11:2O-22*

Em derheqa rehmbûna Xwedê da baş zanin. Lê çawa jî hebe em gerekê tenê rehmbûna Wî hesab hilnedin. Em gerekê usa jî berkbûna Wî fem bikin. Rehmbûna Wî me nêzîkî dilê Wî dike, lê berk’bûna Wî me ji kubarîyê û guna xweyî dike. Eger meriv tenê rehmbûnê hesab hiltîne, wî çaxî ew bi wê yekê tirsê încar dike, bi kîjanê ji kubarîyê xweyî dike. Lê eger wî cûreyî meriv tenê berkbûna Xwedê hesab hiltîne, wî çaxî ewê bi cûrê hêsa bikeve nava tela qanûnparastinê. Herdu jî, him hizkirina Xwedê û him jî xofa Xwedê te nava vî emirî da xweyî dike.

Ez gumanim, wekî tu fem dikî, wekî ez bi zanebûn derheqa xofa Xwedê da dibêjim, kîjan niha li civînên me gelek cara nayê hesabildanê. Ez bi hizkirina bêşînor Xwedê hiz dikim û ez şame, bona bûyîna lawê Wî û qulixkirina bona Wî. Ez zanim, wekî hema rehmbûna Xwedê me berbi tobekirinê dibe /Romayî. 2:4/. Ez usa jî zanim, wekî hema xofa Xwedê û dîwana Wî me ji gunehyên duşurmîşbûyî dûr xweyî dike.

“Çimkî eger me rastî nas kirîye, qebûl kirîye, peyî ra bi hemdî xwe nava gunah da bimînin, idî vir şûnda bona baxşandina guna qurban berga tu tiştî nagire, lê tenê li lerizekê dimîne hîvîya dîwanê û kûra agir, ku wê yên miqabilî Xwedê hûfî xweke. Yekî eger Qanûna Mûsa biteribanda, gava du yan sê şede hebûna, bêrehm dihate kuştinê. Lê texmîna we, ewê hê çiqasî hêjayî cezayê giran be, yê ku Kurê Xwedê daye bin pîyên xwe û xwîna peymanê heram hesab kirîye, bi kîjanê ew paqij bû û Ruhê keremdayînê bêhurmet kirîye?. Belê, em wî nas dikin, yê ku got: “Heyfildan ya mine, ezê hilînim”.

*Xofa Xwedê, yan tirsa mîriv?*

Û dîsa: “Xudan wê dîwana cimeta xwe bike”. Tiştekî bêwa ye, ku bikevine destê Xwedê yê sax!” /Îbranî. 1O:26-31/.

Meriv dikeve nava wan guneha, wextê ku wan tişta, ci ku Xwedê pîroz hesab dike, çawa tişte ne ferz hesab dike. Em gelek cara bi sivikayî nêzîkî wan tişta dîbin, kîjana Xwedê ferz /girîng/ hesab dike û ew tiştên ku Xwedê girîng hesab nake, em peyî wana dikevin. Bona me tişte herî girîng ewe, ku em li ber meriva xwe bi qedir bidine kivşê.

Min meriv nas kirine, kîjan ketine nava tela guneha û çawa ku wan ra dest dida, digotin, ku ew Îsa hiz dikin. Wana halê xweyî Ruhanî bi wê yekê va didane kivşê, ku ew himberî Îsa ci texmîn dikin. Lê gelo ew Îsa awqas hiz dikin, ku hazirin bona guneha bimîrin? Na xêr, li cem wan xofa Xwedê tune.

Carekê ez çûme zindanê li cem qulixçîkî, yê ku ketibû nava ruşetxwerinê û rîderketinê. Ewî min ra got: “Con min hertim Îsa hiz dikir, hela wî çaxî jî, wextê ku ez xapîayî bûm. Îsa Xilazkirê min bû, lê ne ku Xudanê min”. Ewî ji tirsa ji mîriv qîrar qebûl kiribû. Ewî xwestibû li ber meriva xwe baş bide kivşê. Evê yekê jî ew biribû berbi tiştên wî cûreyî. Zindanê da Xwedê hizkirina Xwe û rehma Xwe nîşanî wî kir û ew hînî xofa Xudan kir. Niha xofa Xudan li ser wî heye.

## **Bi înkarkirina teglîfkirina Xwedê**

Bi paşdaçûyîna li ser mesela çiyayê Sînayê, ez dixwezim tiştekî bidime kivşê, kîjanê meriv gelek cara navînin. Xwedê him Mûsa ra, him jî Harûn ra got, ku ew hilkişine li ser çiyê /Derketin. 19:24/. Mûsa hilkişîya serê çiyê, lê rûê hinek menîya da em Harûn dîsa li binatara çiyê divînin /Derketin. 32:1/. Ez difikirim, wekî Harûn paşda vegerîya cem cimetê, çimkî ewî xwe li wir nava bêqeziabûnê da texmîn dikir, lê ne ku nava hazırlîya Xwedê da. Gelo roja frôyîn em li civînê xwe usa nînin?. Bona me çûyîna li civînê, hevaltîya tevî

mesîhîyên mayîn, mijûlbûna bi borcdarîy ên xweye qulixêva diha başin, ne ku bûyîna tevî Xudan. Em ji wê yekê dûr dikevin, ku tevî Xudan tenê bimînin, lê dewsa wê yekê em bi meriva va têne dorgirtinê û şuxulê xweva mijûl dîbin, bi wê gumanê, wekî evê valaya me veşêre.

Ji alîkî mayînva jî, dilê Hêşû hema ew dil bû, yê ku Xwedê xwestibû. Ewî dixwest ku çiqas dikare awqas gelekî nava hazirîya Xwedê da be. Hetanî ku Mûsa tevî Xwedê bû, Hêşû 4O rojî li jêra çiyê bû /Derketin. 32:17/. Ew awqasî nêzîkî Xwedê bû, çiqas ew dikaribû. Lê ew neçû li wir, li kîderê tenê Mûsa û Harûn hatibûne teglîfîkirinê. Xofa Xwedê awqas nava Hêşû da hebû, wekî ew nikaribû kubar û xwehiz bûya.

Wextê ku Hêşû li binatara çiyê hîvîyê bû, cimet çiqas diçû, awqas nerihet /xemgîn/ dibû. Ew li wî cîhyî bû, rêberê wan jî ji mehekê zêdetir bû ku çûbû, lê Xwedê jî hetanî niha Xwe eyan nedikir. Meriva destpêkir himberî Xwedê û Mûsa şikber bin:

*“Gava cimetê dîna xwe dayê, ku Mûsa derengî dikeve,  
ji ser çiyê nayê xarê, hingê cimet topî cem Harûn bû  
û gote wî: “Rabe me ra xwedêya çê bike, ku pêşîya  
mekevin, çîmkî ew Mûsa yê meriv, yê ku em ji welatê  
Misirê derxistin, em nizanin ci hate serê wî”.*

Derketin. 32:1

Wana dida kivşê, ku qedirê Xwedê digrin û ji Wî ditirsin. Meriva nerazîbûna xwe dida kivşê: “O! Mûsa. Ew gelekî qewate. Tu Wî ra xeberde û elamî me bike, ku Ewî ci got. Emê guhdarkin û gurê da bin”. Wana teze dîtibû, ku Xwedê çiqas qewate, lê pê ra jî xofa Xwedê li cem wan tune bû. Niha, wextê ku Xwedê xwe ker kir, sidqê wanî rast eyan bû.

Wextê ku Xwedê keremet dikirin û qewata Xwe nîşan dikir, wî çaxî gelekî hêsa bû ji Xwedê bitirsin. Lê Xwedê yên usa digerîya, yên ku wê wî çaxî jî qedirê Wî bigirtana û ji Wî bitrsîana, wextê ku

*Xofa Xwedê, yan tirsa mîriv?*

Li ser xwe hazirîya Wî yan jî qewata Wî texmîn nekirana. Xwedê yên usa digerîya, ku mînanî wan zaroka bûna, yên ku wî çaxî jî gurêdanin,wextê ku bav guhdarîyê nade ser wana. Gurêdabûna rast bona nîşandayînê nîne.

Xwedê gote Îsraêlê: “Ne Min xwe ker kirîye, ew jî zûva û tu ji Min natirsî?” /Îşaya. 57:11/.Bona Wî ev pirs gelekî girîng bû: “Bona çi cimeta Min ji Min natirse?”. Paşê Ewî caba pirsa Xwe da û şirove kir, wekî cimet ji Wî nedîtirsîya, çîmkî hinek wede Ewî qewata Xwe ye mezin eyan nekiribû.Bi gilîkî mayîn gotî,wextê ku meriva kar û şuxulên Wî ye mezin nedidîtin, xwe usa xweyî dikirin, tê bêjî Ew ne li wir bû. Xwekerkirina Xwedê dilê meriva ye rast eşkere dike.

Bawarmendê rast nava qûmistanê da, wextê cêribandina tê kivşê, lê ne ku wextê qulixa. Çawa ku meriv xwe wextê “hukmkirina” li ser xwe dide kivşê, ew bi rastî wî cûreyî ye. Binhêre, ku Harûn bin hokum da çi kir:

*“Harûn gote wan: “Guharêن zêre ku guhêن jinêن we, kurêن we û qîzêن wedanin, derxin û bînine cem min”. Ü temamîya cimetê guharêن guhêن xwe da ye zêr derxistin û anîne cem Harûn. Harûn ew ji destêن wan hildan, cûre dayê û golikek ro kir. Gotin: “Eve Xwedê yê te, Îsraêlê, yê ku tu ji welatê Misirê derxistî”.*

*Derketin. 32:2-4*

Wana tiştekî wî cûreyî çê kir, lê tiştê herî xirab ew bû, wekî Harûn, yê ku gerekê hilnekişîya çiyê ew yek çêkir. Ew xeberdankirê Mûsa bûye. Harûn li rex wî sekinibû û hemû tiş dîtibû. Lê niha ew ji meriva tirsîya û ew yek da wana, çi ku wana dixwest. Harûn ji mîriv diha gelekî ditirsîya, ne ku ji Xwedê û bona wê yekê jî ew gelekî rehet ji meriva tirsîya. Nava Harûn da mîrxasî tune bû, pêşkêşa Xwedê temiribû. Evê yekê jî ew kire rîberekî sist.Wextê ku Mûsa miqabilî Harûn derket, Harûn cimet gunekar kir, ji kîjanê ew tirsîayî bû.

*“Harûn gotê: “Bira xweyê min hêrs nekeve. Tu vê cimetê nas dikî, ew xirabiê ra hazirin. Gotine min: “Me ra xwedêya çê bike ku pêşîya me kevin, çimkî ew Mû-sayê meriv, ku ji welatê Misirê derxistin, ci hate serê wî”. Min jî gote wan: “Zêrê kê heye, bira derxe”. Wan dane min, min jî ew avîtine li nav êgir, ev golika derket””.*

*Derketin. 32:22-24*

Harûn bona kirina xwe cabdarî hilneda ser xwe. Belê, qîmetkirina wî ye bona cimetê rast bû. Ew yek fikira wan bû, lê ne ya Harûn. Lê Harûn ji wana ditirsîya, ew awqas qewat nîbû, ku bikaribûya tirsa ji cimetê bişkênda û wî cûreyî rêberî li wan bikira.

Ew rêberên, ku ji meriva ditirsin, wê paşda vekişin û wan tişa bidine meriva, ci ku ew dixwezin. Ew rêber rehet dibine qurbana tirsê. Wextê ku rêber ji meriva ditirse, ewê pêşketina rast nevîne, ne nava xwe da ne jî nava cimeta xwe da.

Ew merivê ku ji Xwedê ditirse, difikire, ku Xwedê derheqa Wî da ci dibêje. Ew merivê ku ji meriva ditirse, difikire, ku meriv derheqa wî da ci difikirin, lê ne ku Xwedê. Bona bêhurmetnekirina meriva, ew Xwedê bêhurmet dike.

Min rêber dîtine, kîjana qirar kirîye wan tişa bide meriva, ci ku ew dixwezin. Menîya wan ewe, ku nava meriva da ew eyan bin. Ewana tu cara wê ewê yekê qebûl nekin. Ew qirarêن xwe bi van menîya afû dikan: “Em naxwezin meriva bêhurmetkin”, “Eva me cala here başe, ya ku hemûya razî dike”, “Bi vî cûreyî em dikarin qulixî gelek meriva bikin”. Padişatîya Xwedê dêmokratîya nîne, ew padişatîye. Eyanbûn ferz nîne. Wana texmîn nedikir, wekî ew ji tirsê usa dikan. Kirinêن wan ne ku nava hizkirina himberî meriva hatine hîmdanînê, lê nava xwehizîya wandanin.

*Xofa Xwedê, yan tirsa mîriv?*

## Çi diqewime, wextê ku em ji Xwedê natirsin?

Xwedê gote Mûsa: “Xwezî nêt-fikirên wan her gav ev bin, ji min bitirsin, hemû emirên min biqedînin, wekî wan zarokên wan ra heta-hetayê qencbe” /Q Ducarî. 5:29/. Feqet meriv netirsîyan û niha dîna xwe bidinê çi qewimî.Xudan gote Mûsa: “Xwe ra meriva bişîne, ku cesûsiya erdê Kenanê bikin, ku ezê bidime zarokên Îsraêlê” /Jimar. 13:2/. Guhdar be, wekî Xwedê got: “Ez... gerekê bidim”. Ewî got, ku cesûsiya welêt bikin, bivînin ku dikarin wî hildin.

Bi vî cûr’eyî Mûsa ew şandin. Çil roja wana li welêt cesûsi kir û dîtin, wekî binelî li vir cî-war bibûn, lê bajar gelekî mezin bû û parastî bû.

12 ce’sûsa hema ew meriv, hema ew esker, hema ew bajarêن qewîn dîtin. Hêşû û Kaxêb hazır bûn, ku carekê ra herin û wê yekê hildin, çi ku Xwedê soz dabû.Feqet deh cesûsên mayîn ji wê yekê tirsîyan, çi ku dîtin.Wana eskerêن mezin dîtin, lê Hêşû û Kaxêb dîtin,ku Xwedê çiqas rehm û raste:

Deh cesûsa cimetê ra gilî kirin, ku nikarin vî welatî hildin. Ewana ji 24 hezar sala zêdetir kole bûne, nava şêr da hazır nîbûne, çawa ku wana li cem eskerê vî welatî dît. Cimet carekê ra tirsîya û destpê kir nerazîbûna xwe elamke:

*“Gelo bona çi Xudan me dibe li wî erdî? Wekî em bi şûr bêne qirê? Jin û zarêr me talan herin. Gelo me ra ne qence em vegerine Misirê?”.*

*Jimar. 14:3*

Nava vê gotinê da em koka tirsa meriva divînin: “Gelo li wî welatî wê bona me diha baş nîbe?”. Ev meriv tirsîyâ bûn, çimkî ew derheqa xwe da difikirîn. Wana negot, ku gotina Xwedê ya here başe. Dewsa wê yekê wana dipirşî: “Tiştê herî baş bona me kîjane?”.

Çawa vê yekê fem bikin?. Koka tirsa mîriv xwehizî ye. Wextê ku tu emirê xwe hiz dikî, dicedînî wî xilazkî. Tê ji wî hemû tiştî bitirsî, çi ku bona emirê te qezîa ye. Xwedê ew meriv anîne cîhekî usa, li kîderê bijartineke başqe tune bû, lê wana gerekê gumana xwe bida ser wî. Meriva texmîn dikir, wekî binelîyên evî welatê nû wê wana qirkin. Dewsa wê yekê ku gumana xwe bidana ser Xwedê, usa derdiket, tê bêjî Xwedê ew ji misirîya xilaz kiribû bona wê yekê, niha jî anîbû ku ew ji alîyê kenanîa da bihatana kuştinê. Eva bi rastî tiştekî nêzîkî aqila nîne, lê gelek cara lazim dibe, bi çûyîna peyî Xudan bikevî nava halê vî cûreyî, kîjan bona emirê me qezîaye.

Nava qewilêن wî cûr'eyî da em tenê wî çaxî dikarin peyî Xudan herin,wextê ku em dilên xwe da zanin, wekî Xwedê rehme. Nava wî da hemû tişt rehme. Ewê tenê bona kara Xwe tu tiştekî neke, kîjanê zyanê bide me. Em gerekê bîr bînin, wekî Xwedê ji alîyê heta-hetayê da dîwanê dike, lê meriv bona 7O- yan 8O sala.

## **Înkarkirina Xwedê, yan ya mîriv?**

Kaxêb û Hêşû rîya çetin bijartin. Xwedê got, ku nava wan da ruhekî başqe hebûye û ew bi temamî peyî Wî diçûn. Yêن mayîn nedixwestin gura Xwedê da bin û xwe bikine bin qezîyaê. Xwedê himberî Kaxêb û Hêşû rast bû.Ewana merivên wê nisiletêye tek-tenê bûn, yêن ku ketine welatê sozdayî /Jimar. 14:24,3O/.

Ewêن ku cedandin emirê xwe xilazkin, wana emirê xwe unda kir. Xwedê derheqa pêşeroja wan da xeberda û got: “Lê cinyazêن we wê li vê qûmistanê bikevin... û hûnê înkarkirina Min nas-kin” /Jimar 14:32,34/. Wextê ku tu fem dikî, wekî gelekê ji alîyê Xwedê da bêne înkarkirinê, çimkî ew ditirsin ji alîyê meriva da bêne înk’arkirinê, tu carekêra têyî ser hişê xwe.

Ez dua dikim, wekî em hemû hînbin, ku ji tirsa Xudan kêfxwes

*Xofa Xwedê, yan tirsâ mîriv?*

bin, çimkî “tirsâ Xwedê kanîya dua ye...”.

Serê kitêbeyî mayîn da tê bivînî, ku çawa xofa Xudan wê alî te bike, ku tu wextê tirsê nava xwestina Xwedê da bigerî.

*Xofa Xudan îtbarîyê û serxwebûnê tîne*

## **Bişuxulin, yan cabê bidin?**

**T**irs dikare bi rîya qewimandina, fikira, yan jî bi destê meriva pêşda bê. Gelek meriv miqabilî wê tirsê şer dîkin, kîjan bi destê merivên baþqe tê. Tîrsa mîriv hema vî cûreyî ye. Tîrsa himberî mîriv mecbûr dike, ku em ji înkarkirina mîriv, xeyîdandinê û miqabilderketinê dûr bimînin, bi hesab hilnedana wê yekê, wekî em wî cûreyî Xwedê înakar dîkin. Eger merivek ji merivekî mayîn ditirse, bi wê yekê ew Wî bêhurmet dike, kîjanî ew nikare biyîne, bona ku wî bêhurmet neke, kîjanî ew divîne.

Îsa me ra dibêje: “Ez we pismamên xwe ra dibêjim, ji wana netirsin, yên ku bedenê dikujin, ji wê pêştir tiştekî din nikarin bikin. Lê ezê we ra bêjim, ku hûn ji kê bitirsin. Ji wî bitirsin, yê ku peyî kuştinê ra jî hukumê wî heye ku biavêje cehnemê. Belê, ez we ra dibêjim ji Wî bitirsin” /Lûqa. 12:4:5/.

Eger tu ji meriva ditirsi, wextê ku Xwedê nava çetinaya û tengasîa da rêberîyê te dike, tê bicêribînî xwe biparêzî û xweykî, dewsa wê yekê, ku tu xwestina Xwedê bigerî, tê bicêribînî ya xwe bikî. Feqet eger xofa Xwedê li cem te heye, tu dikarî nava her

çetinayîkê ra derbaz bî û bi wê yekê qedirê Xwedê bigrî.

Wî çaxî tu fem dikî, wekî tenê Ew dikare te xweyke. Tê guman bî, wekî Xwedê zane, ku nava sîstêma qîmetîyên heta- hetayê da tiştê herî baş kîjane.

Derheqa xofa Xudan da sozdayîneke qewat nava kitêba Metelokada heye:

*“Nava xofa Xwedê da îtbarîya qewat heye û ew yek gerekê bona lawên Wî bibe guman. Xofa Xudan kaniya dua ye, ku tu ji bobelîskên mirinê dûr bimîni”.*

*Gotinêن Silêman. 14:26,27*

Ji alîkî mayîn va jî Kitêba Pîroz zelal dibêje:

*“Tirsa mîriv wê te biavêje nava bobelîskê”.*

*Gotinêن Silêman. 29:25*

Tirs yan bobelîske, yan jî tele ye, lê xofa Xudan îtbarîyê û serxwebûnê tîne. Evana hema ew mecalin, bi kîjana hûn ji tela tirsê aza dibin.

## **Hukum eşkere dike**

Ez dixwezim du padişa himberî hev bikim. Ewana herdu jî serkarîya wê padişatîyê dikirin, herdua jî dîsa ew Xwedê dihebandin. Ji wana yek ji Xwedê hate înkarkirinê, lê yê mayîn Xwedê çawa merivê himberî dilê Xwe qedirê wî digit. Bi himberîhevkirina emirên wan meriva bona me firqîya orta /navbera/ xofa Xwedê û tirsa mîriv da zelal û femdarî dibe. Werin em qewimandineke nelêkolînkirî, ya ji emirê Shaûl binihêrin. Serhatî eve.

Îdî serê du sala bû, ku Shaûl padişatî dikir. Mînanî nava gelek qewimandina da, xeysetê wî yî rast nava wî wedeyîda eşkere nebû.

*Bışuxulin, yan cabê bidin?*

Peyî hinek wede ra ew tişt eyan bû.

Wextê ku Şaûl tevî leşkerên xwe ye here baş li Makmasê bû, filistînî berev bûn û miqabilî wî şer destpê kirin /A Padiş. 13:5-15/. Eva eskerê here qewat bûn, yê ku rastî Şaûl hatin. 3O-î hezar fayton û şes hezar sîyarên dijmin hebûn, lê reqema leşkera jî mînanî qûma li ber behrê. Bê şikberî eva eskerekî gelekî mezin bû. Şerkirina miqabilî 3O-î hezar faytona hema ewe, ku tu miqabilî 3O-î h'ezar tanka bisekinî. Bi wê yekêva tevayî esker awqas mezin bû, meriv nikaribû hesab bikira. Bona eskerê Îsraîlê eva tiştekî gelekî giran bû.

Leşkerên Şaûle tırsîyâ xwe veşartin. Ew tırsîyâ bûn. Hinek pîya revîn, lê yên ku peyî Şaûl diçûn, ji tırsê dilerizîn.

Pêşîya şer Îsraîl gerekê li ber Xudan gorî bikira. Samûêl ji alîyê Xudanda gotibû Şaûl, wekî wextê wedê qirarkirî ewê hazır be ku li ber Xudan gorî bike. Şaûl “Weke wedê ku Samûêl qirar kiribû hîviyê sekinî, lê Samûêl nehat û cimet ji cem wî bela bû” /A Padiş. 13:8/.

Bin hokum da Şaûl got: “Gorîyê û qurbana aşîfîyê bînine cem min”. Ewî gorî kir û wextê ku teze xilaz kiribû, Samûêl hat.

Samûêl ji Şaûl pirsî, ku ewî çi kirîye. Guhdarîyê bide ser caba Şaûl:

*“Min dît, ku cimet ji cem min bela dibe û tu roja qirarkirî nehatî, lê filistînî nava Makmasê da berev bûne. Wî çaxî min got: “Filistînî wê niha peyîyâ li ser min, li Gaxgaxyê bin û min dua yê Xudanî ewlin nekirîye. Min bi mecbûrî gorî kir””.*

*A Padiş. 13:11,12*

Samûêl miqabilî Şaûl derket û gote wî, ku ewî rast nekirîye.

Bi vî cûreyî me dît, ku çi qewimî û niha tu xwe dayne dewsa Şaûl. Tu rêberî, tu û merivên te hevt roj in, ku rastî eskerekî mezin hatine. Reqema dijmin zêde ye û cêrg ên wana roj bi roj diha zêde

dibin, lê eskerê te jî kêm dibe. Merivên te ji dijmin ditirsin û bi xwe dihêlin, direvin. Çend merivên mayîn jî ku mane, tırsîyâ ne. Tu dîsa hîvîya milyaketê Xwedê yî, lê ew jî wede da nayê, ku gorî bê kirinê.

Hukumekî mezin li ser te heye. Ev jî halekî mînanî “dezgehê bizire”. Ewênu ku li dor-berê te ne, te lez dêxin: “Tiştekî bike, yan na emê hemû bimirin”. Tê hîvîyê bisekinî, çawa ku Xudan gotîye, yan tê gavekê bona xilazkirina xwe biavêjî?

Ev bû ew hal, kîjan rastî Şaûlê Padişa hatibû /A Padiş. 13:1-8/. Te-lebext ra ew bin hokum da şikest. Ew gurê da nema û wî cûreyî qurban da. Niha xweafûkirina Şaûl binihêre: “Filistînî wê niha bêne ser min... Min bi mecbûrî gorî kir” /A Padiş. 13:12/. Ewî wî çaxî usa kir, ku li ber çavê meriva xwe alîyê başyê da bide kivşê, lê paşê jî cêriband li ber çavê Samûêl xwe çawa yekî ruhanî bide kivşê. Bi rastî ew kete bin hukumê meriva û pêra jî kete tela tırsê.

## **Tiştekî bike**

Gelek cara tu rastî halê vî cûreyî têyî. Gelo tu qet vî cûreyî fikirîyî: “Ez zanim, wekî Xwedê min ra dibêje, ku hîvîyê bisekine, lê ez mecbûrim, gavekê biavêjim, ku evî halî biguhêrim”.

Ez ketime nava halên usa, wextê ku hevalên min, yan jî ew merivên ku bin serwêrtîya min da bûne, ji min tewaqe kirine: “Con, tu gerekê tiştekî bikî”. Lê min dilê xwe da zanibûye, ku Xwedê vî cûreyî navêje. Ewî xwe ker kirîye.

Tiştekî çetin jî ewe, wekî tu gerekê hîvîya Xwedê bî, îlahî wî çaxî, wextê ku Ew tu tişfî navêje. Roja îroyîn jî gerekê usa bê kirinê. Li Amérîkayê tevî gelek mecalên me û pera, em dikarin wî çaxî jî tiştekî bikin, wextê ku Xwedê nalive. Em bi tabî û karebûna xwe, lê bêyî Xwedê, dikarin tiştekî bikin û bidine kivê, ku ew yek ji Xwedê ye.

Wextê ku qebûlkirina qirara tê, em gelek cara nikarin gotinekê ji Kitêba Pîroz bivînin, kîjanê rêberîyê li me bike. Em borcdarin bi-zanibin, ku Xwedê hertim çi dibêje. Feqet wextê ku tê texmînkirinê,

ku Xwedê xeber nade, wî çaxî Ew bi rastî xeber dide. Ew dibêje: “Wê yekê rast mîaser bike, ci ku min tera gotîye. Tu tişt nehatîye guhastinê”. Ev yek wî çaxî çetin dibe, wextê ku em bin hukumê tîrsêdanin.

Ez dixwezim gotinekê wera bêjim, kîjan Xudan rojêna sala Nû da min. Ez li welatekî der bûm. Ez kûraya xewêda bûm, çimkî ji sefera, rîya 46 sehetê, û usa jî rojê du cara derbazkirina qulixê, bêqewat bibûm.

Şev seheta duda ez nişkêva ji kûraya xewê hişyar bûm. Min zanibû, wekî tenê Xudan dikaribû vî cûreyî min hişyar bike, çimkî peyî razana sê seheta ra, ez idî li ser xwe bûm. Xudan gotinek da min, derheqa kîjanêda minê xeber neda, çimkî ew ya şexsî bû. Fejet ez bawarim, wekî Xudan izinê dide min, ku ez derheqa wê yekê da xeberdim, bona ku ez vê pirsê bidime zelalkirinê. Ez bawarim, wekî ji we gelek ketine nava vî halî û ev yek wê hal bide zelalkirinê. Niha ezê parekê ji wê gotinê raber bikim:

*“Tu ketî nava halê ne zelal û bi wî cûreyî hatî cêribandinê. Min izin nedaye, ku tu fikirên xwe topî ser hev bikî, bona ku Ez bivînim, ku gelo té bêyî rêberiya Min gava biavêjî yan na. Ew yek gelekî Min xweş hatîye, wekî wextê xwekerkirina Min te tu tişt nekiriye. Te tu tişt nekiriye, çimkî Min tu tişt negotîye û te bernemên xwe mîaser nekirine, bi wê gumanê, wekî ew yên Min in. Niha li cem te merkezkirina guhdarîye mezin wê hebe. Ezê bernemên /progiramên/ mezin û cuda bidime te û jina te, kîjanê şabûnê bona we herdua jî bîne”.*

Xudan wî çaxî tevî min xeberda, wextê ku nava emirê min û jina minda me pêşketin nedidît. Xwestin û hewcetîyênmeye şexsî hebûn, kîjan mîaser nedibûn. Em herdu jî çend sala bin hukumekî mezin da diman. Hevalên me şêwir didane me, ku em gava biavêjin. Lê me texmîn nedikir, wekî ew gotinêna Xudanin. Ewêna ku digotin, şaş nîbûn, wextê ku tiştên vî cûreyî digitine me. Wana awqasî me nava wî halî da didîtin û bo wê yekê jî digotin. Xwedê wî çaxî me dinihêrî.

Guhastin hebûn, kuîjan me dikaribû bona sivikkirina wî hukumî bikira. Me dikaribû miqabilî şikberîyên xwe şer bikira. Feqet ew yek hewaskar bû, gelo emê bi wê yekê miqabilî gotina Xwedê dernekevin. Wî çaxî me dilê xwe da zanibû, wekî Xwedê me ra negotibû, ku em tiştekî bikin.

Pêşîya xilazbûna meha sala Nû ye ewlin me dît, wekî Xwedê ji xwestinên me zêdetir tişta dike. Ez nizanim, ku ezê gelo dîsa awqas tişti bivînim, kîjan nava mehekê da qewimîn. Dihate kîvşê, wekî Xwedê nava wê mehê da diha gelek tişt kirin, ne ku nava pênc salên derbazbûyî da.

Ya sereke ewe, wekî em nekevine bin hukuma. Em borcdarin anegorî Gotîna Xudan pêşda herin.

## **Merivê himberî dilê Xwedê**

Şaûl tirsîayî bû. Navê wî, emir û padîsatîya wî bin qezîayê da bûn û bona wê yekê jî ew ji cî leqîya, wextê ku Xwedê gotibû bisekine. Samûêl miqabilî Shaûl derket û fermana wî bela kir:

*“Lê niha padîsatîya te wê rast tune be. Xudan bona Xwe, anegorî dilê Xwe merivekî dixweze, kîjanî Ewê bona cimeta Xwe çawa mîr kîvş bike, çimkî çawa ku Xudan gotibû te, te usa nekir”.*

*A Padiş. 13:14*

Eva cara ewlin nîbû, ku Shaûl cîh dabû tirsê. Nava emirê wî da dîsa tişten usa qewimîbûn, wextê ku ew bin hukumên qewat da gura Xudan da nîbûye. Carekê ew ketîye bin hukumê meriva û ew tişt ji wî bajarî hildane, kîjan Xwedê gotibû, ku bi temamî undakin. Ewî nedixwest qedirê xweye li ber meriva undake. Wextê ku Samûêl jî derkete miqabilî wî, Shaûl xwe mikur hat: “Min guneh kir, wekî min emirên Xudan, gotinên Te nekirin, çimkî ez ji cimetê tirsîyam û min gura gotinên wana kir”/A Padiş. 15:24/.

Elametîya Şaûle mayîn dide kivşê, wekî ew diha gelekî bona nav- dengê xwe xemgîn bû, ne ku bona mayîna gurêda. Ev xeberên Samûêl tiştên dilê wî da dane eşkerekirinê: “Min guneh kir. Reca dikim li ber cimetê û Îsraêlê qedirê min bilind bike” /A Padiş. 15:3O/.

Şâûl usa digot, çimkî ew ji mîriv ditirsîya. Bi çiqasîva ew ditirsîya, bi ewqasîva halê wî giran dibû. Gelek cara tiştê haya rastî wan rêbera tê, yên ku li ser xwe guman nînin. Ew xirab nêzîkî cimetê dibin, bona ku wê yekê bidine kivşê, ku hal bin kontrola wan da ne, lê bi rastî ew bi wê yekê dicêribînin tirsa xwe veşîrin.

Samûêl gote Şâûl, wekî Xwedê wê padîsatîyê bide merivekî usa, yê ku wê gotinên Wî xweyî bike /A Padiş. 13:14/. Ew meriv Dawid bû. Min bihîstîye, ku çawa hinek meriv dibêjin, wekî ew merivên anegorî Xwedê ne, lê ez dixwezim ji Xwedê bibhêm. Yê ku wê wî tişti bêje, ci ku Ewî digote Dawid: “Tu merivê anegorî dilê Minî”. Ez zanim, eva xwestina her bawarmendekî ye, yên ku Xwedê hiz dikin. Min bi guhdarî emirê Dawid lêkolîn kirîye /lê nihêriye/ û xwestîye bizanibim, ku menî ci bû, wekî Xudan Dawid himberî xwe kir.

Min dît, wekî Dawid nava vê yekê da guhdar bû, wekî ewî tu cara hetanî guhdarkirina Xwedê tu tişt nedikir. Gelek cara, nava hukumên mezin da Dawid berbirî şêwira Xwedê dibû /A Padiş. 2O:31/. Werin em halekî gelekî çetin binihêrin.

## **Ew yek dikaribû hê xirab bûya?**

Nava sala xilazîyê da /dawîyê da/, ya padîsatîya Şâûl, Dawid û merivên wî li welatê filistîniyâ cîhê xwe dîtibûn. Usa qewimî, wekî Dawid û merivên wî çûn, ku bîghîjine filistîniyâ, wextê ku eskerê wana miqabilî îsraêliyâ berev dibûn. Paşê serleşkerên filistîniyâ hêrs ketin, wextê ku dîtin, ku mîrên cuhîya hazır dibin tevî wan herine þêr. Bona wê yekê jî serleşkera nehişt, ku Dawid û merivên wî tevî wan herine şer.

Rojtira mayîn eskerê Dawid ji wir dûrkentin, paşda vegefane

li cem jin û zarokêن xwe, kîjan li bajarê Sîkêlakê bûn. Çûyîna wane wedekurt, ya berbi deşta şer hatibû teribandinê û Dawid tevî merivêن xwe xwe çawa bêkêr texmîn dikirin. Ew ne tenê ji alîyê padişêda hatibûne înkarkirinê, lê usa jî ji alîyê milet da, nava kîjanîda wana ciyê xwe dîtibû. Dawid dikaribû li ser xwe tenêbûn texmîn bikira, lê ev yek himberî wî tiştê, ku rastî wî hat, tiştek nîbû. Bi guhdarî bixwîne, wextê ku ew hate li cem malbeta xwe, ci qewimîbû û texmînke, ku ew bi xwe halekî çawa da bû:

*“Wextê ku roja sisîya Dawid û merivêن wî ketine Sîkêlakê dijmin êrîşî li ser welatê Başûr û Sîkêlakê kiri-bûn û şewitandibûn. Ji çûka hetanî mezina dîl biribûn. Tu kes nekuştibûn, lê tevî xwe biribûn. Wextê ku Dawid û merivêن wî gihîntine bajér, bajar şewitî bû û keç û kurên wan çawa dîl biribûn. Dawid û cimeta tevî wî bi dengê bilind digirîyan, hetanî wî çaxî, wextê ku qewata wan idî tune bû, bigirîyana. Herdu jinêن Dawid jî dîl biribûn”.*

*A Padiş. 3O:1-5*

Tu dikarî ewê êşê li ser xwe texmîn bikî, kîjan Dawid texmîn dikir? Malbeta wî dîl biribûn. Hemû tiştêن giranbiha talan kiribûn, lê tiştêن mayîn jî şewitandibûn. Ew ne tenê bona malbeta xwe xemgîn bû, lê usa jî bona malbetêن merivêن xwe. Ew bê welat mabûn, lê paşê jî paşda hatine malêن xwe ye nava dûmanê da, lê hizkirîyêن wan jî tune bûn. Eva hemû tişt nîbû:

*“Dawid tev-hev bibû, çimkî cimetê dixwest wî bide ber kevira, çimkî dilê her yekî bona keç û xorêtêن wan diêşîya”.*

*A Padiş. 3O:6*

Ew merivên ku tevî wî çûbûne bona şerkirinê, niha jî hazir bûn Dawid bidana ber kevira, bona neparastina jin û zarokên wan. Ji vê yekê xirabtir tu tişt tune. Eva ji halê Shaûl jî çetintir bû. Li cem Shaûl dîsa eskerên tirsonek û malbet hebûn û merivên wî jî gef nexwarin, ku wî bidine ber kevira.

Gelek bawarmend nava emirê xwe da rastî wedê usa tê, wextê ku ew xwe tenê texmîn dikin. Ez difikirim, wekî Xwedê îzinê dide, ku ew yek usa biqewime. Xwedê menîya wê yekê nîne, çimkî Ew xudanê xirabîyê nîne. Lê Xwedê tevî wê yekê nabe, çimkî bona ewî wedê gumanbirîyê meremê Wî heye. Dawid dikaribû teslîm bûya, eger ewî destpê bikira bida peyî dijmin, yan jî rêke başqe bona rehetkirina meriva bidîta. Lê niha binihêre ku dewsa wê yekê ewî ci kir,

*“Feqet Dawid bi Xudan Xwedê va qewat bû. Û Dawid kurê Akîmelek Abîatarê kahîn ra got: “Cilê xwe nêzîkî min bike”. Û Abîatar cilê xwe nêzîkî Dawid kir. Û Dawid ji Xudan pirsî: “Eger ez peyî wî eskerî kevim, bi-zêrînim, ezê bighîjime wana?”. Û Ewî got: “Bizêrîne, çimkî tê ese bighîjeyî û tê hemûya azakî””.*

*A Padiş. 3O:6-8*

Hema bin hukumê mezin da jî Dawid tu gavek neavît hetanî ku ewî şêwira Xudan nestend. Wextê ku ew berbirî Xudan bû, ewî qewat stend. Peyî wê yekê ra ew pê hesîya, ku gerekê ewî ci bikira. Xwedê got: “Bizêrîne”.

Dawid peyî dijmin ket. “Ewî h’emû tiştên destê dijmin da û herdu jinê xwe jî aza kirin. Hemû kes hatine azakirinê, him keç û xort, him jî tiştên talankirî, ci ku wana biribûn. Dawid hemû tişt paşda anîn” /A Padiş. 3O:18,19/.

Çi ku çawa tiştekî bêguman dihate texmînkirinê, werguhêzî serketinê bû. Bona Xwedê yê me tu tişt çetin nîne. Dawid diha gelekî

ji Xwedê ditirsîya, lê ne ku ji meriva. Ev bû menî, wekî ewî gumana xwe da ser berbirbûna berbi Xwedê. Ev yek ji kirina Shaûl cuda dibû.

Dawid ew yek kir, lê Shaûl tenê caba halê pêşdahatî da. Dawid karibû wê yekê bike, lê ne ku anegorî halê pêşdahatî caba anegor bide, çimkî ew pê hesîya, ku Xwedê çi dibêje. Wextê ku em fikira Mesîh pê dihesin, em kar dikin, lê ne ku cabê didin.

## Xwegirtin

Nava pareke kitêbê ye derbazbûyî da me dît, wekî bona şikêndina tirsê serxwebûn lazime. Ev serxwebûn ya tebyetî nîne, lê ya usaye, kîjan bi saya qewat, hizkirina Xwedê tê. Eve xebera meye kilît:

*“Bona wê yekê ez tînim bîra te, ku tu agirê pêşkêsa Xwedê hê gur bikî, ya ku bi destdanîna min te ra hate dayînê. Çimkî Xwedê ruhekî tirsê neda me, lê Yê qewatê, hizkirinê û xwegirtinê”.*

*B Timotêyo. 1:6.7*

Em binihêr'in, ku çawa ev hersê tişt nava Dawid da serxwebûn pêşda anîn, bi kîjanê ew miqabilî tirsê derket.

1. Qewat. Dawid Xwedê nas dikir û ewî zanibû, wekî Xwedê diha mezine, diha qewate, ne ku tiştên ku rastî wî tên.

2. Hizkirin. Dawid Xwedê diha gelekî hiz dikir, ne ku xwe.

3. Xwegirtin. Dawid tu gav neavîtin, hetanî ku gotina Xudan û fikira Wî pê nehesîya. Ewî ferzbûn /gîringî/ neda wê yekê, ku hukumê li ser wî çiqas mezin bû.

Wextê ku ruhêن me bi qewat, hizkirin û Gotina Xudan va tijî dibin, em nabine qurbana tirsê. Ji van hersê tiştâ ne tenê yek, lê he rsê tevayî me lazimin. Eger hersê tevayî lazim nîbûna, wî çaxî Pawlosê tenê derheqa yekê da bîr banîya. Bona ku tu nava

*Bışuxulin, yan cabê bidin?*

serxwebûna Xwedê da bî, ev her sê tişt jî lazimin.

Me îdî bi hûrgilî qewat û hizkirina Xwedê lêk'olîn kir. Were,  
em pêşda bilivin û fikira Xudan fem bikin.

*Xwegirtin ewe, wekî tu bizanibî, ku hema niha  
Xwedê çi dibêje û çi dike*

## Ruhê xwegirtinê

**T**u tişt awqas meriva natirsîne,çıqas nezanî. Nezanî kemasîya ulme. Derheqa qîmetê ulm da gelek cara nava Kitêba Pîroz da tê gotinê. Nava Metelok 24:5-da tê gotinê: “Merivê aqil wê qewat be, lê merivê zane wê qewata xwe zêde bike”. Lê Metelok 11:9 tîne bîra me,wekî “yên heq wê bi ulm aza bin”. Ulm qewatê dide, ku tu ji tela tirsê dûr bimînî.

Fem bike, wekî heye ulmê tebyetê û ulmê ruhanî. Ulmê ruhanî û îman ji ulmên tebyetê û îmanê bilindtirin. Bo wê yekê jî em wî çawa “yê nebînayî”, ji qewatê zêdetir hesab dikan. Nava kaxeza Tîmotêyo ye duda da, ya 1:6,7-ada Pawlos tîne bîra Tîmotêyo, wekî ew hersê tişt girîgin bona serketina himberî tirsê. Ew hersê tişt evin-hizkirin, qewat û xwegirtin. Nava evî serê kitêbêda emê derheqa ruhê xwegirtinê da xeberdin.

Xwegirtin çiî ye? Gelo ew zanebûna Kitêba Pîroze? Şagirt çawa mesîgirên nezan dihatine hesabê, lê koma merivaye li Îsraîlê ye here xwendî Sînêdrîon /civîna cuhîaye bilind/, ji aqilmendî û serxwebûna wana tev-hev bibûn.

*“Gava wana mîrkîmîya Petrûs û Yûhenna dît û pê hes-*

*îan, ku evana merivne nexwendî û nezanin, ecêbmayî man û nas kirin, ku ewana tevî Isa bûne”.*

*Karêن Şandîya. 4:13*

Merivekî bi navê Stêpanos, yê ku berdestîyê sivira sêwîya û jinebîya bû, devê rêberên xwendî girt. Kitêba Pîroz dibêje: “Lê nikaribûn li ber wê serwextîyê û wî Ruhê ku pê xeber dida, bisekinîyana” /Karêن Şandîya. 6:1O/.

Carekê ra em divînin, wekî ruhê xwegirtinê ji serwextbûna tebyetê, yan jî ji dersên Kitêba Pîroz pêşda nayê. Dêmek, ruhê xwegirtinê ji kîderê tê?

## **Heyîna eyantîyê**

Xwegirtin ji wê yekê tê, wextê ku tu fikira Mesîh pê dihesî. Tenê zanebûna Nivîsarê, nade kivşê, wekî tu fikira Mesîh zanî. Me ra hatîye gotinê, wekî “nivîsar dikuje, ruh sax dike” /B Korintî 3:6/.

Nava pirsa zanebûna Kitêbada fêrisî nezan nîbûn, wana ew ruh nizanibûn, bo wê yekê jî qulixa wan mirin dianî. Ewê yekê meriv ji dilê Xwedê dûr dixistin, lê ne ku nêzîkî Wî dikirin. Wana Xwedê usa raber dikir, çawa ku wana fem dikir- bi rîya sêrî, lê ne bi rîya dil. Isa got: “Însan tenê bi nêt najî, lê bi her xebera, ku ji devê Xwedê derdikeve” /Metta. 4:4/. Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî Isa negot derket. Wî çaxî ewê ne ku bibûya wedê derbazbûyî, lê tenê bi xebera nivîsar. Tenê Kitêba Pîroz e ku ji devê Xwedê derketîye. Isa got: “derdikeve”, kîjan anegorî dema niha ye. Em gerekê Xudanê Nivîsarê naskin, bona ku bizanibin, ku îro ji devê Wî ci derdikeve.

“Lê gava ew Ruhê Rastîyê bê, ewê we berbi temamîya rastîyê bibe. Çimkî ewê ne ku xwe serî xwe xeberde, lê ci ku bibhê, ewê wê yekê bêje û tiştên ku hê neqewimîne, wê we ra gilî bike. Ewê rûmeta navê min bilindke, çimkî ewê ji min bistîne û wera gilîke”

/Yûhenna. 16:13,14/. Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî Îsa got- ci ku bibhê, lê ne ku ci kubihist. Bi alîkarîya Ruhê Pîroz em dikarin bizanibin, ku Îsa niha ci dibêje.

Wî çaxî tu dikarî pîrskî: “Ji Kitêba Pîroz ci kar heye?”. Ew rênîşa alîkirin û rîberkirina me ye, ew yek ji Xwedê hatîye. Wextê ku Ruhê Pîroz wê yekê sax dike, gotin dilên me da sax dibin, lê ne ku serêne me da. Kitêba Pîroz ew norme, kîjanê em bona îzbatkirinê didine xebatê, ci ku me ji Ruhê Pîroz bihîstîye. Ruhê Pîroz tu cara miqabilî Kitêba Pîroz xeber nade. Feqet em dikarin bi xwe bona xwe çetinaya pêşda bînin. Em dikarin bi femdarîya xwe wê yekê bidine sînorkirinê, ci ku Ruhê Pîroz dikare bêje, yan bike. Şaşîya fêrisîya hemâ ev bû.

## **Tenê zanebûna cîhê parêن Kitêba Pîroz û gotina bes nîne**

Zanebûnê fêrisîya gelek bûn.Bi gîlîkî wana her pênc kitêbên Kitêba Pîroze Kevin ezberî zanibûn. Wana Nivîsar lêkolîn dikirin û bêsebir hîviya Mesîh bûn. Feqet fêrisî bi femdarîya xweye derheqa Nivîsarê da hîviya Wî bûn. Wana zanibû, wekî Îşaya wî cûreyî bû pêxember:

*“Çimkî bona me Zarokek hate dinîayê, Kurek bona me hate dayînê û serwîrtî wê li ser milê Wî be û ewê çawa Şêwirdar, Xwedêyê Qewat, Bavê Heta-Hetayê, Mîrê Aşîtiyê bê navkirinê. Li ser kursiyê Dawid û padîsatîya Wî xilazbûna zêdekirina serwêrîyê û aşîtiyê tune, ku bi mafê Wî û bi heqîtiyê ji niha da Wî hetanî heta-hetayê iżbat ke û qewîn ke. Çavnebarîya Xudanê Qewat gerekê vê yekê bike”.*

*Îşaya. 9:6,7*

Bi gotina fêrisîya Mesîh gerekê padişatîya Xwe ye li ser dinîayê ïzbat bikira û wê ew ji hukumê Romayê aza bikira û rûnişa li ser textê Dawid. Bona wê yekê jî, wextê ku Îsa ji bajarê Galîlêaêyî Nazarêtê çawa dûrger hat, lê şagirtên Wî ye nezan jî rêberîya wî dikirin, fêrisî ji rê derketin.

Fêrisî hertim bi têmaên usa miqabilî Îsa derdiketin, kîjan wana bi xwe li ber xwe derxistibûn, bi hesab hiladana femdarîya wane derheqa Kitêba Pîroz da. Wana qirar kiribû, wekî Mesîhê bibe rêberê miletiyêyî qewat. Bona wê yekê jî ew miqabilî Îsa derdiketin û pirsên vî cûreyî didane wî: “Eger Tu yî Mesîh, wî çaxî padişatîya Te li kîderê ye, kîjanê tu dixwezî ïzbat bikî? Tu bona ci li ser textê Dawid rûnanêyî?”

Îsa cab dida: “Padişatîya Xwedê eşkere nayê. Ne jî wê bêjin: “Vaye vire!”, yan jî : “Wê dera hane!” Çimkî padişatîya Xwedê nava we da ye /Lûqa. 17:20,21/. Îro em dikarin vê yekê fem bikin, çimkî mecalâ me heye em bizanibin, wekî Îsa mir û ji nava mirîya rabû, lê ew jî li ser xwe guman bûn, wekî ew rastin. Çawa jî hebe gumana fêrisîya ji femdarîya wane Kitêba Pîroz dihat. Femdarîya wane Ruh tune bû.

## Eyantîya ji Ruh stendî

Merivekî bi navê Şîmhûn jî hîvîya Mesîh bû. Zanebûnên wî awqas nîbûn, çiqas yên fêrisîya. Feqet lê binhêre ku Kitêba Pîroz derheqa wî da ci dibêje:

*“Ew merivekî rast, xwedêxof û li hîvîya berdiliya Îs-raêlê bû. Ruhê Pîroz jî li ser wî û wî ra gotibû: “Heta ku tu Mesîhê Xudan nevînî, nemirî”. Hingê ew bi rêberîya Ruh hate paristgehê. Çaxê dê û bavê Îsa yê biçûk Ew anîn, ku li gora edetê Qanûnê bona wî bikin, Şîmhûn kurik hilda, da hembêza xwe, şikirî da Xwedê û got: “Ya Xweyi, niha li gora sozê xwe bi xêr û silamet berdestiyê xwe berde. Çimkî çavê min azakirina te dît...”*

*Dê û bavê Wî ser tiştên ku Şimhûn bona Wî digotin,  
zendegirtî man”.*

*Lûqa. 2:25-3O,33*

Wextê ku Îsa anîn pêşkêşî Xudan bikin, Ew wî çaxî nêzîkî ji  
şes mehî hetanî du salî bû. Paristgeh mezin bû, çend avayêñ mezin  
diketine nava têrîtoriya wê. Li wir hertim bi seda, hela bi hezara jî  
meriv hazir dibûn.

Em bicêribînin bi fikirêñ xweva wê yekê bivînin. Dûrgerek ji  
Galîlêayê tevî jina xwe tê, hembêza kîjanîda zarokeke şes mehî ye.  
Ew li paristgehê nava cimetê da nin. Wextê ku Şimhûn direve, ku  
zarokê hilde, dibêje: “Awa Mesîh”. Niha hûn dikarin fem bikin, ku  
Ûsiv û Meyrem bona ci zendegirtî mabûn.

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî Şimhûn hatina Mesîh eşke-  
re nekir, bi xwedina kitêbekê, mesele, ya bi sernavê “1O1 menî ku  
bona ci Mesîh gerekê sala çara pêşîya hatina Îsa bê”. Ewî ev behs bi  
lêkolînkirina kitêbêñ Pîroz nestend. Bi eyantîya Ruhê Pîroz Şimhûn  
pê hesîya, wekî Mesîh tê. Ew bi rêberîya Ruhê Pîroz hate paristgehê.

Tiştekî ecêbmâyînê usa dike ku em bifikirin. Ew merivê ku  
pêşekzanê qanûnê nîbû, Îsa çawa Mesîh qebûl kir, wextê ku Ew  
nêzîkî şeşmehî bû, lê peyî 3O-î salî ra fêrisîya Mesîh nas nekirin,  
wextê ku Ewî cin derdixistin, nexweş qenc dikirin, çavêñ kora vedi-  
kirin û mirî sax dikirin. Eve firqîya navbera femkirina fikira Xudan  
û fikira Nivîsarê.

Usa dikare biqwime, wekî em wî cûreyî nêzîkî Kitêba Pîroze  
Nû bibin, çawa ku fêrisî ew yek himberî ya Kevin dikirin? Gelo  
ulmê meyî derheqa Xwedê da bi serwêrî û zanebûnameye Kitêba  
haîye sînorkirinê? Serwêrî tevgirêdana tevî Xwedê saz nake, ew  
tenê şirove dike. Wextê ku min wextê zewaca xwe got- belê, min  
nivîsara derheqa zewacê da nestend. Min heleqetîyêñ xwe ye şexsî  
tevî jina xwe destpêkir sazkir.

Dêmek, gerekê em terka xwendina Kitêba Pîroz bidin? Bêfitîya, na. Em gerekê wêya bi cûrekî mayîn bixwînin. Wextê ku ez Kitêba Pîroz hildidime destê xwe, hertim dua dikim, tewaqe ji Ruhê Pîroz dikim, ku gotina Xudan elamî min bike. Wextê ku ez dixwînim, rastî nava dilê min da gur dibe. Ew bi rastî ew gotinin, bi kîjana ez gerekê bijîm.

Xwegirtin ewe, ku tu bizanibî, ku niha Xwedê çi dibêje û çi dike. Tenê Ruhê Xwedê dikare vê yekê eşkere bike. Ew dikare bi rîya Kitêba Pîroz meva bê girêdanê, yan jî tevî dilê me xeberde, bi dengê Xweyî nerm û rehet.

Wextê ku em zanin, ku Xwedê çi dibêje, em li ser zinarekî qewîn ïzbat dabin.

## Îsa bi hukum xeber dide

Kitêbên Pîroz hertim gilî dikin, ku çawa Îsa bi hukum xeber dida. Niha dîna xwe bide qewimandinekê.

*“Gava Îsa ev gotinên xwe ser hevda anîn, elalet ser hînkirina wî zendegirtî ma, çîmkî ewî mîna yekî xwey-bihukum ew hîn dikirin, ne ku mîna qanûnzanên wan”.*

*Metta. 7:28,29*

Ewî ne tenê bi hukum xeber dida, lê usa jî bi hukum digerîya. Dîna xwe bide qewimandineke mayîn:

*“Hemû zendegirtî man, hevra digotin: “Ev çi gotine? Ew bi hukum û qewatê emirî li ruhêن heram dike û ew derdikevin?””.*

*Lûqa. 4:36*

Îsa bi hukumê usa him dijîya û him jî dilivîya, wekî sersedekî

*Ruhê xwegirtinê*

romayî Ew nas kir. Ewî Îsa ra got, wekî eger Ew gotinekê bêje, xulamê wî wê qenc bibe /Metta. 8:5-10/. Evî romayî kanîya hukumê Îsa fem kiribû. Hukumê Îsa bi Wî va nedihate sînorkirinê, lê ew yek Xwedê dida. Ew usa bû, çimkî Îsa bi temamî gura Ruhê Pîroz da bû, Yê ku xwestina Bavê elamî Wî dikir.

Sersed got: “Çawa ku ez jî merivekim, yê ku bin hukumdane û bin hukumê min da jî leşker hene”. Îsa zendegirtî ma, wextê ku ev yekbihist. Evî fermandarî fem kiribû, wekî rîya tek- tenêye bona ku hukumê te hebe, ewe ku tu jî bin hokum da bî. Îsa bi hukum kar dikir, çimkî Ew bin hokum da bû. Ew bi temamî gura Ruhê Pîroz da bû, Yê ku xwestina Bavê elam dikir. Ewî got:

*“Çimkî min xwe serî xwe negotin, lê Bavê ku ez şandime, ewî temî daye min, ku ez çi bêjim û çi xeberdim”.*

*Yûhenna. 12:49*

Û dîsa:

*“Ez bi xwe nikarim tiştekî bikim. Çawa ku ez dibihêm, usa jî dîwanê dikim. Dîwankirina Min raste, çimkî Ez ne ku li xwestina xwe digerim, lê xwestina Yê ku Ez şandime”.*

*Yûhenna. 5:30*

Îsa zelal şirove kir, wekî hukumê Wî ji Bavê tê:

*“Tu bawar nakî, ku ez nava Bavê da me û Bav nava Min da ye? Ev xeberên ku ez we ra dibêjim, ne ku xwe serî xwe dibêjim, lê ew Bavê ku nava Min da dimîne ewe, ku ya xwe dike”.*

*Yûhenna. 14:10*

*“Ez rast bêxêlif we ra dibêjim, ku Kur nikare xwe serî*

*xwe tiştekî bike, ew tenê wan tiştên ku divîne Bav dike,  
ew jî dike. Bav çi dike, Kur jî usa dike”.*

*Yûhenna. 5:19*

Bîr bîne, wekî nenihêrî wê yekê, ku Ew Kurê Xwedê ye, Ew çawa merivekî bi Ruhê Pîroz va tijîbûyî ma. Ewî Xwe ji hemû mecalên Xwedê aza kir, lê bi wê yekê va tevayî bi hukumekî usa emir dikir, wekî meriv zendegirtî diman. Ew yek ji wê yekê dihat, wekî Ewî tenê usa xeber dida û kar dikir, çawa ku Ruhê Pîroz rêberî dikir. Îsa tu cara netirsîya, çimkî Xwedê tu cara natirse. Xêncî Xwedê yekî usa qewat, yê ku hemû tiştî dikare û aqile tune.

Îsa wî çaxî jî nava hukumê Xwe da dima, wextê ku fêrisîya dicêriband Wî bi pirsên ruhanî û fêlbazî va bitirşînin. Wana dixwest Îsa bikira nava telê û hema bi xeberên WîEw bêhurmet bikirana. Feqet firqî tune bû, ku tela wan çi cûreyî ye. Îsa hertim bi Ruhê Pîroz caba xwe dida û bi wê yekê tirsa ku ji wan dihat, dişkênan. Ewî bi zanebüna xwe fêrisî nav- hev dixistin û fêrisî jî paşê ji cêribandina tırsandina Îsa bi gumanbirî paşa disekinîn:

*“Û k’esekî nikaribû caba wî bida û li peyî wê rojê ra  
kesekî newêribû pirsek jê bikira”.*

*Metta. 22:46*

## **Çawa ku Bavê Ez şandim...**

Niha behsa baş: “Çawa ku Bavê Ez şandim, usa jî Ez we dişînim” /Yûhenna. 2O:21/. Em gerekê usa bijîn, xeberdin û bilivin, çawa ku Ewî dikir. Bona vê yekê jî Ewî me ra wa digot:

*“Û awa vê yekê bikine bîra xwe, ku pêşda xema nekin,  
hûnê çi caba xwe bidin. Çimkî ezê zar- ziman û serwex-  
tîyê bidime we, ku dijminên we wê nikaribin li ber we  
xeberdin, yan bisekinin”.*

*Lûqa. 21:14,15*

Menîya wê yekê, ku bona ci hinek bêyî hukum xeber didin, yan jî hîn dîkin ewe, wekî ew ji Kitêba Pîroz berbiribûnekê lêkolîn dîkin û paşê van xeberên Kitêba Pîroz tevî femdarîya xwe dîkin. Ew derheqa wê yekê da xeber didin, ku Xwedê ci got, yan jî ci kir nava wedê derazbûyî da, lê ne ku ci dike û niha ci dibêje. Tenê bi xeberdana bi Ruhê Xwedê emê bi hukum xeberdin.

*“Ezê tu car ji te neçim, tu car te bernadim. Lema jî rûê me digre, ku em bêjin : “Xudan piştovanê mine û ez natirsim. Însanê ci li min bike?.*

*Îbranî. 13:5,*

Bi guhdarî careke mayîn van xebera binihêre. Em dikarin bi serxwebûn bi hukum xeberdin, wexêt ku em zanin ku Ew ci dibêje. Gumanâ himberî Gotina Xwedê serxwebûnê dide me. Xwedê dide bawarkirinê, wekî wextê ku em zanin, ku Ew ci dibêje û em bawar dîkin, wekî Ew hertim tevî meye, em dikarin li ser xwe guman elam bikin ku ev meriv dikare ci li min bike. Wextê ku em li ser vê gumanê dijîn me nikarin bitirsînin.

## Fêrisiyêñ wedê niha

Gelek cara min ra li hev hatîye ez rastî merivên usa bêm, kîjana ez çawa fêrisiyêñ wedê niha nav dikim, li cem kîjana Ruhê Xwedê tune. Ewana diha zû gotinên ji Kitêba Pîroz çawa mesele pêşda tînin, lê ne ku yên mayîn.

Ew meriv bi pirsên xweva miqabilî min derdiketin, kîjan derheqa xeberdana minda bûn, yan jî derheqa nivîsareke minda.

Ez wê yekê navêjim, wekî meriva pirs bona hînbûnê didan, yan jî fem nedikirin. Na xêr, ez derheqa wan meriva da dibêjim, yên ku hemû tiştî bi normên xweye ruhanîvaderbaz dîkin û wê yekê înkardîkin, ci ku ne anegorî zanebûna wane.

Min guhdarî daye ser wê yekê, wekî wî çaxî qise dikare bi du alîyava pêşda here. Berê ewlin ewe, wekî ez dikarim tevî wana derheqa Kitêba Pîroz da bikevime nava dîskûşîayê û ji wê yekê ez binketî derkevime, wextê ku ew derheqa wan tişta da baş zanin û dicêribînin te bînin li ser wê fikirê. Ezê binkevime, eger ez navhevkevime, tevlîhevbim. Ez hînbûme nekevime nava vê yekê.

Rîya mayîn jî ewe, wekî ez Ruhê Pîroz binihêrim û wê yekê xebardim, çi ku ez dilê xwe da dibihêm. Wî çaxî aqilmendîya Xwedê wê bê û ji gotinên wana wê tu tişt nemîne. Aqilmendîya Xwedê ji Kitêba Pîroz tê, lê Ruhê Pîroz jî behna sazbûnê dide.

Çend sal pêşda ez tevî qulixçîkî teyarê da bûm. Me nasîya xwe da jineke cihû, ya ku gelekî aqil bû. Qisa meye gur derheqa Xudan Mesîh da derbaz bû. Me dicêriband bida kivşê, wekî Îsa Mesîh e. Nava temamîya qisê da ewê jinê dicêriiband bide kivşê, wekî gotinên Îsa derewin.

Pasê nişkêva min fem kir, ku min çi dikir. Min zanibû, wekî ev xeberdana wê negihîne tu tiştî. Wî çaxî ez rîberîya Ruhê Pîroz gerîyam û Ewî elam kir, ku ez gerekê çi xeberdim. Min ewê jinê nihîrî û ew xeber gotin, kîjan Ruhê Pîroz dane min. Peyî wê yekê ra dengê min hate guhastinê û min bi hukum xeberda. Wextê ku ewê jinê ew xeberbihîstin, çavê wê fireh bûn û ewê xwe ker kir. Temamîya xeberdanê alî wê nekir. Feqet wextê ku xebera Xudan hat, ewê carekê ra hukumî li ser jinê kir.

Piştî derketina ji teyarê, qulixçîyê ku tevî min bû got: “Con, min hazırîya Xudan texmîn kir, wextê ku te ev xeber digotin. Te dît, wekî ewê nikaribû tu tişt bigota?”. Tu gerekê teslîmî xeberdanen bêfeyda nebî, kîjan li ser femdarîya fikirdarîya Kitêba Pîroz hatine hîmdanînê. Dewsa wê yekê ïzinê bide Ruhê Pîroz, wekî Ew rîberîyê li te nava aqilmendîya ruhanî da bike.

*“Em bona van tiştâ bi gotinên ji serwextîya merivayê  
hînbûyî xeber nadin, lê bi gotinên hînkirina ji Ruhê*

*Xwedê xeber didin, tiştên Ruhanî wan ra şirove dikin, yênu ku xweyî-Ruhê Xwedê ne. Lé yê xweyî-Ruhê Xwedê her tiştî givtugo dike, lê belê, xwexwe ji kesekî nayê givtugokirinê. Çawa nivîsare: "Kê nêt-fikira Xudan pê hesiya, ku şiretekê bide wî?" Lé nêt-fikira Mesîh serê me da ye".*

*A Korintî. 2:13:15:16*

Tu kes nikare wî merivî givtugo bike, yan jî bitirsîne, li cem kîjanî fikira Mesîh heye. Ez dikarim gelek qewimandina bînim ber çava, wextê kîjana ezê bitirsîama, eger ez berbirî Ruhê Xwedê nebûma.

Şewir li me tê dayînê, ku usa bijîn, çawa ku Îsa ew yek dikir /A Yûhenna. 2:6/. Îsa tenê ew yek dikir, ci ku ewî didît, ku Ruhê Pîroz dike. Eger em wî cûreyî bikin, xwegirtina me wê hebe û emê serxwebûnê dest bînin, ku ser tirsêkevin.

## **Xudan, ez gerekê ci bikim?**

Gelek cara em rastî halên usa tê, kîjan dikarin me seqet bikin. Rûê wê yekê da em nikarin bi temamî wê yekê bikin, ci ku Xwedê daye pêşîya me. Ew yek wî çaxî diqewime, wextê ku fikira Mesîh li cem me tune. Li Mêksîkayê ez li ber pirseke vî cûreyî sekinîm. Bona qulixê min teglîfi bajarê Mêksîkaîyî Montêrêyê kiribûn. Ez bona derbâzkirina qulixekê hatibûme teglîfkirinê û min xercê xwe bi xwe hildabû ser xwe. Nîvê roja ewlin min nava duaêda derbaz kir. Wextê ku min dua dikir, min dît, ku ewrekî reşî mezin li ser wî avahî ye, li kîderê em gerekê berev bûna. Min ji Xudan pirsî, ku ew ci bû?. Ew şirove kir: "Con, ewa ew tarîstane, ya ku miqabilî vê qulixê şer dike. Tu dua bike".

Rûnkirineke gelekî qewat hat û nava duaê da qewat da min. Nava nîv sehetîda min dîsa tiştek dît. Tîrênceke ronahîyê ji ezmîn

raste- rast peyayî li ser banê wî avahî dibû. Min careke mayîn ji Xudan pirsî, ku ew çi bû?. Ewî goteruhê min: “Ew pesindayîna Mine, kîjanê iro êvarê wextê qulixê bê”. Kela min tijî bû.

Qulixa me gerekê sehera şesa destpê bûya. Em hinekî zû hatin. Me ra gotin, wekî nevsekî resmî dixweze serwêrê ku qulixê teşkil dike, bivîne. Du ofisêra rêberîya wî nevsê resmî dikirin.

Ez tevî serwêr çûme rasthatina wî. Ewî merivî bi îspanî serwêr ra xeberda, paşê berê xwe da min û bi înglîsî ji min pirsî: “Hûn bi îspanî xeber didin?”. “Na xêr, birêz”, - min cab da.

Paşê ewî emirî li ser min kir û got: “Evê êvarê hûn gerekê tevî cimetê tu tiştî xeber nedin, xêncî pirsên girêdayî tûrîzmê ra”.

Paşê ew zivirî berbi serwêr û tevî wî xeberda. Min dîna xwe dida serwêr. Ew şâ nîbû. Bi gîlîkî serwêr gelekî tirsîayî bû.

Wextê ku ewî merivî xeberdana xwe xilaz kir û ew tevî herdu qulixçiyêne eskerîyêye mayîn ji wir cûn. Serwêr ez birime li ser alîkî û got: “Con ev meriva qulixçiyê hukumatê ye û dibêje, wekî tu nikarî qulixê derbazkî. Li Mêksikayê qanûneke usa heye, anegorî kîjanê tu nikarî bêyî izinstendinê qulixê derbazkî, eger tu ne welatîyê vî welatîyî?”. Paşê ewî xeberdana xwe dûmayî kir û got: “Eva qanûneke, kîjan mecbûr nake, lê kivşe, wekî ev meriva naxweze te li vir bivîne û dixweze wê qanûnê bide xebatê. Ewî usa jî got, wekî dixweze te roja duşemê, sehera neha li ofisa xwe bivîne”.

Min nikaribû bawarîya xwe wan xebera banîya. Min carekê ra gote serwêr: “Min temamîya rê da pêşîya xwe, wekî li vir qulixê derbaz nekim? Eger tu tenê bona min xemgîn bûyî, wî çaxî izinê bide, ku ez qulixê derbazkim”.

Serwêr got: “Con ew yek usa jî dikare li ser civîna min hukumê xwe bihêle, gelek problêm dikarin pêşda bê. Ew nevsekî resmîye derecebilde. Wê diha baş be, ku tu wê yekê neki?”. Ev serwêr gelekî tirsîayî bû û xêncî duakirinê, min tu tişt nikaribû bikira, çimkî hukmê wîyî li ser wê qulixê hebû.

Ez ji avayî derketim. Ew avayî yê sportê bû û li merkeza bajarê Montêrêyê bû. Li ber serayê stûneke beyraqê danîbûn û min destpê kir dora wê bigerim. Min zanibû, wekî Xwedê min ra gotibû, ku pesindayîna Wî wê wextê qulixê bê, lê min nizanibû wî çaxî ez çi bikim. Fikirdarîya min nav- hev ket: “Gelo ev merivê resmî gerekê min ji wê yekê paşda bigre, ku Xwedê ez şandime wê yekê bikim?”. Paşê ez hatime ser wê fikirê, wekî ev meriv nikare wê yekê bide sekinaenînê, çi ku Xwedê nava dua da nîşanî min kirîye. Ez diçüm-dihatim û min şer dikir: “Ez çi bikim”. Paşê min got: “Bavo, ez nizanim çi bikim, lê ev yek bona Te tiştekî nişkêva nîbû. Te idî derheqa wê yekda zanibû. Bona wê yekê jî ez hewcê serwextî û şewira Teme”. Min dest pê kir bi Ruh dua bikim. Min xeber stend:

*“Şewira dilê mériv avên kûr in, lê merivê serwext wê wêya derxe”.*

*Gotinên Silêman. 2O:5*

Îsa got, wekî ji zikê wan merivên ku bawarîya xwe Wî tînin, wê avên çema bikişin /Yûhenna. 7:38/. Ez hewcê çemê şewira Xwedê bûm. Ez hewcê fikira Mesîh bûm. Duakirina bi zimana nava wê pirsê da wê alî bike.

Peyî duakirinê ra fikira min bona guhdarkirinê diha rehet bû. Û nişkêva dilê minda ev fikir pêşda hat: “Merivara derheqa tûrîstê herî mezin, yê ku hatîye Mêksîkayê gilî bike”. Min bi dengê bilind kire gazî: “Min dît! Ewî merivî got, wekî ez dikarim derheqa tûrîzmê da xeberdim. Ezê jî derheqa tûrîstê herî mezinî ku li Mêksîkayê quesidîye- Îsa Mesîh da gilîkim”. Şabûneke mezin kete nava min û ez keniyam.

Ez lez hatime avayî. Ez zendegirtî mam: Xwedê idî tevî serwêr xebat derbaz kiribû. Ewî got: “Xwedê min ra xeberda û got, wekî ez tera bêjîm, ku tu wê yekê bikî, çi ku Ew dibêje”.

Min qulix destpê kir û vî cûreyî got: “Min ra gotine, wekî ez

tevî we derheqa têma tûrîzmê da xeberdim. Bo wê yekê jî îro êvarê ezê derheqa trûistê herî mezin da gilîkim, yê ku hatîye Mêksîkayê”.

Qasî sehetekê min derheqa Îsa da- çawa Xudan û Xilazkir xeba. Gelek meriv gihîstine ewê banga qebûlkirina Îsa ye çawa Xudan. Nava vê komêda merivekî seqet hebû. Peyî wê yekê ra, wextê ku min bona meriva dua kir ku Îsa qebûlkin, Xudan min ra xeba: “Ez dixwezim wî merivî qenckim”.

Min wî merivî nihêri û gotê: “Ruhê Xwedê got, wekî dixweze We qenc bike”. Min destê xwe danî li ser wî û dua kir. Paşê min destê wî girt û me tevayî destpê kir biggerin. Pêşda ewî destpê kir fesal bigere, lê paşê destpê kir gelekî lez bilive. Zûtirekê ew meriv îdî aza digerîya. Xilazîyê min destê wî berda û ewî destpêkir bi xwe bireve.

Cime’t nav- hev ket. Merivên bi nexweşîyên cûre- cûre pêşda hatin.

Nava wê tev-hevbûnê da min tercimeçiyê xwe unda kir. Nêzîkî 2OO merivî hatine ber dikê. Gelek qenc bûn, nava kîjanada jinek hebû, guhê kîjanê hema ji roja bûyîna wêda ker bû, lê guhê mayîn jî çetin dibihîst. Kela wê jinê usa tijî dibû, wekî hêşirên wê kincêwê şil kiribûn.

Ez haj pê tunebûm, wekî ew merivê resmî herdu merivên xwe şandibûn ku eger ez qulixê derbazkim, ew min bigrin. Ew wî çaxî gihîstine li wir, wextê ku min bona merivê seqet dua dikir. Qulixçiyê wan deraye qeyde-qanûna bihîstibûn ku wana ci gotibû: “Pêşîya girtinê were em binhêrin ku ew ci dike”.

Wextê ku wana dîtibû, wekî merivê seqet qenc bibû, ji wana yekî ji yê mayîn pirşibû: “Bi fikira te eva rastî ye?” Ewana diha nêzîkî dikê bûne û dîna xwe dabûnê ku Xwedê ci dike.

Wextê ku wana dît, ku jina ker çawa qenc bû û çawa digirîya, ji wana yekî got: “Bi fikira min eva rastî ye”. Paşê ji hukumê Xwedê zareke pêncsalî ketibû erdê. Bi dîtina vê yekê ew têne ser vê fikirê:

“Eva rastîye”. Û ev herdu merivên ku hatibûn min bigrin, bona duakirinê pêşda hatin. Alêluya!

Rojtira mayîn ez ji Mêksîkayê çûm. Ez xemgîn nedibûm ku ez rastî ewî merivê resmî nehatim. Hevtîya mayîn serwêrê ji Mêk’sîkayê hate Ştatên Yekbûyî û tevî xwe ewî kovareke / jûrnaleke/ Montêrêyê anîbû. Li ser rûpelê ewlin ewî miqaleke derheqa qulixa me da xwend.

Kovarê nivîsîbû, wekî ew merivê hukumatê gofîye ku ez meriva dixapînim û xwestina min jî tenê pere bûne. Ez çûbûme Mêksîkayê û min pere ji wî welatî hilnedabûn, xercê xweyî çûyînê min hildabûne ser xwe. Peyî guhdarkirina vê yekê ra min fem kir, ku ev hemû tişt bo çî ye. Feqet çawa jî hebe kovarê nivîsîbû, wekî rojnamevana dîtîye ku çawa meriv bi rastî qenc dibûn. Şikir ji Xwedê!

Merivê hukumatêyî resmî cêriband bi gefxwarinên xwe min bide sekinandinê. Eger ez û serwêr biketana bin hukumê van gefxwarina, wî çaxî pêşkêşa Xwedê wê nava emirê me da temirî bûya. Tu kes wê xilaz nebûya û wê êvarê bona tu kesî qulix jî wê derbaz nebûya. Xeberdana ku Ewî tevî min bi Ruhê Xwe kir, serxwebûn da min, ku ez tirsê bişkênim, kîjan miqabilî min hatibû berdanê. Ev jî hema hukumê xwegirtinêye.

*Ew tiştên ku meriv çawa tiştekî biçûk hesab dike,  
Xwedê wê yekê dide xebatê ku tiştên nebûyînê  
biqewimin*

## Pêşda bicedîne

**N**êmîya cihû bû, yê ku wedekî usa dijîya, wextê ku Îsraêl nava dîltîyê da bû. Çend sal pêşîya wê yekê babêlonî hatibûn û temamîya Orşelîmê xirab kiribûn. Wana gelek binelîyên bajêr kuştibûn, yan jî dîl hildabûn. Sûrêñ bajêr şewitandî yan jî hedimandî bûn, bajar wêrankirî bû.

Xwedê kiribû dilê Nêmîya, ku ew paşda vegere Orşelîmê û sûrêñ wî, usa jî bajar çê bike. Nêmîya bona padişakî başqe qulix kiribû û layîqî begemîya padişê bibû. Padişê izin da wî ku ew here û wî hemû tişfî mîaserke, ci ku Xwedê kiribû dilê wî. Nêmîya çû Orşelîmê û merivêñ ku sax mabûn, berev kirin, piştgirî da wan, ku ew wî hemû tiştî bidine dasekinandinê, ci ku dijmin xirab kiribû. Ew rastî berxwedayîneke mezin hatibûn. Sê merivêñ resmîye cî- Sanaxat, Tûbiya û Gêsam nedixwestin ku sûrêñ bajêr bêne çekirinê. Ew miqabilî wê yekê bûn, ku Îsraêl gulvede û wana qirar kiribû Nêmîya û cimeta Xwedê ye mayîn bidine sekinandinê, miqabilî wana tişt teşkîl dikirin ku wana bitirsînin.

Wextê ev rêber derheqa bernama /programa/ Nêmîya da pê hesian, çawa ku ew dibêje, qerfê xwe pê anîn û ew bendî tiştekî hesab

nekirin /Nêmîya .2:19/. Wana ne tenê dicêriband Nêmîya û merivên wî gumanbir bikin, lê usa jî dicêribandin çavê cimetê da qedirê wan bêxin. Ü qerfê xwe wana dianîn: “Eger li ser çêkirina wana rûvîk jî rabe, sûra kö wana çê kirîye wê bihedime /Nêmîya. 4:3/.

Gelek cara meriv dicêribînin bi pêkenînê te bitirsînin. Ew dikarin qerfê xwe te bikin, yan jî li ser karebûna te şikber bin, bi kîjanê tu wî hemû tiştî dikî, ci ku Xwedê kirîye dilê te. Vî hemû tiştî ewana dikarin hema rû bi rû bikin, yan jî şikberîyê û qerfa li cem merivên başqe bikin. Usa jî diqewime, wekî meriv miqabilî te dernakevin, lê tu tevî fikira xwe şerkarîye dikî, çimkî ew bi fikirêna usa tê tobekirinê, çawa ku- gelo merivê çi bifikirin? Ewê li min bikenin, yan jî- lê eger ez nikaribim wê yekê bikim?

Nava halên vî cûreyî da gelekî ferze /girînge/, wekî em bizanbin ku Xwedê ci dibêje me. Em vê gotinê bîr bînin: “Lê Xwedê bêhişen dinê bijartin, wekî serwexta bide şermê û sistên dinê bijartin, wekî yên qewat bide şermê” /A Korintî. 1:27/. Ew tiştên ku meriv çawa tiştekî biçûk hesab dike, Xwedê wê yekê dide xebatê, ku tiştê nebûyînê bike. Peyî wê yekê ra jî Ewê layîqî pesindayînê be.

Nêmîya rojî girtin û awqas dua kir, hetanî ku fikira Xudan hate cem wî. Peyî wê yekê ra, ew li ser xwe miqabilî dijmin derket.

*“Xwedê yê Ezmîn bi xwe wê açixîyê bide me û em-xulamên wî, emê rabin, ku çê bikin, lê para we, mafê we û bîranîna we wê li Orşelîmê tune be”.*

*Nêmîya. 2:20*

Wextê ku wana fem kir, wekî ew nikarin Nêmîya bidine sekinandinê, lê îsraîlî jî nava xebata xwe da pêşda diçûn, ew gelekî hêrs ketin. Ew idî nedikenîyan, çimkî hal yê kenandinê nîbû. Wana nemamtî tekîl kir û diskirîn, wekî bi hicûmkirina /êrîşkirin/ li ser bajêr tev-hevbûnê bikeve nava progırama Nêmîya /Nêmîya. 4:7,8/. Hêrsketin jî dîsa sîlihekî tirsêye mayîne. Ewê miqabilî te bê

xebitandinê, bona ku tu gumanbir bî û bisekinî. Ji hêrsê qezîayên cûre-cûre dikarin pêşda bêñ. Ev hicûmkirin /êrîşkirin/ mecaleke kardare ku te bitirsîne. Min gelek cara dîfîye çawa meriv bona ku rastî hêrsa merivêñ başqe neyêñ, nexwestine wê yekê bikin, çi ku zanin û raste. Ew ber wana dadixun, bona ku edilaya feş /qelp/ bê xweyîkirinê.

## **Hukumê ji der û hundur**

Nêmîya ne tenê ji alîyê bêxwedêya da hate hicûmkirinê, lê tevî merivêñ wî jî problêm pêşda hatin, yên ku ji wî halê pêşdahatî ne-rehet bûn. Gelek cara, wextê Xwedê tiştekî tesmîlî me dike, em him ji der û him ji ji hundur rastî berxwedayînê û miqabilderketinê têñ.

Merivêñ Nêmîya îdî aciz bûn. Gemara dor- bera awqas zef bû, wekî xebata wan pêşda nedîçû /Nêmîya. 4:1O/. Pirseke mayîn jî hebû. Xebatkarêñ wî ye dewletî hukumê finansiyê dikirine li ser wan malbeta, yên ku nava deynadabûn, ji wana dewa bacê mezin dikirin – bona zevîyêñ çandî /Nêmîya. 5:1-8/. Evê yekê ew meriv gumanbir dikirin, malbetêñ kîjana nava tengasîyê da bûn. Ev pirsên hundur berxwedayîna wana ye himberî dijmin diha didane çetinkirinê /dijwarkirinê/.

## **Tirsa ji hemû alîya**

Ez ketime nava halêñ vî cûreyî. Wextê ku cara ewlin min gera xwe destpê kir, tewaqe ji min kiribûn ku ez alî civînekê bikim, kîjanê serwêrê xwe unda kiribû. Civîn li bajarekî biçûk bû, li kîderê 800 meriv diman. Peyî herdu qulixa ra jî hemû tevbûyêñ civînê tobe ki-rin û hukumê Xwedê li ser xwe texmîn kirin. Bi saya wê yekê reqe-ma endamêñ civînê gihişte sedî. Min û jina xwe tevayî me qulixêñ xwe dane dirêjkirinê. Me qirar kir em bivînin, wekî hîmekî qewîn li vê civînê daynin û wê civînê bona serwêrekî nû hazirkin.

Ji serwêra gelek hebûn ku xeberdana me wana xweş nedihat. Mे-riivek nerazîbû. Wextê ku ew kete qulixa sisîya hemû cahilêñ civînê

li herdu cêrgên ewlin rûniştî bûn, li kîderê ew û jina xwe rûdiniştin.  
/Li vê civînê xort û keç hert’im cêrgên xilazîyê da rûdiniştin/.

Yê mayîn jî digotin, wekî ez ji çapê derbaztir dibim. Menî ew bû, wekî wana dixwest li ser min hukumkin û civînê bi cûrê xwe pêşda bibin. Peyî çend berevbûna ra min bi kutasî got: “Hukumê min li vir şes hevtê ne. Peyî wê yekê ra serwêrê we yî nû wê qulix bike. Wê vî cûreyî be, hûn bi xwe qirarkin”.

Ewê rojê, wextê ku wana gerekê derheqa qirara xwe da elamî min bikira, narkomanekî cî min ra têlêfon kir, jina kîjanî dihate qulixê. Jinê li ber mîrê xwe xwe mikur hatibû, wekî ew tevî hevalê mîrê xweyî baş razabû. Ewî merivî qirar kiribû, hêrsa xwe li ser min û civînê birêje. Ewî gote min, wekî ewê êvarê bona min problêmê pêşda bê. Min guhdarî neda li ser gefxwerina wî. Peyî çend seheta ra serwêrek, yê ku alî min dikir, elamî min kir, wekî ewî merivî têlêfon kirîyiê û gef xwerîye, wekî wê sera civînê biteqîne.

Min teslîmî wî kir ku ew polîsîayê ra têlêfonke û tewaqe kir ku guhdarîyê bidine li ser wî merivî, peyî wî bigerin.

Çend seheta şûnda jî polîsîayê min ra têlêfon kirin. Ofisêrekî gote min: “Birêz Bîvîr, tewaqe dikim ku hûn bêne polîsîayê ku dokûmîntekê îmze bikin, wekî hûn girtina vî merivî ra qayîlbin”.

- Birêz ofisêr, ez naxwezim wî merivî girtî bivînim. Ew şikestîye. Tiştê tek- tenê ku ez tewaqe dikim ewe, wekî hûn vê êvarê parastina avayî bidine çareserkirinê.

- Nobedarıya min peyî çar seheta ra xilaz dibe, lê polîsîya lape nêzîk jî ji we 57 kîlomêtira dûrtire. Evarê ewê pêra negihînin meriva bişînin.

- Ez girtina wî merivî naxwezim,- min caba wî da.

- Birêz Bîvîr, ev çiqas wede ye hûn li vir dijîn?.

Min gote wî, wekî ez ji vî bajarî nînim.

- Birêz Bîvîr,ez wî merivî nas dikim, ew narkomane. Eger ew

hinek îçike jî vexwe, ezê tu tiştî nikaribim bikim.

Min bawarîya xwe wê yekê neanî, wekî xebatkarê polîsîayê got, ku ew meriv qeziyaye û ez hatime ser wê fikirê, wekî bi rastî usa ye. Min texmîn dikir, wekî gerekê dokûmêntê îmze nekim. Min ew înakar kir û razalixî elamî wî kir.

Karê min ne tenê gefxwarinên wî merivîva girêdayî bû, lê bi wê yekêva tevayî problêmên min serwêra ra hebû. Ez fikirîm: “Ev çîkiye?. Serwêr bona min çetinaya çê dikin, naxwezim ez li vir bim. Niha jî yekî din gefa li min û li malbeta min duxwe”. Hundurê min da dengekî digot ku ez toza li ser nigêن xwe daweşînim û hetanî berîêvarê malbeta xwe ji vî bajarî derxim. Eger min nizanibûya, wekî Xwedê ez şandime li vir, ezê boy malbeta xwe ji wir dûrketama. Çawa jî hebe rûê sê menîya da, dilê min ïzin nedida min ez herim. Ya ewlin ew bû, wekî Xwedê ez şandibûme li wir û min ji Wî nebibîstibû, wekî ezê bikaribim ji wir dûrkevîm. Ya duda- min nedixwest ji wan meriva dûrketama, kîjana hazırlîya Xudan texmîn kiribûn, ya sisîya jî ew bû, wekî ez difikirîm, ku eger tu carekê rûê tirsê da birevî, cara mayîn wê diha hêsa be birevî.

Fikira Xudan li cem min hebû û min qirar kir bimînim, eger ew yek wê anegorî qirara serwêra bûya. Çend sehet min nava dua da derbaz kirin. Pêşkêşa Xwedê nava min da qewat stend. Ez bona qulixa êvarê hazır bûm.

Ez gîhiştîme civînê û pê hesiyam, wekî ez gerekê nemînim, çimkî serwêr pêşîya qulixê berev bibûn û qirara xwe qebûl kiribûn. Ji wana yekî gote min, wekî wana qirar kirîye ku ez ji bajêr herim. Wê êvarê qulixa mine xilazîyê /dawîyê/ derbaz dibû.

Ez ber xwe ketim. Û min qirar kir guhdarîyê bidime li ser wê yekê, ku ewê êvarê Xwedê çi dixwest bona cimetê bikira. Ez bi hukumekî mezin berbirî cimetê bûm û qewata Xwedê awqas mezin bû, wekî hemû meriv ketibûne erdê.

Ji wana gelek, yên ku ji Xwedê dûrketibûn, emirên xwe pêşkêşî

Xudan kirin. Ew merivê ku gef dixwarin, li wir nehate kivşê. Dawîya qulixê ez mecbûr bûm elam bikim, wekî serwêr naxwezin, ku ez li wir bimînim. Cimetê dengê nerazîbûnê bilind kir.

Hevtêk derbaz bû. Hema wan serwêra nava xwe da serwêrek bijart, yê ku çawa ku paşê eşkere bû, ji rîya xwe derketibû. Nava sala mayîn da wana çar serwêr ber hev guhartin.

Ruhê tirsê, kîjan nava serwêrên wê civînê da dixebeitî, zyanekê mezin gîhande wê olkê.

## **Bimîne qewat û xwegirtî**

Nêmîya teze pirsên xwe ye nava merivên xweda dabûne helkirinê, wextê ku pêleke tirsê ye mayîn pêşda hat.

“Wî çaxî Sanabaxat û Gêsam meriv şandine cem min û gotin, were em tevayî li deşta Vovnovê, li gunda, rastî hev bêñ, lê ewana difikirîn, xirabîyê min bikin. Min meriv şandine cem wan û gote wan: “Ez bi karekî mezinvâ mijûlim û nikarim peya bim. Bona çi kar bisekine?”. Feqet wana bi vî meremî çar cara meriv şandine cem min û min hertim ew cab da destê wan” /Nêmîya. 6:2-4/. Sanabaxat û Gêsam usa dikirin ku guhdarîya Nêmîya biguhêzine ser tiştekî mayîn. Feqet Nêmîya qewat bû û guhdarîya wî li ser wî tişfî bû, çi ku Xwedê tesmîlî wî kiribû. Nêmîya nedixwest, wekî ew qewata wî bê teribandinê.

Dijmin hertim dixweze guhdarîya me ji ser wî tişfî dûr bixe, ku karê me neyê sêri. Mîrêcin ne carekê, lê wê hertim bicêribîne wê yekê bike. Em gerekê nava qirara xwe da diha gelekî qewat bin, ne ku ew. Bo wê yekê jî Kitêba Pîroz dibêje: “Bi bawarîya îzbatbûyî miqabilî wê yekê derkevin...” /A Petrûs. 5:9/. Xebera “îzbatbûyî” fikira “qewat, li ser qirara xwe” tîne ber çava. Gelek meriv ji çend derbêñ dijmin teslîm dibin, lê bi rastî ew gerekê usa qewîn bimînin, hetanî ku bighîjine serkevtinê.

### *Pêşda bicedîne*

Sanabaxat xulamên xwe cara pêncâ şandine cem Nêmîya, lê vê carê bi namekê, kîjanê da ewî Nêmîya nava wê yekê da gunekar dikir ku ew miqabilî wî ye û ewî li Cihûdayê xwe çawa padişa hesab dike /Nêmîya. 6:5-7/. Eva gunekarkirina derew bû.

Nêmîya xebata xwe dîsa berdewam dikir. Rûê buxdana da ewî guhdarîya xwe dîsa ji ser şuxulê xwe dûr nedixist. Gelek cara em dicêribînin xebata xwe bihêlin û pirsên tevî dijmin bidine helkirinê, yê ku dicêribîne me bitirsîne.

Min çavê geleka nihêrîye û gotîye: “Bona ci ïzinê didin, wekî dilên meriva hukumî li ser wê yekê bikin, bona ci jî Xwedê gazî we kirîye? Wextê ku yek we gunekar dike, ew yek nade kivşê, wekî ew raste, yan jî rastîyê dixweze. Hûn gerekê wê yekê bizanibin, ci Xwedê derheqa we da dibêje û progirama Wî ye bona we ci ye.

Bona ci hûn guhdarîyê didine li ser tiştên vala? Kitêba Pîroz dibêje: “Caba yê neserwaxt nede, çimkî tu dikarî bibî mîna wî”  
/Gotinê Silêman. 26:4/.

Merivê xilaziyê, yê ku dicêriband Nêmîya bide sekinandinê, hat û got, wekî Nêmîya gerekê li paristgehê xwe veşêre, çimkî dijmin tê wî bikuje /Nêmîya. 6:10/. Eger Nêmîya karê xwe bihişta, ew yek wê meriv sist bikirana û xebatê ser hevda nehata.

Nêmîya cab da: “Gelo merivê mînanî min wê bireve û here paristgehê ku sax bimîne?. Ezê neçim” /Nêmîya. 6:11/. Paşê Nêmîya fem kir, wekî Xwedê ew meriv neşandibûn. Ewî miqabilî Nêmîya pêxembertî kir, çimkî Tûbîya û Sanabaxat ew kirê kiribûn. Niha binihêre ku Nêmîya peyî wê yekê ra ci got:

*“Bona wê yekê ew kirê kirine, ku ez bitirsim û usa bikim, ku neheq derkevîm û ev jî bona wan bibe menî, ku navê min xirabkin, qedirê min bêxin”.*

*Nêmîya. 6:13*

Dijminê navê te ra bilîze ku tu bitirsî û xwe biparêzî. Li cem

Nêmîya fikira Xudan hebû û bona wê yekê jî ew dikaribû firqîya paqijîyê û rastîye ji xirabîyê ji hev cuda bike.

Kirinên Sanabaxat, Gêsam û Tûbîya ye hazirkirî Nêmîya vî cûreyî qîmet kirin:

*“Çimkî wana em ditirsandin û digotin, wekî destên wan wê ji wî şuxulî sistbin û şuxulê neyê kirinê. Lê Tu, Xudan, qewatê bide destên me”.*

*Nêmîya. 6:9*

Em dîsa meremê tirsandinê divînin. Ew dixwezin me sist bêxin, ku em nikaribin xwestina Xwedê mîaserkin û li ber ewê ku ditirsîne ber xwe nedin. Eger em li ber vê yekê nesekinin, emê binkevin.

Dijminê me- mîrêcin gelek rûyên tirsandinê çê dike, wextê ku em dikevine têrîtorîya wî. Eva carek nîne ew usa dike, dicêribîne û paşê paşda vedikişe. Eger ew bikaribe mecbûrke ku em bisekinin, yan sistbin, wî çaxî ewê nehêle, ku padışatîya Xwedê pêşda here.

Nêmîya û merivên wî çêkirina sûrê ser hevda anîn. Niha îdî bajarê parastî dikaribû bihata daçêkirinê. Ew yek ne tiştekî hêsa bû. Li ser her gavekê ew rastî berxwedayînê dihatin. Feqet meriva zanibû, wekî Xwedê xeberdabû û wana paşdavekişandin încar dikir.

## **Bi qelaştina berxwedayînê tirsê bişkênin**

Mesela Nêmîya bona bawarmenda meseleke klasîke:

*“Ez navêjim ku ez îdî gihîştîme meremê xwe, yan jî îdî kamil bûme, lê ez peyî ketime, ku wê xelatê qazanckim, bona kîjanê Mesîh Îsa ez qazanc kirime”.*

*Filîpî. 3:12*

Li vir xebera kîlît “cedandine”. Pawlos bi Ruhê Pîroz got- Ez dicedînim. Nêmîya jî dicedand û gelek cara nava berxwedayînê ra

*Pêşda bicedîne*

derbaz dibû. Em nikarin dora wê yekê ra derbazbin. Em gerekê li ser xwe guman kar bikin û bi qelaştina wê yekê, nav ra derbazbin. Pawlos digot:

*“Dicedînim bighîjime meremê xwe, wê lecxelata jor-çûyînê, awa gotî gazîya Xwedê ye bi saya Mesîh Îsa bistînim”.*

*Filîpî. 3:14*

Tomerî hildayî lecxelata bilind û nimiz heye. Ya jorin emireke, bi kîjanê tu li ser dinîayê dijîyî . Nava wî emirî da padışatîya Xwedê bi emirê şexsê mîrîv tê kivşê. Merivên ku nava wî navî da dijîn, hukumî li ser dor- bera dikin.Bi mayîna nava wî hukumî da,ew dicîribînin atmosifêra ruhanî biguhêrin û azayê ji hukuma tînin.

Tarîstanî nikare li ser ronayê keve, çimkî ronayî tarîyê dûr dixe. Bi çiqasîva ronayî qewate, bi awqasîva tarîstanî tê belakirinê.Bi vî cûreyî em nava hukumê padışatîya Xwedê da digerin.Bi vî cûreyî em merivên dor- bera tînine bin serkarîkirina padışatîya Xwedê.

Îsa dikaribû t'evî gunekara nan ker bike, çimkî ewî dikaribû atmosifêra dor- bera bin hukumê xweda xweyîke.Eger tu nava Xwedê da diha qewatî, ne ku yekî bêbawerî nava mîrêcin da, tu dikarî hukumê xwe li ser dor- bera bihêlî. Eger gunekar nava xirabîyê da diha zêde ne, ne ku bawarmend nava heqîtîyê da,wî çaxî ewê bêbawer wê li ser dor- bera hokum bikin.

Eger te qirar kirîye nava lehcixelata jorin da bijîyî, tê rastî berxwedayînê û miqbilderketinê bêyî. “Belê, her kesê ku dix-weze yekîtiya Mesîh Îsa da bi xwedînasî bijî, wê bê zêrandinê” /B Tîmotêyo. 3:12/. Dîsa me ra tê gotinê: “Gerekê em bi gelek cefakişandina bikevine Padişaftîya Xwedê” /Karêن Şandîya. 14:22/.

Gelek mesîhî qirar dikin û nava lecxelata jêrin da dijîn.Bona çî?. Ew naxwezin rastî wê berxwedayînê bêñ, bi kîjanê ewê berbi ya jorin bicedînin. Ew hesab dikin, wekî diha baþe merivên dor-berêñ xwe ra yole herin, ne ku bi berxwedayîna Xwedê wana bidne

guhartinê. Diha hêsa ye wana ra yole herin, ne ku miqabilî wan bisekinin. Hinek meriv, wextê ku rastî miqabilderketinê têñ, qirar dikin, berbi berdaxustinê herin û rîya berxwedayînêye here sist digerin.

Bi fikira min menî ewe, wekî gelek cara em dixwezin emirê baş û hêsa çêkin. Û pêra jî em naxwezin miqabil derkevin. Em fesal emirê xwe çê dikin û ji çetinaya xwe dûr digrin. Ez ne ku çetinayê emir afû dikim, lê bi rastî difikirim, wekî em diha gelekî gumana xwe di-dine li ser proêkta û progirama, ne ku li ser Xwedê.

Li Amêrikayê, eger em nexwaş dikevin, em carekê ra direvine li cem doxtir. Lê em pêşda nafikirin dua bikin, çimkî em zanin, wekî qulixdarîya usa heye, kîjanê xercê doxtirîyê hilde ser xwe. Dewsa xebata me, bona hevtêkê yan duda çêka aylixê didine me. Eger em xebatê unda dikin, em statûsa bêxebatîyê distînin, kîjan hinek alîkarîya finansiyê dide çareserkirinê. Eger ew yek jî xilaz dibe, wî çaxî alîkarîke mayîn heye, lê eger ew jî neyê dayînê, em dikarin progiramekê bivînin, kîjanê piştgirîya me bike. Diqewime hema bona xweranedîtinê jî pera bidine me.

Têlêvîzîon jî me ra diêbjê bi emirê pasîv bijîn. Amêrikî nava hevtê da nêzîkî 24 seheta wedê xwe li ber têlêvîzîonê derbaz dikin. Em ïzinê didin, wekî saytên intérnêtê û Holîvûd dewsâ me bifikirin. Prînsîpêneji ji bernamên wana saz dibin.

Cîyên xwarina lez me ra xwarinê pêşnîyar dikin, ku em bêyî çetinayî lez nan bixun. Gelek cîya jî xwarina bêheq didin. Li cem me posta lez heye, paqikkirina kinca ye nava sehetekê da, derxistina şikila ye lez, guhartina rûnê avtomaşîna ye lez, stendina deng û behsa ye lez hene û evana tenê çend tiştên ku min gotin, ewin.

Ji wana gelek tişt basın. Bi saya van tişta, em wedê xwe diha gelekî bona tiştên diha girîng didine xebatê. Feqet dîsa gelek cara em tiştê herî girîng /ferz/ nikarin bibijêrin. Gelek meriv roja îroyîn naxebitin, çimkî bona gihîştina wî tişfî ew gerekê gelekî bixebeitin.

Telebextra fikirdarîya vî cûreyî usa jî ketîye nava civîna roavayê. Hindik mesîhîyî xweyê xeysetê qewînin, kîjan bona gihîştina lecxe-

lata Xwedêye jorin lazime. Wextê ku ew rastî berxwedayînê têن, ew gavêن xwe berbi berxwedayîna diha sist diavêjin. Pêşda ev rîya revê tê texmîn kirinê çawa gaveke baş, kîjan açixîya hêsa destanî soz dide. Îsa em hîn kirin, ku li ber çiayên dijmin bisekinin, peyî kîjanê ra jî ewê ji cîyê xwe derkevin. Bi gotinêن mayîn, çîyê xirabke, eger tu pêra jî mecbûrbî kevir bi kevir xirabkî. Yêن mînanî Nêmîya nava çîya ra derbaz dibin û li ser xwe gumanin, wekî bona wana tiştêن nebûyînê tunene, yên ku bawar dikin /Metta. 17:20/. Ewêن ku bi rîya hêsa diçin, dora çîya ra derbaz dibin û ji miqabilderketinê dûr disekinin.

Gava hûn peyî edetêن vê dînyayê diçûn, li gora xwestina Mîrê serwêrtîya vê hewê, wî ruhê ku niha jî nava wan meriva da ya xwe dike, yên ku ne gura Xwedê da ne /Efesî. 2:2/. Ezman eşkere miqabilî van edeta ye. Çûyîna bi rîya ezman dide kivşê, ku tê ese rastî miqabilderketina edetêن vê dînyayê bêyî. Telebext ra edetêن vê dînyayê usa jî li gelek civîna serwêrtîyê dike.

Ez evê berxwedayînê himberî gemîkê dikim, kîjan miqabilî çêm dice. Tê hema usa bicêribînî gemîyê miqabilî avê bajoyî. Ü gerekê nesekinî. Eger tu dequekê jî bisekinî avê te bibe, çawa ew dikişê. Raste, diqewime pozê gemîyê bilind bûye, lê tê herî jér. Titêن vî cûreyî rastî wan bawarmenda têن, yên ku naxwezin pêşda herin. Ew dicêribînin bidine kivşê, wekî alîyê mesîhîtiyê diçin, lê niha ew tevî dînyayê diçin. Merivêن vî cûreyî qewata xwe unda kirine û kardar nînin. Bi bîranîna gotinêن Îsa, em dikarin bêjin, wekî ew “îdî kêri tu tişfî nayêن” /Metta. 5:13/.

## **Qewat be**

Peyî wê yekêra, wextê ku Pawlos ber dilê Tîmotêyo da hat, ku ew pêşkêsa Xwedê gurke, ewî serda zêde kir: “Awa, lawê min, bi wê kerema meye, ku yektîya Mesîh Îsa daye, qewat be” /B Tîmotêyo. 2:1/. Bona pêşdaçûyînê û serkevtina himberî tirsê, em gerekê qewat bin.

Pawlos vî cûreyî şîretê diçin civîna Korintiya:

*“Hişyar bin, nava bawarîyê da qewîn bin, serxwe bin  
û qewat bin”.*

*A Korintî. 16:13.*

Bawarmendê bê tirs rû bi rû li ber çetinaya diseleine.

Xwedê Hêşû ne ku carekê, lê hevt cara piştgirî dayê, ku ew qewat be û li ser xwe be:

*“Tenê qewat be û li ser xwe be, ku mînanî wê qanûnê  
bikî, kîjan Mûsa yê xulamê Min te ra gotîye. Ji wê yekê  
şas nebî, ku vî alî, yan wî alî herî, li hemû cîya serwext  
bî, li kîderê tu diçî”.*

*Hêşû. I:7*

Guhdarîyê bide ser wê yekê, wekî Xwedê got qewat be û li ser xwe be. Merem kîjane, ku ew bona serketina nava şêr da got, yan ew bibe rîbereki mezin? Na xêr, ew yek bona xweyîkirina Gotina Xudan bû. Hema bi vê yekê Hêşû wê bibûya rîbereki mezin û wê nava hemû şer ada serketa. Tirs dicêribîne te ji wê azayê dûrxe, bi kîjanê gura Gotina Xwedê dayî. Bona wê yekê jî em gerekê her car qewat û li ser xwebin, lê ne ku ji wê yekê birevin, ci ku em zanin raste.

Eger em fikira xebera “mêrxasî, yan jî li serxwebûn”-ê şirove bikin, emê bêne ser vê fikirê:

*mêrxasî bona me haziriya bona berxwedayîna li ber  
çetinayê, yan qezîyê ye û ew yeke, ku em jî çetinaya  
nerevin.*

Lê xebera miqabilî mêrxasîyê kîjane? Tu dikarî texmîn bikî, wekî xebera wekî mayîn yan tirse, yan jî sistbûne. Nava vê fikirê da hinek rastî heye. Fejet were em hildin xebera “gumanbirî”. Xwedê digote Hêşû û me, ku em qewat bin, li ser xwe bin û ïzinê nedîn,

## *Pêşda bicedîne*

wekî gumanbirî bikeve dilê me, çimkî ew yek wê me ji mîaserkirina xwestina Xwedê paşda xweyke.

Were em niha jî fikira xebera “gumanbirî” bînin ber çava:

*gumanbirî dide kivşê, ku em ji mîrxasîyê dûr in, em  
dibine gumanbir; bawar nakin, gumanâ xwe dibirin.*

Bîr bîne, ku çawa Îlyas rûê tirsa ji alîyê Îzabêlê da gumanbir bû. Ew tırsîya û revî. Îlyas gumanâ xwe usa unda kiribû, ku ew ji hukumê xweyî heyî derketibû. Em gerekê gumanbirîyê çawa dijmin qebûlkin. Em gerekê qewata wê jî usa h'esab nekin, ku ew biçûke. Ew yek nahêle, ku em bighîjine lecxelata Xwedêye jorin. Gumanbirî meriva dikuje. Eger em miqabilî wê yekê dernekevin, ewê me mecbûr bike, ku em paşda vekişin.

*“Lê yê ber min rast, wê bi bawarîyê bijî û eger ew  
paşda vekişe, ez wî begem nakim”.*

## *Îbranî. 10:38*

Gelekî ferze /girînge/ fem bikin, wekî Xwedê tirsoneka begem nake. Me ra hatîye gotinê: “Ewê ku serkeve, her tiştê para wî bikeve, ezê bibime Xwedê yê wî, ewê jî bibe lawê min. Lê para tirsoneka, bêamina, kirêt- herama, merivkuja, bênamûsa, serbaza, pûtparista û hemû derewîna wê gola agirê ku kirkûtêva dişewite, bikeve. Eve mirina duda” /Eyantî. 21:7,8/.

Xebera “tirsonek” derheqa wî merivî da ne, yê ku wextê qezîayê, yan jî eşê tê, tirsa bi şermî dide kivşê”. Gelo ew yek tu tiştî navêje mîriv, wekî Xwedê nava cêrga merivkuja û bênamûsa da navê tirsoneka jî dide, lê em xwe afû dikin û dibêjin, wekî tirsonektî sistbûne.

Na xêr. Tirs ji bêbawarîyê tê, lê bona bêbawarîyê jî lawên Îsraîlê emirê xwe dan. Ew tu cara neketine welatên sozdayî. “Îdî em divînin, ku ji dest nebawarîya xwe nikaribûn dûrketana” /Îbranî. 3:19/.

Ew yek roja îroyîn jî raste, tirsonek ser nakeve. Ew wê yekê

nastîne, çi ku bona wî hatîye sozdayînê. Xudan bi destî Pawlosê şandî me ra dibêje:

*“Lê tenê çawa layîqî mizgînîya Mesîhe hûn xwe usa xweykin, ku eger ser we da bêñ û we bibînin, yan dûrva bibhêñ, bizanibin, ku we bi ruh û dilekî pişt daye pişta hev, bona şerkarîya bawarîya Mizgînîyê sekinîne. Tu alîyava ji peyîketîyên xwe venekîsin”.*

*Fîlîpî. 1:27,28*

Qewîn bisekine û ïzinê nede, ku dijminê te te bitîrsînin. Qewat be, li ser xwe be, bona berxwedayînê hazir be û ji wê yekê nereve. Nava gotina mayîn da Pawlos wa dibêje:

*“Eva kerema Xwedê bona xatirê Mesîh daye we, wekî ne ku tenê hûn wî bawar bikin, lê bona wî cefê ji bikişînin”.*

*Fîlîpî. 1:29*

Gelo ev çi cefa ye, kîjanê gerekê em bivînin? Petrûs cabê dide:

*“Awa Mesîh ku bona me bedenî cefa kişand, hûn jî bi wê nêt- fikirê sîlihkîrî bin, çimkî yê bi bedenî cefa kişand, wî dest ji gunha kişandîye, wekî heta mirina xwe ne ku bi gora dilhavêjîyên xweye merivayî bijîn, lê li gora qirara Xwedê”.*

*A Petrûs. 4:1,2*

Cefa ewe, rastî çi em têñ, yan jî sebir dikin, wextê ku bedena me, yan jî hukumê yêñ mayîn li ser me hukum dikin, wekî em alîkî da herin, lê xwestina Xwedê jî çûyîna li alîkî mayîne. Me ra hatîye emirkirinê, ku em qewat bin û li ser xwe bin, wekî gotina Xudan xweyî bikin.

Petrûs dibêje, wekî em bona wê yekê gerekê xwe sîlihkin. Wextê

*Pêşda bicedîne*

ku mesîhîyî xwe sîlih nake, yan jî bona cefakişandinê xwe hazir nake, dibe mîna leşkerekî usa, yê ku bêyî sîlih diçe şer. Ev leşke-ra yan wê dîl bikeve, yan jî bê kuştinê. Ew mesîhîyên, ku bona cefakişuandinê sîlihkirî nînin, gelekî hêsa dîl dikevin, rûê tîrsa ji alîyê meriva da têne girtinê.

Em gerekê bona berxwedayîna nişkêva hazirbin, kîjanê rêberîyê me bike, wextê cedandina berbi lecxlata jorin.Bi vê yekêva tevayî Pawlos li ser xwe guman dibêje: “Xudan wê ji her kirên xirab xilazke û sax –silamet bighîne padişatîya xwe ye Ezmana. Şikir ji wî ra, heta- hetayê” /B Tîmotêyo. 4:18/. Xwedîyê hertim jî me xilazke, ku em bighîjine şikirîya Wî. Alêlûya.

Bi guhdarî wan xeberên ji gotina Xwedê bixwîne. Usa bixwîne, çawa tê bêjî te tu cara ew nexwendine. Carna bisekine û li ser her Gotinekê bifikire, îzinê bide, ku Ruhê Pîroz wana ronayî bike.

*“... Eger Xwedê piştameye, kî dikare miqabilî me be? ”.*

*Romayî. 8:31*

*“Çi tiştê ızbat ke, ku hizkirina Mesîh li ser me sar bûye?  
Derd- kul, teli- tengî, zérandin, xelayî- celayî, bêsitarî,  
qedâ- bela, yan şûr? Lê em nava van hemû tişta da hê  
zêde ser dikevin, bi saya Ewî ku em hiz kirin”.*

*Romayî. 8:35,37*

*“Hûn ji Xwedê ne, zarok û hûn ser pêxemberén derew  
ketine, çimkî ew Ruhê nava we da ji wî Ruhê ku nava  
dinîyaê da ye, mestire”.*

*A Yûhenna. 4:4*

Paqijaya dilê xwe xweyî bike û çawa lawê Xwedê û xulamê Wî li ser tabîya hukumê xwe bimîne. Tenê wî çaxî tu dikarî li ser xwe guman elamkî:

## Xebera xilazîyê /dawîyê/

---

Bi serhevdaanîna kitêbê, ez ber dilê weda têm, ku tu cara ïzinê nedine xwe, ku ji neaçixîyên berê yek we paşda bikişîne. Pêşeroja xwe bi tiştên derbazbûyîva qîmet neke. Eger tu usa bikî, tê ji emirê derbazbûyî pêş nekevî. Ew yek ferz nîne tu çiqas ketî, çawa jî hebe, gumanekе qewîn heye. Xwedê pêşekzanê usa ye, ku dikare tirsoneka werguhêzî yên usa bike, ku ew serkevin. Alêlûya! Hukumê Wî nava sistbûnê da dixebite.

Çawa meseleke wî cûreyî em emirê birayê Şimhûn Petrûs-Andrêas bînin ber çava. Wê şevê, wextê ku Îsa girtin, hemû şagirt Ew hiştin û revîn /Metta. 26:56/. Petrûs yê tek- tenê nîbû ku tırsîya. Andrêas jî bona xilazkirina emirê xwe revî. Ev gava tırsonektîyê nade kivşê, wekî Andrêas gerekê tırsonek bima.

Peyî rabûna Îsa ye ji nava mirîya, Andrêas li Yêtovpîayê digerîya û Xebera Xwedê digîhande cimetê. Yêtovpîya wî çaxî bin desthilatdarîya Romayê da bû. Nava vê xeberê da binihêrin, ku çawa Andrêas pesinê Îsa da /Ji kitêba Foks/.

*Wextê kö Andrêas bi xeberdana xwe ye aktîv gelek anîne li ser bawarîya Mesîh, Êgêasê serkar ji sénata Romayê ïzin xwest ku hemû mesîhiya bi destê zorê bona qedirê romaya bikini qurban. Andrêas fikirî, wekî ew gerekê miqabilî Êgêas derkeve, here bêje wî, ku hakimê meriva pêşda gerekê Hakimêezmîn naske. Andrêas gotîye, wekî bi hebandina Xwedê yê rast, Êgêas gerekê hemû xwedêyên feş ji fikira xwe dûrxe. Êgêas li ser Andrêas hêrs ket û dew kir, ku bizanibe, ku ew meriv kî ye, yê ku van axirîya tev-hevbûn li paristgeha xwedêya pêşda anîye û meriv anîne li ser wê fikirê, ku ew bibine mesîhî, çimkî mesîhî li Romayê çawa tiştékî bêqanûnî dihate naskirinê.*

*Andréas cab da, wekî serkarêن Romayê rastîfem nedikirin. Kurê Xwedê, Yê ku bona meriva hate dinîyâê, hîn kir, wekî xwedêyên romaya cinin, dijminêن merivatîyê ne, kîjan hîn dîkin Xwedê bêhurmetkin û rûê wê yekê da Xwedê ji meriva dûr dikeve. Bi qulixkirina bona cin, meriv dikevine nava her xirabîkê. Andréas digot, û peyî mirinê ra jî xêncî tiştêن xirab tu tişt nayê bîranînê.*

*Êgîas emir kir, ku Andréas idî tu cara tiştêن vîcûreyî nevêje, lê eger dîsa usa bike, ewê bê xaçkirinê. Peyî vê yekê ra Andréas cab da: "Minê negota, wekî xaç hurmet û pesindayîne, eger ez ji mirina xaç bitîrsîma". Dîwana wî bona hînkirina wê yekê û înkarkirina xwedêyên romaya, hate kirinê.*

*Andréas çû cîyê ku gerekê wî xaçkirana û wextê ku ewî xaç dît, ji tu tiştî netîrsîya û ji gotinêن xwe paşda nesekini. Wextê xaçkirinê, ewî femdarîya xwe unda nekir. Ewî got: "O, xaçê ku ez awqasî hîvîya te bûm. Bi fikira xwe ez hazirim, bi şabûnê tijîbûyî me û bi xwestineke mezin ez tême cem te. Ez şagirtê Wî me, yê ku xaç kirin. Min hertim te hiz kirîye".*

Eva hema ew meriv bû, yê ku bona xilazkirina emirê xwe revî, wextê ku Îsa girtin. Ew hatibû guhastinê.

Bi gîlîkî hemû şagirt jî, yên ku revîn, xilazîyê bona şedetîya Îsa Mesîh hatine kuştinê. Xwedê mecal pêşkêşî wan kir, hema bona wê yekê, ji çi ew revîn. Bi dayîna emirên xwe, şagirta hukumê tirsê şikênand.

"Ewê ku dilê we da dest bi şuxulê xweyî qenc kirîye, wê heta Roja hatina Mesîh Îsa jî bîghîne sêrî" /Filîpî. 1:6/.

Emirê şagirta şedetîya wê yekê dide, ku çawa Xwedê bêaçixîyêن me werguhêzî serketina dike. Paşda venekişe, lê bawarîya xwe Wî

bîne, Yê ku tu hizkirî û emirê Xwe bona te da.

Were em tevayî dua bikin:

*“Bavo, bi navê Îsa ez tewaqe ji Te dikim, bi saya hizkirin û serwextîya Xwe qewatê bide. Min bibaxşîne, wekî wextê çetinayê ez paşda vekişîya me, bona xweykirina xweşîya xwe. Xudan Îsa, iro ez înkarkirina şexsê xwe dibijérîm, ezê xaçê xwe hildim û peyî Te bêm. Ez xulamê Te me, ez pêşkêşa Te qebûl dikim, kîjanê qewatê bide min, ku ez bikaribim gotina Te bêjim û li ser xwe guman, bi hizkirin xwestîna Te mîaser bikim”*

Niha jî bêje Ruhê tirsê û hukum:

*“EZ gotinên tirsê û hukum xirab dikim, kîjan ji alîyê merivên başqe da li ser emirê min hatine elamkirinê. EZ giréfûtkên tirsâ mîrîve nava emirê xwe da xirab dikim. Ruhê tarîyê ye heram, ez miqabilî we derdikevîm û gura Xwedê da me. Cîyê te nava emirê min da töne. Bi navê Xudan Îsa Mesîh dûrkeve. Amîn”*

*“Wî ra, yê ku dikare we ji ketinê xweyî bike û li ber rûmeta xwe bêqisûr eşq bide sekinandinê. Xwedê yê bêşirîkî- bêheval, Xilazkirê me ra, bi destê Îsa Mesîhê Xudanê me, şikir û mezinayî, qudret û hukumet be, berî her- heyê û niha jî heta-hetayê! Amîn”.*

*Cihûda. 24:25*

Van matêriyala û usa jî matêriyalên Con û Lîza Bîvêra ye hînbûnê ye bi  
zimanê ermenî hûn dikarin ji van malpera ber bigrin:

[www.Messengerinternational.org](http://www.Messengerinternational.org)  
[www.CloudLibrary.org](http://www.CloudLibrary.org)

Matêriyalê bi zimanên cuda-cuda jî meriv dikare li van malpera temaşê  
bike û ber bigire:

**Youtube.com** û **Youku.com** û ji saytên mayîn

Bi wê serwertiya ji alîyê Xwedê da dayî gava  
biavêje, yan na, yekê ewê ji te bistîne û dijî  
te bide xebatê.

Her merivek nava emirê xwe da nava demekî da tirsîayî bûye. Tu bi rastî zanî, ku ew yek qewimî, yan jî ci bikî ku ew careke mayîn neqewime? Con Bîvîr wê yekê eşkere dike, xeleqa tirsê dişkêne û te hîn dike çawa pêskêşen Xwedê aza berdî û serwertiya Wî ye bilind nava emirê te da îzbatbe.

## Tu dikarî wê yekê bikî

Li ber koka tirsê ye here kûr ber xwe bide û wê yekê hîn be, ku bona ci te ra çetine bêjî “na”, bona ci ji şerkarîyê ditîrsî, bona ci ji pevcûyînê dûr dikevî û bona ci awqas ênêrgîya xerc dikî ku dilên yên mayîn bidî razîkirinê. Îzinê nede ku tirsa te te paşa bigire. Ser hişê xweda were, ji wê yekê aza be û bi serxwebûneke nû va pêşda here- bi qewata Îsa Mesîh.



CON BÎVÎR avtorekî eyan e, xeberdankirê civîna ye eyan û qulixçiyê rûnkirî ye. Ew û jina wî- Lîzayê, ya ku dîsa avtoreke eyan e, sala 1990-î “Qulixdarîyên Con Bîvîr saz kirin. Qulixdarî awqas pêşda çû, wekî ew werguhêzî ya navnetewî bûye, dikeve nava kîjanê usa jî programa têlêvîzîonê ye “Temîanîn”. Kitêbên Cone mayîn evin- “Tela şeytan”, “Tirsa Xudan”, “Gelo Xudan wa dibêje?” û “Derê şeytan”.

Van matîriyala û usa jî qinyatîn mayîn hûn dikarin ji vê malperê ber bigrin:  
[www.CloudLibrary.org](http://www.CloudLibrary.org)

Dixeza zede bîzanbin?  
Vi silî ber bigrin.



teach reach rescue  
**Messenger International**<sup>®</sup>  
[MessengerInternational.org](http://MessengerInternational.org)



Ev kitêb pêskêşa ji alîyê xudanê  
kitêbê da ne û bona frotanê nîne.